

the journal of mesopotamian studies



Periodical Journal for Kurdish, Arabic and Syriac Studies
Vol. 2/2 Summer 2017

ISSN: 2147-6659



MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ



The Journal of
Mesopotamian Studies

Periodical Journal for Kurdish, Arabic and Syriac Studies

Vol. 2/2 Summer 2017

ISSN: 2147-6659

Mardin Artuklu Üniversitesi Adına:
Owner on Behalf of Mardin Artuklu University:

Prof. Dr. Ahmet AĞIRAKÇA
(Rektör)

Editor | Editor in Chief
Doç. Dr. M. Nesim DORU (Enstitü Müdürü)

Sayı Editörleri | Issue Editors
Dr. Zülküf ERGÜN, Dr. Shahab VALİ

Editör Yardımcıları | Assistant Editors
Arş. Gör. Kenan SUBAŞI, Arş. Gör. Ziyattin YILDIRIMÇAKAR

Yazı İşleri Müdürü | Editor In Chief
Ali DEMİR (Enstitü Sekreteri)

JMS Kordinatörü | Coordinator
Uzm. Ferhat DEMİRALP

Yönetim Kurulu | Board of Directors
Doç. Dr. Mehmet Nesim DORU, Doç. Dr. Abdurrahman ADAK, Dr. Shahab VALİ,
Dr. Necat KESKİN, Dr. Kutlu AKALIN, Dr. Zülküf ERGÜN

Yayım Kurulu | Editorial Board
Doç. Dr. Mehmet Nesim DORU, Doç. Dr. Rafik SULEIMAN, Doç. Dr. Abdurrahman ADAK, Dr. Kutlu AKALIN,
Dr. Mustafa ASLAN, Dr. Shahab VALİ, Dr. Necat KESKİN, Dr. Yılmaz ÖZDİL, Dr. İbrahim BİNGÖL, Dr. Mehmet Tayfun,
Dr. Zülküf ERGÜN

Danışma Kurulu | Advisory Board

Prof. Dr. Ahmet AĞIRAKÇA - Mardin Artuklu Ünv., Prof. Dr. Abdülhalim AYDIN - Fırat Ünv., Prof. Dr. Farouk ISMAEL- Univ
Hamburg (Almanya), Prof. Dr. Eleanor COGHILL - Uppsala Ünv (İsveç), Prof. Dr. Carina JAHANI Uppsala Ünv (İsveç), Prof.
Dr. Gülsat AYGEN - Illinois Ünv. (ABD), Prof. Dr. Arda ARIKAN - Akdeniz Ünv., Prof. Dr. İbrahim ÖZCOŞAR - Mardin
Artuklu Ünv., Prof. Dr. Mesut ERGİN - Dicle Ünv., Prof. Dr. M. Faruk TOPRAK - Ankara Ünv., Prof. Dr. Vahab VALİ (İran), Doç.
Dr. Abdulwahab K. MOUSA - Zahro Ünv. (Irak), Doç. Dr. Abdurrahman ADAK-Mardin Artuklu Ünv., Doç. Dr. Hazem Said
MONTASIR - El-Ezher Ünv (Misir), Doç. Dr. Jean François PEROUSE - İst. Anad. Arş. Enst., Doç. Dr. M. Nesim DORU - Mardin
Artuklu Ünv., Doç. Dr. M. Sait TOPRAK - Mardin Artuklu Ünv., Doç. Dr. Vahap ÖZPOLAT - Mardin Artuklu Ünv., Dr. Amr
TAHER - Harward Ünv. (ABD), Dr. Barzoo ELIASI - Oxford Ünv. (İngiltere), Dr. Kaveh DASTOOREH - Koye Ünv. (Irak), Dr.
Khaled KHAYATI - London Ünv. (İngiltere), Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN - Bingöl Ünv., Dr. Nesim SÖNMEZ - Van Yüzüncü Yıl
Ünv., Dr. Osman ASLANOĞLU - Dicle Ünv., Dr. Yavuz AYKAN - Boğaziçi Ünv., Dr. Michael CHYET - Washington Library (ABD).
Dr. Hayrullah ACAR - Mardin Artuklu Ünv., Dr. Mustafa ÖZTÜRK - Mardin Artuklu Ünv.

Bu Sayının Hakemleri | Reviewers of This Issue
Doç. Dr. Rafik SULEIMAN, Doç. Dr. Abdurrahman ADAK, Doç. Dr. Tahirhan AYDIN, Dr. Ahmet GEMİ,
Dr. Necat KESKİN, Dr. Mehmet TAYFUN, Dr. Hayrullah ACAR, Dr. Zülküf ERGÜN, Dr. Shahab VALİ
Dr. Nurettin BELTEKİN, Dr. Osman ASLANOĞLU, Kayhan MUSHİRPANAHİ

Yönetim Yeri | Head Office
Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü
Rektörlük Ek Binası Yerleşkesi Artuklu/Mardin

Tlf: +90 482 212 98 84 20 Fax: +90 482 212 98 85 e-mail: : jms@artuklu.edu.tr / mesopotamianstudies@gmail.com
web: <http://jms.artuklu.edu.tr>

Baskı | Printing

Dizgi ve Tasarım: Mustafa Akbaş
Baskı: Mardin Sesi Gazetecilik Matbaacılık Ltd. Şti.

Baskı Yeri ve Tarihi | Publication Place and Date

13 Mart Mah. Özel İdare Müd. Ark. Sürücü Apt. No:3/B - Mardin
Tel&Fax: 0482 213 16 56 - 212 11 58 • www.mardinsesi.com.tr

Augustos 2017

© Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü'nün bilimsel bir yayım organı olan Mesopotamian Studies Dergisi, uluslararası
hakemli bir dergi olup altı ayda bir (Ağustos-Şubat) ve yılda iki sayı olarak yayımlanacaktır. Dergide Kürt, Arap ve Süryani kültürü, dili ve edebiyatı
alanlarında akademik nitelik taşıyan ve Türkçe, Kürtçe, Arapça, İngilizce ve Süryanice dillerinde yazılacak olan bilimsel çalışmalarla yer verilecektir. | The
Journal of Mesopotamian Studies is publication of The Institute of Living Language of Mardin Artuklu University. The Journal Mesopotamian Studies is a
international peer-reviewed journal and will be published semi-annually (August - February). The scientific research on Kurdish, Arabic and Syriac culture,
language and literature which written in Turkish, Kurdish, Arabic and Syriac languages will be published in The Journal of Mesopotamian Studies.

İçindekiler | Contents

		Editör'den	IV-VII	Editorial	
Makaleler Articles					
01-29	Abdurrahman ADAK Destnivisê Mewlûda Melayê Bateyî di Arşiva A. Jaba de: Nasandin û Analiz	31-47	Ümran ALTINKILIÇ Heteroglossia di Romana <i>Saturn</i> a Remezan Alan de	49-70	Güneş KAN Îmaja Ermenî di Romanê Kurdî yên Sovyetê de
71-87	Sevda ORAK REŞİTOĞLU Di Edebiyata Yarsanan de Kelamên Jinan: Mînaka Remzbarê	89-107	İbrahim BİNGÖL Cihnav di Zazakiya Gimgimê de	109-141	م.ى. نادیه ولی جبار پرسه‌ی زنان (تویزینه‌ی مهکی نمنتر و پیونزیه)
159-177	Özgür KÖSE, H. Sezgi SARAÇ, Arda ARIKAN An Ethnolinguistic Portrayal of the Arabic-Speaking Orthodox Christian Community of Antakya, Turkey	143-158	Safia F. ZEVENKİ Mقارنات في محاكاة الأصوات بين اللغتين العربية والكوردية	197-208	Sebastian P. BROCK Nesturi Kilisesi: Esefle Karşılacak Bir İsimlendirme Çev: Kutlu AKALIN, Zafer DUYGU
181-195	Stephan PROCHÁZKA Dil İlişkisinden Dil Ölümüne: Kiliçya'da (Güney Türkiye'de) Konuşulan Arapça Örneği Çev: Muna YÜCEOL ÖZESEN	211-213	Stephan PROCHÁZKA From Language to Language Death: The Example of the Arabic Spoken in Cilicia (Southern Turkey) Trs: Muna YÜCEOL ÖZESEN		
211-213	Zafer DUYGU Süryani Tarih Yazılılığında Geç Antikçağ: Hristiyanlık, İslam, Siyasi Tarih Değerlendirme: Kutlu AKALIN		Sebastian P. BROCK The Nestorian Church: A Lamentable Misnomer Trs: Kutlu AKALIN, Zafer DUYGU		
Kitap Değerlendirmesi Book Review					
211-213	Zafer DUYGU Süryani Tarih Yazılılığında Geç Antikçağ: Hristiyanlık, İslam, Siyasi Tarih Review: Kutlu AKALIN				

Editör'den

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü yayını olan The Journal of Mesopotamian Studies dergisininin 3. sayısını siz değerli okur, araştırmacı ve akademisyenlere ulaştırmaktan mutluluk duyuyoruz.

Yeni bir dergi olmamız ve daha uluslararası indekslere girmememize rağmen yurt içinden ve yurt dışından gelen makalelerin varlığı bizleri memnun etmiştir. Bununla birlikte bu sayımızda Süryaniyat ile ilgili herhangi bir makale yayınlayamamamız bizim için üzüntü verici bir noktadır. İleriki sayılarımıza bu alan ile ilgili makaleleri yayımlamayı umuyor ve değerli akademisyen ve araştırmacılardan makale beklediğimizi belirtmek istiyoruz.

Bu sayımızda toplam sekiz makale, iki çeviri ve bir de kitap tanıtımı yer almaktadır. Bu makalelerden beşi Kürtçenin Kurmancı lehçesi, biri Kürtçenin Sorani lehçesi, biri İngilizce ve biri de Arapça ile kaleme alınmışlardır. Diğer iki makale de İngilizceden Türkçe'ye çevrilmişlerdir.

Abdurrahman Adak "Destnîsê Mewlûda Melayê Bateyî di Arşîva A. Jaba de: Nasandin û Analîz" adlı makalesinde A. Jaba'nın arşivinde bulunan ve Leningrad Kütüphanesinde Kurd 7, Kurd 9 ve Kurd 33b numaralarıyla kayıt altına alınan Melayê Bateyî'nin Kürtçe mevlidinin nûsha tavsiflerini yaparak bu üç nûshayı elyazmaları (codicology) disiplini çerçevesinde değerlendirmektedir.

Ümran Altinkılıç "Heteroglossia di Romana Saturn a Remezan Alan de" makalesinde Mihail Bakhtin'in roman teorisi çerçevesinde tarihi ve toplumsal bir olgu olarak heteroglossia kavramını açıklamakta ve bu kavram etrafında Remezan Alan'ın Saturn adlı romanını incelemektedir.

Güneş Kan "Îmaja Ermenî di romanên Kurdî yên Sovyetê de" makalesinde sekiz Sovyet Kürt romanında (Berbang, Hopo, Dimdim, Xatê Xanim, Şer Li Çiya, Kurdê Rêwî, Hewarî, Dê û Dêmârî) ermeni imajını işlemekte ve olumlu ermeni temsilinin arka planındaki faktörleri ortaya çıkarmaktadır.

Sevda Orak Reşitoğlu "Di Edebiyata Yarsanan de Kelamên Jinan: Mînaka Remzbarê" adlı makalesinde Remzbar örneğinde Yarsan Kürt edebiyatında kadının rolü üzerinde durduktan sonra Remzbar'ın deyişlerinin içerik analizi ni yapmaktadır.

İbrahim Bingöl "Cihnav di Zazakiya Gimgimê de" adlı makalesiyle Zazaca-nın kuzey ağızına mensup olan Gimgim (Varto) yöreni Zazacasının zamirlerinin özelliklerini incelemektedir.

Nadia JABBAR, “نَادِيَا جَبَّارِ، مُرْسَىٰ تَرْكِيَّةٍ وَمِيقَاتِهِ، تَنَانِ” adlı makalesinde özellikle Erbil şehri üzerinde yoğunlaşarak, kadın cenaze törenleri geleneği ve sosyal bir fenomen olarak bu geleneğin değişim potansiyelini antropolojik bir bakışla incelemeye çalışmıştır.

Özgür Köse, H. Sezgi Saraç ve Arda Arikān “An Ethnolinguistic Portrayal of the Arabic-Speaking Orthodox Christian Community of Antakya, Turkey” başlıklı makalede Türkiye’de Arapça konuşanların üçte birini barındıran Antakya’da Arapça kullanım durumu ve bu dilin yaşadığı değişimi, kuşaklar arasında bir perspektif ile incelemeye çalışmışlardır.

Safiye F.Zevenki, “مقارنات في محاكاة الأصوات بين اللغتين العربية والكوردية”， adlı makalesinde Kürtçe ve Arapça arasında bir karşılaştırma yaparak, ses simülasyonu alanında (Onomatopoeia), bu iki dilin kelime dağarcığını izlemiş, ayrıca bu iki dil arasındaki benzerlikleri ve farklılıklarını inceleyerek Kürtçe ve Arapçanın anlamsal özelliklerini belirlemeye çalışmıştır.

Muna Yüceol Özezen, Stephan Procházka’nın “Orientalia Suecana (S. XL-VIII, ss. 115-125, 1999)”da yayınlanan “From Language to Language Death: The Example of the Arabic Spoken in Cilicia (Southern Turkey) makalesini “Dil İlişkisinden Dil Ölümüne: Kilikya’da (Güney Türkiye’de) Konuşulan Arapça Örneği” başlığı altında Türkçeye aktarmıştır.

Kutlu Akalın ve Zafer Duygu da Sebastian P. Brock’un “Bulletin of the John Rylands University Library of Manchester (78: 3, 1996)”da yayımlanan “The Nestorian Church: A Lamentable Misnomer” adlı makalesini “Nesturî Kilisesi: Esefle Karşılanacak Bir İslimlendirme” adı altında Türkçeye kazandırmışlardır.

Ayrıca bu sayıda Kutlu Akalın, Zafer Duygu’nun Süryani Tarih Yazıcılığında Geç Antikçağ: Hıristiyanlık, İslam, Siyasi Tarih kitabı tanıtmaktadır.

Yukarıda kısaca içeriklerinden bahsettiğimiz makaleler ile dergimizin bu sayısında kendi alanlarımızda bilim dünyasına küçük de olsa bir katkıda bulunmuş olmayı umuyor ve çalışmalarımızın daha iyiye doğru gitmesi için her türlü eleştiri ve katkılarınızı almaya hazır olduğumuzu bildirmek istiyoruz.

Dr. Zülküf ERGÜN / Dr. Shahap VALİ
Editörler

Editorial

It is a great pleasure for us to present the 3rd issue of The Journal Of Mesopotamian Studies, which is a publication of The Institute of Living Languages of Mardin Artuklu University, to you dear readers, researchers and academicians.

It pleases us that we received many articles from both national and international parts although our journal is new and not in the international indexes. We feel sorry that there is not any work on Assyrian in this issue. But we hope that we will be able to publish some articles about it in the next issues; so, we are expecting articles from academicians and researchers to be published in the next issues.

There are eight articles, two translations and one book review included in this issue. Five of these articles are in Kurmanji Kurdish, one is in Sorani Kurdish, one is in English and one is in Arabic. And one of the two translated articles is translated from English, the other one from Turkish.

In his article “Destnivîsên Mewlûda Melayê Bateyî di Arşîva A. Jaba de: Nasandin û Analîz” (The Manuscript of Melayê Bateyî’s Mewlûd in A. Jaba’s Archive: The Introduction and the Analysis), Abdurrahman Adak analyzes three manuscripts of Mawlid, written by Melayê Bateyî, according to the cordiology Discipline.

Ümran Altinkılıç explains the term heteroglossia as a historical and social fact in accordance with the theory of novel of Mikhail Bakhtin in his article “Heteroglossia di Romana Saturn a Remezan Alan de” (Heteroglossia in the Novel Saturn by Remezan Alan) and analyzes the novel Saturn by Remezan Alan.

Güneş Kan in her article “Îmajâ Ermenî di romanê Kurdî yên Sovyetê de” (Image of Armenian in Soviet Kurdish Novels), analyzes the Armenian Image in eight Soviet Kurdish novels (Berbang, Hopo, Dimdim, Xatê Xanim, Şer Li Çiya, Kurdê Rêwî, Hewarî, Dê û Dêmarî) and finds out the factors behind the positive representation of Armenians.

Sevda Orak Reşitoğlu in her article “Di Edebiyata Yarsanan de Kelamên Jinan: Mînaka Remzbarê” (The Kalams of the Women in the Yarsan Literature: Example of Remzbar), focuses on the role of women in Yarsan Kurdish Literature in the example of Remzbar and also does the content analysis of the statements of Remzbar.

İbrahim Bingöl in his article “Cihnav di Zazakiya Gimgimê de” (Pronouns in the Zazaki of Gimgim’s Accent), analyzes the pronouns in the Gimigim (Varto)

region which belongs to the northern variety of Zazaki Kurdish.

Nadia JABBAR in her article “ئەنترۆپۆلۆزىيە تۆزىنەمەكى ، پرسەى ئىنان ”(Women’s Funeral -An Anthropological Study-) ,by especially focusing on the city of Erbil, analyzes the tradition of funeral of women and the changing potential of this tradition as a social phenomenon.

Özgür Köse, H. Sezgi Sarac and Arda Arikán in the article “An Ethnolinguistic Portrayal of the Arabic-Speaking Orthodox Christian Community of Antakya, Turkey”, analyzes the use of Arabic and the change of its use in Antakya (Antioch) city, the one third of the population of which speaks Arabic, with an intergenerational perspective.

Safia F. Zevenki in her article ”مقارنات في محاكاة الأصوات بين اللغتين العربية و الكوردية“ (Comparisons In Onomatopoeia Between Arabic And Kurdish), compares the vocabulary of Kurdish and Arabic in terms of Onomatopoeia and by also analyzing the similarities and differences in the two languages she tries to determine the semantic characteristic of Kurdish and Arabic.

Muna Yüceol Özezen translated Stephan Procházka’s work “From Language to Language Death: The Example of the Arabic Spoken in Cilicia (Southern Turkey)”, which was published in “Orientalia Suecana (S. XL - VIII, ss. 115-125, 1999)”, into Turkish with the title “Dil İlişkisinden Dil Ölümüne: Kilikya’da (Güney Türkiye’de) Konuşulan Arapça Örneği”.

Kutlu Akalın and Zafer Duygu translated Sebastian P. Brock’s work “The Nestorian Church: A Lamentable Misnomer”, which was published in “Bulletin of the John Rylands Universitiy Library of Manchester (78: 3, 1996)”, into Turkish with the title “Nesturî Kilisesi: Esefle Karşılanacak Bir İsimlendirme”.

In this issue there is also a review of Zafer Duygu’s book “Süryani Tarih Yازىcliğında Geç Antikçağ: Hıristiyanlık, İslam, Siyasi Tarih” written by Kutlu Akalın.

We hope that we could contribute to the World of Science, though little, with the works mentioned above and we want to say that we will be happy with any of your critics and contributions to help us improve.

Dr. Zülküf ERGÜN / Dr. Shahap VALİ
Editors



Makaleler | Articles





DESTNIVÎSÊN MEWLÛDA MELAYÊ BATEYÎ DI ARŞÎVA A. JABA DE: NASANDIN Û ANALÎZ

Abdurrahman ADAK*

KURTE

Mewlûda Melayê Bateyî berhemeke girîng a edebiyata Kurdi ya klasik e. Her çiqas ji aliye gelek disiplinê zanistên sosyal ve li ser Mewlûdê xebat dikarin bêñ kirin ji berî her tiştî, ji aliye disiplîna destnivîsariyê ve divê xebat bêñ kirin û li ser esasê nusxeyê destnivîs divê metneke durist û zanistî bê amadekirin. Nasandina nusxeyê destnivîs û analîza wan (nirxê nusxeyê, şecereya nusxeyan) di pêvajoya amadekirina metna zanistî ya berhemê de du karêñ pêşî ne ku divê bêñ kirin. Di arşîva A. Jaba de sê nusxeyen Mewlûda Bateyî hene ku yek ji wan di nav hemû nusxeyê ku têñ zanîn de ya herfî kevin e. Heta niha yazdeh nusxeyen Mewlûdê yên ku di qonaxa berî Şerî Cîhanê yê Yekem de hatine istînsaxkirin, têñ zanîn ku sê heb ji van di arşîva A. Jaba de têñ parastin. Di vê gotarê de ji aliye kî ve bi hûrgîlî ev her sê nusxe hatine nasandin û analîza wan hatiye kirin, ji aliye kî ve ji rola arşîva Jaba di parastina van nusxeyan de li ber çavan hatiye raxistin.

Bêjeyê Sereke: destnivîsarî, Mewlûda Bateyî, arşîva A. Jaba, nirxê nusxeyê, şecereya nusxeyê.

ABSTRACT

"The Manuscript of Melayê Bateyî's Mewlûd in A. Jaba's Archives: The Introduction and the Analysis"

Melayê Bateyî's mewlûd is a significant work in Kurdish Classical Literature. Even though a variety of studies have been carried out about it by disciplines of social sciences, first of all in terms of discipline of the manuscripts, it is a must to execute more works and a scientific and coherent text should be prepared on the basis of manuscripts samples. The introduction and their analysis (the virtue of the sample, the family tree of the samples) are the two first works should be done in the process of the preparation of a scientific document to be done. Three manuscript samples exist in the A.Jaba's collection, one of which is known to be as the oldest. Up to now, eleven samples of this Mewlûd are known three of which had been studied in detail and known to exist in the archives of A. Jaba. In this article, these three manuscript samples are examined in detail and they are analyzed, afterwards. Moreover, the role that A. Jaba plays in terms of protection of the manuscripts samples have been pointed out.

Key words: codicology, Bateyî's Mewlûd, A.Jaba's archive, the virtue of the manuscript, the family tree of the manuscript.

* Doç. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Fakulteya Edebiyatê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdi.
abdurrrahmanadak@gmail.com

DESTPÊK

Melayê Bateyî helbestvanekî girîng ê edebiyata Kurdî ya klasîk e ku di tarîxa vê edebiyatê de mewlûda yekem ji aliyê wî ve hatiye nivîsin. Bêguman hunermendiya Bateyî ne tenê di warê mewlûdê de ye, lêbelê mewlûda wî xwediyê hin taybetiyê xweser e. Mewlûda Bateyî di tarîxa edebiyata Kurdî de nimûneya yekem a cureya xwe ye, heta roja me ji qîmetê xwe tiştek winda nekiriye û dikare bê gotin ku payeya “berhemeye klasîk” bi dest xistiyeye. Hevterîbê vê pozîsyona wê, mewlûda Bateyî heta niha bûye mijara gelek lêkolînan û guman tuneye ku ji vir sündê jî demeke dirêj dê di navenda lêkolînan de cih bigire. Mewlûda Bateyî ji aliyê dîsîplînên curbicur ên wek dîn û bawerî, huner û estetîk, hîzr û felsefe, çand û antropolijyê ve dikare li ber çavan bê girtin, lêbelê di vê gotarê de em dê ji aliyê dîsîplîna destnivîsariyê ve (codicology) li ser mewlûda Bateyî rawestin.

Çawa tê zanîn, mewlûda Bateyî jî di nav de hemû berhemên berê, ji aliyê nivîskarêن xwe ve bi destan hatine nivîsin, di qonaxa berî çapxaneyê de her bi destan hatine zêdekirin û di qonaxa çapxaneyê de jî li kêleka nusxeyen çapkirî zêdekirina wan a bi destan wek kevneşopiyekê dîsa dewam kiriye. Di encamê de gelek nusxeyen wan ên destnivîs ji me re mîras mane. Tesbîtkirina cihê van nusxeyan; berhevkin, danasîn û analîza wan û herî dawî amadekirina metnên wan li gor rîbaza weşana metna rexneyî (edition critique) wek qadeke girîng a dîsîplîna destnivîsariyê derdikeye pêş (Ji bo agahiyên berfireh ên derheqê van qonaxan û mijarên têkildar de bnr. Esilan 1994; el-Muneccid, 1987). Bi gotina teorîsyenê navdar ên Ewropî Wellek&Warren, karêن vê qadê, “karêن pêşî” ne ku berî vekolînen din ên zanistî divê bêñ kirin (Wellek & Warren, 1948, r. 49). Bi rastî jî berî ku ji aliyê dîsîplînên curbicur ên zanistên sosyal ve li ser berhemên destnivîs xebat bêñ kirin, divê pêşî hemû nusxeyen wan ên destnivîs bêñ berhevkin, û di çarçoveya wan nusxeyan de metnên wan ên durist û zanistî bêñ amadekirin ku tişa Wellek dibêje ev bixwe ye. Ev jî rasterast bi dîsîplîna destnivîsariyê re têkildar e. Eger mijar destnivîsen kurdî bin, ev tişt îcar wek pêdiviyekê girîng derdikeye pêş. Çawa ku Wellek&Warren dibêjin; ev qada xebatê bi taybetî ji bo kevneşopiyen edebî yêñ ku materyalên wan ên edebî nîvî nîvî winda bûne, pir girîng e (Wellek&Warren, 1948, r. 49). Bêguman Wellek û Warren wek nimûneya vê diyardeyê behsa Kurdî nekirine, lêbelê aşkera ye ku Kurdî nimûneyeke gelek xweş a vê tesbîta wan e. Loma eger mijar destnivîsen kurdî bin, berî her tiştî divê ev “karêñ pêşî” bêñ kirin. Ji ber vê jî em dixwazin di vê gotarê de di çarçoveya van “karêñ pêşî” yêñ qada destnivîsariyê de li ser mewlûda Melayê Bateyî rawestin.

Bêguman heta niha metna mewlûdê, ji aliyê gelek lêkolîneran ve ji perspektîfa destnivîsariyê û li ber destnivîsen curbicur hatiye amadekirin. Di vî warî de lêkolîneren ku derdikeyin pêş Sadiq B. Amêdî (Amêdî, ?), Zeynelabidîn Zinar (Zinar, 1992), Tehsîn I. Doskî (T. Doskî & M. Doskî, 2005), Huseyn Şemrexî (Şemrexî 2011), Xalid Sadîmî (Sadîmî, 2015) û Ziver İlhan (İlhan, 2014) in.

Lêbelê tê çavdêrîkirin ku di van xebatan de yan ji aliyê berhevkirina nusxeyan yan ji aliyê danasîn û analîza wan yan jî ji aliyê amadekirina metna rexneyî ve rîbazân dîsîplîna destnivîsariyê bi tevahî li ber çavan nehatine girtin. Ji ber vê di çarçoveya vê rîbazê de xebatê li ser mewlûdê wek pêdiviyekê derdikevin pêş. Aşkera ye ku di çarçoveya tevahiya nusxeyê destnivîs de amadekirina metneke zanistî ya mewlûdê ne mijara gotara me ye. Lewra ew karekî cuda ye ku di gotarekê de nagunce. Loma em ê gotara xwe ji bo karênu ku di qonaxa berî weşanê de cih digirin, terxan bikin ku ew jî danasîna nusxeyê destnivîs û analîza wan e. Lêbelê ji ber ku em dixwazin van her du xalan, bi hûrgilî derxin meydanê, em ê nikaribin di gotarekê de dest bavêjin hemû nusxeyê destnivîs ên Mewlûdê. Ji ber vê jî diviyabû em gotarê bi çend nusxeyan bi sînor bikin. Di tesbîtkirina nusxeyan de jî arşîva A. Jaba ya ku li Rûsyayê li Pirtûkxaneya Gişfî ya Lenîngradê tê parastin, bû diyarker (Ji bo Jaba û arşîva wî bnr. Pirbal, 2000, r. 3-8). Lewra vê dawiyê kopyayê dîjîtal ên vê arşîvê ji aliyê Zanîngeha Mardin Artukluyê ve ji Rûsyayê hatibûn wergirtin û vê yekê pêwîst didêra ku em li ser vê arşîvê xebatê zanistî bikin. Di arşîva Jaba de sê destnivîsên kevin ên mewlûda Bateyî cih digirin ku yek ji wan jî di nav hemû nusxeyê ku têr naskirin de ya herî kevin e. Vê yekê jî em han dan ku em van her sê nusxeyan bikin mijara gotarê. Armanca me ew e ku di vê gotarê de em li gor krîterên dîsîplîna destnivîsariyê danasîn û analîza van nusxeyê mewlûda Bateyî bikin û rola ku arşîva Jaba di parastina wan de lîstiye destnîşan bikin. Hêviya me ew e ku ev xebat di şêweya danasîn û analîza nusxeyê destnivîs ên berhemên Kurdî de wek modelekê jî rol bilize.

Di gotarê de em dê pêşî zanyariyêng bingehîn derheqê Melayê Bateyî û Mewlûda wî de pêşkêş bikin, peyre her sê nusxeyê destnivîs ên Mewlûdê yên ku di arşîva Jaba de cih digirin bidin nasandin û herî dawî jî em dê bi rîbaza berawirdkirinê, li ser van nusxeyan analîzeke berfireh bikin. Di vê analîzê de em dê nirxê nusxeyan tesbît bikin, şecereya têkiliyê wan derxin meydanê û cihê arşîva Jaba di nav destnivîsên mewlûda Bateyî de îfade bikin. Gotar dê bi besê encam û çavkaniyan biqedê. Di dawiya gotarê de jî wêneyê rûpelên destpêk û dawiyê yên her sê nusxeyan dê bêr parvekirin.

1. MELAYÊ BATEYÎ Û MEWLUDA WÎ

Derheqê jiyana Melayê Bateyî de agahiyêng teqezi ên ku xwe disperîn jêderên nivîskî tunene. Bateyî demeke dirêj, wek helbestvanê sedsala XVem hatiye nîşandan. Çavkaniya vê nîrînê “Rîsaleya Şa’ir û Musenrefîn di Kurdistanê” ye ku ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve hatiye nivisîn û ji aliyê A. Jaba ve di sala 1860î de li Lenîngradê hatiye çapkiran. Li gor vê rîsaleyê Bateyî, di navbera salên 820-900 (1417-1495)an de jiyaye (Bazîdî, 2010, r. 13). Piştî çapkiranina vê rîsaleyê gelek nivîskaran di destnîşankirina serdemâ Bateyî de ev zanyarî dubare kirine. Lêbelê hin argumanêng ku vê zanyariyê şaş derdixin, vê dawiyê ji aliyê Doskiyan ve hatine destnîşankirin. Li gor van argumanêng ku ji zanyariyêng

malbatî û hin nîşaneyê tarîxî hatine bidestxistin, bi rehetî dikare bê gotin ku Bateyî di dawiya sedsala hevdehem de hatiye dinyayê û heta bi çaryeka sêyem ji sedsala hijdehem jiyaye (T. Doskî û M. Doskî, 2005, r. 21-26; Herweha bnr. Sadînî, 2010, r. 21-30).

Dîsa her çiqas navê Melayê Bateyî, di gelek çavkaniyê berê de wek Ehmed (Bazîdî, 2010, r. 13; Amêdî, 1998, r. 190-191; Azîzan 1998, r. 813; Kurdo, 1992. r. 65) û di hinan de jî wek Hesen (Ertûşî, 1323) hatibe bikaranîn jî navê wî yê rastî Huseyn e. Ev jî ji zanyariyê malbata wî û hin qeydên nivîskî tê bidestxistin (Sadinî, 2015, r. 7-8).

Çawa ku ji nîsbeta wî ya bi bal Bateyê tê fêmkirin, Melayê Bateyî ji gundê Bateyê ye. Ev gund dikeve rojhilatê Beytuşşebabê (Elke). Eşîra wî jî eşîra Ertûşîyan e. Navê bavê wî Mela Mustafa ye. Mela Mustafa bi eslê xwe ji gundê Batuyan e ku niha li ser Şîrnexê ye. Ew û sê birayê xwe ji wir çûne devera Zaxoyê li gundê Bazingîrê li nav Mamîzdînan bi cih bûne, piştre ji wir jî çûne û li gundê Bateyê bi cih bûne. Bi navê Osman, Ehmed, Mihemed sê birayê Melayê Bateyî û bi navê Mela Ehmed apekî wî hebûye (T. Doskî û M. Doskî, 2005, r. 19-21).

Melayê Bateyî, li cem apê xwe Mela Ehmed dest bi xwendinê kiriye, li Hekkarî di medreseya mîrgehê de perwerdeya xwe xilas kiriye, piştre jî li gundê Pîrosayê ku nêzî Bateyê ye, dest bi melatiyê kiriye. Bateyî, li gundê Pîrosayê, bi xanimeke bi navê Hemayil re zewiciye. Kurekî wî yê bi navê Mela Tahir û kurekî Mela Tahir yanî neviyekî wî yê bi navê Mela Dirbas hebûye (T. Doskî û M. Doskî, 2005, r. 19-21). Li gor hinek rîwayetan (Zêrevanî, 2002) bi navê Asmîn, Zulfê û Banê sê keçen Melayê Bateyî jî hebûne.

Ji Melayê Bateyî menzûmeyeke dînî (Mewlûd), li gor hin çavkaniyan (Kurdo, 1992. r. 65) menzûmeyeke evînî (Zembîlfiroş), bi qasî dîwançeyekê helbest û berhemeyeke pexşan a bi zimanê erebî (Hemail) gihiştine me. Melayê Bateyî, di van berhemên xwe de peyva “Bateyî” wek mexles bi kar anije ku forma nîşbetê ya gundê wî ye. Bateyî di edebiyata Kurdî ya Kurmancî de wek nûnerê herî girîng ê edebiyata dînî tê qebûlkirin. Lewra wî hem tewhîd û ne’tên orjînal nivîsîne, hem jî di tarîxa edebiyata kurdî de di cureya mewlûdê de berhema yekem nivîsiye. Di mewlûda Bateyî de ji xulqiyeta nûra Pêxember heta bi sê saliya wî li ser Cenabê Pêxember hatiye rawestan. Her çiqas jimara besan û sernavênu ku hatine bikaranîn, li gor nusxeyan hin cudahiyan erz bikin jî di tevan de heman naverok heye (Ji bo agahiyê berfireh derheqê naveroka Mewlûda Bateyî de bnr. Kızıl, Şingâr û Çetin, 2015, r. 53-97).

2. NASANDINA NUSXEYAN

Çawa ku di destpêkê de hat gotin, di Koleksiyona Jaba de sê nusxeyên Mewlûda Melayê Bateyî cih digirin ku wek Kurd 7, Kurd 9 û Kurd 33b hatine binavkirin. Di vê beşê de em dê li ser nasandina van nusxeyan rawestin. Di zanista destnivîsariyê de nasandina nusxeyên destnivîs di çarçoveya rîbazeke taybet de tê kirin ku ev rîbaz li nav Rojhîlatnasân wek “notice du manuscrit” û li nav ereban wek “wesfu'l-mextût” hatiye binavkirin (Binbîn û Tûbî 2005, r. 386). Tirkan jî têgeha “nûsha tavşifi”, yan jî “nûsha tanitimi” bi kar anîne, ku ev tev nasandina nusxeyê îfade dikin. Di tewsîfa nusxeyê de şabloneke tradîsyonel heye ku pêwîst e nusxeya destxet, li gor wê şablonê bê nasandin. Xalênu di vê şablonê de cih digirin, ji aliyê derekî yê nusxeyê ber bi aliyê navekî ve têrêzîkirin (Ji bo agahiyên berfireh derheqê tewsîfa nusxeyan de bnr. el-Muneccid, 1976; Kavakçı, 1991, r. 23-25; Bilgin, 2013, r. 369-373). Em ê jî ji bo nasandina her sê nusxeyan pêşî serî li vê rîbazê bidin û şablonâ klasik a tewsîfa nusxeyê amade bikin. Li vir divê bê gotin ku Kurdologa Rûs Margarîta B. Rudenkoyê hemû destnivîsên ku di arşîva Jaba de cih digirin tewsîf kirine û ew bi şêweya katalogekê çap jî kirine (Rudenko, 1961). Lîbelê hem di kataloga Rudenkoyê de xalênu di şablonâ tewsîfa nusxeyê de cih digirin hindik in hem jî zimanê katalogê rûsî ye. Loma em ê li vir ji nû ve tewsîfa her sê nusxeyên Mewlûdê bi awayekî berfirehtir û bi Kurmancî amade bikin. Lîbelê ji ber ku nusxeyên orjînal li Rûsyayê di Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngradê de ne û di destê me de tenê nusxeyên wan ên dîjîtal hene, em ê zanyariyên hin xalan di çarçoveya nusxeyên dîjîtal de pêşkêş bikin ku di serê van xalan de taybetiyên bergê, filigrana kaxezê û ebadêne kaxezê têr. Aşkera ye ku ji bo bidestxistina encameke tam, pêdivî bi dîtina nusxeyên orjînal heye. Ji ber ku di kataloga Rudenkoyê de ebadêne kaxezê hene, me di vê xalê de xwe spart zanyariyên Rudenkoyê. Ji ber ku dîjîtalên wan rengîn in, dikare bê gotin ku heta astekê di rengê kaxezan de jî îsabet hatiye bidestxistin. Lîbelê heta orjînalên nusxeyan neyên dîtin, îsabetkirina di zanyariyên berg û filigranê de pir zehmet e. Loma di tewsîfê de em ê cih nedin van her du xalan. Ji bilî van awarteyan di tevahîya xalênu din ên tewsîfê de zanyariyên rast û durist hatine bidestxistin. Di besa peyrew de li ser esasê zanyariyên tewsîfa nusxeyan, em dê li ser van her sê nusxeyan, analîzeke berfireh bikin.

2. 1. Tewsîfa Nusxeya Kurd 7ê

1. **Navê berhemê** : Mewlidu'n-Nebî
2. **Te'lîf, tercume, şerh** : Te'lîf
3. **Navê nivîskar** : Melayê Bateyî
4. **Cih (bajar û dewlet)** : Lenîngrad, Rûsyâ
5. **Navê Pirtûkxaneyê** : Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngradê
6. **Koleksiyon** : Koleksiyona A. Jaba

7. Pirtûkxane no	: Kurd 7
8. Navê xwedî	: Feqî Mustefa
9. Zimanê destxetê	: Kurdî (Kurmancî)
10. Serbixwe-mecmû'e	: Serbixwe
11. Menzûm-mensûr	: Menzûm
12. Rengê kaxezê	: Zer
13. Jimara wereqan	: 30
14. Ebadêن kaxezê	: 25x15 (18x11,5)
15. Cureya xetê	: Şexsî
16. Îmla	: Bi hereke ye.
17. Murekkeb	: Reş û sor
18. Cedwel	: Li dora misrayên yekem cedwelek û li dora misrayên duyem jî cedweleke din hatiye danîn. Di cedwelê de tenê xêzek hatiye bikaranîn. Ji bo ku cedwel ji nivîsê bê cudakirin, bi murekkeba sor hatiye xêzkirin.
19. Serlewhe	: Di serlewheyê de bi zimanê erebî navê berhemê hatiye nivîsin: “ <i>Haze Mewlidu 'n-Nebiyyî Sellallahu 'Eleyhî we Sellem</i> ” Ji bilî vê nivîsê di serlewheyê de tu motîf, yan jî neqş cih nagirin.
20. Besmele	: Heye
21. Jimara besan	: 18
22. Sernav	: 17 sernav hene. Beşa destpêkê bê sernav e.
23. Jimara beytan	: 555
24. Jimara rêzan	: 10
25. Peyva te'qîbê	: Heye
26. Cihê istînsaxê	: Erzirûm
27. Qeyda istînsaxê	: Di dawiya berhemê de qeyda istînxaxê heye: “ <i>Nemmeqeħħu Muhemmed el-Muksî min qebîlet el-Hekkarî fî beled Erzurûm we temme ey hazihî el-Mewlûd fî leylet es-Sulesa li ecl Feqî Mustefa We 'esluhu millîyyun We meskenehû el-an fî beled Erzirom xeferellahû lehû we li walidahû we li katibî hazihî 'n-nuseخ</i>

we cemî' el-Mu'minîn we'lmu'minat we'l-muslimîn we'l-muslimat, amîn fî 1206. 2/3"

- 28. Tarîxa istînsaxê** : 1206 H. (1791-92 M.) 2/3
- 29. Cihê istînsaxê** : Erzirûm
- 30. Navê mustensix** : Muhemmed el-Muksî (Mihemedê Miksî)
- 31. Temelluk** : Feqî Mustefa
- 32. Hamîş/derkenar** : Sernavek li hamîşê hatiye nivîsîn (10a)
- 33. Destpêka destxetê** : Hemdê bê hed bo Xudaê 'alemîn
- 34. Dawiya destxetê** : Bo feqîrê Bateî el-Fatîhe

2. 2. Tewsîfa Nusxeya Kurd 9ê

- 1. Navê berhemê** : Kitabu Mewlida Şerif
- 2. Te'lîf, tercume, şerh** : Te'lîf
- 3. Navê nivîskar** : Melayê Bateyî
- 4. Cih (bajar û dewlet)** : Lenîngrad, Rûsyâ
- 5. Navê Pirtûkxaneyê** : Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngradê
- 6. Koleksiyon** : Koleksiyona A. Jaba
- 7. Pirtûkxane no** : Kurd 9
- 8. Zimanê destxetê** : Kurdî (Kurmancî)
- 9. Serbixwe-mecmû'e** : Serbixwe
- 10. Menzûm-mensûr** : Menzûm
- 11. Zehriye** : Zehriye heye. Di zehriyeyê de navê berhemê, zimanê berhemê û dîroka nivîsîna berhemê cih digirin. Herwiha bi qelemeke cuda wergera van agahiyan bi zimanê frensî hatiye nivîsîn.
- 12. Rengê kaxezê** : Bej
- 13. Jimara wereqan** : Berhem li gor rêzbendiya pirtûkên çapkirî û bi jimarêñ erebî hatiye jimarekirin. Li gor vê berhem ji 261 rûpelan pêk tê. Di vê rêzbendiyê de zehriye nehatiye jimarekirin. Herwiha rûpelên milê çepê, vala hatine hiştin. Yanî li ser wan tiştek nehatiye nivîsîn. Eger em vê li ber çavan bigirin, rûpelên berhemê dê dakevin 130î. Li gor sîstema wereqan berhem ji wereq 1a dest pê dike û bi wereq 131b diqedede. (1a-

131b). Eger em aliyêñ vala nehesibînin ev dê dakeve 65 wereqan.

14. Ebadêñ kaxezê	: 24x18 (16x6)
15. Cureya xetê	: Nesx
16. Îmla	: Bi hereke ye.
17. Murekkeb	: Murekkeba reş hatiye bikaranîn.
18. Serlewhe	: Di serlewheyê de bi zimanê erebî navê berhemê hatiye nivîsîn: “ <i>Haze Mewlidu 'n-Nebiyî Sellallahu 'Eleyhî we Sellem</i> ”
19. Besmele	: Heye
20. Jimara besan	: 18
21. Sernav	: 17 sernav hene. Beşa destpêkê bê sernav e.
22. Jimara beytan	: 509
23. Jimara rêzan	: 8
24. Peyva te'qîbê	: Heye.
25. Cihê istînsaxê	: Erzirûm
26. Qeyda istînsaxê	: Di dawiya berhemê de qeyda istînxaxê heye: “ <i>Temmet Mewlida Nebî fî yed Mehmûd Efendî li ecl Mosyo Jaba fî beled Erzirûm fî sene 1274</i> ”
27. Tarîxa istînsaxê	: 1274 H (1857-58 M)
28. Cihê istînsaxê	: Erzirûm
29. Navê mustensix	: Mela Mehmûdê Bayezîdî
30. Temelluk	: Mosyo Jaba (A. Jaba)
31. Destpêka destxetê	: Hemdê bê hed bo Xudaê ‘alemîn
32. Dawiya destxetê	: Bo feqîrê Bateî el-Fatîhe

2. 3. Tewsîfa Nusxeya Kurd 33byê

1. Navê berhemê	: Mewlûd
2. Te'lîf, tercume, şerh	: Te'lif
3. Navê nivîskar	: Melayê Bateyî
4. Cih (bajar û dewlet)	: Lenîngrad, Rûsyâ
5. Navê Pirtûkxaneyê	: Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngradê
6. Koleksiyon	: Koleksiyona A. Jaba

7. **Pirtûkxane no** : Kurd 33b
8. **Zimanê destxetê** : Kurdî (Kurmancî)
9. **Taybetiyêñ bergê** : Ji ber ku di serî û dawiya berhemê de wereqên kêm hene, derheqê bergê orjînal de tiştek nayê zanîn. Lîbelê di çarçoveya te'mîra berhemê de jê re bergekî kaxezî hatiye çêkirin.
10. **Serbixwe-mecmû'e** : Serbixwe
11. **Menzûm-mensûr** : Menzûm
12. **Ziman** : Kurdî (Kurmancî)
13. **Rengê kaxezê** : Zerê kayê
14. **Rizîbûna kaxezê** : Hemû wereqên kaxezê ji kenaran ve rizî ne, yan jî ji aliyê kurman ve hatine xwarin.
15. **Te'mîra kaxezê** : Kenarê çepê yê çar wereqên dawî hatine te'mîkirin û bi kaxzeke cuda hatine temamkirin. Ji ber vê "han"a peyva "der cîhan" û peyva "ne'îma" jê çûne (20a).
16. **Jimara wereqan** : Berhem tev de ji 20 wereqan pêk tê, bi rûyê a'yê dest pê dike û bi rûyê b'yê diqedê. Di binê rûyê a'yan de jimar piştre bi qelemzîreçê hatine danîn.
17. **Ebadêñ kaxezê¹** :
18. **Cureya xetê** : Nesxeke taybet.
19. **Îmla** : Nivîs xweş e û bi hereke ye. Bi îhtîmaleke mezin ji ber ku dirûtina wereqên berhemê xweşik çê nebûye, herfîn dawiyê yên milê rastê û herfîn destpêkê yên milê çepê tam nayêñ dîtin û xwendin.
20. **Murekkeb** : Di tevahiya berhemê de tenê murekkeba reş hatiye bikaranîn. Li gelek cihan murekkeb heşiviye.
21. **Cedwel** : Li dora misrayêñ yekem cedwelek û li dora misrayêñ duym jî cedweleke din hatiye danîn. Bi vî awayî dirûvê du sitûnan pê dikeve. Di cedwelê de du xêz hatine bikaranîn.
22. **Jimara rêzan** : Pênc rûpel 10, çardeh rûpel 9, şazdeh rûpel 8, pênc rûpel 7 rêz in. Nîvekiya wan dike 8 rêz.

¹ Di kataloga Rudenkoyê de tuneye.

23. Jimara beytan	: Beytên heyî yên vê nusxeyê 339 in. Lêbelê rûpela 19ayê ku ji neh beytan pêk tê, di 21ayê de bi şaşî hatine dubarekirin. Loma jî rûpela berî 21ayê (20b) ne ji 21ayê, ji 21byê dewam dike. Dema em neh beytên dubare derdixin, beytên vê nusxeyê dadikevin 330î.
24. Peyva te'qîbê	: Heye
25. Mutale'e û teshîh	: Hene.
26. Hamîş/derkenar	: Di hamîş û derkenaran de hin sererastkirin, beytên ne ji Mewlûdê û hin selewatên bi zimanê Erebî hene.
27. Destpêka destxetê	: Nê hezaran sal(i) çûne axirî
28. Dawiya destxetê	: Xweş li pey me mulhidanê bê eman

3. ANALÎZA NUSXEYAN

Di vê beşê de em dê li ser esasên zanyariyên ku di beşa danasîna nusxeyan de (tewsîfa nusxeyê û dabeşkirin) hatine dayîn, her sê nusxeyên Mewlûda Bateyî yên ku di arşîva Jaba de cih digirin, analîz bikin. Di vê analîzê de em dê pêşî nirxê her sê nusxeyan tesbît bikin, piştre şecere/şemaya têkiliyên wan derxin meydanê û herî dawî jî cihê arşîva Jaba di nav destnivîsên mewlûda Bateyî de îfade bikin.

3. 1. Nirxê Wan

Di zanista destnivîsariyê de nirxê nusxeyan, bi xalên wek tambûn, fêmbarî, dêrînî û hebûna teshîhan tê pîvan. Ev jî ji îfadeyên destpêkê û dawiyê, qeyda istînsaxê (dîrok û cihê nîvîsîna nusxeyê û nîvîserê nusxeyê), kaxez, îmla, hamîş û hwd. tê fêmkirin ku ev tev di tewsîfa nusxeyê de cih digirin (Bergsträsser, 2011, r. 1; Esîlan, 1994, r. 131-134). Li vê derê em dê hewl bidin ku di çarçoveya van xalan de nirxên her sê nusxeyan derxin meydanê.

Eger em pêşî ji aliyê tambûnê ve li wan binêrin, em ê bibînin ku nusxeyên Kurd 7 û Kurd 9 tam in, yanî ji destpêkê heta dawiyê bi awayekî yekpare gihiştine roja me. Heçî Kurd 33 b ye ew ne tam e, di destpêk û dawiya wê de wereqên kêm hene. Loma ji aliyê tambûnê ve nirxên Kurd 7 û Kurd 9ê ji nirxê Kurd 33byê bilindtir in.

Ji aliyê qeyda istînsaxê ve jî rewş hevterîbê rewşa tambûnê ye. Di her du nusxeyên tam de (Kurd 7 û Kurd 9) ji ber ku rûpela dawî gihiştine me, qeydên istînsaxê jî cih digirin û di nusxeya ne tam de ku Kurd 33b ye ji ber ku rûpela dawî tuneye, qeyda ketebe/istînsaxê tuneye, yan jî negihiştine me. Bêguman hebûna qeydên istînsaxê nirxê Kurd 7 û Kurd 9ê gelekî bilin dike. Lewra ev qeyd derheqê van nusxeyan de agahiyêng girîng bexşî me dike. Ji van agahiyan a herî girîng dîroka istînsaxê ye. Nusxeya Kurd 7ê di 1206ê hicrî de ku beramberî

1791-92ê mîladî tê, nusxeya Kurd 9ê jî di 1274ê hicrî de ku beramberî 1857-58ê mîladî tê hatine istînsaxkirin. Li gor vê Kurd 7 ji Kurd 9ê bi 66 salan kevintir e. Ji ber ku Kurd 7 ji Kurd 9ê kevintir e û herwiha jê re bûye binema, nirxê wê jî ji yê Kurd 9ê zêdetir e.

Agahiyeke din a ku di qeyda istînsaxê de cih digire, cihê istînsaxê ye. Dema ku em ji vî aliyî ve lê dinêrin, em dibînin ku her du nusxe (Kurd 7 û Kurd 9) jî li bajarê Erzirûmê hatine istînsaxkirin. Ev her du nusxe, ji ber ku cihê bajarê Erzirûmê di dîroka rewşenbîriya Kurdî de derdixin meydanê xwedî nirx in.

Di qeyda istînsaxê ya her du nusxeyan de derheqê mustensikan û xwediyyê nusxeyan de jî agahî hatine dayîn. Kurd 7 ji aliyê Mihemedê Muksî ve ji bo kesekî bi navê Feqî Mustefa; Kurd 9 jî ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve ji bo Mosyo Jaba (A. Jaba) hatine istînsaxkirin. Di Kurd 7ê de Feqî Mustefa û di Kurd 9ê de jî Jaba dibin xwediyyê nusxeyan. Mustensikê Kurd 7ê derheqê xwediyyê nusxeyê -Feqî Mustefa- de hin agahî jî dane. Li gor vê Feqî Mustefa bi eslê xwe ji eşîra Millî ye û di esnayê nivîsîna wê nusxeyê de iqameta wî Erzirûm e. Li gor vê teqrîbî 250 sal berî niha li bajarê Erzurûmê berhemên edebî hatine istînsaxkirin û ji devera Miksê û ji eşîra Millî hin kurd niştecihîn wî bajarî ne. Ev her du nusxe, ji ber ku van agahîyên dîrokî û civakî vedigirin xwedî nirx in.

Eger em bênen ser nusxeya sêyem a mewlûda Bateyî ku di koleksiyona Jaba de cih digire (Kurd 33b), ji ber ku ev nusxe bi tevahî negihiştiye me, mixabin em nikarin nirxandineke tam li ser wê bikin. Berî her tiştî di wê nusxeyê de wereqa dawî tuneye û di encamê de em derheqê tarîxa te'lîf/istînsaxa wê berhemê de, herwiha derheqê cihê istînsaxa wê de nikarin bibin xwedî agahî. Bêguman ev yek nirxê wê nusxeyê dadixîne. Digel vê jî di çarçoveya wereqên heyî de, em dikarin derheqê serdema wê nusxeyê de hin şîrove û analîzan bikin: Ji ber hebûna çend nîşaneyan, ev nusxe ji her du nusxeyên din kevintir dixuye. Nîşaneyâ yekem rewşa kaxzea wê ye. Ji rizîn û peritîna kaxezê, herwiha ji te'mîra ku li ser kaxezê hatiye kirin, tê fêmkirin ku ev nusxe di nav van her sê nusxeyan de ya herî kevin e. Nîşaneyâ duyem ew e ku di metna heyî ya wê nusxeyê de bi awayekî sistematîk sernav nehatine bikaranîn. Tenê di beşekê de sernavek heye ku ew jî “Întîqalê Nûrê Muhammed Sellallahu ‘Eleyhî we Sellem be Amîne” ye. Ji bilî vê di beşa “Amedenê Ebdulmettelib ez Ke’be” de jî ji bo sernavê, cih vala hatiye hiştin, lêbelê sernav nehatiye nivîsîn. Ev jî bi me dide hizirkirin ku ev nusxe ji her duyên din yên ku di wan de bi awayekî sistematîk, sernav hatine bikaranîn kevintir e. Lewra bi piranî nusxeyên dereng ji yên zû birêkûpêktir in. Mustensikan bi awayên curbicur di wan de çaksazî kirine (Bergsträsser, 2011, r. 85-86). Loma Kurd 33bya ku bê sernav e, dibe ku ji Kurd 7 û Kurd 9ên bisernav kevintir be. Nîşaneyâ sêyem jî taybetiyê wê yên paleografîk in ku li gor Cewdet Huşyar ev taybetî, nusxeyê dixin malê sedsala hijdehem (Huşyar, 29. 10. 2013). Li gor van nîşaneyan, tarîxa nivîsîna wê dê vegere berî tarîxa 1791-92yan ku tarîxa istînsaxa Kurd 7ê ye. Ev qonaxa tarîxê jî berê me dide serdemeke girîng ku ew jî serdema jiyana nivîskarê Mewlûdê,

Melayê Bateyî ye. Çawa tê zanîn ku Melayê Bateyî heta bi çaryeka sêyem a sedsala XVIIIem jiyaye. Li vir bivênevê ev pirs tê bîra mirov: Gelo nabe ku ev nusxe nusxeya muellif bixwe be. Bêguman em nikarin vê yekê bi teqezî piştrast bikin. Lêbelê em dikarin bibêjin ku ev nusxe yek ji nusxeyên herî kevin ên mewlûda Bateyî ye; dibe ku nusxeya muellif bixwe be, dibe ku di serdema muellif de li ber nusxeya muellif hatibe kopîkirin û dibe ku piştî wefata muellif ne bi gelekî, li ber nusxeyeke din hatibe istînsaxkirin.

Ji aliyê îmlayê ve jî nusxeya Kurd 33b nusxeyeke xwedî nirx e. Lewra dema mirov wê bi Kurd 7ê re berawid dike, derdiikeve meydanê ku îmlaya wê ji îmlaya Kurd 7ê û bi awayekî siruştî ji ya Kurd 9ê jî duristtir e. Li jêr bi awayî kategorîk, îmlaya her du nusxeyan hatiye berhevkinir:

1. Di Kurd 33byê de hin edat/gire li gor standarda îmlayê ji peyvan cuda, di Kurd 7ê de bi peyvan re zeliqandî hatine nivîsîn. Nimûne:

Kurd 33b

abo çi her (1a)
دا شعله سعو'le da (1b)

Kurd 7

بو جهر bo çiher (6a)
شعلدا şu'leda (6b)

2. Dengdêra “e”yê di Kurd 33byê de li gor standarda îmlayê herfa (◐) ye. Lêbelê di Kurd 7ê de şûna wê herfê fethê (◑) hatiye bikaranîn. Nimûne:

12

Kurd 33b

توبیا ته tobeya teh (3b)
وسلطانه westan e (1a)

Kurd 7

توبیات tobeya te (7b)
وسلطانه westane (6a)

3. Dengdêra dirêj (ى) di Kurd 33byê de hatiye nivîsîn, di Kurd 7ê de nehatiye nivîsîn. Nimûne:

Kurd 33b: غیری داری ذی بخوه

xeyrê darê jê bixwe (1a)

Kurd 7: غیری دار ذ بخوه

xeyrê darê jê bixwe (6a)

4. Di hin cihêن Kurd 33byê de kêş têk çûye ku ev jî ji aliyekî ve bi îmlayê ve girêdayî ye. Nimûne:

Kurd 33b

دît nivîsî دît نفیسی (3a)

Kurd 7

دît و نفیسی دît nivîsî (7a)

Ji van tevan aşkera tê fêmkirin ku mustensîxê Kurd 33byê kesayetekî zana ye, lêbelê yê Kurd 7ê (Muhammedê Miksi) ne wisa ye. Ev jî nirxê nusxeya Kurd 33byê gelekî bilind dike.

Kurd 33b ji aliyê teshîh/sererastkirin û têbîniyên di hamîşan (kenarêñ vala yên rûpelan) de jî xwedî nirx e. Lewra di vê nusxeyê de gelek teshîh û têbînî hene ku hemû jî di hamîşan de hatine nivîsîn. Çawa tê zanîn nusxeyên ku hatine

teshîhkîrin û li ser wan têbîniyêñ curbicur hatine nivîsîn, bi nîrx in. Ji ber ku di her du nusxeyêñ din de rewšeke weha tuneye, nîrxê vê nusxeyê ji yên wan bilindir dibe. Kurd 33b ji bo bikaranîna hamîşan di nav destnivîsêñ kurdî de wek nimûneyeke girîng derdikeve pêş. Ji bo ku derheqê vê tradîsyonê de hizrekê bide, em dê bi awayekî kategorîk ji van teshîh û têbîniyan çend nimûneyan pêşkêş bikin.

Teshîhêñ ku hatine kirin, bi piranî bi şâsiyêñ metna binema re têkildar in. Di hinan de şâsiyêñ îmlayê hatine sererastkirin. Bo nimûne peyva طلمنا / Telemna wek ظلمنا / Zelemla (3a) hatiye teshîhkîrin. ھوا ahû'ya ku "Elîf" û "Hê"ya wê ji hev dûr hatine nivîsîn, bê valahî ji nû ve hatiye nivîsîn (6b). Di teshîhinan de jî peyvîn şâş hatine sererastkirin. Bo nimûne peyva "Ebdullah" wek "Muttelib" (8b) û peyva "der zeman" wek "der cîhan" (19a) hatine teshîhkîrin. Herwiha çar beytên kêm ên metna Mewlûdê li hamîşan hatine nivîsîn û di dawiya wan de ifadeya "sehh" hatiye bicihkirin (5b, 14b, 17a, 19b). Çawa ku li jor em li ser rawestiyabûn, îmlaya Kurd 33byê jixwe rast û durist bû. Bi van teshîhan kîmasiyêñ mayî ji hatine sererastkirin. Bi vî awayî jî nusxe ji aliyê îmlaya durist ve gihiştîye asteke bilind.

Têbîniyêñ vê nusxeyê jî curbicur in. Bo nimûne di du hamîşan de du beytên ne ji metna Mewlûdê (bi cureyêñ cuda yên nivîsê) hatine nivîsîn (6a û 18b). Di du hamîşen din de jî bi erebî du selewat hatine nivîsîn (20a û 20b). Ev selewat ji Mewlûda Erebî ya Ibn Hecer hatine wergirtin.

Hin beytên ku di rîzê de neguncîne, di hamîşan de hatine temamkirin. Di misraya "Wê şevê wan go du sed jin jê mirin" "jê mirin" li hamîşê hatiye nivîsîn (9a). Dîsa di misraya "Dîti Haris ruhnikê wê bûne rîz" de "bûne rîz" li hamîşê hatiye nivîsîn (19a, 21a).

Hin peyv û ifade digel ku bê şâşî ne û bi hêsanî têñ xwendin, li hamîşan ji nû ve hatine nivîsîn: Bo nimûne ifadeya "hûr û xilman" (9a) û misraya "Girt û bir lê hate guh min ew xeber" (14a) bi heman şêweyê dîsa hatine nivîsîn.

Ji bilî van du metnêñ pexşan ên ne ji mewlûdê jî di nav rûpelêñ mewlûdê de hatine bicihkirin. Yek ji wan bi osmanî ye û derheqê girîngiya ilmê de ye, yê dî jî bi farisî ye û derheqê kirina nimêjê de ye.

3. 2. Berawirdkirina Nusxeyan û Şecereya Wan

Ji bo ku em bikarin têkiliyêñ navbera her sê nusxeyêñ arşîva Jaba tesbît bikin û di encamê de şecereya wan derxin, pêwist e em li ser van nusxeyan analîzeke berawirdî bikin. Ev analîz jî dê di çarçoveya binyad û tertîba berhemê (destpêk û dawiya berhemê, navê berhemê, tambûna berhemê, qeyda istînsaxê, beşen wê, sernavêñ wan, jimara beytan û hwd.) û ziman û îmlaya berhemê ve bê kirin ku ev tev di heman demê de di şablona tewsîfa nusxeyê de jî cih digirin. Loma berawirdkirina nusxeyan ji aliyekî ve berawirdkirina şablona tewsîfa nusxeyan e. Pişti vê berawirdkirinê, eger di naybera du nusxeyan de wekheviyeke tam

hebe, bi taybetî eger ev wekhevî şâsiyan jî vegire, ji wan ya zû ji ya dereng re dibe binema, ya dereng jî dibe kopyaya wê (Ji bo agahiyên berfireh derheqê berawirdkirina nusxeyê de bnr. Esilan1994; el-Muneccid 1976; Togan1985, r. 86-88). Pişti berawirdkirinan, nusxeyên ku xwediyê têkiliyeke bi vî rengî ne û yên ku ne wisa ne, tên tesbîtkirin û bi vî awayî şaxên nusxeyan û şecereya wan tên bidestxistin. Di nav destnivîsên Mewlûdê yên arşîva Jaba de ji ber ku tarîxa nivîsînê ya Kurd 7 û Kurd 9ê heye û tarîxa nivîsîna Kurd 33byê tuneye, pêşî berawirdkirina Kurd 7 û Kurd 9ê guncawtir dixuye.

3. 2. 1. Berawirdkirina Kurd 7 û Kurd 9ê

Dema em li van her du nusxeyan dinêrin, berî her tiştî em dibînin ku di her duyan de jî qeydên istînsaxê hene. Dema em li zanyariyên qeyda istînsaxê dinêrin, em dibînin ku di cihê istînsaxa van her du nusxeyan de hevbeşiyek heye ku ew cih jî bajarê Erzirûmê ye. Ji ber ku her du nusxe jî li Erzirûmê hatine istînsaxkirin (pêşî Kurd 7 ji aliyê Muksî ve, piştre Kurd 9 ji aliyê Bazîdî ve), wek ihtîmal tê hişê mirov ku Bazîdî li Erzirûmê nusxeya Kurd 7ê bi dest xistiye û nusxeya xwe li ber wê zêde kiriye. Di vê rewşê de Kurd 7 ji Kurd 9ê re dê bibe binema. Bêguman eger cihê istînsaxa wan cuda bûya, di destpêkê de ev hîzr û pêşqebûl qet dê nehatiba hişê me. Hevbeşiya wan a di cihê istînsaxê de di gihiştina encamê de bi tena serê xwe ne diyarker jî be, derheqê hebûna têkiliyeke bi vî rengî de hizrekê dide me.

14

Ji bo ku em encameke teqez bi dest bixin, divê em li xalêñ din temaşa bikin. Ji aliyê terfîba nusxeyan ve em dibînin ku di destpêka her du nusxeyan de di serlewheyê de ji bo berhemê heman nav hatîye nivîsîn: “Haza Mewlidu’n-Nebiyyî Sellallahu ’Eleyhî we Sellem”. Destpêk û dawiya berhemê di her duyan de wek hev e. Her du jî bi “*Hemdê bê hed bo Xudaê ‘alemîn*” dest pê dikin û bi “*Bo seqîrê Bateî el-Fatîhe*” diqedin. Her du jî li gor sîstema beşan hatine dabeşkirin û di her duyan de li jor beşan jî sernav hatine bikaranîn. Di her duyan de jî beşa yekem bê sernav e.

Bêguman hevbeşiyên jorîn têkiliya di navbera van her du nusxeyan de xurt dikin, lêbelê têra encameke tam nakin. Loma em ê her du nusxeyan, ji aliyê jimara beşan, sernavê wan û jimara beytan jî berawird bikin. Li jêr em dê sernavê ku di van beşan de hatine bikaranîn, digel jimara beytên ku di beşan de cih girtine, di nav tabloyekê de pêşkêş bikin.

Nusxeya Kurd 7ê

Beş		Sernavêr Beşan	Jimara Beytan
Beşen Durist	Beşen Aşkera		
1	1	Di vê beşê de sernav tuneye.	11 beyt
2		Di vê beşê de sernavek (Der Beyanê Feda'ilê Mewlûdê Muhammed Sellallahu 'Eleyhi we Sellem) heye, lêbelê ser wê hatiye xêzkirin. Loma wek sernavekî betalkirî dixuye.	13 beyt
3	2	Der Beyanê Feda'ilê Mewlûdê Muhammed Sellallahu 'Eleyhi we Sellem.	21 beyt
4	3	Beyanê Ibtidaê Nurê Muhammed Sellallahu 'Eleyhî we Sellem.	33 beyt
5	4	Der Beyanê Xulqê Adem 'Eleyhî we Sellem.	39 beyt
6	5	Der Beyanê Amedenê Nûrê Muhammed Sellallahu 'Eleyhî we Sellem.	11 beyt
7	6	Der Beyanê Bûdenê 'Ebdullah we Intîqalê Nûrê Muhammed Sellallahu 'Eleyhî we Sellem.	34 beyt
8	7	Der Beyanê Sebeb Dadenê Weheb Amîne li Ebdullahî Dehed.	20 beyt
9	8	Der Beyanê Întîqalê Nûrê Muhammed Sellallahu 'Eleyhî we Sellem.	50 beyt
10	9	Der Beyanê Waqî'atê Muddetê Heml.	25 beyt
11	10	Der Beyanê Wiladetî Ba Sa'det Muhammed Sellallahu 'Eleyhî we Sellem.	25 beyt
12	11	Haza Mekan el-Merheba Sahîbuhu Feqî Mustefa.	10 beyt
13		Ji sernavê re cih nehatiye çêkirin. Tenê di nav valahiya rêtê ya asayî de cedweleke ku nivîs tê de negunce heye. Loma ev der wek beşeke serbixwe naxuye.	18 beyt

14	12	Amedenê ‘Ebdulmuttelib ez Ka‘be Be Nezdê Amîne.	21 beyt
15	13	Amedenê Halîme û Bordenî Muhemmed Sellallahu ‘Eleyhî we Sellem.	83 beyt
16	14	Beyanê Weqîatî ki der Meyanê Benî Se‘dî Peyda Bûde.	67 beyt
17	15	Baz Awardenê Helîme Muhemmed Sellallahu ‘Eleyhî we Sellem.	49 beyt
18	16	Der Beyanê Munacat we Xetmi’l-Kîtab.	25 beyt

Tablo 1: Şêweya dabeşkirina Kurd 7ê**Nusxeya Kurd 9ê**

Beş	Sernavên Beşan	Jimara Beytan
1	Di vê beşê de sernav tuneye.	11 beyt
2	Der Beyanê Feda’ilê Mewlûdê Muhemmed Sellallahî ‘Eleyhî we Sellem (Ev sernav ji Kurd 7ê hatiye wergirtin. Lîbelê digel ku di Kurd 7ê de ser wê hatiye xêzkirin û bi vî awayî şâşıya wî sernavî hatiye ferqkirin, ev li ber çavan nehatiye girtin û heman sernav hatiye kopîkirin. Sernavê durist pêwist e “Der Medhê Muhemmed Sellallahî ‘Eleyhi we Sellem” be.)	13 beyt
3	Der Beyanê Feda’ilê Mewlûdê Muhemmed Sellallahî Te’ala ‘Eleyhî we Sellem.	21 beyt
4	Beyana Îbtîdaya Nura Muhemmed Sellallahî Te’ala ‘Eleyhî we Sellem.	32 beyt
5	Der Beyanê Xilqetê Adem ‘Eleyhî Selam.	39 beyt
6	Der Beyanê Amedenê Nûrê Muhemmed Sellallahî Te’ala ‘Eleyhî we Sellem.	11 beyt
7	Der Beyanê Bûdenî ‘Ebdullah we Întîqalî Nûrî Muhemmed Sellallahî ‘Eleyhî we Sellem.	34 beyt
8	Der Beyanê Sebeb Dadenê Weheb Amîne li Ebdullah dad û şod.	20 beyt

9	Der Beyanê Întîqalê Nûrê Muhemmed Sellallahu ‘Eleyhî we Sellem.	50 beyt
10	Der Beyanê Waqî‘atê Muddetî Heml.	25 beyt
11	Der Beyanê Wîladetê Basea’detê Muhemmed Sellallahu ‘Eleyhî wessellem.	20 beyt
12	Mekanu’l-Merheba li ecli’l-Mustefa.	10 beyt
13	Der Beyanê Mu‘cîzatê Nebî Sellallahu ‘Eleyhî Selam.	18 beyt
14	Amedenê ‘Ebdulmuttelib ez Ka’be Be nezdê Amîne.	21 beyt
15	Amedenê Helîme û Bordenê Muhemmed Sellallahu ‘Eleyhî we Sellem.	43 beyt
16	Beyanê Weqîatê kî der meyanê Benî Se‘diyan Peyda Bûden.	67 beyt
17	Baz Awardenê Helîme Muhemmed Sellallahu ‘Eleyhî we Sellem.	49 beyt
18	Der Beyanê Munacat we Xetmi’l-Kîtab.	25 beyt

Tablo 2: Şêweya dabeşkirina Kurd 9ê

Dema mirov bi awayekî sethî lê dinêre, tê zenkirin ku jimarên beşan hev nagirin, lewra di Kurd 9ê de 18 bes, di Kurd 7ê de jî 16 beş dixuyin. Lîbelê eger dahûrîneke baş bê kirin, dê bê dîtin ku ji ber du aloziyan ji Kurd 7ê du sernav dakterine û di binemaya xwe de beşen Kurd 7ê jî wek yên Kurd 9ê 18 in. Ji van aloziyan a yekem ew e ku mustensîxê Kurd 7ê di beşa 13em de danîma sernavî ji bîr kiriye. Dema ku ev yek ferq kiriye jî di nav valahiya rêtê ya asayî de ji bo sernavê cedweleke teng çê kiriye, lîbelê nekariye di nav wê cedwela teng de sernav binivîse. Mustensîxê nusxeya Kurd 9ê (Mela Mehmûdê Bazîdî) di esnayê istînsaxê de ev yek ferq kiriye û di nusxeya xwe de hevterîbê mijara wê beşê sernavê “Der Beyanê Mu‘cîzatê Nebî” daniye. Yanî herçiqas di Kurd 7ê de beşek kêm dixuye jî di binemaya xwe de kêmasiya wê beşê tuneye, tenê nivîsına sernavê wê hatiye jibîrkirin. Aloziya duyem jî ew e ku mustensîxê Kurd 7ê ji bo beşa duyem ku mijara wê pesnê Pêxember e, bi şâşî sernavê beşa sêyem (Der Beyanê Feda’ilê Mewlûdê Muhemmed) nivîsiye, lîbelê piştî ku ev şâşıya xwe ferq kiriye ji ber ku nekariya wî sernavî jê bibe û yê rast binivîse, ser wê xêz kiriye û ew sernav bi vî awayî betal kiriye. Heman sernav di cihê xwe yê asayî de (beşa sêyem) jî hatiye bikaranîn. Bi vî awayî di beşa duyem de bi awayekî şâş û di beşa sêyem de jî bi awayekî rast heman sernav du caran hatiye bikaranîn. Di vê rewşê de ji ber ku ji du sernavêne wek hev yê pêşî hatiye xêzkirin, mirov zen dike ku beşa sernavê xêzkirî hatiye betalkirin û ew der dewama beşa berî wê ye.

Bi vî awayî digel ku beşa sernavê xêzkirî, beşeke serbixwe ye jî ew beş bi şasî tê daxistin û ji Kurd 7ê beşeke din jî kêm dibe. Çawa ku hat izahkirin, eger mirov bi baldarî lê binêre, dê bê dîtin ku besên vê nusxeyê jî di binemaya xwe de 18 in û her du nusxe di mijara jimara beşan de jî hevbeş in.²

Zêdebarî vê hevbeşiyê di beşa duyem a Kurd 9ê de şûna ku sernavê şasî û serxêzkirî yê Kurd 7'ê bê sererastkirin, heman şasî hatiye dubarekirin. Bêguman hevgirtina şaşiyên du nusxeyan nîşaneyeke bingehîn e ku ji wan nusxeyan ya dereng li ber ya zû hatiye kopîkirin. Ev jî dibe nîşaneyeke girîng ku Kurd 7 ji Kurd 9ê re binema ye.

Ji bilî hevbeşiya di jimara beşan de, di metnên sernavan de jî hevgirtineke tam heye. Lewra di her duyan de jî sernavek bi erebî yên din tev bi farisî ne. Tenê Bazîdî sernavekî Farisî bi rakirina hin edatê farisî xistiye dirûvê Kurmancî.

Eger em bêñ jimara beytan, di vê mijarê de di navbera her du nusxeyan de newekheviyek heye. Lewra jimara beytan di Kurd 7ê de 555 û di Kurd 9ê de jî 509 e. Lêbelê jimara beytên wan ne wek hev jî bin, ji ber ku kêmasiya beytan di nusxeya dereng (Kurd 9) de ye, ev di zanista destnivîsariyê de nabe asteng ku nusxeya zû ji ya dereng re bibe binema. Lewra mustensix dema nusxeya nû kopî dike carinan cihê ku lê maye ji bîr dike û beytinan, yan jî rûpelinan diqevêze (Bergsträsser, 2011, r. 74). Li vir jî dema mustensixê Kurd 9ê nusxeya xwe kopî kiriye, di beşa çarem de beytek, di beşa yazdehem de pênc beyt û di beşa pazdehem de jî cil beyt (du wereq), yani tev de 46 beyt qevastine. Bi kurtî di nusxeya Kurd 9ê de kêmasiya beytan nabe asteng ku ew nusxe kopiya Kurd 7ê be.

Di encama berawirdkirina her du nusxeyan de derdikeve meydanê ku di navbera Kurd 7 û Kurd 9ê de wekheviyek tam heye. Ev jî berê me dide wê yekê ku nusxeya Kurd 7 ji Kurd 9ê re binema ye û Kurd 9 li ber wê hatiye istînsaxkirin. Piştî ku bi saya vekolîna li ser binyad û tertîba her du nusxeyan derket meydanê ku Kurd 7 ji bo Kurd 9ê binema ye, hevbeşiya wan a cihê istînsaxê jî ku bajarê Erziromê ye, watedartir dibe.

3. 2. 2. Berawirdkirina Kurd 33b û Kurd 7ê

Madem em êdî dizanin ku Kurd 9 kopyaya Kurd 7ê ye, em ê bi awayekî siruşî nusxeya kopyakirî daynin aliyekî û nusxeya binema (Kurd 7) bi nusxeya sêyem a mayî re (Kurd 33b) berawird bikin. Bi vî awayî, em dê hebûn, yan nebûna têkiliyê fêm bikin û ji bo derxistina şecereyê gava dawî biavêjin.

Dema em li binyad û tertîba Kurd 33byê dinêrin, berî her tiştî netambûna wê balê dikişîne. Ev jî tê wê wateyê ku di vê nusxeyê de qeyda istînsaxê, yanî tarîxa

² Ji ber ku ev hürgilî li ber çavan nehatine girtin, di weşana rexneyî ya metnê Mewlûda Bateyî de ku bi serpereştiya me ji aliyê Ziver İlhan ve hat amadekirin, besên nusxeya Kurd 7ê wek 16 hatine nîşandan. (Ilhan, 2014, r. 31.)

nivîsîna nusxeyê cih nagire. Ji ber vê jî berawirdkirina binyadî girîngiyeke zêde bi dest dixe. Lewra her cure encam tenê bi saya vê berawirdkirinê dê bê bidestxistin. Lêbelê mixabin ji ber ku ev nusxe, bi tevahî negihiştiye me, ne pêkan e em derheqê tevahiya besên wê de agahiyeke tam bi dest bixin. Eger beyta yekem a ku ev nusxe bi wê dest pê dike (Nê hezaran sal(i) çûne axirî / Ew nebî bû Adem hêj av û herî) li ber çavan bê girtin, dê bê dîtin ku ji serê vê nusxeyê, çar besên pêşî bi tevahî û destpêka beşa pêncem kêm in. Kojima beytên van beşan teqrîbî 85 in. Dîsa eger beyta dawî ya ku ev nusxe pê diqedesas bê girtin (Dest(i) da şiran û hatin şubhê san / Xweş li pey me mulhidanê bê eman), dê bê dîtin ku çend beytên dawî yên beşa pazdehem û her sê besên dawî bi tevahî di vê nusxeyê de cih negirtine. Kojima beytên van beşan jî teqrîbî 148 in. Bi vî awayî derdikeye meydanê ku ji vê nusxeyê heft beş bi tevahî kêm in û kojima beytên kêm jî teqrîbî digihîje 233 beytan. Eger em di çarçoveya Kurd 7 û Kurd 9 ê de standarta besên mewlûdê 18 beş qebûl bikin, di dest me de 11 beş dimînin.

Ji ber kêmasiya van beşan em mecbûr in analîzêñ xwe di çarçoveya besên heyî de bikin. Dema em ji aliyê dabeşkirin û sernavêñ beşan ve li metna heyî dinêrin, em dibînin ku di vê nusxeyê de, berevajî her du nusxeyêñ din, rîbaza dabeşkirinê nehatiye şopandin. Lewra di metna heyî de tenê ji bo beşekê sernav hatiye bikaranîn ku ew jî “Întîqalê Nûrê Muhammed Sellallahu ‘Eleyhî we Sellem be Amîne” ye. Herwiha di beşa “Amedenê Ebdulmettelib ez Ke’be” de jî ji bo sernavê, cihê vala hatiye hiştin, lêbelê sernav nehatiye nivîsin. Wek encam di çarçoveya metna heyî de em dikarin bibêjin ku di nusxeya Kurd 33byê de bi piranî sernav nehatine bikaranîn, loma jî dabeşkirin ji hev nayê ferqkirin. Ji aliyê dabeşkirinê ve taybetiyeke din a vê nusxeyê ew e ku di vê nusxeyê de, berevajî Kurd 7 ê, beşa merhebayê tuneye.

Çawa tê dîtin ku ji aliyê dabeşkirin û sernavan ve tu têkili di navbera her du nusxeyan de naxuye. Lêbelê digel vê jî divê bersiva vê pîrsê bê dayîn: Gelo nabe ku mustensixê Kurd 7 ê, digel zêdekirina sernavan nusxeya xwe li ber Kurd 33byê istînsax kiribe? Bêguman ev yek wek teorîk pêkan e, lêbelê di navbera wan de du cudahî hene ku vê ihtiîmalê ji holê radikin. Ya yekem ew e ku di Kurd 33byê de beşa merhebayê tuneye, lêbelê di Kurd 7 ê de ev beş heye. Ev jî nîşan dide ku Kurd 33b ji bo Kurd 7 ê ne binema ye û di navbera wan de têkiliyek tuneye. Lewra beşeke ku di nusxeya binema de tunebe, divê di nusxeya kopîkirî de jî tunebe. Ya duyem jî ew e ku di navbera îmla û peyvîn wan de cudahiyêñ mezin hene. Li jorê di beşa nirxêñ nusxeyan de me ji aliyê imlayê ve her du nusxe berawird kiribûn û nimûneyêñ wan pêşkêş kiribûn. Loma li vir em dê çend cudahiyêñ din jî bi awayekî kategorîk û berawirdî pêşkêş bikin:

1. Hin peyv bi herfîn cuda hatine nivîsin.

Kurd 33b

وخته رابت Wexte rabbit (3b)

ارضی Erdê (2a)

سحرا Sehra (5a)

نو کمیشتن Zû gehiştin (5a)

بو خلا Bû xela (15a)

2. Hin peyv ji hev cuda ne.

Kurd 33b

پا خداوندی فلک Ya Xudawendê felek (1a)

دا بینی Da bibînê (6a)

سرا عظیم sirra ‘ezîm (7a)

3. Hin peyvan cih guherandine.

Kurd 33b: هم د وی روزی ل صیدی بو و هب Hem di wê rojê li seydê bû weheb (6a)

Kurd 7: هم دروزی وی ل صیدی بو و هب Hem di rojê wê li seydê bû weheb (10 b)

Ev cudahî nîşan didin ku di navbera Kurd 33b ji Kurd 7ê de tu têkilî tuneye û binemaya Kurd 7ê ne Kurd 33b ye, nusxeyeke nenas e.

Kurd 7

وقته رابت weqte rabbit (8b)

‘عرضی’ erdê (9b)


صحرا sehra (10a)

زو کمیشتن zû gehiştin (10a)

بو غلا bû gela (18a)

3. 2. 3. Şecereya Her Sê Nusxeyan

Di zanista destnîvîsariyê de nusxeya binema û kopyaya/kopyayêن wê û eger hebin kopyayêن kopyayan şaxeke nusxeyan, kojima hemû şaxan jî şecereya nusxeyan saz dikin (Ji bo agahîyên berfireh bnr. Togan 1985, r. 86-88, 90, 92). Di çarçoveya vê dustûrê de berawirdkirin û analîzên jorîn di du xalan de dikarin bêñ xulasekirin: Ya yekem tu têkilî di navbera Kurd 33b û Kurd 7ê de tuneye, ev du şaxêñ cuda ne û li ber binemayêñ cuda hatine istînsaxkirin. Bêguman ji ber ku xebata me tenê bi sê nusxeyêñ ku di arşîva Jaba de cih digirin bi sînor e, em li vir nadîn pey jêderêñ wan. Aşkera ye ku ji bo vê yekê divê nusxeyêñ din ên Mewlûdê ku li jêrê dê bi helkefteke dî, lîsteya wan bê dayîn, bi heman şêweyê bêñ analîzkirin. Encama duyem jî ew e ku nusxeya Kurd 9ê li ber Kurd 7ê hatiye istînsaxkirin. Yanî Kurd 7 binema, Kurd 9 jî kopyaya wê ye. Di vê çarçoveyê de şecereya van her sê nusxeyan digel şaxêñ wê weha dikare bê şematîzekirin:



Şema: Şecereya Nusxeyên Mewlûda Melayê Bateyî yê Koleksiyona A. Jaba

3. 3. Cihê Arşîva A. Jaba di nav Destnivîsên Mewlûda Bateyî de

Ji bo ku em ji aliyê destnivîsên Mewlûda Bateyî ve girîngiya arşîva A. Jaba tesbit bikin û cihê wan di nav nusxeyên din ên Mewlûda Bateyî de derxin meydanê, divê em pêşî ji nusxeyên din ên Mewlûda Bateyî haydar bin. Heta niha gelek lêkolîneran hewl dane ku nusxeyên destnivîs ên Mewlûda Bateyî berhev bikin û Mewlûdê li ser esasê wan nusxeyan ji nû ve biweşînin. Di vî warî de xebata herî dawî ya Ziver İlhan e (İlhan, 2014, r. 31). Her çiqas berî İlhan gelek lêkolîneran (Amêdî, ?.; Zinar, 1992; T. Doskî û M. Doskî, 2005; Sadînî, 2015; Şemrexî, 2011) di weşanên metna Mewlûdê de ji gelek nusxeyên destnivîs sûd wergirtibin jî, ji aliyê berhevkirinê ve xebata İlhan ji ya hemûyan berfirehtir e û pêşketitir e. İlhan di teza xwe ya masterê de ku ji metna rexneyî ya Mewlûda Bateyî pêk tê, ji bo ku vê metnê amade bike, heşt nusxeyên destnivîs ên Mewlûdê berhev kirine ku tevahiya van nusxeyan di qonaxa berî Şerê Cîhanê yê Yekem de hatine istînsaxkirin (İlhan, 2014, r. 31-40). Bêguman nusxeyên Mewlûdê ne ev tenê ne. Ji bili van nusxeyan gelek nusxe jî di qonaxa piştî Şerê Cîhanê yê Yekem de hatine istînsaxkirin. Xebata İlhan nusxeyên vê serdemê venegirtine, lêbelê xebata Amêdî ji van nusxeyan du heban (Amêdî, ?, r. 9) û xebata Doskî jî pênc heban (T. Doskî û M. Doskî, 2005, r. 39-40) vedigire. Ji ber ku nusxeyên berî qonaxa şer ji aliyê qidemê ve girîngtit in û nusxeyên arşîva Jaba jî di vê qonaxê de ne, em dê li vir xwe bi wê qonaxê bi sînor bikin û nusxeyên wê qonaxê yêne ku ketine literaturê tesbit bikin.

Çawa ku berî niha çendîn caran hat diyarkirin, di arşîva Jaba de sê nusxeyên Mewlûda Bateyî hene. Ji heşt nusxeyên ku İlhan di teza xwe de bi kar anîne, du nusxe yê arşîva Jaba ne ku ew jî Kurd 7 û Kurd 9 in. Di xebata İlhan de Kurd 33b cih nagire. Eger em vê jî li ber çavan bigirin, jimara destnivîsên Mewlûdê dibe neh. Dîsa di xebata Sadiq B. Amêdî de nusxeyeke kevin heye ku ew jî di xebata İlhan de cih nagire Ev nusxe ji aliyê Hesen el- Îrûnî b. Cangîr el-Binbatî

ve di sala 1871ê de hatiye istînsaxkirin. (Amêdî, ?, r. 9). Bi vî awayî jimara nusxeyan dibe deh. Ji bilî van deh nusxeyan, li Almanya li pirtûkxaneya Staatsbibliothek zu Berlinê jî nusxeeyeke Mewlûdê heye (Bateyî, 1854). Digel vê jimara destnivîsên Mewlûdê digihîje yazdehan ku ev tev di qonaxa berî Şerê Cîhanê yê Yekem de hatine istînsaxkirin. Di tabloya jérîn de, ji bo ku bi awayekî berawirdî cihê arşîva Jaba di nav nusxeyen Mewlûdê de bê tesbîtkirin, cihêne ku ev nusxe lê têr parastin û eger hebin jimareyên wan û tarîxa ku hatine istînsaxkirin bi hev re cih digirin:

	Cih	Jimare	Tarîx
1	Arşîva Jaba-Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngradê/Rûsyâ	Kurd 7	1792
2	Milli Kütüphane-Ankara/Turkiye	06 Hk 4390	1824
3	Îsmaîl Taha Şahîn-Dihok/Kurdistan-Iraq	-	1854
4	Staatsbibliothek zu Berlin/Almanya	Ms. or. oct. 1083	1854
5	Arşîva Jaba-Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngradê/Rûsyâ	Kurd 9	1858
6	Sadiq B. Amêdî-Dihok/Kurdistan-Iraq	-	1871
7	Z. Gökalp İhtîsas Kütüphanesi-Diyarbekir/Turkiye	21 Hk 1916	1880
8	A. Lec Oq Berlîn	faksimile	1887
9	Hüseyîn Galip Kütüphanesi-Ortahîsar/Turkiye	016	1910
10	Arşîva Jaba-Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngradê/Rûsyâ	Kurd 33b	?
11	Mela Nûrî-Gundê Batê/Turkiye	-	?

Tablo 3: Nusxeyen Mewlûdê yên berî Şerê Cîhanê yê Yekem

Bêguman li vir em dê ji hemû aliyan ve (dêrînî, binyada berhemê, tesnîf/dabeşkirin, tertîb/rêzbendî, metna berhemê û hwd.) van nusxeyan analîz nekin. Ji ber ku ev gotar bi nusxeyen arşîva Jaba sînorkirî ye, analîzeke bi vî rengî, çawa ku li jorê derbas bû, tenê di her sê nusxeyen arşîva Jaba de hatiye bicîhkirin. Teşmîlkirina vî karî li ser nusxeyen din karê gotareke cuda ye. Li vir tenê em dixwazin van nusxeyen arşîva Jaba ji aliyê rêje û dêrîniyê ve bi yên din

re berawird bikin. Dema em ji aliyê rîjeyê ve lê dinêrin, em dibînin ku ji yazdeh nusxeyan sê heb di arşîva Jaba de, lêbelê her yek ji nusxeyen din li cihêن ciyawaz cih digirin. Bi gotineke din tenê arşîva Jaba ye ku ji yekê zêdetir nusxê lê têne parastin. Bêguman ev wek taybetiyeke girîng a arşîva Jaba derdikeve pêş.

Ji aliyê dêrîniya nusxeyan ve jî arşîva Jaba girîngiyeke xwe ya taybet heye. Lewra di nav hemû nusxeyan de ya herî kevin di arşîva Jaba de ye. Ew jî Kurd 7 e ku tarîxa nivîsînê 1792 ye. Çawa di tabloyê de jî tê dîtin, nusxeya Kurd 9 jî yek ji nusxeyen kevin dikare bê qebûlkirin. Lewra qet nebe di nîveka listeyê de cih digire. Nusxeya Kurd 33b jî, herçiqas tarîxa nivîsîna wê ne diyar e, dirûvê nusxeyeke kevin pê dikeve.

Di encamê de arşîva Jaba ji yazdeh nusxeyen Mewlûda Bateyî sê nusxeyen kevin vedigire ku yek ji van sê nusxeyan di nav hemûyan de ya herî kevin e. Loma arşîva Jaba di parastina van nusxeyen binirx ên Mewlûda Bateyî de xwediyê roleke mezin e. Eger ev nusxe di wê arşîvê de nehatibana parastin, bi iştîmaleke mezin, an dê negihiştibana roja me yan jî em dê ji wan haydar nebûna.

ENCAM

Di arşîva A. Jaba de (li Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngrad/Rûsyayê) sê nusxeyen Mewlûda Melayê Bateyî hene: Kurd 7, Kurd 9 û Kurd 33b. Ji analîzen ku ji perspektîfa dîsiplîna destnîvîsariyê ya li ser van nusxeyan hatin kirin, derket meydanê ku ji van nusxeyan Kurd 7 û Kurd 9 tam in, Kurd 33b jî ne tam e. Hevterîbê vê di Kurd 7 û Kurd 9ê de qeyda istînsaxê heye, lêbelê di Kurd 33byê de tuneye. Ji ber vê jî zanyariyên cih û tarîxa istînsaxê û herwiha kesê ku istînsax kiriye ji bo Kurd 7 û Kurd 9ê di destê me de hene, lêbelê ji bo Kurd 33byê tunene. Dîsa Kurd 7 û Kurd 9 di qeyda istînsaxê de agahiyên civakî û dîrokî jî vedigirin. Ji van agahiyân tê fêmkirin ku teqrîbî 250 sal berî niha li bajarê Erzirûmê berhemên edebî yên kurdî hatine istînsaxkirin û ji devera Miksê û ji eşîra Millî kurdên niştecihê wî bajarî hene. Ev tev nirxê Kurd 7 û Kurd 9ê bilind dikin. Heçî nusxeya Kurd 33byê ye, ew wek Kurd 7 û Kurd 9ê ne tam e, lewra di destpêk û dawiya wê de wereqên kêm hene. Ev jî dibe sedem ku em ji zanyariyên bingehîn ên wek dîrok û cihê nivîsîna vê nusxeyê bêpar bimînin. Lewra ev zanyarî bi giştî di dawiya nusxeyan de cih digirin. Bêguman ev yek jî nirxê vê nusxeyê (Kurd 33b) dadixîne. Lêbelê digel vê jî ev nusxe ji aliyê hin xalêñ din ve xwediyê nirxekî mezin e. Berî her tiştî ev nusxe ji yên din kevintir dixuye. Lewra kaxzeza wê peritî ye û hatiye te'mîrkirin. Herweha şewaza dabeşkirina wê ne birêkûpêk e û ji vî aliyî ve dirûvê nusxeyeke kevin pê dikeve ku piştre di istînsaxên din de hatiye dabeşkirin. Ev nusxe ji aliyê îmlayê ve jî nusxeyeke pir girîng e. Lewra îmlaya wê jî îmlaya Kurd 7ê rasttir û duristtir e. Ji vê jî tê fêmkirin ku mustensîxê Kurd 33byê kesayetekî zana ye, lêbelê yê Kurd 7ê (Muhemmedê Miksî) ne wisa ye. Kurd 33b ji aliyê teshîh/sererastkirin û têbîniyên di hamîşan (kenarêñ vala yên rûpelan) de jî xwedî nirx e. Hem bi

teshîhan kêmasiyên heyî hatine sererastkirin, hem jî nusxe bi vê rewşa xwe ji bo bikaranîna hamîşan di destnîvîsên kurdî de wek nimûneyeke girîng dikare bê pêşniyarkirin.

Nusxeya Kurd 7ê di 1206ê hicrî/1791-92ê mîladî de ji aliyê Muhemedê Miksî ve û nusxeya Kurd 9 ê di 1274ê hicrî/1857-58ê mîladî de ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve hatine istînsaxkirin. Di encama berawîrdkirina van her du nusxeyan de derdikeye meydanê ku Bazîdî nusxeya xwe (Kurd 9) li ber nusxeya Muksî (Kurd 7) nivîsiye. Yanî nusxeya Muksî ji ya Bazîdî re binema ye. Lewra di navbera her du nusxeyan de ji aliyê binyad û tertîbê ve wekheviyeke tam heye. Pişti dahûrîneke kûr derdikeye meydanê ku di Kurd 9 ê de sernavêن beşan digel şâsiyên xwe bi tevahî hatine kopyakirin. Tenê di jimara beytan de, ji ber ku mustensixê Kurd 9 ê hin beyt bi şâşî qevaztine, di navbera wan de newekheviyek dixuye ku ev jî di tradîsyona istînsaxê de tiştekî asayî ye. Dema du nusxe, şâşî jî di nav de, bi giştî wek hev bin, ji wan ya zû ji ya dereng re dibe binema. Loma jî Kurd 7 ji Kurd 9 ê re binema ye. Heçî nusxeya Kurd 33byê ye, tu têkili di navbera wê û nusxeya Kurd 7 ê de tuneye û her du jî li ber jêderêن cuda hatine istînsaxkirin. Di navbera van her du nusxeyan de cudahiyên girîng hene. Ji van cudahiyan du xal derdikeyin pêş. Yek jê ew e ku di Kurd 33byê de beşa merhebayê tuneye, lê di Kurd 7 ê de heye. Ya duyem jî ew e ku ji aliyê îmlayê ve di navbera wan de cudahiyê mezin hene. Wek encam ji her sê nusxeyen mewlûda Bateyî yên arşîva Jaba, Kurd 33b û Kurd 7 du şaxêن cuda ne. Kurd 9 jî li ber Kurd 7 ê hatiye istînsaxkirin.

24

Ji aliyê destnîvîsên mewlûda Bateyî ve girîngiya arşîva A. Jaba gelek e. Ji yazdeh nusxeyen kevin ên mewlûda Bateyî ku di qonaxa berî Şerê Cihanê yê Yekem de hatine istînsaxkirin, sê heb tenê di arşîva Jaba de cih digirin. Di nav van nusxeyan tevan de ya herî kevin dîsa di arşîva Jaba de ye ku ew jî nusxeya Kurd 7 e. Nîşaneyên heyî Kurd 33byê ji wê jî kevintir didin xuyakirin. Ev jî nîşan didin ku arşîva Jaba di parastina van nusxeyen xwedî nirx de roleke mezin lîstiye.

ÇAVKANÎ

Çavkaniyê Çapkirî:

Amêdî, S. B. (?). *Mewlûda Melayê Bateyî*, Hewlêr: Emîndarêtiyê Giştî yê Rewşenbîrî û Lawan, Hewlêr.

Amêdî, S. B. (1998). *Hozanvanêt Kurd*, (Amd. Zeynelabidîn Zinar), Stockholm: Pencînar.

Azizan, H. (1998). "Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin", *Hawar*, Stokolm:Nûdem.

Babê Zêrevanî, (2002). "Mela Hisêne Bateyî-1", *Nûbihar*, hj. 87, Stenbol.

Bazîdî, M. M. (2010). "Rîsaleyha Sha'ir û Musennefên di Kurdistanê", *Camî'eya Rîsaleyen û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî*, Amd. Ziya Avcı, Stenbol: Lîs.

- Bergsträsser, G. (2011). *Metin Tenkidi ve Yazma Metinleri Yayınlama İlkeleri*,
Yayına Haz. Muhammed Hamdi el-Bekri, Çev. Eyyüp Tanrıverdi, İstanbul:
Kitabevi.
- Bilgin, O. (2013). “Yazma” DIA, (b. XLIII), İstanbul:DİB Yay.
- Binbîn, E û Şewqî T (2005). Mustefa, *Mu’cem Mustelehat el-Mextût el-‘Erebî*,
Merakeş: el-Xizane el-Heseniyye er-Ribat.
- Doskî, T. Î. û Doskî, M. (2005). *Melayê Bateyî Jiyan û Berhem*, Duhok: Spîrêz.
- Ertûşî, H. (1323). *Mewlidun ’Nebî*, Stenbol:Dersaadet
- Esîlan, E. E. (1994). *Tehqîqu ’l-Mextûtat beyne ’l-Waqi’ we ’n-Nehc el-Emsel*,
Riyad: Mektebet el-Melik Fehd el-Weteniyye.
- İlhan, Z. (2014). *Mewlûda Mela Huseynê Bateyî-Metn û Lêkolîn*, Enstîtuya
Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, t.ç, Mardin: Teza Lîsansa Bilind
- Kavakçı, Y. Z. (1991). *İslam Araştırmalarında Usul*, Ankara: DİB Yay.
- Kızıl, H., Şingâr, C. û Çetin, R. (2015), “Ceribandinek Li Ser Senifandina
Mewlûdêne Kurdiya Kurmancî Li Gorî Mijarê Wan”, *International Journal
of Kurdish Studies*, j.1, Diyarbakır.
- el-Muneccid, S. (1976). *Qewa’id Fehreset el-Mextûtat el-‘Erebiyye*, Beyrûd:
Dar el-Kitab el-Cedîd.
- el-Muneccid, S. (1987). *Qewa’id Tehqîq el-Mextûtat*, Dar el-Kitab el-Cedîd,
Beyrûd: Dar el-Kitab el-Cedîd.
- Genatê Kurdo (1992). *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, Ankara: Ozge.
- Pîrbal, F. (2000). *Mela Mehmûdê Bayezîdî (1799-1867) Yekemîn Çîroknûs û
Pexşannûsî Kurd*, Hewlêr: Aras.
- Rudenko, M. B. (1961). *Opisanie Kurdsikh Rukopisey Leningradskikh Sobraniy*,
Moskova: Izdatelbstyo Ydstdçnoy Literaturi.
- Sadîni, M. X. (2015). *Molla Huseyin-i Bateyî Mevlid-i Şerif/Mewlûda Nebî*,
Ankara: Kültür ve Turizm Bakanlığı Yay.
- Sadinî, M. X. (2010), *Mela Huseynê Bateyî Jiyan*, Berhem û Helbestê Wî,
İstanbul: Nûbihar.
- Şemrexî, H. (2011). *Mewlûd Melayê Bateyî*, Stenbol: Nûbihar.
- Togan, A. Z. V. (1985). *Tarihte Usul*, İstanbul: Enderun Kitabevi.
- Wellek, R. û Warren, A. (1948). *Theoryn of Literature*, New York: Harcourt,
Brace and Company .
- Zinar, Z. (1992). *Mewlûd*, İstanbul: Fırat Yay.

Çavkaniyê Destnîvîs:

- Melayê Bateyî, (1206 H/1791-92 M). *Mewlidu ’n-Nebî*, nusxeya dijîtal a arşîva
A. Jaba li Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngrad/Rûsyayê, j. Kurd 7, Erzirûm:
Muhammed el-Muksî
- Melayê Bateyî, (1274 H/1857-58 M) . *Kitabu Mewlidâ Şerif*, nusxeya dijîtal a
arşîva A. Jaba li Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngrad/Rûsyayê, j. Kurd 9,
Erzirûm: Mela Mehmûdê Bayezîdî

Melayê Bateyî, (?). Mewlûd, nusxeya dijîtal a arşîva A. Jaba li Pirtûkxaneya
Giştî ya Lenîngrad/Rûsyayê, j. Kurd 33b. ?: ?.

Melayê Bateyî, (1854). Mewlûda Melayê Bateyî, nusxeya dijîtal
Staatsbibliothek zu Berlin/Almanya, j. Ms. or. oct.1083. Bithîs: Salih b.
Mustefa.

Çavkaniya Elektronîk:

Huşyar, Cewdet, “Zexâîru’t-Turasi’l-Kurdî fi Xezainî Petersborg”,
<http://brob.org/old/bohotoh/bohotoh/hooht026.htm>, 29. 10. 2013.

Kurd 7

لَبَرْ	هَذِهِ مُوْلَدَةُ النَّبِيِّ صَلَّى اللَّهُ عَلَيْهِ وَسَلَّمَ
أَوْحَدُوا دِيْنَهُ دِيرْمِيْشِتَهِ	حَدَّبِيْرَ حَرَبِيْرَ خَرِبِيْرَ عَالِيَّهِ
تَابِعُو وَمَقْتَدَهُ تَامَوْفَهُ	اَمَّهُ كَرِيْزَ اَمَّهُ حَيْرَهُ شَهَرَ
دَلِيْسَهُ مِيرَتَهُ قَلَّاكِرَهُ	أَوْحَدَهُ مَالِكَهُ الْمَلِكَهُ عَظِيمَهُ
بَعْنَادَهُ اَحَدَهُ وَدَلَّاسَلَمَهُ	دِيزَكَهُ كَامِلَهُ نِعْتَهُ قَاعَهُ
دِمَشَائَهُ بَاهَقَاهُهُ لَذَفَولَهُ	أَوْحَدَهُ سَلَطِينَهُ دَوَالَّهُ لَبَلَّا
عَالِيَهُ سَرِنَكَوَهُ دَرَصَورَهُ	لَوْقَهُ دَهَشَتَهُ وَلَيَا وَهَارَهُورَهُ
راَحِمَهُ وَرَحَمَانَ طَبِيعَهُمَهُ بَانَهُ	لَادَسَازِيَّهُ سَلَطَانَ جَانَهُ
صَوْرَتَهُ بَاخَلَوَهُ طَهُوَهُ اَفَسَيدَهُ	اَسَمَانِ بَسْتُونَهُ وَدَكَهُ بَهِيدَهُ

جَهْنَمْ


Rûpela Destpêkê

27




Rûpela Dawiyê

Kurd 9



28

Rûpela Destpêkê




Rûpela Dawiyê

Kurd 33b



Rûpela Destpêkê



Rûpela Dawiyê



HETEROGLOSSIA DI ROMANA *SATURN* A REMEZAN ALAN DE*

Ümrان ALTINKILIÇ**

KURTE

Mîxaîl Mîxaîlovîç Baxtîn (1895-1975) yek ji zanyarên giring ên sedsala XXem e ku di gelek biyavên wek felsefe, fenomenolojî, dîroka çandê, antropolojî û zanista edebiyatê de xebat kirine û bi piranî ji ber xebatên xwe yên derbarê teoriya romanê de navdar bûye. Teoriya wî ya romanê di çarçoveya çemkên pirdengî, kronotop, karnaval û heteroglossia de teşe girtiye ku her yek ji van di vî warî de bûye cihê gelek lêkolînan û îlhama gelek xebatan. Ji van çemkan a ku ev meqale li ser hatiye avakirin, heteroglossia ye. Heteroglossia, amaje bi ziman, şêwezar, axaftin û gotarêن civakî yên curbicur ên li civakê heyî û ketina wan di romanê de dike. Bi reya vê çemkê hat nîşandan bê ka çawa şêwezarên curbicur ên civakî, ziman û şêwazên janrêن edebî, jargona kom û pişeyan di romana Remezan Alan, *Saturn*ê de hatine nimandin.

Bêjeyêن sereke: Roman, Baxtîn, heteroglossia, şêwezar, *Saturn*.

ABSTRACT

"Heteroglossia in the Novel Saturn by Remezan Alan"

Mikhail Mikhailovich Bakhtin (1895-1975) is one of the most important theorists of XX century. He studied in many fields such as phenomenology, philosophy, cultural history, anthropology, literary theory but he widely became famous for his studies about the theory of the novel. His theory of the novel is based on the concepts such as polyphony, chronotope, carnival and heteroglossia. Of these concepts, it is the concept of heteroglossia that this article is based on. Heteroglossia refers to a diversity of social languages, dialects, speech types and discourses and their treatment in the novel. By this concept, the representation of various social dialects, the languages and styles of literary genres and the occupational and group jargons in the novel *Saturn* by Remezan Alan are scrutinized.

Key Words: Novel, Bakhtin, heteroglossia, dialect, *Saturn*.

* Ev meqale ji ber teza masterê ya nivîser hatiye derxistin. Bnr.: Altinkılıç, Ü. (2015). *Xwendineke Baxtînyen di Sé Romanên Kurdi de* (Teza masterê ya neçapkirî). Mêrdîn, Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstituya Zimanê Zindi yên li Tirkîyeyê.

** Lêkolîner, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindi yên li Tirkîyeyê, Beşa Ziman û Çanda Kurdi, e-mail: lawij@hotmail.com

DESTPÊK

Li gor hin zanyaran Mîxaîl Baxtîn teorîsyenê edebiyatê yê herî mezin ê sedsala bîstem û yet ji bîrmendên pêşeng ên heman sedsalê ye (Todorov, 1998, r. IX; Holquist, 1981, r. XV). Her ku lêkolînên li ser Baxtîn zêde dibin, pişta vê angaşte bîhêztir dibe. Tişta ku di edebiyatê de ev navdarî ji Baxtîn re anije, xebatê wî yên derbarê romanê de ne. Her ci janrê [genre/tür] din ên edebî û ne-edebî ne, ew jî di konteksta têkiliya xwe ya ligel romanê di xebatê wî de cih girtine. Di vê çarçoveyê de Baxtîn romanê bi epîk, helbest, drama û retorîkê re dide berhev da ku yektafî û cudahiya wê nîşan bide. Herwiha bi heman armancê li ser janrê wek name, mikurhatin, axaftinê rojane, janrê gelêrî disekine bê çawa roman di binyada xwe de cih dide wan û dikare wan vegire nav xwe.

Îro ne bêsedem e ku xebatê derbarê Baxtîn de, li ser romanê gur bûne. Ji ber ku Baxtîn her li ser ci xebitîbe, bi awayekî ew têkildarî romanê kiriye. Di her xebatekê de aliyekî cuda yê romanê vekolaye û bi rîyeke cuda gihîştiye encamên manend. Dema ku mirov bi giştî lê binêre xebatê wî bi hev re, derbarê romanê de teoriyeke tekûz ava dikan. Ev yet jî giringiya wî zêde dike, ji ber ku xebatê beriya wî xwediyyê nêrîneke gişgir nebûn. Weku Baxtîn bi xwe di “From the Prehistory of Novelistic Discourse” [Ji Pêşdîroka Gotara Romanî] de diyar dike hin ji xebatê beriya wî hewl dane ku romanê bi kategoriyê helbestê binixînin, hin bi tenê li ser zimanê romanê hûr bûne, hin bi tenê di çarçoveya temayul û bizavê edebî de mane, hin jî ne wek janrekî edebî lê wek janrekî retorîk li romanê nêrîne; hinan bi hin pîvanên tematîk sînorêne wê dîyar kirine, bi iňtîmala herî baş pênaseyâ kesinan bi tenê hin cureyên romanê girtiye nava xwe (Bakhtin, 1981, r. 41-2). Her ci Baxtîn e, wî ev nêrînen han ji bo ravekirin û famkirina romanê kêm dîtine. Lewma bi dirêjiya xebatê xwe Baxtîn bi van nêzikbûnen cuda re gengeşe û guftûgoyê dike û hewl dide ku resenî û xweseriya romanê nîşan bide.

Ji bo Baxtîn roman ew janr e ku tê de curbicurî û pirqatiya dengêne takekesî û zimanê civakî heye; ziman û dengêne cuda di romanê de watayeke nû bi dest dixin û hevdu romî dikan; riwangeh û nerînen cuda yên li cîhanê, bi awayekî hunerî bi hev re dikevin diyalogê. Li gor wî roman tekane janr e ku hîna geşedana wê berdewam e, skeletê wê wek janrê din hişk nebûye; kanona wê tuneye. Baxtîn difikire ku roman di bin karîgeriya ken û pirzimaniyê de pêk hatiye û di her serdemê de di nav janrê din de roleke muxalîf gêraye.

Di vê meqaleyê de wek rîbaz me xwe ji aliyekî ve spart berhemên Baxtîn bi xwe, ji aliyekî ve jî me xwe spart xebatê ku berê di vî warî de çê bûne. Çavkaniya sereke bo vê meqaleyê, pirtûka Baxtîn a bi navê *The Dialogic Imagination* [Texeyula Diyalojîk] e ku tê de nivîsareke giring bi navê “Discourse in the Novel” [Gotar di Romanê de] heye ku bingeha çemka heteroglossia ew e, herwiha nivîsara “From the Prehistory of Novelistic Discourse” [Ji Pêşdîroka Gotara Romanî] jî li ser heteroglossiayê hûr dibe.

Ev meqale ji du besên sereke pêk tê. Em ê di beşa yekem de pêşî wek diyardeyeke civakî û dîrokî li ser heteroglossiayê bisekinin, dûre li ser bisekinin bê ka bi giştî heteroglossiâ di romanê de çawa reng vedide. Di beşa duyem de jî em ê rengvedana heteroglossiayê di romana *Saturn a Remezan Alan de* analîz bikin.

1. HETEROGLOSSIA

1.1. Heteroglossia di Civakê de

Berginda heteroglossiayê, bi rûsî *raznorecie* ye, ku wataya herf bi herf a vê zaravê cuda-axaftinî/gotinî [diffirent-speech-ness] ye. Heteroglossia awayekî têgihîştina cîhanê ye ku wê wek pêkhateyeke ji zimanê curbicur ên xwedî cîhanbîniyêن taybet dibîne.

Heteroglossia du formên giştî digire: Ya yekem, ‘zimanê civakî’ di nav zimanekî neteweyî de; û ya duyem, ‘zimanê cuda yên neteweyî di nav heman çandê de’ (Vice, 1997, r. 19). Bo nimûne li aliyeke zar û şewezar, zimanên çînan û ekolêne edebî di nav sînorêne kurdî de; li aliye din zimanê kurdî, farisî, erebî, tirkî di nav çanda îslamî de. Lê belê li vir xala giring tebeqeyîbûna zimanî ya di nav heman zimanê neteweyî de ye. Li gor Baxtîn zimanekî neteweyî li gor şewezarêne civakî, restarêne komî yên karakteristîk, jargonêne pîşeyî, zimanêne janrî, zimanêne nifşan û komêne temenî, zimanêne temayulan, zimanêne otorîteyan, zimanêne derdoran û modayêne demkî, zimanêne di xizmeta armancêne sosyopolîtik ên taybet ên rojê de, heta yên di xizmeta saetê (her rojek slogan, ferheng û cextkirina xwe heye) de tebeqeyî dibe (Bakhtin, 1981, r. 262-3).

Ev yek ji ber hindê tê ku Baxtîn zimêne wek cihê milmilaneya îdeolojî, bawerî û cîhanbîniyan dibîne. Di vê nêrînê de, her hêzek û komek dixwaze xwe di gotarê [discourse] de, di gotinê de zal bike; lewma bi wan watayan re dikevin nav pevçûn û diyalogê ku berê di gotinê de hene. Weku tê dîtin di vê perspektifê de, ziman sistemeke razber a nîşaneyan nîne, diyardeyeke zindî ya îdeolojîk e. Di vê çarçoveyê de divê mirov diyar bike ku li gor Baxtîn di ziman û gotarê de du hêz hene: hêzên navendkêş [centripetal] û hêzên navendrev [centrifugal]. Hêzên navendkêş ên di gotarê de, ji bo empozekirina idraka xwe ya monolojîk û unîter ji hêla her koma civakî ya serdest ve têne bikaranîn. Lê belê li dij vê pêvajoya navendker hêza navendrev heye- hêza heteroglossiayê- ku ramana îdeolojîk bi pey gelek dîtinêne cîhanê, tebeqeyî û parce dike (Morris, 1994, r. 15).

1.2. Heteroglossia di Romanê de

Di “Discourse in the Novel”ê [Gotar di Romanê de] de Baxtîn romanê dide ber janrêne din û bi taybetî dide ber lîrîkê. Di baweriya wî de, janrêne helbestî di bin karîgeriya hêzên unîter de bi pêş ketine û xizmeta wan kirine. Lewma heteroglossiayê di binyada xwe de nahewînin. Li gor Baxtîn helbestkar nikare şîûra xwe, mebestêne xwe li dijberî zimanê xwe dayîne, ji ber ku bi temamî di

hundirê vî zimanî de ye û lewma nikare zimên veguherîne objeyekê ku bê famkirin, li ser bê fikirîn û pêwendî pê re bê danîn. Yanî ancaq ew dikare ji hundir ve li zimên binêre. Heta ji bo ronîkirina cîhana biyanî, heger ew ziman ji bo wê cîhanê guncawtir be jî helbestkar tu carî serî li zimanekî biyanî nade. Lê belê nivîskarê pexşanê berevajî vê yekê hewl dide ku heta derbarê cîhana xwe de jî bi zimanekî biyanî bipeyive (Bakhtin, 1981, r. 287). Ji ber van mercan zimanê janrêن helbestî, ji bo bandorêن şêwezarêن civakî girtî ne; otorîter, dogmatîk û mûhefezekar in. Helbestkar curbicuriya zimên û heteroglossiayê di xebata xwe de nade der, gotina wî bi tenê aîdî wî ye, lewma gotinê ji mebest û armancêن kesêن din diço. Berevajî vê yekê romannûs heteroglossiayê û curbicuriya zimanî ya edebî û ne-edebî lawaz nake, wê keremî nav berhema xwe dike (Bakhtin, 1981, r. 296-8).

Ji ber van sedeman Baxtîn şêwaznasiya ku di bin karîgeriya janrên helbestî de bi pêş ketiye, ji bo vekolîna romanê kêm dibîne. "Zimanê helbestî", "takekesiya zimên", "hêma", "sembol", "şêwaza epîk" û kategoriyyen giştî yên din ku ji hêla vê şêwaznasiyê ve hatine bipêşxistin û tetbiqkirin herwiha temamê rêze-amûrêن şenber ên şêwazî yên di çarçoveya van kategoriyan de, bi heman awayî berê wan li janrên yek-ziman û yek-şêwaz e, bi wataya teng a gotinê berê wan li janrên helbestî ye (Bakhtin, 1981, r. 266). Lewma ev hemû kategorî û têgihîştina felsefi ya gotara helbestî ku ew xwe dispêrinê, zêde teng û mehdûd e û nikare pexşana hunerî ya gotara romanî di xwe de bihewîne. Lê her ci roman e, ew di şêwazê de pirform û di axaftin û deng de curbicur e. Di wê de vekoler pêrgî gelek yekeyên şêwazî yên heterojen tê ku bi piranî di astêن cuda yên zimanî de bi cih dibin û girêdayî kontrolêن şêwazî yên cuda ne. Yekeyên kompozisyonel-şêwazî yên sereke ku roman pê dabeş dibin, ev in:

- (I) Vegêrana edebî-hunerî ya yekser nivîskarî [authorial] (bi hemû varyantên xwe);
- (II) Şêwazîkirina [stylization] formên curbicur ên vegêrana devkî ya rojane (*skaz*);
- (III) Şêwazîkirina formên cuda yên vegêrana rojane ya nîv-edebî (name, rojnivîsk hwd.);
- (IV) Formên curbicur ên edebî, lê ne-hunerî yên axaftina nivîskarî (exlaqî, felsefi, beyanêن zanistî, xîtabet, şayeseyên etnografîk, belgename hwd.);
- (V) Axaftinêن karakteran ên ji hêla şêwazê ve takekeskirî. (Bakhtin, 1981, r. 261)

Li gor Baxtîn yektatiya romanê ji besdarkirina van hêmanan tê ku evêن han qismen serbixwe ne, lê di sîstema romanê de girêdayî binyadeke bilindir in. "Şêwaza romanekê kombînasyona şêwazên wê û zimanê romanekê sîstema "zimanê" wê ye" (Bakhtin, 1981, r. 262). Berevajî yekzimaniya helbestê,

pirzimaniyek li dar e di romanê de. “Zimanê romanê sîstemeke zimanan e ku bi beramberî û bi îdeolojîkî hevdu ges dikin. Ne gengaz e ku wek zimanekî tak ê unîter bê pênasekirin û analîzkirin” (Bakhtin, 1981, r. 47). Zîra roman tebeqeyîbûna civakî ji binyada xwe veder nake, berevajî vê yekê xwe li ser vê tebeqeyîbûnê saz dike. “Ev tebeqeyîbûna ku di her zimanî de di her qonaxa wî ya dîrokî de peyda dibe, wek janrekî ji bo romanê pêşmercê zarûrî ye” (Bakhtin, 1981, r. 263). Roman bi rêya vê tebeqeyîbûnê tevahiya cîhana mijar û ramanen tê de şayesandî û derbirandî orkestra dike.

Helbet ev tebeqeyîbûna zimanî, ev zimanen heteroglossiayê nabe ku rasterast têkevin romanê, ew ancaq wek îmajen zimên tê de cih bigirin. Zîra li gor Baxtin “ji bo şewaznasiya romanê pirsgirêka sereke nimandina zimên e bi awayekî hunerî, pirsgirêka nimandina îmaja zimanekî ye” (Bakhtin, 1981, r. 336). Di avakirina hunerî ya zimanekî de hebûna du şîrûn zimanî şertê bingehîn e. Divê du şîrûn zimanî hebin: Yek tê nimandin û ya din dinimîne ku her yek aîdî pergaleke cuda ya zimên e. Bi rastî heger şîûreke duyem a nimînende tunebe, hingê tişta ku derdikeve holê, wê ne *îmajeke* zimên be, bi tenê *mestereyeke* [sample] zimanê kesekî din be, ci resen be ci çêkirî be. Dengê duyem ê nimînende cudahiya navbera *îmajeke* zimên û mestereyekê çê dike (Vice, 1997, r. 21).

Hemû amrazên ku di romanê de îmaja zimanekî diafirînin, di sê kategoriyen sereke de kom dibin: durehîkirin, danûstendina diyalojîk a zimanan û diyalogên saf (Morris, 1994, r. 113). Baxtin diyar dike ku ev her sê kategorî ancaq di teoriyê de ji hev cuda bibin û di rastiyê de her tim di cawê hunerî de bi hev re tê hûnandin. Durehîkirin, cola [mixture] du zimanen civakî ye di nav sînorêne yek peyvekê [utterance] de; pêrgîhevbûna du şîrûn zimanî ye di qada peyvekê de ku ev her du şîr ji hêla serdem, cihêrengiya civakî an hokareke din ve ji hev cudabûyi ne. Durehiya romanî sistemeke bi awayekî hunerî orgnîzekirî ye ku zimanen cuda bi hev re dixe kontaktê, sîstemek e ku armanca wê ronîkirina zimanekî bi zimanekî din e, çêkirina îmaja zindî ya zimanekî din e (Bakhtin, 1981, r. 361). Formen herî giring ku dikevin çarçoveya kategoriya duyem, şewazîkirin û parodî ye. Şewazîkirin nimandina hunerî ya şewaza zimanî ya kesekî din e, îmajeke hunerî ya zimanê kesekî din. Divê tê de du şîrûn zimanî yê takanebûyi hebin: Yek ku *dinimîne* (yanî şîûra zimanî ya nimînende) û ya din ku tê *nimandin*, ku tê şewazîkirin (Bakhtin, 1981, r. 362). Gava ku mebesten gotara nimînende li dij mebesten gotara nimandî be, hingê tişta ku pêk tê *şewazîkirina parodîk* e (Bakhtin, 1981, r. 364). Zimanen saf di romanê de, di diyalog û monologen karakteren romanê de, heman peywira afirandina îmajen zimên bi cih tînin. Di vê xalê de Baxtin giringiya rêzebûyerê [plot] cext dike. Li gor wî divê rêzebûyerâ romanî ziman û îdeolojîyen civakî birexsîne û wan marûzî hev bike. Yanî rêzebûyerâ romanê xizmeta nimandina kesen peyivende [speaking persons] û cîhanen wan en îdeolojîk dike (Bakhtin, 1981, r. 365).

Baxfîn diyar dike ku heteroglossia bi rêya axaftina nivîskarî, axaftinê vegêran, axaftinê karakteran û janrên lêzêdekirî dikevin nav romanê. Her yek ji van yekeyan rê li ber pirqatiya dengê civakî û pêwendî û hevtêkildariya wan a berfireh vedike (Bakhtin, 1981, r. 263).

2. HETEROGLOSSIA DI SATURNÊ DE

Saturn bi vegêrana cinekî bi navê Ibn Pitat dest pê dike ku ev cin metnekê dînivîse û tê de xîtabî mirovan dike û derbarê ramanê wan ên li ser cinan itirazên xwe didirkîne. Ji ber vê yekê hîn di hevoka yekem de rengekî diyalojîk li *Saturnê* daye der. Mîrcin yekî dişîne pey Pitat da ku biçe civata wî xweş bike. Li vê civatê li ser daxwaza Mîrcin textê keçeye xweşik tê veguhastin bo odeya xortekî çeleng. Li vir êdî em dîbin şahidê çîroka van her duyan. Di beşa dawî ya romanê de em hîn dîbin ku ev metneke nivîskarekî ye û wek senaryoyekê hatiye guhertin û li filmekî hatiye guncandin. Lewma em dikarin bibêjin ku sê tebeqeyen sereke yên çîroka *Saturnê* hene: Çîroka cinan, çîroka ku îlhama xwe ji Memê Alan girtiye û çîroka nivîskarê ku metna wî li sînemayê hatiye adaptekirin. Ji beşa yekem çîroka cinan dest pê dike. Dema ku li ser daxwaza Mîrcin, cin textê Xewbanûyê dîbin jûra Bengîn çîroka ku îlhama xwe ji Memê Alan wergirtiye dest pê dike. Di beşa dawî de jî dema tê fêrbûn ku esasen ev filmek e û ji ber romana nivîskarekî hatiye adaptekirin, çîroka wî nivîskarî lê zêde dibe.

2.1. Janrên Lêzêdekirî di *Saturnê* de

Yek ji rîyê tebeqeyîkirina zimanê romanê beşdarkirina janrên curbicur in. “Zimanê edebî bi xwe jî bi tenê yek ji van zimanê heteroglot e û ew jî di nav xwe de tebeqeyî dibe (li gor janr û serdemê û hwd.)” (Bakhtin, 1981, r. 272). Janrên edebî li gor têgihîştina cîhanê, li gor serdem, ziman, şêwaz û ferhengê ji hev cuda dîbin. Roman xwedî wê kapasîteyê ye ku van janran di binyada xwe de vehewîne. Ev janrên ku di romanê de têb bicihkîrin, pişti ku dikevin romanê, bêyî ku karakteristîkên xwe yên xweser winda bikin, ligel şêwaz û zimanê xwe dikevin binyada heteroglot a romanê. Ligel zimanê ku berê di romanê de hene, xaleke nû ya temasê diafirînin û tevkariyeke mezin li dewlemendkirina heteroglossiaya zimanî dîkin (Madran, 2012, r. 153).

Ji ber ku bi rîya têkiliyê navmetnî di vî warî de dewlemendîyeke berçav heye di romanê de, serê pêşî divê mirov ji vê hêlê ve li *Saturnê* binêre. Roman ji sê beşen sereke pêk hatiye: Girîzgah, agaz-i qise, xatîme. Weku tê zanîn ev beşen han, beşen sereke yên mesnewiyê ne ku mesnewî yek ji formen herî giring ên edebiyata klasîk a Şerqê ye. Lewma hîn di serî de rengê janrekî cuda li nav romanê ketiye. Di girîzgahê de beyteke *Mem û Zîna Ehmedê Xanî* (Da bêñ û bikin hikayetê gûş/ Hindek bikirin xwe pê feramûş), di agaz-i qiseyê de beyteke *Husn û Eşqa Şêx Xalib* (Li ciyeki bûn du calis/Kete eyne aks û akîs), di xatîmeyê de jî beyteke *Mantiqut-Teyra Ferîdeddin Attar* (Ew, qetreyek bû ji

bebra mecazê/Dîsa dagerya wê behra rastiyê) heye. Ev her sê jêgirtinê ji sê mesnewiyêñ mezin ên edebiyata klasik, zimanê romanê tebeqeyî kiriye. Hem wek teşe forma xwe daye romanê, hem zimanê xwe yê kevn aniye nav romanê û hem jî ew nêrîna xwe ya tesewifi ya li cîhanê nimandine. Vê yekê wataya deqê berfireh kiriye, zimanê wê heteroglottir kiriye. Herwiha her beyteke serê beşekê bi naveroka wê re jî eleqedar e. Binenavê beşa girîzgahê “çiroka çîrokê” ye, binenavê beşa agaz-i qiseyê tuneye, binenavê beşa xatîmeyê “rastiya çîrokê” ye.

Di beşa yekem de mîrê cinan Mîrcin aciz e û bang li geştgîn Ibn Pitat dike da ku ew û hinek cinêñ din jê re çîrokan bibêjin. Ev beş weku naverok bi girîzgaha mesnewiyan re pêwendîdar e; ji ber ku weku tê zanîn di girîzgahê de ligel binbeşen wek tewhîd û munacatê, şair bi piranî diyar dîkin ku bi işareteke manewî an jî li ser daxwaza dostekî semîmî mesnewiya xwe nivîsîne. Di romanê de jî em dibînin ku fermaña Mîrcin amaje bi vê daxwaza ji hêla kesekî din ve dike. Herwiha beyta “Da bêñ û bikin hikayetê gûş/ Hindek bikirin xwe pê feramûş”, daxwaza Mîrcin a ku xwe bi çîrokan biawiqîne rave dike. Herçi beşa agaz-i qise ye, binenavekî wê tunebe jî çîroka esil di wê de derbas dibe. Weku beyta “Li ciyeki bûn du calis/Kete eynê aks û akîs” jî amajeyê pê dike, li ser daxwaza Mîrcin xizmetkarêñ wî, textê Xewbanû dîbin li odeya Bengîn datînin, “eyneya xeybê” êdî dikeve dewrê û beşa herî dirêj a romanê dest pê dike. Manendî vê yekê di mesnewiyan de jî mijara sereke di vê beşê de tê dayîn. Di xatîmeyê de jî weku beyta “Ew, qetreyek bû ji behra mecazê/Dîsa dagerya wê behra rastiyê” jî amajeyê pê dike, nivîskarek xwîneran agahdar dike ku ev romana wî ye û bûye senaryoya filmekî û ew film hatiye çêkirin. Di vê beşê de aliyê bançîroksaz [metafiction/üstkurmaca] ê romanê derketiye holê. Nivîskar aciz e ku metna wî ketiye vî halî û aciziya xwe didirkîne. Hevterîbê vê yekê di mesnewiyan de jî carinan şair di vê beşê de derbarê berhema xwe de hin agahiyan dide û nirxandinan dike.

Di warê tebeqeyîkirina zimanê romanê de di asta janran de, hêmana herî giring destana *Memê Alan* e (Lescot, 1996). Beşa sereke ya romanê destana *Memê Alan* wek binmetnekê [subtext/alt metin] wergirtiye û li ser wê hatiye avakirin. Ev yek ji gelek amajeyêñ romanê diyar e ku em ê bi tenê çend hebêñ sereke bihejmîrin da ku asta navmetnîtiyê bibînin. Bo nimûne di *Memê Alan* de Xocê Xizir xwe nîşanî Mîr Eliyê kordûnde dide û wî tembîh dike ku keça mîrê Qureşîyan ji xwe re bîne da ku dola wan bidome û Mem ji vê zewacê diwelide. Di *Saturnê* de jî kalek tê xewna Mîr Kalanê kordûnde û tembîhê lê dike ku Zelîxaya kor û şeht bîne da ku bibe xwedî kurekî û Bengîn ji vê zewacê diwelide. Di *Memê Alan* de textê Zînê bi destê sê xwişkên perî yên bi navê Stêrbanû, Tavbanû û Heyvbanû tê guhastin bo odeya Mem, û Zîn bawer dike ku Mem hatiye odaya wê lewma pê re hêrs dibe û jê dixwaze derkeve ji odaya wê; lê dûre rastî tê famkirin û her du ciwan ji hev hez dîkin, wek delîla rastiya wê şevê jî gustîlêñ xwe bi hev diguherin. Di *Saturnê* de textê Xewbanû (ku navê wê jî amaje bi navê her sê xwişkên perî dike), bi destê cinan tê veguhastin bo odaya

Bengîn û dîsa di wê de jî Xewbanû bawer dike ku Bengîn hatiye odeya wê, pê re hêrs dibe û piştî ku mesele tê famkirin, her du ciwan ji hev hez dikin û wek delîla rastiya wê şevê gustîlan pev diguherin. Di *Memê Alan* de ji ber ku Stêrbanû dixwaze du ciwanên herî xweşik li nik hev bibîne, textê Zînê vediguhêzin û di *Saturnê* de jî ji ber ku Mîrcin dixwaze du seriyên layîqî hev xweşik li nik hev bibîne, textê Xewbanûyê tê veguhastin. Di van danberhevan de xuya dibe ku di her duyan de jî hêzên dersiruştî karîger in. Dîsa, navê hespê her du lehengan jî Boz e û wek hespên avê derbas dîbin ku bi torê hatine girtin û ji manendên xwe gelekî cuda û xurttir in. Her du lehengên mîr jî ji ber eşqa yên jin, sewdaser dîbin û tevî hemû bergerîn û lavayan jî bi merema ku bigihîjin evîndarêن xwe, ji bajarê xwe vediqetin û li temamê bajêr ji bo wan şîn tê girêdan.

Herçend gewdeya *Saturnê* li ser *Memê Alan* hatîbe avakirin jî li cihê ku *Memê Alan* ges dibe, *Saturn* diqedede. "Roman, çend rojên berî çûna Memê Alan ji xwe re kiriye mijar lê wek ku tê zanîn dînamîk û pevcûnên wê çûnê di tu derên destanê de nînin" (Alan, 2013, r. 145). Alan, destaneke devkî wergirtiye û ji hêla dem, cih, leheng, rêzebûyerê ve ew di konteksteke nû de ji nû ve hilberandiye. Gava ku ji nû ve hilberandiye jî hin taybetiyêna naîf û yekdeng ên wê cîhana epîk derizandiye. Bo nimûne di destanê de di şeva hevdîtina Mem û Zînê de tiştek naqewime ku cinsiyet an şehwetê bîne bîra mirov, her du ciwan li wê cîhana naîf wê şevê bi temamî wek xwişk û bira radikevin. Lê di romanê de gava ku her du ciwan di şibakê re li stêrkan temaşe dikin bedena wan digihîje hev, Bengîn vê yekê wisa derdibire: "Ez çi bêjim! Dinya li min tarî bû, serî li min gêj bû. Bêhna bedena di şevkiras de ku bûbûn xet, kelek bi ser min de rêt; tevzinokan bi min ve hilkişand" (Alan, 2002, r. 37). Herwiha di vê cîhana epîk de bi tenê lehengên sereke û evîna wan giring e, tu qederên din ên takekesî nakeve bergeha wê; lê belê di *Saturnê* de ji meyter bigire, heta Bextresaya li kerxaneyê, heta dersdar, şêwirdar, remildar û heta Bozê hespê Bengîn, her takekesek bi axaftina xwe besdarî romanê dibe û jargon û ferhenga cîhana xwe bi xwe re tîne. Bi vî awayî destana *Memê Alan* di konteksteke nû de tevkârî li heteroglossiaya romanê kiriye, rê li ber têkiliyeke navmetnî vekiriye û hem ji hêla zimên hem ji hêla watayê ve roman tebeqeyî kiriye. Ji ber ku li vir *Memê Alan* bi helwesteke tinazpêkerane, hilweşînerane an rexnekirane nehatîye bikaranîn, bi wataya Baxtînyen em nikarin vê karanînê wek parodîk biwesifinin. Lê dîsa jî bi cextkirin û hûrgiliyêna cuda rengekî parodîk lê daye der. Axîrî "parodî ew e ku metnek bi armanceke nû bê bikaranîn, watayeke nû lê bê barkirin" (Aktulum, 1999, r. 117).

Amajepêkirin û bicîhkirina janrên cuda di *Saturnê* de bi vî çendî namîne. Em dibînin ku di *Saturnê* de metnên ne-edebî, çîrok, stran, retorîk, şêwazîkirina parodîk a zimanê romantîk û sehneyê dramatîk jî hene.

Di destpêka romanê de metnek li nav vegêranê ketiye. Pêşgotinek e ev metn, ku Ibn Pittat wê dînivîse. Ne diyar e bê pêşgotina çi ye, lê belê gava ku

peyasivikekî Mîrcin tê li derî dixe û jê re eyan dike ku Mîrcin li benda wî ye, pêşgotin nîvco dimîne. Ev pêşgotina han nimûneyeke skazê ye. Zimanê heteroglot bi rêya skazê jî dikevin romanê (Bakhtin, 1981, r. 335). Skaz ji bo vegérana kesê yekem ê yekjimar tê bikaranîn ku ji taybetiyên zimanê nivîskî bêtir xwedî taybetiyên zimanê devkî ye û berê wê li axaftina kesekî din e. Em dibînin ku di vê pêşgotinê de berê gotinên Pitat jî li xwînerekî xeyalî ye, bersiv û bertekê muhtemel ên wî xwînerî tê texmînkirin û li gor wê monologeke diyalojîk tê sazkirin:

EZ efîde im. Cin im yanê. We xelet nebihîst, na. Cin im ez. Ji min re dibêñ Gerrok Ibn Pitat. Yanê gerrokê kurrê Pitat. Ew ê xeberxweş! Geştgîn im ez. Guhdêr û çavdêrek, an guhkun û dîdevanek! Çima guhbelî li we ket? Ci bû? Hûn çîma şas bûn? We ji ber ci birûyan bi ser şîkbîriyê de xwar kir? (Alan, 2002, r. 11)

Li ser banga Mîrcin, Pitat diçe eywana seraya wî. Li wê derê Mîrcin ji wî û hinek cinêñ din dixwaze ku jê re çîrokan bibêjin: "...ezîzan bo çîrokekê, serpêhatiyekê dilê min têra xwe daxwazkar e!" (r. 15) Axaftinêñ li eywanê di navbera Mîrcin û cinêñ din de sehneyeke dramatîk e. Her cinek mîna lehengê dramayekê bi dorê dipeyive û hewl dide ji yê din xweştir bibêje û teqdîra civatê û Mîrcin wergire. Li vê derê çend çîrok li nav vegérana dikevin. Di van çîrokan de em dibînin şewaza çîrçîrokêñ gelêri tê teqlîdkirin, anku bi terma Baxtîn, çîrçîrok tê şewazîkirin [stylization/üsluplaştırma]. Di şewazîkirinê de, şewaza berê heyî ya janrekî bi mebesteke din tê teqlîdkirin (Bahtin, 2004, r. 262). Bo nimûne bi awayekî eşkere şewazîkirina çîrçîrokan di vê vegérana jêre de xuya ye:

Dibêjin, Mîrê Mîran, piştî ewqas bazgûr û diayan, lawekî da mîre Amedarê. Mîrê heftê û heft salî, hezar hemd û spas jê re anî û lawê xwe bi şîrê teyran xwedî kir. Kur, ji çavêñ nezerî bi dûr, roj bi roj zêde kir û hate bejna spîndarekê... (Alan, 2002, r. 17)

Gava ku ev cinêñ han çîrokêñ xwe vedibêjin, ji bo ku karîgeriya xwe zêde bikin, serî li retorîkê jî didin ku weku me behs kir retorîk yek ji wan janran e ku zimanê romanê heteroglot dike. Heger em li qismekî axaftina Pitat binêrin ev yek bi zelalî xuya dibe:

... Lîbelê bawer bikin ne ins û ne jî cin, ji tiştekî vê dinya fanî têr nabin tu car. Ci ye ew tişt hûn dizanî? .. Sekinîm bêhnekê, bo ku bandora gotina xwe li ser her kesî belav bikim. Gava min dît çavêñ Mîrcin, hevalêñ min û yên civatê bi merek zîqê min bûne, min domand. Ew tişte ku mirov jê têr nabe Bedewî ye, Spehîti ye ezzulam!.. (r. 17)

Dîsa wek janrekî edebî, şewaza stranî jî di romanê de cih girtiye. Stran wek şewazîkirina parodîk a axaftina nimandî ya Gurgîn dikeve nav romanê. Gurgîn çûye cem jina bi navê Bextreşa ku li mala (kerxaneya) Xatûnê dixebite. Bextreşa

dil ketiye Gurgîn, lê ev yek ne di xema wî de ye. Bextreşa bi awayekî dilbijokane dipirse bê bi rastî jî Bengîn dil berdaye jinekê û ji derdê wê bi şev û roj dilorîne, ji ber ku li gor gotegotan wisa ye. Li ser vê pirsê Gurgîn bi awayekî tinazpêkerane ji ber xwe ve stranekê çêdike, weku xwedêgiravî Bengîn bi şev û roj dilorîne: “Şevê dibêm Xewbanûyê/ Rojê dibêm Xewbanûyê/ Lêv tenikê, dêm guliyê/ Qajgûstîla nav li serê/ Ji min dûrê, ji min dûrê.” (r. 121-2)

Herwiha di romanê de zimanê edebî yê romantik jî gelekî hatiye şewazîkirin. Bi vî awayî jî bi mebesteke cuda ew ziman hatiye vehilberandin, wî zimanî nêrîn û sentaksa xwe bi xwe re anije û ew jî besdarî heteroglossiaya romanê bûye. Em nimûneyeke vê yekê bidin, em dibînin ku şayeseyeke siruştê, bi şewazeke romantik hatiye kirin:

...Sibeh e û sirra wê, perên bîşengên li dora şadirvanek
kevirreş şeh dike. Bi kesk û sor û zer û spî û xumriyên xwe
dibeşîse baxçe. Çükên sêncâ ji darekê difirin yeka din, ji wir
jî carna xwe berdidin ser şilekiyên wê derdorê. Qijeqîja
meqesokênu di dor sûran de fetlêni nişkav didin xwe ye...
(r. 125)

Di mijara janrê lêzêdekirî de xaleke din ku em ê behs bikin, pêkenok [fikra] e. Pêkenokê jî wek janrekî lêzêdekirî cihê xwe girtiye di romanê de. Carekê gava ku Eyna Xeybê di nav bîranînê Gurgîn de rîwîtiyê dike, em dibînin ku li hember şeniyê qesra mîrekiyê, qirdikek pêkenokekê dibêje. Vê yekê nêrîn û zimanê pêkenokê anije romanê û careke din ew tebeqeyî kiriye. Ev yek ji aliyekî din jî giring e, ji ber ku li gor Baxtîn figurên qirdik, ehmeq û serserî ji bo pêşketina romanê roleke giring gérane (Bakhtin, 1981, r. 158). Ji ber ku ev her sê figur ji ciddiyet û maqûliyetê dûr in, di vî warî de xweş hatine dîtin, bûne sebeba ken û vê yekê jî rê li ber tinazpêkirin û parodîzekirinê vekiriye.

Şewazîkirina cureyên axaftin û nivîsinê bi vî çendî namîne di romanê de. Bo nimûne gava ku Bengîn xwe ji koma siwariyên ligel xwe, vedidize û berê Boz dide tariya şevê û winda dibe, çîroka Bengîn û Xewbanû diqedê anku Eyna Xeybê tê sekinandin, ji ber ku xewa Mîrcin hatiye û wê rakeve. Li vir Mîrcin bi vegérana Pitat, bi gotareke wisa dipeyive ku wek a bêjerekî bernameyeke televîzyonê ye. Em li vir dibînin ku ev gotara wereng hatiye şewazîkirin û ew jî bi jargon û sentaksa xwe besdarî heteroglossiaya romanê dibe:

"Ezîzan! Eve we dît! Pariyek bi derengî jî be, lehengê me ji
bo çîroka ku me li benda xwe tenê hişt û qırşen pêsiya
îdiaya me jî da aliyekî. Lê mixabin dê wext têra me neke...
Em ê encax şeveke din bikaribin hîn bibin ka bedewî
nexweşî," awirêñ wî ketin ser min, "an xweşî," û ew awir
çûn ser Helat, "çi tîne serê insanan!.. Em ê encax şeveke din
hîn bibin vana!.." (r. 147)

Weku tê dîtin *Saturn* ji hêla janrên lêzêdekirî dewlemend e. Janrên edebî û yên ne-edebî yên wek binyada dramatîk, mesnewî, çîrçîrok, retorîk, stran, pêkenok, şêwazîkirina zimanê romantîk, pêşgotin û şêwazîkirina zimanê bêjerî, bi awayekî li nav romanê ketine, her yekê zimanê xwe û nêrîna xwe ya li cîhanê bi xwe re anije; wan bi vî awayî pirqatiyek çekiriye di romanê de û heteroglossiaya wê dewlemend kiriye. Ji ber ku ev janrên han bi piranî ji devên kesen peyivende hatine dirkandin ji mesterebûnê rizgar bûne û bûne îmajên zimên. Weku Baxtîn diyar kiriye bo ku “zimanek bibe îmajeke hunerî divê bibe axaftineke ji nav lêvên peyivende, divê bi îmaja kesekî peyivende re bê bestandin” (Bakhtin, 1981, r. 336). Herwiha ev îmajên zimên bi rêya amrazên [device] wek şêwazîkirin, parodî û skazê hatine afirandin ku “ev fenomenên han du-deng û du-zimanî ne” (r. 337). Ev janr hemû gava ku dikevin romanê, zimanê xwe bi xwe re tînin û ji ber vê yekê yekparetiya zimanî ya romanê tebeqeyî dikan û curbicuriya axaftinê bi awayên teze xurt dikan. Piştî janran rêya din a besdarkirina heteroglossiayê di Saturnê de, axaftinê vegêr û lehengan in.

2.2. Axaftinê Vegêr û Lehengan di Saturnê de

Yek ji rêyên besdarkirina heteroglossiayê di romanê de bikaranîna vegêrên cuda ye. Her vegerek bi zimanê xwe û dîtina xwe ya cihanê besdarî romanê dibe û bi vî awayî heteroglossiayê tîne nav romanê û zimanê romanê tebeqeyî dike. Gava ku vê yekê dike jî du-dengiyekê pêk tîne, li aliyekî dengê vegêr û li aliyê din jî dengê nivîskêr ê ku di wî de veşikandî heye.

Di *Saturn*ê de ji hêla vegêran ve jî dewlemendiyeke berbiçav heye. Esasen sê vegêrên sereke hene: Di beşa de yekem Pitat, di beşa duyem de Eyna Xeybê û di beşa sêyem de “nivîskarê poşman ê ku metna wî (*Keywan*) ji eslê wê dûr xistine, niha di dilqê senaryoyekê de jê filmek (*Saturn*) dikişînin” (Alan, 2013, r. 145). Lê belê di beşa duyem a bingehîn de ji ber taybetiya Eyna Xeybê hejmara vegêran zêde dibe. Eyna Xeybê hem di mekan û zemanan de digere û wek vegêrê kesê sêyem anku wek kamerayekê ji bîranînen lehengan sehneyên cuda vediguheze û hem jî dadikeve hişê wan, axaftinê wan ên hundirîn vediguheze. Lewma pirvegêriyekê pêk tîne ku dihêle her lehengek ligel ziman û cîhana xwe besdarî romanê bibe.

Piştî ku bi fermana Mîrcin du heb cin textê Xewbanûyê dibin odaya Bengîn, êdî Eyna Xeybê dikeve dewrê; lê belê li cihê ku ew di dewrê de ye jî Pitat wek vegêr mudaxele dike carinan. Gava ku bi vî şîklî daxîlî vagêranê dibe, axaftina wî bi nivîsa îtalîk û di kevanekan de tê dayîn ku şiroveyên xwe û yên Mîrcin û reftarên civata cinan li hember bûyeran vediguheze. Bo nimûne gava ku Bengîn ji ber şâşwaziya dîtina textê keçekê li odaya xwe, xwe diqurince axaftina Pitat bi vî awayî li nav vegêranê dikeve: (*Xwezî wisa nekira, ji ber ku pirqîn bi Mîrcin û eywanê ket.*) (r. 30) Bi vî awayî vegêrana du vegêran hevdu vedişikîne¹ û

¹ Veşikandin: Refract/ Kirip yansıtmak

tebeqebûnekê pêk tîne. Herwiha mirov dikare beşa duyem anku çîroka Bengîn û Xewbanûyê, wek çîrokeke di hundirê çîroka Pitat de bixwîne. Bi heman nêrîmê gava ku xwîner digihîje beşa sêyem û hîn dibe ku tiştên heta wê besê filmek e, dîsa beşa yekem û duyem dibin wek çîrokêni di hundirê beşa sêyem de. Ji vê hêlê de her beşek di hundirê beşike din de tê veşikandin, vegêrana her vegêrekî di vegêrana yekî din de tê veşikandin û pirtebeqeyiyek pêk tê. Pitat, Mîrcin û kesen li civata cinan, li ser çîroka Bengîn û Xewbanûyê, nivîskarê di beşa dawî de jî li ser temamê qismê çîrokê yê heta wê beşê, şiroveyan dikin û wê dinirxînin. Her yek ji wan li gor riwangeh û cîhanbîniya xwe vê yekê dike û tevkariyê li heteroglossiaya romanê dike.

Heger em ji hêla axaftin û diyalogên karakteran binêrin, herweku me got Eyna Xeybê carinan lehengekî dike vegêrê beşekê û diyalogên di navbera wî û lehengê din de bi vegêrana wî vediguhêze û herwiha dadikeve şîura lehengan û axaftinêwan ên hundirîn bi devê wan wek vegêrê kesê yekem vediguhêze. Bi vî awayî jî her lehengek derfetê dibîne ku bi ziman, gotar û dîtina xwe daxilî romanê bibe. Lewma ziman ji hêla pîşe, temen û devokan tebeqeyî dibe.

Herweku tê zanîn li her civakekê zimanê pîseyan hene. Her pîşe xwedî jargonekê ye ku li gor rîbaza wê ya çemkandin û hilsengandinê pêk hatiye. Di *Saturnê* de zimanê pîseyî bi serdema xwe ya Batlamyusî ve hatiye nimandin û tebeqeyîbûna pîseyî jî li gor vê yekê xuya dibe. Zimanê xwedîkirin û kedîkirina hespan, yê şervaniyê, yê stêrnasiyê, hekîmiyê û hwd. cihê xwe girtine di romanê de. Bo nimûne gava ku Mîr Kalan diçe bal remildar da ku tiştêkî ji aqûbata kurê sewsîbûyî fam bike, remildar bi jargona astrolojiyê jê re rewşê wiha rave dike:

...Va ji van çerxan Beran, Şêr û Kevan birc-î agirî; Kevjal, û Dûpişk û Masî birc-î âbî; Ga,Karik û Bîşî birc-î arzî; Cêwik, Mêzîn û Dewlik jî birc-î bâdî ne... Ezbenî! Mîrzayê me yê ferîşte-sifat, va di vê çerxê de, di ya Dewlikê de, hatiye dinê.
(r. 82)

Dîsa gava ku Eyna Xeybê axaftina hundirîn a remildar vediguhêze û remildar di dilê xwe de difikire ku heger Mîr Kalan ji bo nexweşıya xwe bixwesta dikarî ji wî re jî derman amade bikira, em dibînin ku jargona hekîmiyê an dermankariyê hatiye bikaranîn:

Dê ji serê pelçimên mirwara reş lepek di avê de bê kelandin û dû re dê ew av, bi sibe û êvaran were vexwarin û dû re, esas dû re, pişti destava yekemîn 4 lib ud-î hindî bi 4 fincan avê re dê bê kelandin û gava ji wê bi qasî 2 fincan ma, dê bê vexwarin. Zîra encax pişti vê yekê teaffûna hundir paqij bibe, rovî vedibin. (r. 90-1)

Her ziman li gor temenan jî tebeqeyî dibe. Di her temenî de li gor şertên demê û geşedana şexsî zimanekî mirov çêdibe. Zimanê zarokek, ciwanek û extiyarekî ji hev cuda dibin. Zimanê her yekî li gor tecrûbe, sal û baweriyê wî toneke cuda werdigire. Roman xwedî wê şıyanê ye ku vê tebeqeyîbûnê jî di binyada xwe de

vehewîne. Di *Saturnê* de bi taybetî di têkiliya bav û law anku Mîr Kalan û Bengîn de ev cuda-zimanî tê dîtin. Li gor temenê wî gotina bavekî ku di jiyanê de gihîştiye qonaxekê ku êdî ji macera û meraqê dûr e û bi tenê li berdewamiya mîrekiya xwe û dola xwe difikire û bi semt tevdigere, Mîr Kalan wisa dibêje:

EZ dibêm ka bisekine ronahiya çavê min, ka em hinek lê
bipirsin, bikolin, gotinê te bêtir li çirokan têñ, ev xewn e,
rastî ye, dek e, dolav e, çi ye, ka bisekine ez binya wî bînim,
qey min navê tu bigîhî mirazê xwe û pişta mîrektiya me ya
em li bendê zeximtir bikî, li dû vî temeni, ji bo bavekî tiştê
herî xwes dîtina miraz e; qey eve çend meh e çîma di nava
gotinê de carna qala xweşîya ezêbiye dikim, lê ka bisekine,
belkî fenekî neyaran be. (r. 47)

Bengîn jî li gor temenê xwe yê sengele, maceraperest, heweskar û meraqdar e, lewma dibêje:

“Tu çîma nabînî ez qurban yekî din ketiye qalibê min û
lewma mîna pirpirokekî her serxwêş im, vê gûstîlê ez bêhiş
kirime û rastiya wê ji min re bûye meraqke mezin ê xwedê
dizane bûye qeder jî.” (r. 47-8)

Ji bili van, di romanê de nimandina zimanê desthilatdar jî heye. Mîrcin û Mîr Kalan nûneriya vê yekê dikan. Lê belê ev yek di tona Mîrcin de beloqtir e. Mîrcin hem bi fermanêñ ku dide derdorê û hem bi tona xwe ya tinazpêkerane û biçûkbînane vî zimanî dinimîne.

Di *Saturnê* de awayekî din ê besdarkirina heteroglossiayê, devokên karakteran in. Karakterêñ ji tebeqe û herêmên cuda ligel xwe devoka xwe jî tînin nav romanê û curbicuriyeke zimanî pêk tînin. Li vir em ê li ser çend nimûneyên sereke bisekinin û bibînin bê çawa van devokên cuda di heteroglotkirina zimanê romanê de rol gêraye. Gava ku Xewbanû bi xwe dihise, xwe li odeya Bengîn dibîne; lê belê ew wisa bawer dike ku ev der odeya wê ye û Bengîn bi awayekî hatiye ketiye odeya wê, lewma bi devoka xwe, ya ku şêwazikirina zimanê *Memê Alan* e, dibêje: “Qey tu ne bawer iji çavan e? Kê dera min dimîne cin û periyan e? Bêje çi işe te heye li van deran e? Ger bibihîse kekê min Mîr Cezîrin e, wê serê te bavêje ber devê şûran e!” Bengîn ji ber vê yekê aciz dibe û bi qestî devoka wê teqlîd dike û bi vî awayî lê vedigerîne: “Ew kî ye? Mîrê we fenbaz û parsekan e?” (r. 32) Pişti kurtedemekê mesele tê famkirin û tê pejirandin ku karekî awarte di meseleyê de heye. Bengîn û Xewbanû li gor mantiqa cîhana destanî ya *Memê Alan* biryar didin ku wê şevê wek xwişk û bira rakevin û sibeha wê jî bibin bûk û zava. Ji bo ku bikarin rastiya vê bûyerê îspat bikin jî gustîlên xwe bi hev diguherin. Li ser vê yekê Bengîn dibêje “ku bi devê wê bibêjim, me ji hev re vekir qutiya dilan e, da ku nepen bibin hevalê eşkeran e (r.37)” Lewma Xewbanû ji Bengîn re dibêje: “Te dît, tu çi zû hînê zimanê min bûyî!” Bengîn jî dibêje: “Tu jî hînê yê min (r. 39).” Li vir em dibînin ku di diyalogeke saf de pêrgîhevبûna du şêweyên zimanî diqewime. Weku Baxtîn bi

pêdagirî dupat dike, ya giring ne ew e ku zimanên herêmî rasterast di romanê de cih bigirin, a giring ew e ku ew wek ûmajên zimên tê de cih bigirin. Heger ne ûmajên zimên bin wê mestereyên rasterast ên şêwezarinan bin ku ji hêla hunerî ve tu qîmeta wan tuneye.

Berî ku em nîqaş bikin bê ev devok, ûmajên zimên in an mestereyên zimên in, em ê li mînakine din jî binerin ku devokine cuda di wan de hene. Bo nimûne kurmetê Bengîn, Gurgîn diçe kerxaneyê. Xatûna wê derê pêşwaziya wî dike. Gurgîn, gotinê Xatûnê yên dema pêşwaziyê wisa vedigêre: ““Oo esbenî, tu xêr hatî, ser seran hatî!” got bi devoka xwe ya ekaliyefî. ‘Te çi baş kir, te çi baş kir... Wile êdîm çava me li ser rîya te qerimîbû’ (r. 117).” Dîsa em dibînin ku querwaşa Zelîxaya dêya Bengîn, Zaxrosa jî bi devokeke ji zimanê giştî yê romanê cuda dipeyive. Gava ku Zaxrosa di ber dilê xanima xwe dide, wisa dipeyive: “Sitiya min! Tenêtî li te nayit! Ez kengî te tenêbihêlim, tu wehman ji xwe re dikit heval. Ka bi vê şorbeşîrê qirika xwe şil bikit. Boy çî tu yê xwe ji birçiya bikujit?” Berevajî wê dengê Zelîxayê bi zimanê giştî yê romanê olan dide: “Erê... Qey tu tentêla me nabînî? Ji işev pê ve guh û çavên xwe ji hesûdêne me re tûjtir bike.” (r. 76)

Li vir du hokar hene ku pêşiyê li ber wê yekê digirin ku ev devok weku nimûneyên xwerû yên devokan xuya bibin û wan dixin rengê ûmajên zimên. Hokara yekem ew e ku herêmên kurdan ku ev devok weku aîdî wan xuya dibin, di rastiya cîhana romanê de tunene. Yanî di romanê de herêmeke wek Botan an jî Mêrdînê tuneye ku ev devok bibin nimûneyên rasterast ên wan. Bi tenê bi lîstikeke edebî hin devokên kurdan li hin karakteran hatine guncandin. Ev yek jî wan ji rengê nimûneyên zimên derdixe û dike ûmajên zimên. Hokara duyem rengê ûmajbûnê ji ya yekem tîrtir dike. Weku me behs kiribû ji bo ûmajâ zimanekî ancaq du şîurê/zimanên cuda hebin; yek dinimîne û yek jî tê nimandin. Divê zimanek di şîura zimanekî din de bê vesikandin, ji paceya zimanekî din re bê dîtin. “Ûmajeke ziman ancaq ji riwangeha zimanekî din ve bê avakirin, ku ev zimanê din wek norm tê pejirandin” (Bakhtin, 1981, r. 359).

Di vê kontekstê de diyaloga herî lawaz, a navbera Zelîxa û Zaxrosa ye. Gava ku xwîner axaftinê wan ên ji hev cuda dixwîne, heta dereceyekê ev her du ziman hev du rolatîvîze dikin û riwangehêne xwe bi xwe re tînin; lê belê di şîura lehengan de rageşîyeke ji ber zimanê cuda naqewime. Ev yek dişibe nimûneya gundiyê ku Baxtîn behsê lê dike. Baxtîn radîgihêne ku bi her performansa edebî-peyvkî re, şîur mecbûr e ku bi awayekî çalak xwe di nav heteroglossiayê de araste bike, tê de tevbîgere û ji bo xwe cihekî bigire, bi gotineke din ew ‘zimanekî’ hildibijêre (Bakhtin, 1981, r. 295). Li gor Baxtîn ancaq mirovekî ku li jîngeheke girtî ya bêfikirîn û nivîsîn, mirovekî ku ji parêzbendiya [inviolability] zimanê xwe amin be û bawer be ku zimanê wî ji berê de diyarkirî ye, xwe di nav pêwîstiya hilbijartina zimanekî de nebîne. Di şîureke wisa de ziman li bin guhê hev nakevin, hewldanek tuneye ji bo kordînekirina wan, ji bo nêrîna li van zimanan yekî bi çavê yekî din ji wan. Nimûneya vê yekê ya Baxtîn,

gundiyekî nexwende ye ku ji navenda bajarekî bi kîlometreyan dûr e û bi awayekî naîf di cîhanekê rojane ya bêtevger û nehejînbar de dijî. Lê belê ev gundî jî di gelek sistêmê zimên de dijî:

Ew bi zimanekî ji Xwedê re dua dike, bi yekî distrê, bi yekî sêyem bi malbata xwe re dipeyive û gava ku ji bo desthilata herêmî bi nivîsendeyî daxwaznameyekê dide nivîsandin, hingê jî hewl dide bi zimanekî çarem bipeyive (zimanê fermî yê xwendin û nivîsinê, zimanê “ewraqan”). Ev ziman hemû ji hev cuda ne; lê bele di şîura zimanî ya gundî de bi awayekî diyalojîk nayêñ kordînekirin; ew bêyî ku bifikire jixweber ji yekî derbasî yekî din dibe: Cihê her yekî ji wan bêniqaş e û her yek ji wan bi bêniqaşî li cihê xwe ye. (r. 295-6)

Di rewşa Gurgîn û Xatûnê de, zimanê Xatûnê îmaja zimanekî ye ku di fihîliyatê de ji hêla hin erebêñ li nav kurdan tê axaftin. Ev zimanê han di şîura Gurgîn de bi awayekî cuda olan dide. Gurgîn hay ji yadinbûna [otherness/ötekilik] vî zimanî heye. Lewma dibêje: “bi devoka xwe ya ekaliyetî ...” Zimanê Xatûnê di şîura Gurgîn de vedîşikê. Devoka Gurgîn ji bo wî dibe norm û bi çavê devoka xwe li devoka Xatûnê dinêre û cextê li yadinbûna wî dike.

Her çi diyaloga navbera Bengîn û Xewbanû ye, di wê de rengê îmajbûna zimên ji her du nimûneyêñ din bihêztir e. Berî her tişti ev şêwazîkirina anku bikaranîma qestî ya şêwaza zimanê *Memê Alan* e. Lewma jî îmaja wî zimanî ye. Heger em ji hêla şîura lehengan ve lê binêrin, em dibînin ku şîura her duyan jî di warê zimên de çalak e, her du jî bi yadinbûna hev dihesin. Bengîn, pêşî bi meqsedâ ku tinazê xwe pê bike, devoka Xewbanûyê teqlîd dike. Di van nimûneyan de îmaja herî xurt a zimên ev teqlîdkirina wî ye; ji ber ku heger nikaribe di pencereya zimanê xwe re li vî zimanê din binêre û zimanê xwe wek norm bipejirîne, nikare vî zimanê din teqlîd bike. Bîsteke din gava ku her du jî zimanê hevdu teqlîd dîkin, ev çalakiya şîura zimanî digihîje lutkeyê û herweku vê angaşta Baxtîn piştarst dike:

“Tişta ku di romanê de diqewime pêvajoya naskirina zimanê xwe ye bi awayê ew di zimanê kesekî din de tê îdrakkirin, naskirina asoya xwe ye di asoya kesekî din de. Di romanê de wergeraneke îdeolojîk a zimanê kesekî din û têkbirina yadinbûna wî pêk tê.” (Bakhtin, 1981, r. 365)

Baxtîn diyar dike ku dibe ku hin şêwezar di edebiyatê de bêñ rewakirin û ji hêla zimanê edebî ve bêñ temelukkirin (r. 294). Her wiha li gor wî, zimanê neteweyî hêzeke pêwîst a navendkêş e ku kaosa heteroglossiaya civakî dixe rengekî têgîhîştinbar, nêrîneke kolektif li cîhanê pênase dike ku ev yek “di hemû tebeqeyêñ jiyana îdeolojîk de maksîmûmeke famkirineke beramberî” misoger dike (r. 271). Ji bo kurmancî jî em dikarin bibêjin ku zimanek çêbûye ku wek zimanê giştî yê edebiyatê tê pejirandin. Nivîskîr ev zimanê giştî û devokê cuda bi hev re xistine têkiliyekê û ew bi hev rolatîvîze kirine, bi vî awayî jî îmajen

zimên afirandine ku li gor Baxtîn ji bo şêwaznasiya romanê pirsgirêka sereke, nimandina zimên bi awayekî hunerî ye; yanî pirsgirêka nimandina îmaja zimanekî ye (r. 336).

ENCAM

Di vê meqaleyê de çemka heteroglossia li romana Remezan Alan *Saturnê* hat tetbîqkirin. Di vê yekê de fonksiyoneke du alî derket holê: Ji aliyekî de taybetiyêş şêwazî yên vê romanê bi alîkarîya vê çemkê hat nîşandan; ji aliyê din jî şiyana tetbîqbûna vê çemkê bi alîkarîya vê romanê hat testkirin. Di vê xebatê de hat dîtin ku ji bo têgihîştin û feraseta cîhana romana hilbijartî, teoriya Baxtîn mifteyekê dabîn dike. Teoriya Baxtîn dihêle ku em vê romanê ji hêla şêwazî ve analîz bikin.

Di *Saturnê* de heteroglossia bi rîya janrên lêzêdekirî; şêwazîkirina janrên wek retorîk, stran, zimanê romantîk; û bi axaftinê vegêr û lehengan dikeve nav romanê. Di vî warî de şêwazîn janrên wek mesnewî, çîrçîrok, retorîk, stran û pêkenokê tê de cih girtine. Ji hêla vegêran ve Eyna Xeybê derfeta pirvegêriyê dabîn kiriye û çîrok di hundirê çîrokê de veşikiyaye; di ber derbirînin bi rîya Eyna Xeybê, Pitat jî wek vegêrekî mudaxeleyan dike. Herwiha ji hêla axaftinê lehengan ve jî em dibînin ku zimanê temenî, pîşeyî, zimanê desthilatê, şêwazîkirina zimanê *Memê Alan* û zimanê herêmî li nav vegêranê ketine û roman bi wan tebeqeyî bûye.

46

Herçend zimanê aforîzmatîk ê lehengan ji bo cudazimaniya wan hokareke negatîf be jî, bi giştî mirov dikare bibêje ku *Saturn* bi şîûreke wisa hatiye nivîsandin ku hay jî heteroglossiaya civakî heye û hewl hatiye dayîn da ku ev heteroglossia di romanê de reng vede û pirşêwazî û pirformî pêk bê.

ÇAVKANÎ

- Aktulum, K. (1999). *Metinlerarası İlişkiler*, İstanbul: Öteki.
- Alan, R. (2002). *Saturn*, İstanbul: Avesta
- Alan, R. (2013). Folklor û Roman: Li dor texeyulên berê rêcêن îroyîn, Stenbol: Peywend.
- Bahtin, M.M. (2004). *Dostoyevski Poetikasının Sorunları*, (Wer. Cem Soydemir), İstanbul: Metis.
- Bakhtin, M.M. (1982). “Discourse in the Novel”, *The Dialogic Imagination*, (Wer. Caryl Emerson and Michael Holquist), Austin: University of Texas Press, r. 259-422.
- Bakhtin, M.M. (1982). “From the Prehistory of Novelistic Discourse”, *The Dialogic Imagination*, (Wer. Caryl Emerson and Michael Holquist), Austin: University of Texas Press, r. 41-83.
- Holquist, M. (1981). “Introduction”, *The Dialogic Imagination*, (Wer. Caryl Emerson and Michael Holquist), Austin: University of Texas Press, r. xv-xxxiii.

- Holquist, M. (2002). *Dialogism: Bakhtin and his world*, London and New York: Taylor & Francis e-Library.
- Lescot, R. (1996). *Memé Alan*, İstanbul: Orfeus.
- Madran, C.Y. (2010). *Modern İngiliz Romanında Mikhail Bakhtin*, İstanbul: Gündoğan Yayıncıları.
- Morris, P. (1994). *The Bakhtin Reader: Selected Writings of Bakhtin*, Medvedev and Voloshinov, London: Arnold.
- Todorov, T. (1998). *Mikhail Bakhtin: The Dialogical Principle*, (ç.7.), (Wer. Wlad Godzich), Minneapolis, London: University of Minnesota Press.
- Vice, S. (1997). *Introducing Bakhtin*, Manchester and New York: Manchester University Press.



ÎMAJA ERMENÎ DI ROMANÊ KURDÎ YÊN SOVYETÊ DE*

Güneş KAN**

KURTE

Di çêbûna îmaja ermenî de, rola koça girseyî ya kurdan a ber bi Ermenistanê ve û destkeftiyên kurdan ên li Ermenistanê gelek e. Di rojê man û nemanê de kurd ji welatê xwe reviyan û xwe sipartin welatê ermeniyan. Li wir bi saya politikayên Yekîtiya Sovyetan, di qadêن cuda de derfet û mafêن girfing bi dest xistin. Bi karigeriya van faktorên sereke ermenî, di romanê kurdi yên Sovyetê de bi awayekî erêni, baş û idealizekirî derketine pêş. Karakterên ermenî, ji gelek aliyan ve weke kesayet, xwendin, pêşketin, xîret, şoresgerî nimûneyên ïdeal hatine nimandin. Civaka ermenî jî weke civakeke pêşketî û şareza di van romanen de xuya dibe. Ermenî, bi piranî di perspektîfa têkiliyên kurd û ermeniyan de ketine rojeva van berheman. Helwesta dewleta tirk, di çawaniya têkiliyên kurd û ermeniyan de weke hêzeke diyarker cihê xwe girtiye. Ev têkilî, ligel têkiliyên her du neteweyan ên bi tirkan re bi awayekî baş û idealizekirî hatine temsîkirin. Dîroka têkiliyên kurd û ermeniyan ên di van romanen de, di dawiya sedsala 19an de dest pê dike û heta roja nivîsına berheman berdewam e. Felaketa ermenî bi awayekî spesîfik nebe jî di nava mijara van romanen de ji xwe re cih dîtiye.

Bêjeyêن Sereke: Ermenistan, Polîtikayên Yekîtiya Sovyetan, Îmaja Ermenî, Romanê kurdi yên Sovyetê, Têkiliyên kurd û ermeniyan.

ABSTRACT

“Image of Armenian in Soviet Kurdish Novels”

In the formation of image of Armenians, the role of the mass migration of Kurds in Armenia and gains of Kurds in Armenia is considerable. During life and death days, the Kurds defect from their own country to country of the Armenian. Thanks to the politics of the Soviet Union there, they gain important opportunities and rights in various fields. Under the influence of these main factors, in Soviet Kurdish novels, Armenians have come into prominence as positive, good, and idealized people. Armenian characters are represented as ideal models in personality, intellectualism, progressivism, hard-working, revolutionism. The Armenian society is also regarded as a progressive and a civilized society in these novels. Armenians mostly enter the agenda of these works in line with the Kurdish-Armenian relations. The attitude of the Turkish State has situated as a decisive power in the nature of these relationship. Kurdish-Armenian relationships

* Ev gotar li ser bingeha beşeke teza mastirê ya nivîskar a çapnebûyi hatiye amadekirin. Bnr. Güneş Kan, *Îmaja Ermenî di Romanê Kurdi yên Sovyeta berê de*, Mêrdin: Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindî yên li Tirkîiyê, Şaxa Makedanista Çand û Zimanê Kurdi, Teza Mastirê ya Çapnebûyi.

** Lêkoliner, Zanîngeha Mardin Artukluyê – Enstituya Zimanê Zindî yên li Tirkîiyê, Şaxa Makedanista Çand û Zimanê Kurdi, e-mail: rojxun@hotmail.com.tr

have been regarded as good and ideal contrary to the relationships of the two nations with Turks. The history of Kurdish and Armenian relations mentioned in these novels began in the late 19th Century and continued until the day the works were written. Though not specifically, ‘Armenian catastrophe’ is placed among the subject of these novels.

Key Words: Armenia, the politics of the Soviet Union, image of Armenian, Soviet Kurdish novels, the Kurdish-Armenian relations.

DESTPÊK

Kurd û ermenî, du gelên cîran ên qedîm in. Ji gelek aliyan ve çarenivîs û qedera van her du gelan dişibin hevûdin. Ev her du gel, di dîrokê de li cihêن cuda cuda leqayî hevûdin hatine, têkiliyêن wan çêbûne û coxrafayayeke hevpar parve kiriye, bi hev re jiyanê, çûne şînêن hevûdin, bûne kirîvên hevûdin. Ev taybetî di navbera van her du gelan de têkiliyeyeke dîrokî daniye. Di vê têkiliya dîrokî de, lihevkirin û dirûvên cil û berg, lîstik, muzîk û xwarinan jî çêbûye. Digel van, tiştên cuda û nexweş jî qewimîne. Tiştê herî zêde ku wan ji hev cuda kiriye ola wan bûye. Yanê ol ji bo van her du gelan bûye cihê sedema nakokiyen. Helbet ev nakokî her dem di nava wan de tunebûye, lê di sedsala bîstan de zêde bûye. Dewletên serdest bi politikayêن xwe ev nakokî weke amûreke jihevcudakirinê bi kar anije.

Bêguman edebiyat, yek ji rîyêن herî bibandor e ku bûyer û karesatên dîrokî pêşkêşî mirovan dike. Ew derfetên hesabdîtin/hesabdayînê, analîzkirina bûyeren dîrokî, di xwendevan de muhasebeyeke wijdanî pêk tîne. Ev xebat, dil dike bi rîya romanê kurdêن Sovyeta berê, îmaja ermeniyan a neteweyî bikole û paşxaneya vê îmajê destnîşan bike. Dema ev temsîl û îmaja neteweyî bi rîya hin romanen bê tesbîtkirin û analîzkirin, dê peywenda rewş, siyaset û ïdeolojiya serdema berhemê bê nirxandin.

Romana kurdî, li Ermenistanê bi saya politîka û derfetên ji bo gelên kêmâr derdikeve holê. Pişî romana ewilîn, cureya romanê di nava kurdêن Ermenistanê de dibe tradîsyonek. Ev roman, ji rih û axa xwe dûr, li welatê Ermenistanê hatine dînyayê. Loma jî ci naverokî ci şeveyî dê di bin bandora wêje û ramana ermenî de mabin. Di vê xebatê de em li ser aliyekî vê bandorê rawestiyane. Me bala xwe daye ka leheng û tîpêن ermenî di romanê kurdî yên sovyetê de çawa hatine afirandin, bi ci çavî li wan hatiye mêzekirin û ew bi awayekî çawa hatine wesifandin. Bi saya xwendin û agahiyêن xwe yên teorîk, me hewl daye paşxane û sedemên îmaja ermenî ya di van berheman de analîz bikin.

Ev xebat ji nirxandina heşt romanê kurdî yên Sovyetê pêk tê. Ji bo bidestxistina îmaja ermenî, me romanê Erebê Şemo yên Berbang, Hopo û Dimdim; yên Eliyê Evdilrehman Xatê Xanim û Şer Li Çiya; ya Sehîdê İbo Kurdê Rêwî; ya Heciyê Cindî Hewarî; ya Egîdê Xudo Dê û Dêmarî bi awayekî hûrgilî tehlîl kirine.

1. ÎMAJ Û ÎMAJA NETEWEYÎ

Îmaj, dikare bi awayekî giştî wiha bê pênasekirin: 1. Rewşa kes an heyînê ye ku bi rîya huner, wêne û fotografan çêbûye, 2. Rengyedan an xeyal e ku ji rûyeke rewnaq an neynikekê xuya dibe, 3. Xeyala kes an tiştekî ya di mêtî de ye (Filizok, 2014). Di nava van pênaseyên îmajê de ya ku zêdetir me eleqedar dike benda sêyem e. Li gor pênaseya îmajê ya benda sêyem, ew dikare weke wateya tiştekî an kesekî ya sembolik bê şirovekirin. Bi gotineke din ew dikare weke kurteya çavnêriya tiştekî an kesekî bê pejirandin. Însan filman temâse dîkin, pirtûkan dixwînin, li welatan digerin, bi mirovên din re dûr û dirêj dikevin sohbet û nîqaşan. Lêbelê, piştî ev kiryar diqedin û bi şûn de, ew bi hemû teferûat û hûrgiliyên xwe nayêن bîra mirov, piştî pêvajoya kiryarê tenê çavnêrî û bîranînê kurt dimînîn di mêtî de. Ev çavnêrî û bîranînê bîçûk îmajê pêk tînin.

Wekî Herkûl Millas dibêje îmaj, rastî bixwe nîne, têgihiştina rastiyê ye. Bi qasî têgihiştina mirov e, yanê li gor rastiyê sînordar e. Ev jî pirsgirêkekê derdixe holê. Li gor Millas, pirsgirêka herî mezîn ev e: vejetîna ji hevûdin a îmaj û baweriyê. Îmaj, têgihiştineke netam a beranberê rastiyê ye, lêbelê bawerî çavkaniya xwe ji zanist û çavnêriyê digire ku weke beranberê rastiyê tê pejirandin (Millas, 2005, r. 16). Ji ber şîmûla têgeha îmajê, xebatê li ser wê jî qadeke berfireh divê. Îmaj têgeheke piralî ye û ji xebatek û lêkolîneke îmajê, şîxuleke piralî û pirdisiplinî divê.

Çêbûna îmajê, bi paradîgmayê re têkildar e (Millas, 2005, r. 2). Lewra îmaj, encama nirxandina mêtîkirina me ya objeyê ye. Ji bo ku em mêtîkirina xwe ya li wê objeyê watedar bikin, paradîgma dikeve dewrê. Ew bi xwe re xetereyekê tîne ku ew jî nedîtina me ya tiştekî derveyî paradîgma an cîhana me ye. Îmaj, esasên pêşdaraziyan di xwe de dihewîne. Îmaj, di bin bandora tecrûbeyên mirovan, têgihiştina wan a kolektîf, di nav dîrok, edebiyat, coxrafyaya wan de, di nav têkiliyên dîrokî-civakî, rewşa aborî û hwd. de çêdibe. Lêbelê îmaj, tegihiştineke guherbar e (Millas, 2005, rr. 18-19). Weke ku Haşim Ahmedzade derbarê nasnameya neteweyî de dibêje, îmaj jî her gav li gor sedemên xwe di nava guhertinekê de ye (2004, r. 19). Ev pêkarênu ku me li jor rêz kirine çendîn biguherin îmaj jî li gor wan rûyekî nû digire. Bi rîya îmajê, em bi zanetî an nezantî raman, hest û pejn, îdeolojî, nirx û mêtîkirina xwe ya li cîhanê tînin zîmîn. Di eslê xwe de, dema di mêtîyê me de îmaja tiştekî şekil digire û em bi gotinan wê îmajê dışayesînin, em derbarê nasnameya xwe de agahiyan didin. Dema mirov yekê/î dipesinîne an rexne dike, di eslê xwe de ew taybetiyên kesayetiya xwe dide dest. Lewra îmaj ne ku bi tenê kesayetiya me, kesayetiya kesê ku me dinirxîne jî vedighêze (Güvenç, 2010, r. 291).

Têgeha nasnameya neteweyî an îmaja neteweyî dikare li ser “em” û “ew”ê bê bicîhkirin. Yanê eger lêkdan û nakokiya “ew” û “em” an jî “ez” û “ew”ê tunebûya, dê ne nasname ne jî îmajeke ‘neteweyî’ hebûya. “Ev prensîba “ez li hember ên din” (ego versus autre) lazim e bi xwe re “lêrasthatinek”ê jî bîne. Ji

ber ku dijayetî hewceyî naskirinê an rastîhevhatinê ye ji” (Alan, 2014, r. 49). Ji bo ku “em/ez” û “yê/yên din” li hemberî hev cihê xwe diyar bikin, divê em di cih û demekê de bêñ bal hev û wekhevî û ciyawaziyêñ xwe binasin. Di encama vê lêrasthatin û nasînê de, tarîfa “em”ê dê nasnameya neteweyî û tarîfa “ew”ê ji dê ïmaja neteweyî derxîne holê.

2. ÎMAJA ERMENÎ DI ROMANÊN KURDÎ YÊN SOVYETÊ DE

Di hemû romanêñ kurdî yên Sovyetê de ïmaja ermenî bi piranî bi awayekî erênî derketiye pêş. Ev ïmaja erênî, sedem û paşxaneya xwe heye. Sedemek, di demêñ dijwar de xwedîderketina ermeniyan a li kurdêñ êzidî ye; sedemeke din ji bi reýa derfetdayîna pergala sosyalîst di gelek waran de alîkarî û rêberiya rewşenbîrêñ ermenî ji bo kurdêñ Ermenistanê ye. Kar û qencyîñ ku li jêr behsa wan hatine kirin, di romanêñ kurdêñ Sovyetê de, heta dereceyekê wiha kir ku ermenî bi awayekî ïdealize û bi temamî baş bêñ nimandin.

2.1. Pêkarêñ Çêbûna ïmaja Erêñî ya Ermenî

Di çarçoveya pêşxistina asta neteweyêñ piçûk de, divê ji bo kurdan dibistan bihatana vekirin. Lêbelê, gelê kurd wê çaxê ji bûyerêñ giran ên Tirkîyeyê bi zorê filîtbû, di nava perişaniyeke mezin de, nexwendî, nîvkoçer, hîn di bin darê eşîrtî û feodalîteyê de bû. Lewra ji ji bo vekirina dibistanan, sazkirina pergala perwerdeyê di nava kurdan de rêber tunebûn. Di vê rewşê de ermenî hatin hawara kurdan, ketin gundêñ kurdan û bûn mamosteyêñ pêşeng ên perwerdeya bi zimanê kurdî. Herwiha ermeniyan di fêrgehan de ji bo perwerdeya bi zimanê kurdî mamoste amade kirin. Ew di warê nivîskarî û çapkirina pirtûkêñ bi zimanê kurdî de ji bûne alîkarê kurdan (Xelîl, 2014, r. 17; Boyîk, 2012, r. 12). Di warê kurdewariyê de, salêñ di navbera 1920 û 1937an de li Sovyetê, xasima li Ermenistanê, êwra xebatêñ xwendin, nivîsandin û pêşxistina perwerde û çandê ne ku ev bi alîkariyêñ mezin ên rewşenbîr û pisporêñ ermeniyan pêk dihatin.

Di dibistanêñ gundêñ kurdan de ji bo ku ders bi zimanê dayîkê bêñ dayîn, di meha tîrmehê ya 1921ê de pirtûka dersê ya bi navê ‘Şems’ hate amadekirin. Pirtûk bi kurdî bû û nivîskarê wê Hakop Xazaryanê ermenî bû. Xazaryan an bi navê xwe yê din Lazo di nava kurdêñ Qafqasyayê de kesekî pir populer e. Ji romanêñ kurdêñ Sovyetê bigirin heta lêkolînêñ akademîk ên niha, dema navê Xazaryan derbas dibe ev rengdêrêñ weke ‘xêrxwaz’, ‘dostê kurdan’, ‘Apo’, ‘ewladê gelê ermenî’, ‘pismamê gelê kurd’ ji pê re têñ bikaranîn. Kurd bi vî awayî spasdarî û dilsoziya xwe tînin ziman ji bo xizmet û alîkariya Xazaryan. Heta sala 1929an hem li Ermenistan û hem ji li Tiflîsê, kurd bi pirtûka ‘Şems’ê hînî xwendin û nivîsandinê bûne. Di 1922an de bi însiyatîfa Lazo û Ahmedê Mîrazî li Tiflîsê, ji bo zarokêñ kurd ên sêwî Dibistana 103yan hate vekirin. Li wir zarokan hem dixwend, hem hînî kar dibûn û bi şev ji li wir radizan (Şamil, 2005, r. 93). Ev zarokêñ han, dûre li Ermenistanê, di warê kurdolojiyê de dibin nifşê ewilîn ên rewşenbîrêñ kurd. Ew di sêwîxaneya Ermenistanê de mezin

bûbûn, li wir perwerde dîtibûn û di vê navberê de kurdî ji bîr kiribûn. Dema ku vegeriyan nava gelê xwe, ji nû ve fêri kurdî bûn. Balkêş e, li aliyekî wan zarokên kurd hînî tiştan dikirin li aliyê din ew jî ji wan zarakan hînî zimanê xwe yê zikmakî dibûn. Wê demê ji xeynî wan di nava kurdan de kesên xwende tunebûn, lewra jî ji perwerdeyê bigirin heta folklor, edebiyat, dîrok, rojname, radyo, muzîk yanê di hemû disiplinê kurdî de bar ketibû ser milên wan.

Rojnameya *Rya Teze* jî bi piştgiriya zana û rewşenbîrên ermenî dertê, lewra berpirsiyarê wê yê ewilîn ermeniyekî bi navê Harûtyûn Mkrtçyan e (Xelîl, 2014, r. 17-18). Di demê ewil de ji bo rêkûpêkkirina weşana rojnameyê, nivîskarê ermenî yê bi nav û deng û dostê kurdan Hiraçya Koçar, wêjezan Harûtyûn Mkrtçyan, Gevork Parîs alîkariyeke girîng da rojnameya kurdan. Ew gişt di nava kurdan de mezin bûbûn û baş bi kurmancî zanîbûn. Heta sala 1934an ku kurdan jî êdî dikaribû ew kar bikira, ermeniyan weke berpirsiyar di rojnameyê de kar kir (Boyîk, 2012, r. 55).

Di warê weşanên Radyoya Erîvanê de, salêñ ewilîn bi alîkariya zaneyên ermenî karekî xurt hate kirin (Boyîk, 2012, r. 73). Lewra, wê demê her çend di nava kurdan de merivên xwende hebûn jî kesên pispor ên ku bikarin weşangeriya radyoyê bikin, tunebûn. Di radyoyê de kilama kurdî ya ewil a ku bi dengê jinê hatiyebihîstîn, ji aliyê jineke ermenî ya bi navê Anuş Sahakyan ve hatiye gotin. (Şamil, 2005, r. 101).

Bi piştgirî û tecrubeya ermeniyan li Qafqasyayê, di warê şanoyê de xebatêñ girîng hatin kirin. Di salêñ 20î de Lazoyê ermenî ligel Ahmedê Mîrazî û hinek rewşenbîrên kurd li Tiflisê di klûbeke bi navê ‘Lûkaşîn’ê de êvaran lîstikêñ şanoyê çêdikirin. Koma şanoyê, şanoyê Lazo yên bi navê *Gustîl* û *Qelen* jî derxist ser dikê.

Şanoya Kurdî ya Dewletê, li Ermenistanê hate damezirandin. Di destpêkê de, di nava kurdan de qadroyê neteweyî yên baş, şanogerên pispor, ji bo karêñ teknikî xebatkarêñ hoste û metnêñ zêde yên şanoyê tunebûn. Wekî warêñ din ên kurdan, di vî warî de jî di demê ewil de nivîskar û pisporêñ şanogeriya Ermenistanê alîkariyeke mezin da kurdan. Rejisörê şanoya kurdî ya ewilîn Solak Nîkoxosîyan û serokê para bedewîtiyê aktorê ermenî Mikirtîç Canan bûye. Nivîskar û şanogerên ermenî li ser hîmê zargotin û jiyana kurdan gelek metnêñ şanoyê amade kirine. *Keça Mirekê*, *Ker û Kulik*, *Heso* ya S. Gênosyan, *Xuliqandina Rojê* ya S. Kojoyan, *Kenerê Elegezê* ya V. Şoxêryan, *Nêçîra Lalvarê* ya V. Manvêlyan hinek ji wan in. Pisporêñ şanogeriya ermeniyan diçûn şanoya kurdî, ji bo bilindkirina asta lîstikvanan semîner çêdikirin, kursêñ hînbûnê vedikirin (Boyîk, 2004, rr. 103-112).

Li Ermenistanê di dema Sovyetê de çend belgefîlm jî hatin kişandin. Di salêñ 1920î û 1930î de li YKSSê, sê film li ser kurdan hatin kişandin; lêbelê, yek jî bi kurdî nebû (Hassanpour, 2005, r. 494). Di 1926an de, di studyoya “Armenfilm” de bi senoryaya Lazo, derhêneriya Amo Beknazaryan û bi tevlîbûna aktorêñ

ermenî, filma “Zerê” ku jiyana jina kurd vedibêje, hat kişandin (Şamil, 2005, r. 95). Di serî de, vî filmî pir deng neda, lê di van salên dawîn de bi saya popularite û reseniya çanda kurdî an jî bi saya jinûve vegerîna rehêneteweyî, di navendên çandê yên kurdan de tê nîsandan û nasandin.

2.2. Mînakê İmaja Ermenî di Romanê Kurdî yên Sovyetê de

Béguman heta dereceyekê rola van xebatên behskirî, di çêbûna imaja erêni ya ermeniyan de heye. Bi rêya çend romanê vê periyodê, niha em li rengvedan û teferuatê vê imajê binêrin.

2.2.1. Berbang

Berbang, berhema duyem a Erebê Şemo ye. Ew di sala 1958an de li Erivanê hatiye çapkîrin û piştre di 1969an de ligel *Jiyana Bextewar* û *Hopo* di nava guldesteyeke bi navê *Berevok* de hatiye çapkîrin. *Berbang*, versiyoneke berfirehkirî ya *Şivanê Kurmanca* ye. Dubareyeke *Şivanê Kurmanca* ye û gelek bend pevv bi pevv wekî hev in (Allison, 2014, r. 144). Lîbelê, em nikarin bibêjin ew bi temamî kopiyeke *Şivanê Kurmanca* ye. Di *Berbangê* de hinek bûyerên *Şivanê Kurmanca* hatine derxistin, hinek lê zêde bûne, li hinek deran heman bûyer bi awayekî cuda hatiye ragihandin. İmaja ermenî ligel hinek guhertinê piçûk di her du berheman de weke hev e. Weke romanê din ên Şemo di vê romanê de jî tipêr ermenî weke kesên jêhatî, zana, kêrhatî, pêşeng û idealize hatine temsîlkirin.

Ermenî ji welatê ûris hatin, mera gilî kirin, wekî miletê ûris ne mînanî Romê zulmkare, meletekî rehme. Me şêwr kir, em birevin berbi welatê ûris, berbi miletê rehm...

Beledê me Serkîsê ermenî bû, ê ku gele cara çûbû Ûrisetê, rê zanibû. Ewî hinekî zimanê ûrisa jî zanibû. Em rêketin (r. 73).

Wekî ji pasaja jor jî tê fêhmkirin, kurd û ermenî di Împaratoriya Osmanî de weke kêmâr dijîyan. Ew di salên dawîn de di bin zordesî û çavşoriya împaratoriye de hatibûn azarê. Li gorî pasajê ermenî, ji kurdan çalaktir tevgeriyane û ji xwe re li sitareke ewletir û nû geriyane. Sitar Rûsyaya ku hema di sînorêن Dewleta Osmanî de bû. Pêşiyê ermenî diçin çavdêriyê dîkin ka li wir rewş çawa ye, dikarin li wirbihêwirin an na? Hema têن xeberê didin cîran û dostêن xwe yên kurd ku ew jî rojekê pêş de ji wê eziyet, kuştin û talanê rizgar bibin. Di heman demê de ew ji kurdan re, di dema revê de rêberiyê jî dîkin¹. Di vê peywendê de ermenî ji kurdan çalaktir û pêşdatir hatine temsîlkirin.

¹ Her çend ku nîvîskar li jor cudahiyê nexe nava kurdan jî kurdênu ku koçê Rûsyâ û Ermenistanê kiribûn, ên êzidî bûn. Di kitêbên dîrokî de, bi taybetî di bûyera Mîrza Axayê êzidî de em rastî rola ermeniyan a alîkarî û rînîşandariyê têن. Di serê Mîrza Axa û Osmaniyan de ermenî ligel êzidiyan şer kirine. Dema ku Mîrza Axa, bi fermendarê rûs re ketiye nava têkiliyê, qasidên xwe ji nava ermeniyan hilbijartîye (Bnr. Celîl, 2007, rr. 18-19).

2.2.2. Hopo

Îmaja ermenî di vê romanê de, zêdetir di peywenda dijraberiyêne feodalîzm û sosyalîzm, pêşketû şûndemayî, hovîtiya dema Osmaniyan û aramiya YKSSê de hatiye afirandin. Ermenî, ji aliyê jiyana civakî, xwendin, şarezayî û pêşketinê ve ji bo kurdên cîranêne xwe weke mînakeke baş û guncaw derketine pêş. Kurdên Sovyetê yên ku bi jiyaneke nû re rû bi rû ne û xwe adapteyî şert û bîrdoziya Sovyetê dîkin, şixul û şeklê jiyana ermeniyêne dostêne xwe ji xwe re weke nexşeyeke rê dibînin. Di vê romanê de lehengekî xurt ê ermenî nehatiye afirandin, îmaja ermenî zêdetir di bawerî û fîkrîn nivîskar an lehengêne romanê de diyar dibe. Yanê, ne bi rîya lehengekî romanê, em bi rîya bawerî û ramanên gişî yên derbarê wan de îmajê bi dest dixin.

Di *Hopo* de, modernîzasyon di qadêne çandiniya modern, têkiliyêne jin û mîran, azadiya jinê, jiyana wekhev û hwd. de qismen hatiye gundê kurdan lê tam rûnenîstiye. Cih cih şopêne jiyana feodal a bi salan xwe dide der. Bi qasî ku bala me kişandiye em şopêne jiyana feodal herî zêde di warê civakê de bi dest dixin. Em dibînin, her çend jiyana modern ji aliyê teşeyê ve xwe bide peyikandin jî ji aliyê mantalîteya civakî ve hîn tam nehatiye pejirandin. Di vê rewşê de, nivîskar bi rîya diyalogêne lehengan, şeweya jiyana ermeniyan û têkiliyêne wan ê civakî datîne ber endamêne civakê û dixwaze ji wan dersê bistînin.

Nivîskar di romanê de balê dikişîne ser Zînê, ku kincêne kurdan ên gerdîşî li gor roja xwe nû kirine, bi gotina profesor Xaçatriyan ew “modernîzasiya” kirine. Ji aliyê civakê ve ji bo guhertina forma kincê bav û kalan, ew nayê rexnekirin. Lê, ew ji aliyê têkiliya jin û mîran ve tê sûcdarkirin. Dema hevalê wê yê zanîngehê, di heman demê de hezkiriyê wê Hesen, ji bo dîtina wê tê gund, ew bi hev re dimeşin û Zînê wî heta derveyî gund bi rîike. Ev bûyer di nava gund de dibe pirsgirêk, gelek kes bi awayê berê dev diavêjin Zînê, bi çavekî nebaş li wê dinêrin. Lê di civakê de yên ku wê diparêzin jî hene. Serkisê çêlekdoş, li kesen ku Zînê gunehbar dîkin, hêrs dibe û mînakêne jiyana modern dide: “Li qîzêd Ermeniyan hela lê binihêr. Ez çûme Îrêvanê, ew her gav êvaran bi hev re digeriyan li kuçeyan, gelo ci xerabî di wê yekê de heye? Lê kurêd me hê li pey edetêne kevin diçin, bes e!” (r. 111). Çêlekdoş, ji ber zîhniyeta kevneperekir û paşverû isyan dike û weke alternatif mînaka keçikêne ermeniyêne azad û serbixwe dide. Li gorê wê tu çewtî û xirabî tê de tuneye ku keçikêne kurd jî weke yên ermenî serbixwe bin.

Ji aliyê têkiliyêne civakî, rabûnûrûniştina endamêne civakê ve lehengêne romanê yên nûjenxwaz ligel edet û baweriyêne kurdan ên kevin, xweziya xwe bi pergala civaka ermeniyan tînin. Ji ber ku Zînê di civaka kurd de tîpeke civakî ya nû ye, piraniya nakokiyêne pergala jiyana nû û kevin zêdetir li derdora wê diqewimin. Rojekê endamêne girîng ên kolxoza gund ji ber ku pêşbaziya kar teklîfê kolxoza wan bikin diçin gundê Darebiyê. Darebiyê, gundê Hesen e ku ew bi xwe jî tê de endezyarê çandiniyê ye. Pişti ku li ser şertêne pêşbaziyê li hev têne, kolxzvanêne

gundê Darebiyê wan dawetî xwarinê dîkin. Zelêxa ku dayika Hesen e, ji bo ku wan bike mîvanê xwe û xwarinê bide wan, Zînê û Cemîleyê dibe mala xwe. Di wê gavê de dêya Zelêxê jî li mala wê bû. Dêya Zelêxê yeke xirab, delkbaz û kevnisperest e. Wê ligel hevjinê xwe, keça xwe dane mîr û dema mîrê keça wan dimire ew dixwazin careke din ji bona qelen wê bizewicînin. Ew weke temsîlkara irf û edetê kurdan ên nebaş hatiye pêş. Dema xwarinê dixwin, dê xwe nagire û di navbeyna dema berê û ya niha de berhevdanekê dike. Dema berê bûkê nikaribû ligel xwesiya xwe xwarinê bixwe, li cem wê rûne û pê re biştexile. Lîbelê, aniha eyb hatiye hildanê û bûk li ba xwesiye rûdine, pê re xeber dide. Di vê mijarê de jî dîsa pergala civaka ermeniyan digihije hawara lehengên nûjenxwaz. Cemîle ji dêya Zelêxê re vedibêje ku edetê berê ne baş in, ew di nava endamên civakê de dibin sedema neheqîyan. Ew ermeniyan weke modela civaka şareza destnîşan dike. Bi dêya xwe dide zanîn ku li gundê ermeniyan her kes ligel hev rûdinin, li ber hev xwarinê dixwin û tu xirabî jî di vî tiştî de tuneye. Lîbelê, dêya Zelêxê li dijî vê yekê derdiikeve, angaşt dike ku edetê ermeniyênen welatê wan, ên Entabê, Mûşê û Xinûşê jî her weke yên kurdan bûne. Angaşt dike ku: “Bûkên wan sûretên xwe xêlî dikirin, wekî kesek wan nebîne û tu caran bi xwesiya xwe re an bi xezûrê xwe re rûnediniştin û devêne xwe venedikirin, nan bi wan re nedixwar.” (r. 192). Ev angaşt dibe ku heta derekê rast be. Çimkî, her tim “êñ kêmâr” li gor rêgezên “êñ piranî”yan dikin, xwe adapteyî şeweya jiyana wan dikin. Ev angaşt, ji bo herêmên Kurdistanê yên ku jimara kurdan ji ya ermeniyan zêdetir bû, dikare bibe realîteyek.

Ew her du mînakêñ dij ên derbarê ermeniyan de, delîleke sosyolojîk derheqê têkiliya komên etník de dide me. Ew jî asîmîlebûn an entegrebûna koma etník a piçûk û bêhêz e di nava koma etník an neteweya girs û xurt de. Li Kurdistanê ji bona ku hêza xurt û desthilat kurd bûn, ermeniyêñ li wir hînî edet û pergala jiyanâ kurdan bûne. Lîbelê ji ber ku Ermenistan welatê ermeniyan e, hêza diyarker a li wir ermenî ne û jê wêdetir jî ji ber politikayêñ nûjeniyê yên hikûmeta Ermenistana Sovyetê, divê kurdan jî xwe adapteyî divêtîyiñ jiyanâ nû bikira.

Di romanê de, taybetiyên hevpar ên ermenî û kurdan di jiyana rojane de hatine veguhastin. Weke nimûne, li kolxozan kurd jî ermenî jî nanê tenûrê dipehtin, pratîka karên wan ên gundîtiyê wek hev in mîna paqirkirina embara genim û hwd. Ji xeynî vê yekê, ligel ku gund yekîneya jiyanekê teng bin jî em dibînin ku kurd dikarin biçin li gundênen ermeniyan bijîn. Dê û bavê Hesen bi dilê xwe direvin, diçin xwe dispêrin gundê ermeniyan. Ew çend salan li wir dixebeitin, peryan berhev dikin û vedigerin gundê xwe. Herwiha dema ku Hesen û Zînê dizewicin, ew mîna ermenî û gurcan berbûyan ne ku bi edetên berê, bi kaxezâ dawetê bangî dawetê dikin. Ev yek, bi me dide zanîn ku modernîteya kurdên Sovyetê, bi taybetî yên Ermenistanê li gor a ermeniyan dirûv girtiye.

2.2.3. Dimdim

Di temamiya vê romanê de nêzîkahiyeye berbiçav di navbera kurd û ermeniyan de hatiye avakirin. Bi tenê cihdayîna karekterên ermenî yên erêni û têkiliyên kurd û ermeniyan ên qenc, dikare weke midaxale an niyeta nivîskar a dema xwe bê nirxandin. Her çend ku ermenî û kurd, cîran û dostêr kevin bin jî cudahiya olî di navbera wan de hebû. Cudahiya olî, bivênevê di navbera wan de dibû sedema hinek serêşîyan. Lê di romanê de, behsên derbarê gengeşiyêñ olî yên navbera kurd (piraniya wan misilman) û ermeniyan (xiristiyan) de qet nebûye mijar. Ne cudahiya olî ya di navbera ermenî û kurdan de, lê ya mezhebî ya di navbera kurd û eceman de hatiye rojevê²: “Vir welatê Kurdan e, ne ciyê Şahê Îranê ye, wekî ew mele bişîne. Xêni ji wê yekê, em Kurd in û dinê me cuda ye; em Sunî ne, ne Şî’î ne, ji me re lazim e wekî meleyê me jî kurd be û Sunî be. Lê tu Ecem î, bicehime ji van deran!” (r. 35). Ev mînak dide peyitandin ku temsîla ermenî ya dîrokî di romanê de ji aliyê midaxale an daxwaza îdeolojîk a nivîskar ve derb xwariye. Ji bona ku Îran desthilatdareke serdest û kurd û ermenî gelên bêhêz bûn, nivîskar, ew weke hev dîtine û cudahiyeñ di navbera wan de bînpê kirine. Bala nivîskar ji cudahiya olî zêdetir li ser cudahiya çînî, nakokiya di navbera desthilatêñ zordest û rêvebirêñ adil de ye. Û sedemeke din, Erebê Şemo her çend di berhemên xwe de neyîne pêş jî ew êzidî bû. Çawa ermenî di nava cîranêñ xwe yên kurd de ‘yên din’ bûn (Alan, 2014, r. 52), pozîsyona êzidiyan jî di nava kurdêñ misilman de heman rewş bû. Ev rewşa ‘yên din’, kurdêñ êzidî û ermenî ligel misilmanan nêzîkî hev kirine. Li aliyê din, nasnameya neteweyî girêdana herî xurt e di navbera kurdêñ misilman û kurdêñ êzidî de. Weke nivîskarekî ku piraniya jiyana xwe li Ermenistanê di nava ermeniyan de derbas kiriye, Erebê Şemo, belkî xwestiye di bin nasnameya neteweyî de nêzîkahiya di navbera xwe (êzidî) û ermeniyan de ber bi hemû kurdan ve berfirehtir bike (Adsay, 2013, r. 67).

Rojekê Xano, ji bo ceribandina topan gazî Xaçoyê hosteyê topan dike. Diyaloga di navbera wan a derbarê ermeniyan de girîng e:

-Çavê te li dinê Xaçoyê Hostebaşî. Ez zehf ji te û ji hostetiya te razî me. Tu dizanî Kurd û Fileh dostêr hev ên zemanêñ kevn in. Ev kela min jî dîsa Xaçparêzan çêkir. Em wisa hînî wî bûn, me bi Kurdî gazî wî dikir, “Qero”.

Xaço got:

² Remezan Alan angaşt dike ku cudahiya mezhebî ya di navbera kurd û iraniyan de sedema eslî ya pevçûna wan e. Ew angaşta xwe wiha bi cih dike: “ji ber ku serdem, ne serdemâ netewetiyê ye, bêtir ya nakokî û gelemşeyen mezhebî ye.” (Bnr. Alan, 2009, r. 138).

-Maqûl, ez wî hosteyî nas dikim. Bavê wî hosteyî li adaya Behra Wanê kiliseyeke³ wisa çêkir, te digot qey kela ye. Padişahê Romê çend caran bi qeyîk cûn ser wê kiliseyê şer, bi topan lê xistin, lê nikaribûn tiştek bi wê bikirana (r. 61).

Qaşo, Xan ji bo ceribandina topan gazî wî kiribû, lêbelê herhal ispatkirina dostaniya kurd û ermeniyan û hostetiya ermeniyan girîngtir e ku meseleya leşkerî li paş dimîne. Nivîskar, muhitemelen ev hevdîtina Xano û Xaço ji bo veguhestina ramanên xwe yên derbarê ermeniyan de weke cihekî herî guncaw dîtiye. Bi rêya vê diyalogê nivîskar xwestiye sê tiştan bike: Peyikandina dostaniya qedîm a kurd û ermeniyan, pisporiya ermeniyan a di karên teknîkî de û ragihandina dijminahiya tirkân a li hemberî kurd û ermeniyan.

2.2.4. Xatê Xanim

Xatê Xanimê (Evdilrehman, 2004), mijara xwe ji çîroka jineke serokesîr wergirtiye. Ew, têkiliyên kurd û hikumeta tirkân a demekê vedibêje. Lê roman bi taybetî ji aliyê serlehenga xwe ve bala xwendevanan dikişîne. Çawa ku ji navê pirtûkê tê derxistin, serlehenga wê jineke bi navê Xatê Xanim e. Di romana kurdî de jin, cara ewil di vê romanê de roleke girîng dilîze. Ev roman ji gelek aliyân ve ji bo analîzan guncan e. Yek ji wan aliyênen guncan, îmaja ermenî ye di romanê de.

58

Îmaja ermenî li seranserê romanê belav bûye. Nivîskar bi taybetî, ji bo ermeniyan cih veneqtandiye, lê ermenî di rêzebûyeran de pêşkêşî xwendevan kirine. Dema em jî di seranserî romanê de li temsîla ermeniyan dinêrin, em dibînin ku ermenî ji bo ku ji kurdan re qencî an alîkariyekê bikin her tişti didin ber çavêن xwe. Mîna ku armanca wan a nîhayî, ev be. Ermenî di perspektîfa têkiliyên wan ên bi kurdan re ketine romanê. Ji vî aliyê ve ermenî cîran, dost, hevalên herî ideal in. Di navbera wan û kurdan de qet serêşandin an pirsgirêkeke civakî tuneye. Di romanê de gotareke neteweyî xuyaye. Kurd her çiqas di forma eşiretiyê de li dijî tirkân şer bikin jî nivîskar ew şer li gor nêrîna xwe ya dema nivîsandinê piçekî bi neteweperweriyê ve girê daye. Kurd û ermeniyênu ku li hemberî tirkân xwe dizanin û diparêzin, qet li hemberî hev bi vî awayî tevnagerin. Ji aliyê olî ve jî qet rewşike nebaş an nerazîbûnek di nava wan de pêk nayê. Cudahiya ola kurd û ermeniyan tew nabe mijara gotinê jî. Ev her du xal pirsgirêkên muhîtemel in ku di romanê de bihatana qalkirin. Ne ev pirsgirêk û ne jî pirsgirêkên bi awayekî din ên di navbera kurd û ermeniyan de di romanê de cih negirtine.

Nivîskar li vir gelekî ji rastiyên dîrokî dûr ketiye. Ligel têkiliyên baş di nava kurd û ermeniyan de kêm zêde berberî û nelîhevkirin jî hebûne. Bi taybetî, di dema Siltan Evdilhemîd de lihevnekirinê piçûk digihîjin asta dijminahiyeke nêzîkî 30 salî. Di dijminahiye de, cudahiya şêweya jiyanê ya her du gelan,

³ Redaktorê romanê Kawa Nemir, weke nîşe di dawiya romanê de daye zanîn ku ev kilise, dêra ermeniyan a li Dorgeya Axtamarê ye ku yek ji wan başdırın nimûneyen qesirbendiya kevirkariyê ye.

stratejî û siyaseta rêvebirêñ rûs û tirk, ji aliyê hikûmeta Evdilhemîd ve bikaranîna hêmana olê, pêkarêñ sereke ne. Di vê demê de, ji bo lihevkirin û avakirina têkiliyêñ baş ên kurd û ermeniyan, ji her du aliyan ve hewildanêñ berbiçav pêk hatine. Weke mînak Şêx Ubeydullah û Evdirrehman Bedirxan gazî kurdan dikin ku ew tevilî kuştinêñ ermeniyan nebin, bi ermeniyan re li hev bêñ. Partiya Daşnak jî dixwaze bi kurdan re li hev bêñ û ji serokêñ kurdan re tekliñê hevkariyê dibin. Ew dixwazin li dijî tirkan, kurdan binîñ aliyê xwe. Lêbelê, hewildanêñ serok û rewşenbîrêñ her du gelan pir zêde bi kêr nayêñ, siyaset û pratîkêñ hikûmeta Osmanî bi ser dikevin (Sasuni, 1992, r. 189-211).

Îmaja ermenî, di romanê de di çarçoveya têkiliyêñ malbata Karapêt û malbata serokeşîrê kurdan de hatiye nexşandin. Lê têkiliyêñ her du malbatan ji têkiliyêñ malbatî wêdetir in, ew rasterast weke têkiliyêñ siyasi yêñ nav neteweyan hatine derpêşkirin. Li gor gotara giştî ya romanê, eger dewleta tirk weke dewleteke dagirker bê fikirin, kurd û ermenî weke du neteweyêñ mutefiq li hemberî wê cih girtine. Mala lehengê ermenî, Karapêt, li navenda Ezirganê ye. Ew weke baregeha malbata serokeşîrê kurdan e. Têmûrê Elî, Sultan û Xatê Xanim bêminet diçin mala wî, karê xwe dibînin. Dema ku li Ezirganê karekî wan çêdibe, ew bêyî şêwra Karapêt tevnagerin. Karapêt, kurê wî Sargîs û hevjîna wî Şûşanê hurmeteke bêqisur didin dostêñ xwe. Karapêt, "...him di nava cimaeta Ermeniyan de him jî di nava Kurdish de merivekî bihurmet bû" (r. 20). Karapêt di wê hismendiyê de ye ku hinek dixwazin navbera kurd û ermeniyan xerab bikin. Dema ku Sultan diçe bal milazim, Karapêt li dijî xayîniya milazim, çavgirtî kurê xwe Sargîs û çend lawikên ermenî bi wî re dişîne. Herwiha dema milazim Sultan dikute, Sargîs ji hêrsan digirî. Bandora girtin û kutana Sultan a li ser Karapêt û malbata wî bi awayekî mubalaxayî hatiye vegotin; ew çend ku Karapêt ji bo azadiya Sultan razî ye ku hemû mal û milkê xwe bifiroşe. Di rojêñ teng de ermenî, her li cem kurdan in. Dema ku kurd amadekariya şer dikin, Karapêt çend ermeniyan weke rêber dişîne hawara wan. Ew, li hemberî tirkan yekîtiya kurd û ermeniyan xeyal dike, bi ya wî roja ku kurd û ermenî destê xwe bidin hevûdin, belkî bikarin "Roma Reş" têk bibin: "...dibe ku wextek bê Kurd û Ermenî bibin yek û ji bin wan "qencyîñ" Romê yêng bona Kurdish û Ermeniyan kirine, derkevin." (r. 34).

2.2.5. Şer li Çiya

Roman, zêdetir li ser jiyan û şoreşgeriya qehremanekî serhildanê, Şêx Zayir, bi kûrahî rawestiyaye. Xala navendî ya romanê Şêx Zayir e. Eger peywenda dîrokî tunebûya, li gor romanê, şaxa serhildanê ya bi Şêx Zayir ve girêdayî, dikaribû weke serhildaneke xweserbihata xwendin. Her çend navê serhildêrên girîng ên Serhildana Agirî, Îhsan Nûrî û Birahîm Axa, derbas bibin jî Şêx Zayir, di romanê de ji wan tecrûbetir, jêhatîtir û bi serê xwe hatiye teswîrkirin.

Di romanê de derbarê mijara çawaniya temsîla ermenî de jî xwendevan bi qasî niyet, armanc û hisiyata nivîskar dikare delîlan bi dest bixe. Di yekûna romanê

de hem bi giştî û hem jî di asta lehengan de ermenî bi awayekî erêni, dost, bira, kirîvê kurdan bi cih bûne. Dîsa ermeniyan di çarçoveya gelên bindest û desthilatdarêwan ên zordar, bêînsaf û xwînxar de, cih girtine. Ermenî di peywenda dîrokî, civakî û coxrafik de bi têkiliyên xwe yên bi kurd û tirkan re daxîlî mijarê bûne. Di têkoşîna gelên bindest a li hemberî “Roma Reş” de ermenî li cem gelê kurd cih girtine. Herwiha kurd jî bi her awayî, li pişta gelê ermenî bûne. Eliyê Evdilrehman di vê romana dîrokî de têkiliyên kurd û ermeniyan bi aliyekî derxistiye pêş. Ji ber ku romaneke dîrokî ye, em dikarin jê bipirsin gelo di navbera kurd û ermeniyan de qet pirsgirêk tunebûye? Helbet hebû, weke pirsgirêka araziyan, îstîraqa kurdan a felaketê, pirsgirêka baca ku ermeniyan didan serokeşîrên kurdan û hwd. Lêbelê, Evdilrehman bi tenê bala xwendevanan kişandiye ser çarenivîsa hevpar a kurd û ermeniyan, piştevanî û tevkariya wan a li hemberî dijiminê hevpar (Roma Reş) û dilsoziya wan a ji hev re derxistiye pêş. Bi rastî, ev wêneyê ku nivîskar derbarê ermenî û têkiliyên wan ên bi kurdan re xêz kiriye, dikare ji rastiyeke dîrokî wêdetir weke daxwaz an niyeteke nivîskar bê dîtin.

Destpêka *Ser Li Çiya* (Evdilrehman, 2011), bi prologeke nivîskar a bi çiya, Çiyayê Agirî, Araratê vedibe. Di prologê de, nivîskar têkiliya çiya û têkoşeran vegotkiye, piştgirî, malxweyitiya çiyan a ji bo gelên bindest, aniye zimên. Wî çiya weke parêzkarên şoresserên kurd û ermeniyan teswîr kirine ku li hemberî dewleta dagirkir têdikoşin. Di vê prologa dirêj de, nivîskar dîroka şer û serhildanê kurd û ermeniyan ên li hemberî dewleta tirk, di van şeran de piştgirî û alîkariya wan a ji hev re, polîtika û sepandinê dagirkir û qirêjiyên dewleta tirk bi teferûat vedibêje. Bi rêya serhildan û parastinê kurd û ermeniyan, Çiyayê Agirî bûye semboleke rizgarker. Di heman demê de ew ji bo her du gelan bûye xaleke hevpar a dîrokî. Nivîskar, beriya ku derbasî serhildanê kurdan bibe, ji bo “dijiminê hevpar” baş bide nasandin, tecrûbeya wan a li ser ermeniyan vediguhezîne. Ew, bi dayîna mînakêñ felaket û trajediya ermeniyan, îma dike ku dewleta tirk dixwaze kurdan jî weke ermeniyan tune bike. Gazî çiyayan-bi rastî xwendevan- dike da ku felaketa trajîk ji bîr nekin. Ew di hewldaneke wiha de ye:

Wekî sala 1915an xwînmijêñ Tirk bi mîlyonan Ermenî qir kirine. War û wargehê wan hilweşandine. Talan û şîlandin dane ser wan û ji xwe re birine! Bêînsafîtiya nemirovane gihiştiye wê astê wekî goristan, heykelê kevnar, heta bibêjî derîyê Ermenîyan jî hilweşandine, hedimandine. Li vira gunehê mirîyan ci ye? Wekî mala wan jî heta hetayê hatîye hilweşandin. Decalêñ Tirk bi wan hilweşandinan û paqîjkiran ve xwestine û dixwazin ku şopa Ermenîyan li Tirkîyayê bidine windakirin. Bê şerm ji raya giştî re bibêjin ku wekî di welatê me de Ermen nemane (r. 19).

Evdilrehman, bawer dike ku “tirk” ci jî bikin dê nikaribin “dîroka bi sedan salan a Ermenîyan” bidin jibîkirin. Nivîskar bi xemêñ dîrokî, dixwaze xwendevan

perwerde bike. Ew vedibêje ku dîroka ermeniyan a li ser van erdan, ji ya tirkan kevintir e. Kurd û ermenî weke du gelên kevnar ên vê coxrafayê hatine destnîşankirin. Ermenî û kurd, car caran li dijî tirkan, li rex hev şer kiriye. Lê mixabin ew vê gavê ketine bin şûrê tirkan.

Di vê romana dîrokî de, hewldana nivîskar a ku dixwaze di xwendevanan de hişmendiyekê dîrokî çêbike û bîra civakî zexim bike, pir eyan e. Ew, pir caran bi bibîrxistina “trajediya 1915an”, isbatkirina qewîniya yekîtî û biratiya kurd û ermeniyan û polîtikaya çewisandinê ya li ser kurdan, xwe dubare dike. Tişte balkêş ew e ku gel, şoresger, xayînên kurdan, birayêñ ermenî, paşayêñ dewleta tirk gişt di wê baweriyê de ne ku dewletê qira ermeniyan anîye; lêbelê nikare zû zû weke wan koka kurdan ji rûyê dinê rahêle. Rûsîpiyekî kurd bêtirs ji efserê tirk hesab dipirse: “*Êdî ez nabêjim bi sedsalan we ci anîye serê cînarêñ me yêñ Ermenî? Qet derewan neke?*” (r. 131). Herwiha hevkarekî dewleta tirk, Edo ji walî re li ser şerê bi kurdan re ramanêñ xwe tîne zimên: “*Lê nikare koka Kurdish mîna Ermenîyan bibire.*” (r. 143). Ji nava gel jinek ji Şêx Zayir re tişten ku lê bûye şahid vedibêje: “*Kurê min, nola roja îroyîn rind tê bîra min bê Tirkan ci anîye serê xelkê Ermenîyan vî welatî?*” (r. 170). “*...lê niha vegevîyan ser Kurdish jar ku wana jîfena wan ji vî welatî mihacir kin û paqîj bikin.*” (r. 172).

Gelo, di romanekê derbarê serhildaneke kurdan de çîma ewçend zêde behsa ermeniyan tê kirin. Bi ya me çend sedemên wê hene. Sedema yekemîn meşrûkirina serhildanê ye. Eliyê Evdilrehman, bi rîya medduriyeta gelekî din, neheqiyê dipeyişîne û serhildana kurdan dide ser zemîneke meşrû. Yanê di romanê de tê gotin ku ne bi tenê kurd, gelên weke ermenî heta gelê tirk jî ji çewisandin û zilma dewletê nerazî ne. Tirkîye weke dijiminê gelan ê hevpar derdikeve pêş. Li hemberî dagirkirî û desthilatdariya Tirkîyeyê, Evdilrehman biratiya gelên bindest dipejirîne. Sedema duyem, sempatî û alîkariya rîexistina ermeniyan, Daşnaqê ye ji bo serhildana kurdan. Ji bo ku sedemekê ji bo alîkariya ermeniyan a di Serhildana Agîrî de çê bike, nivîskar loma ewqas vedigere bûyerên salên felaketê. Nivîskar dixwaze peyama ‘kurdan di zemanê xwe de ji ermeniyan re pir qencî kir, lewma ermenî ji bo minetdariya xwe iro li serhildana kurdan xwedî derdikevin’ bide. Lewra jî mînakeke bi vî rengî dide: Ermenîyen Taşteçayê ku bi destê kurdan hatîbûn rizgarkirin, di dema Serhildana Agîrî de carekê rastî şoreşgerên kurd tê: “*Wan sîleh, pere, dûrebîn û gelek tişten mayî ji wan re şandin, wekî “bi van sîlehan bila miqabilî dijminê me herdu neteweyan şer kin û tola me jî ji wan bistînin.*” (r. 270). Sedemeke din jî bi ya me ew e ku Eliyê Evdilrehman dixwaze kurdan ji tawanbarkirina tevlibûna “felaketa ermeniyan” derxe. Bide peyîtandin ku kurd û ermenî hevcîranêñ bi sedan salan in, ew bira, dost û qewmîn hev in û her du jî gelên mezlûm û bêguneh in. Lewra kurdan di bûyerên “felaketa ermeniyan” de cih negirtine, bi tenê ermenî parastine, jiyana wan rizgar kirine. Ev daxwaza nivîskar, di hewldanêñ wî yêng derbarê îdealîzekirina têkiliyêñ kurd û ermeniyan ên salên “felaket”ê û bi awayekî yekalî dayîna bûyerên dîrokî de tê xuyakirin.

2.2.6. Kurdê Rêwî

Kurdê Rêwî (Îbo, 2009), tekane romana Sehîdê Îbo ye. Nivîskar, di sala 1959an de ev roman nivîsand û di 1979an de li Erîvanê weşand; yanê di navbera nivîsandin û weşana wê de bi temamî 20 sal heye. Gelo çîma ev dem ewqas zêde ye, em pê nizanin. Nivîskar di dawiya pirtûkê de diyar kiriye ku “kitêba ewlîn kuta bû”. Ev yeka bi me dide zanîn ku dê berga duyem a pirtûkê jî hebe. Lê heta niha dewama pirtûkê nehatiye dîtin. Bi îhtîmaleke mezin ew an nehatiye nivîsîn an jî hatiye nivîsîn lêbelê wenda bûye.

Nivîskar, ev roman li ser bîranînê dayika xwe nivîsandiye. Romanê mijara xwe ji jiyan, irf û edet, bawerî, rabûn û rûniştin, rewş û pirsgirêkên sosyo-polîtik ên êleke kurdan, Ortiliya, wergirtiye. Ligel dayîna jiyana rojane ya êleke kurdên ezidî, di heman demê de atmosfer û rewşa siyasi, bûyerên girîng ên destpêka sedsala 20an ên derdora bajarê Qersê, di romanê de bi hostetî hatine vegotin. Wê demê Qers di destê Împaratoriya Rûsyayê de bûye.⁴ Lewma di romanê de, bandora qewimandinêş şerê çînî, Şoreşa Cotmehê ya 1917an û dengvadanêñ wê yên di nava neteweyêñ weke ermenî û kurdan de pir ji nêz ve hatine şopandin. Em di dirêjahiya romanê de dibînin ka şoresserên ermenî çawa ji şoresserên rûs hînî propaganda, çalakî û stratejiyêñ şoressê dibin û dûre çawa îcar ew bixwe ji nava kurdan şoresseran digihînin.

62

Di romana *Kurdê Rêwî* de, ermenî li gor angaşta giştî ya vê xebatê hatine nimandin. Ev ïmaj, di paralela rewşa şerê çînî, qewimandinêş Şoreşa Cotmehê, mafêñ gelên bindest û hilweşandina pergala kevin de hatiye rojevê. Ji vî aliyê ve du ïmajên ermenî derdikevin pêşberî me: Li aliyekî ïmajake erêni ku ji temsîla gelê ermenî yê mezlûm û bindest, lawêñ wî yên şoresser û asê, rêber û rêvebirêñ jiyaneke wekhev û adil pêk tê; li aliyê din ïmajake neyînî ya ku ji temsîla axa, beg û milkedarêñ zordest, neheq, kedxwar pêk tê. Di ïmaja erêni ya ermenî de, Sûrîn, weke lehengekî sereke yê şoressa derdora Qersê û Mêrûjan jî weke alîkarekî endamêñ şoressê derdikevin pêş. Di ïmaja neyînî ya ermenî de jî em rastî Karapêt Axa têñ ku ji aliyê zêrandin, pelçiqandina gel ve tu cudahiya wî ji beg û axayêñ kurdan tuneye.

Weke temamiya mijara romanê, temsîla ermeniyan jî li ser dijraberîya gelê bindest û serdestêñ dewlemend, zordest û desthilat hatiye avakirin. Di romanê de cudahiyeñ di navbera gelê ermenî û kurd, rûs an gelekî din de nehatiye pêş.

⁴ Di destpêka sedsala 20an de, serboriya desthilatdariya Qersê gelekî balkêş û guherbar e. Di 1915an de herêma Qersê di nav sînorê Rûsyayê de bûye. Pişti Şoreşa 1917an herêm ji Dewleta Osmanî re tê berdan, di 1918an de dikevin herêma Qersê. Pişti Şerê Cihanê yê Yekem, Osmanî neçar dimînin ku ji erdêñ derdora Qersê vekişin. Dema ku ew vedikişin, Qersê bêxwedî dimîne. Di destpêka sala 1919an de rewşenbir û kesen pêşketî, bi navê Komara Kafkasyayê ya Başûrê Rojava komarekê ilan dikin. Çend mehan idareya Qersê dikeve bin destê wan. Li gor peymanan, wê demê idareyeke ingiliz jî li wir ava dibe. Komar, ji aliyê ingilizan ve ji holê tê rakirin. Di vê navberê de ermenî rewşa xwe xurt dikin. Di sala 1920an de ingiliz diçin û Qersê ji ermeniyan re dihêlin. Bi vî awayî Qersê dibe beşeke Komara Ermenistanê. Di payîza 1920an de rewşa nîhayî ya Qersê diyar dibe. Artêşa Osmanî bi pêşengiya Kazim Karabekir, bajêr digire destê xwe. Pişti bûyerên 1918 û 1920an li Qersê dawiya ermeniyan tê (Alakom, 2015, rr. 59-68).

Cudahî di navbera serdest û bindestan de, herwiha di navbera gelê ermenî yê jirêzê û serdestên ermenî yêng feodal de hatiye kirin. Gelê ermenî û kurd, ji aliyê rewş, şêweya jiyanê, xem û xeyal, pirsgirêkan ve wek hev in, cudahiyeke girâng di nava wan de tuneye. Tu geneşî û mijarêng serêşandî di nava wan de naqewimin, her du gel ji hev hez dîkin, di her aliyê jiyanê de alîkariyê didin hev, dîbin dost û cîranêng qewîn. Nivîskar, tabloyeke bi dilê xwe çêkiriye. Di vê tabloyê de têkiliyêng kurd û ermeniyan, li gor hişmendiya bîrdoziya sosyalist şekil girtiye. Li aliyê din, axayê gundê ermeniyan Karapêt, ji aliyê kedxwari, xirabî, binpêkirina mafêng gundiyan ve tu cudahiya wî ji beg û axayêng din tuneye. Axa, beg û milkedarêng her du neteweyan berjewendperest, şûndemayî û dijminê çînê ne. Bi kurtasî di vê romanê de pale û gundiyan ermenî, ligel ên kurdan û di heman demê de serdestên gelê ermenî ligel ên kurdan di romanê de bi cih bûne.

Di romanê de tê dîtin ku ligel wekheviyêng xwe yêng bi kurdan re ermenî gavek li pêşîya wan in. Em nîşaneyêng vê yekê hem di bizav û çalakiyêng şoreşgerêng ermenî de û hem jî di qewimandinêng şoreşgerî yêng gundê ermeniyan de dibînin. Herwiha, ji aliyê perwerde û rewşenbîriyê ve jî ermenî ji kurdan gelekî jêhatftir û li pêş in. Hem ji ber rêzikêng êzidiyatîyê û hem jî ji ber rewşa civakî, li ba kurdan kesêng xwende hema bibêje tunebûn. Dema karekî xwendinêng derketa, weke xwendin û nivîsandina name an daxwaznameyekê, divê gundiyan kurd biçûna bajarê İdirê, “...vira épêce ermeniyê xwendî hebûn û timê jî bi sidqê qenc dixwestin komek bidana kurmanca.” (r. 30). Heta Sûrênen ermenî diçe gundê kurdan, Qereqoyînê, ji bo ku belkî çend zilamêng kurd bibe li dibistana gundê Zorê qeyd bike da ku rûsî hîn bibin, qet nebe piçekî hînî xwendin û nivîsêng bibin. Lê, pêşeng û giregirêng feodal ên kurdan li dijî teklîfa Sûrênen têng.

Di romanê de, îmaja neyînî ya derbarê ermenî de bi du awayan hatiye pêkanîn. Awayê ewilîn, bi rîya şexsiyeta axayê gundê ermenî, Karapêt Axa pêk hatiye, ya duyemîn bi rîya nêzîkahîya axa, beg û milkedarêng kurd ve hatiye pêkanîn. Ji ber ku ji aliyê feraseta çînî ve li meseleyêng hatiye nêrîn, em rasterast nikarin îmaja Karapêt Axa û îmaja ermeniyan a li ba axa û begêng kurd, weke îmaja neteweyî ya ermenî binirxînîn. Lewra, Karapêt Axa ji bona axatî, milkedarî û zordestiya xwe xerab e, ne ku ji bo ermenîtiya xwe. Û herwiha, çîna serdest dijminêng biratiya gelan e, loma jî axa û begêng kurd derbarê ermeniyan de xwedîng fikrîn baş nînin. Îmaja ermenî ya derbarê Karapêt Axa de hatiye pêşkêşkirin û îmaja ermenî ya di mîjîyê axa û begêng kurdan de şiklek girtiye, di esasê xwe de derbarê hişmendiya kolektîf de jî delîlan dide me. Her çiqas di hemû romanêng kurd ên Sovyetê de ermenî bi piranî bi awayê erenî bêng pêşkêşkirin û têkiliya kurd-ermenî bi awayekî ideal bêng bilêvkirin jî di rastiyê de ermenî li bal kurdan “yêng din” bûn, bivînevêng cudahiya olî, zimanî, çandî di nava wan de mesafeyek pêk anîbû. Lewra ev mînakêng ku ji perspektîfîa çîna serdest ve hatine pêşkêşkirin, heta dereceyekê xwedîng rastiyekê dîrokî û civakî ne. Em dikarin vê yekê di gotinêng Karapêt Axa û Pîr Mîrzo de bi dest bixin.

Dema Zurbe xwe dispêre gundê ermeniyan, gundiyan ermenî Sûrên û hevjîna xwe piştgiriyê didin wî. Lê Karapêt Axa ji mayîna wî ya li gund nerehet dibe, cihêtiye dike navbera her du gelan. Ew ji nêzîkahiya Sûrên ne razî ye, şîretan li wî dike, dibêje: “*Tu ermenî, ew kurd. Teva 'eyan e, niha cim'eta me halekî nemirnejiyî çewa da ne. Eger hereketa te heye, bona azabûna cim'eta me bixebite.*” (r. 61). Ew bi vê yekê namîne rojekê gazî Zurbe dike, bi awayekî wî ji gundê xwe diqewitîne:

Zurbe, tu ku, gundê me ku, tu kurmancî, em ermenî, te çîma gundê xwe yî kal û bavan hiştiye, hatîyî cem me kirîv, xwe gundê me ne xêretxane ye. Xwedê neke, sivê nefereke mala te bimre kê ji me bê serxweşiyê. Dinê me û we timê miqbîlî hev bûne, û timê çîvta li hev dixin (r. 112).

Gotara cudaker, di gotinênd endamên çîna serdest a kurdan de jî tê xuyakirin. Li gor Pîr Mîrzo, mayîna Zurbe ya li gundekî ermenî bê aqîlî ye. Ji gotinênd wî, têkiliya kurd û ermeniyan li ser rûyekî bêewle û xerab dertê pêş: “*Lo, mirîd, tu ku gundê ermeniya ku, miriyê me û wan va li gorê da çîvta hev dixin, tu jî sera pîra çûyî bûyî hewcê wan, dinê 'alem zane, wekî ermenî me ra navine binge.*” (r. 141). Berevajî vê nêrîna Pîr Mîrzo di romanê de, ji têkiliyê kurd û ermenî bi awayekî pozîtîf tê behskirin. Weke mînak li çend cihan (rûpel 49, 93 û 107) tê dubarekirin ku kurd penîr dibin gundê ermenî difiroşin, gundênd kurd û ermenî di rojêن giran de diçin hawara hev û hwd. Herwiha ev mînaka han jî tam li dijî nêrîna Pîr Mîrzo ye: “*Kurd û ermeniyê vê qezayê nasê kal û bava ne. Ewana te 'lî tengasî tevayî kişandine. Mîna bira dest dane destê hev, dilê xwe li ber hev vekirine, halê hev da kewgirîne.*” (r. 49).

2.2.7. Hewarî

Roman, di 1967an de li Erîvanê hatiye weşandin û tekane romana nivîskar e. *Hewarî* (Cindî, 2008), serborî û çarenivîsa kurdêñ êzidî radixe ber çavan. Heciyê Cindî, demeke bi qasî sedsalekê kiriye mijara romana xwe ku ev dem, bi guherînê civakî, polîtîk û coxrafîk ên mezîn dagirtî ye: Dîroka êleke kurdan a nîveka paşîn a sedsalâ 19an û nîveka pêşîn a sedsalâ 20an. Dîrok û serboriya êla Sîpkan tê vegotin.⁵ Di vê dîroka êla kurdan de xwendevan dikare pir bi hêsanî rewşa giştî ya sosyo-polîtîk a demê bibîne. Rewşike ku tê de hestênet neteweperestî gihiştine asta herî bilind, împaratoriyêñ mezîn parça dibin û kêmârêñ bêhêz li ber dest û lingan diçin. Rewş ji bo kêmârêñ Dewleta Osmanî yên weke kurdêñ êzidî û ermenî jî qet baş nebû, ew her bi wêneyêñ revûbez, kuştin, talan, pêpeskirin, çewisandin, nakokî, pirsgirêkan têñ derpêskirin. Di romanê de polîtîkayêñ cudaxwaz û asîmîlekirî yên “Roma Reş” ku di nava

⁵ Navenda romanê li ser koçberbûna êla Sîpkan hatiye sazkirin. Koça êla Sîpkan, yek ji koçen mezîn ên êzidiyan e ber bi Rûsyayê ve. Ev pêla koça êzidiyan di navbera 1879 û 1882an de ji Bazidê -ku di destê Dewleta Osmanî de bû- ber bi rojavaya başûri, herêma Qaxizmanê- ku navçeya Qersê ye û di demêñ dawî de ketibû destê Rûsyayê- ve pêk dihat. Di nava çend salan de êla Sîpkan li warê xwe yê nû çardeh gund ava kirin. Di van gundan de jimara mirovan 1733 bû (Guest, 2012, r. 328).

kurdan de dimeşand, weke hişyariyeke girîng cih girtiye. Dewleta Osmanî, bi karîgeriya polîtîkayêن panîslamîst dike ku kurdên êzidî bînin ser ola misilmaniyê û wan di nava xwe de bîhelinin. Birrek ji êzidiyan ola misilmaniyê dipejirîn, lê birreke din li ser rêzikên êzidiyatîyê dimînin. Kurdên êzidî yên ola xwe neterikandin, weke di romanê de biteferûat hatiye gotin, di dawiya sedsala 19an de ji ber êrîş û polîtîkayêن asîmîlasyon û tunekirinê yên Roma Reş derbasî tixûbê Rûsyayê dibin. Li wir heta Şoreşa Cotmehê ya 1917an bêhnekê distînin. Piştî şoreşê, rûs leşkerêن xwe ji bajarêن Serhedê yên weke Qers, Erzirom, Bazîd, Îdir, Wanê bi şûn de vedikişînin. Û dîsa ew der ji tirkan re dimîne. Kurdên êzidî û ermeniyêن ku carekê ji Romê reviyabûn, dîsa neçar dimînin ku her tiştî li pey xwe bîhelin û bi tenê canê xwe rizgar bikin. Stargeha ku îcar ew xwe lê digirin Ermenistan e. Yêن ji destê leşkerêن Dewleta Osmanî û Alayêن Hemîdî difilitin, di demeke nêz de bi tevlibûna Ermenistanê ya YKSSê dest bi jiyanekê nû dikin. Ew li wir bi alîkariya rewşenbîr û nivîskarêن ermenî di warê wêje, şano, radyo, rojname û hwd. de karên mezin dikin.

Di sala 1917an de şoreş li Rûsyayê rû dide û karîgeriya wê ya li ser herêma Qersê li dijî berjewendiya kurdên êzidî û ermeniyân pêk tê. Herêm careke din dikeve destê tirkan. Helwesta tirkan a panîslamîst û neteweperest, vê carê jî li dijî ermenî û kurdên êzidî berdewam e. Di vê çarçoveyê de qala Alayên Hemîdî tê kirin, tê gotin ku bi navê îslamê Dewleta Osmaniyê “*Alayêñ Hemîdiyê teşkil kir û berî cînarêñ me yên qedîm da.*” (r. 397). Di sala 1918an de kurdên êzidî û ermenî karê xwe dikin, dîsa dikevin ser rîyan, koça xwe ber bi Hayastanê ve dilezînin. Di dawiya romanê de dîmena du jinan, du dayîkan hatiye pêşkêşkirin. Yek jineke kurd e, ya din ermenî ye. Ew ji felaketê direvin, li hêviya ‘hewarî’yê ne ku wan ji wî halê rizgar bike. Ew li derekê digihîjin hev. Pevgihiştina wan a sembolîk weke biratiya kurd û ermeniyân dikare bê şirovekirin. Navê jinika ermenî Hayastan e. Hayastan bi ermenîkî navê Ermenistanê ye. Îmaja Ermenistanê an welatekî hewcedarê ‘hewarî’yê di rewş, helwest û daxwazêن jinekê de şenber bûye. Herwiha, di dîmena pevgihiştina her du jinan de qeder, tirs, hêviyên manendî yên her du gelan hatiye vegotin:

Ew jineke bilind bû, çavêن wê tas, bi zend û bend, lê westiyayî, jitutarketî bû, dergûş li hembêzê. “Ew jî dê ye.” Eva te ji xwe re got û gava ku xwe pê re gihad, fam kir, wekî Ermenî ye, Hayastan. Wê dabû serê rê, wekî navê xwe, namûsa xwe, dergûşa li milê xwe xelas bike ji etabêن giran, ji windabûnê. Dil, got, dilan nas dike, çav çavan. Jinikê jî li wê nihêrî, zarongên wê dît û lehzeyekê halê xwe ji bîr kir, di halê wê de gîro bû û dîsa bi pêş de çûn.

(...)

Hayastanê li Kubarê nihêrî, Kubarê li wê, hêja gihiştine hev,
hev du hembêz kirin... (r. 400).⁶

Hevhembêzkirina her du jinan, bi ya me ji bo têkiliyên kurdên êzidî û ermeniyan ên Sovyetê peyamek e. Jixwe, di paşgotina romanê de Heciyê Cindî qala serborî û destkeftiyên kurdan ên Ermenistanê kiriye. Behs kiriye ku kurd çawa li Ermenistanê hêwirîne, li wir çawa çanda xwe bi pêş xistine û tev li xebatê avakirina sîstema komûnîzmê bûne.

2.2.8. Dê û Dêmari

Dê û Dêmari (1995) ya Egîdê Xudo, wextê ku Yekîtiya Sovyetê qels dibû û ber bi hilweşînê ve diçû, di 1986an de, li Erîvanê hate weşandin. Berhem, ji aliyê hunera romanê ve ji romanên din ên kurdên Sovyetê cihê dibe. Ev roman, bi tenê ji bo agahdarkirina xwendevanan a derbarê zor û zehmetiyên jiyana derbasbûyî, koç û şer, propagandaya sosyalîst û qirêjkirina polîtikayê din de nehatiye nivîsîn. Nivîskar, di heman demê de hewl daye ku xwendevan ji berhema wî heza wêjeyê werbigire.

Di romanê de, tîpekî ermenî yê herî berbiçav Badalyan e. Badalyan, Dîrektorê (serok) mala zarokan (sêwîxane) e. Ew zêdetir bi diyalogan û di siruştıya têkiliyên civakî de derketiye pêş. Ew bi nasnameya xwe ya ermenî, ji lehengên din nehatiye cihêkirin. Tiştekî balkêş e, nasnameya lehengên rûs ên weke Evdokiya û Vîktoryayê hatiye diyarkirin, lê nasnameya lehengên ermenî nehatine diyarkirin. Ev jî dibe ji wê yekê be ku kurd demeke dirêj di nava ermeniyan de jiyane. Lewra, êdî ermenî ji xwe yan xwe ji ermeniyan hesibandine.

Ji diyalogên Badalyan tê fêhmkirin ku ew yekî têgihiştî, dilovan, parêzker û hestyar e. Ew hem zarokên sêwî xwedî dike û wan diparêze û hem jî bi her awayî guhê wî li ser karkerên sêwîxaneyê ye.

Badalyan merivekî dinyadîtí, ceribandî û pedagog bû, zana bû. Bi salêن dirêj wî serkariya êtîmxanê dikir. Ewî hemû karkerên xwe rind nas dikir, lê serhatiya jiyana Karê bi her alî zanibû, qedrê wê ji giştan zeftir digirt. Çend caran pirs pêş de hatibû kû wî bidine ciyên bêtir baş, di cîkî hê bilind de bixebite, lê ew razî nedibû û sebebê neçûyîna wî yek bû; gişkan zanibû, wekî ji bo xwastinêñ awha ew dibêje: “Heta hemû zarêñ kû di êtîmxana min de hene bi firê nexim, tucara ji vir naçim!(r. 62).

⁶ Di vê pevgihiştinê de bêdengiya jinan bala me dikişîne. Ev tesbît, pirsekê ferz dike. Gelo di navbera trajedî û bêdengiya jinan de têkiliyek heye? Lewra, em di gelek metnêñ edebî yén derbarê jina ermenî de wan di nava bêdengiyeke giran û eks de dibînin. Ev jina ermenî bûye şahidê felaketa 1915an û yan bi rîya zewacê yan bi rîya keçmariyê ji felaketê filitiye, bûye misilman. Jina ermenî ya ku bûye lehenga metna edebî, piranî heta dawîya jiyana xwe, bêdengiya xwe didomîne. Li ber sîkratê, yan wek iîrafekê yan weke hesretekê nasnameya xwe ya eslî eşkere dike (Bnr. Delikaya, 2015, rr. 180-192; Akyıldız-Kara, 2015, rr. 58-70).

Bernavkê Badalyan Aşot Mixayîliç e. Karê, bi vî navî gazî wî dike. Badalyan weke kesekî giregir tev li her bûyera girîng a gundê kurdan dibe. Diçe dîlana Ûsiv û Karê, li wir gotinêne xweş dibêje. Dema pirsgirêkên olî li ber zewaca Şaşa û Sîsê derdikevin, ew weke kesekî qedirbilind diçe şîretan li malbata Sîsê dike da ku ew dev ji irf û edetê berê berdin. Di qewimandina her bûyerê de, Karê pêşîya her kesî diçe bal Badalyan, bi wî dişêwire.

Ji xeynî Badalyan, çend kesên din ên ermenî di romanê de derbas dibin. Lêbelê, ew bi tenê weke figur hatine bikaranîn. Em wan ne di nava diyalogan de dibînin, ne jî weke hêzeke diyarker di nava bûyeran de. Derbarê wan de nasandin an şayesandinek jî tuneye. Samsonê kal, memûrekî tenduristiyê yê bitecrûbe ye. Herwiha Sûrîk, Hrant û Hasmîk, hevalên Şaşa ne.

ENCAM

Îmaj ji derve serwextbûna heyînê ye. Îmaj neteweyî jî ji aliyê kes, civak an neteweyekê ve serwextbûna neteweyeke din e. Ji bona ku îmaj kes an neteweyekê li bal kes an neteweyeke din çêbibe, divê di nava her du neteweyan de têkilî û danûstandineke asgarî hebe. Di dirêjahiya dîrokê de di nava gelê ermenî û kurd de têkilî û danûstandinê pêwîst têri dikin ku li bal wan îmajek peyda bibe. Di vê xebatê de me xwest di çarçoveya romanêni kurdi yêni Sovyetê de bibînin ka ermenî çawa hatine temsîlkirin. Herwiha me dixwest em zanibin di van romanen de temsîla ermenî bi karîgeriya kîjan sedem û şertan pêk hatiye. Bi lêkolîn û nirxandinêne xwe, me dît ku di piraniya romanêni kurdi yêni Sovyetê de ermenî, bi awayekî erêni hatine pêşkêşkirin. Tê fêhmkirin ku di avakirina vê temsîla îdealîzekirî de karîgeriya qewimandinê dawiya sedsala 19an, politîkaya Dewleta Osmanî ya li hemberî gelê ermenî û kurdêni êzidî û xwedîderketina li kurdan ji aliyê dewleta Ermenistanê ve û herî dawîn li Ermenistanê dayîna maf û derfetê çandî û perwerdehî yêni ji bo kurdan, bûne sedemên sereke. Ya din jî nêrîneke giştî ya dema Sovyetê ye ku di romanen realîzma sosyalîst de gel bira û dostê hev bûn, nakokî ji taybetiyêneteweyî çênedibûn, ji rewşa çînî diwelidîn. Di van romanen de, şêweya çêbûna îmaj erêni ya ermenî dikare di çend xalan de bê rîzkirin:

Zêdetir di romanen kurdêni nifşê ewilîn de ermenî cih cih ketine nava rîzebûyerên romanê. Ew bi mebesta avakirina bîreke civakî û nejibîrkirina bûyerên giran hatine nimandin. Nivîskarêni nifşê ewil ên weke Erebê Şemo, Eliyê Evdilrehman, Sehîdê Îbo û Heciyê Cindî (ku salêne xwe yêni ewilîn ên zarokatiyê li Dewleta Osmanî derbas kiribûn, di nav bûyerên vê dewletê de dê û bavêne xwe wenda kiribûn û di sêwîxaneyêni Ermenistanê de mezin bibûn) bêyî ku bala xwe bidin ser endîşeyen wêjeyî û estetikî, romanen xwe weke belgeyên dîrokî-civakî nivîsandin. Wan weke rewşenbîren gelekî ku neheqî lê hatiye kirin, xwestine eşâ gelê xwe û eşâ gelên din ên di heman rewşê de bi bîr bînîn.

Di van romanen de tê dîtin ku çarenûseke hevpar, alîkariyêni beramber û minetdariya ji hev, kurd û ermenî nêzî hev kirine. Di vê perspektîfî de nivîskar

hişmendiyeye wiha ji bo xwendevan çekiriye: Kurd û ermenî weke bira li welatê xwe dijiyan, ‘Roma Reş’ qesta erd û ola wan kir. Roma Reş pêşiyê dest avêt ermeniyan, ew kuştin, sirgûn kirin, mal û milkê wan ji destê wan girtin. Di vê rewşê de kurdan alıkariya ermeniyan kir, ew veşartin, parastin, derbasî cihêwle kirin. Dûre dor hat kurdan, tırkan heman zilm û zordarî li kurdan jî kir. Kurd ketin ser rêya koçê, ber bi welatê ermeniyan ve çûn. Ermeniyan ew li li welatê xwe bi cih kirin, li wan xwedî derketin.

Em di qismeke romanên vê periyodê de rastî lehengên şoreşger ên ermenî tê. Tê dîtin ku lehengên kurd xweziya xwe bi van lehengên şoreşger ên ermenî tînin, wan ji xwe re weke model dibînin. Ev lehengên ermenî yên şoreşger ji bo gel şer dikin, gel ronî dikin û pêşerojeke ku dê gel azad be, pêşniyazî wan dikin. Ev lehengên ermenî, hem ji aliyê şoreşgeriyê hem ji aliyê kemalî û zanînê ve weke lehengên baş û qenc hatine nimandin. Herî zêde di romana *Ser Li Çiya* de lehengên ermenî yên şoreşger hatine temsîlkirin. Hatiye destnîşankirin ku ew hem ji bo alıkariya dostênen xwe yên kurd bikin û hem jî heyfa gelê ermenî bistînin, şer dikin.

Pratîkên jiyana rojane an civakî ya ermeniyan zêde nehatiye pêşkêşkirin. Nehatiye gotin ka ermenî çi dikin, çi dixwin, ji hev re çawa ne, ji çi hez dikin, doza wan çi ye û hwd.

Temsîla ermenî di asta lehengê sereke û domdar de nehatiye kirin. Bi tenê temsîla Sûrêna ë *Kurdê Rêwî* belkî hebekî wek lehengekî sereke bê nirxandin. Wekî din ermenî di asta lehengên demdemî û bi piranî di asta figuran de hatine nimandin.

Îmaja ermenî, zêdetir di ser lehengên ermenî yên mîr re hatiye meşandin. Jina ermenî weke lehengeke bi serê xwe, bala nivîskaran nekişandiye. Jina ermenî, kêm caran di van romanen de tê xuyakirin, ew jî weke hevjinâ lehengekî ermenî.

Bi awayekî giştî di van romanen de ermenî, bi piranî bi aliyê erêni ve hatine temsîlkirin. Ermenî weke mirovîn mezlûm, qenc û masûm hatine şayesandin, tu zerara wan ji kesekî re tuneye. Ermenî li gor cîranê xwe yên weke tîrk û kurdan pêşketítir hatine nimandin. Ew kesen dinyaditî, şareza û jêhatî ne. Lehengen ermenî, ji temsîlîn weke mamoste, endezyar, profesor, hoste, şoreşger hatine hilbijartin.

Têkiliya kurd û ermeniyan bi awayekî îdealîzekirî hatiye pêşkêşkirin, pirsgirêk û nakokiyêni di têkiliyêni kurd û ermeniyan de, bûyerên nebaş ên di nava wan de çêbûne, nehatine vegotin. Kurd û ermenî weke dostê bav û kalan, weke du gelên kevnar ên heman coxrafyayê hatine wesifandin. Ew cîran û hevalên qedîm in. Wan her tim ji hev hez kiriye, bûne kirîvîn hev, çûne şahî û şînîn hev. Ermenî pir baş bi kurdî diaxîvin û kurd jî pir baş bi zimanê ermenî dizanin. Di peywenda têkiliyêni kurd û ermeniyan de Dewleta Osmanî weke aktoreke fesad dertê pêş. Roma Reş ji nêzîkahîya kurd û ermeniyan aciz e, dixwaze navbera wan xerab bike. Di demen qewimandin, kuştin û sirgûna ermeniyan de kurdan, gelekî

alîkariya ermeniyan kiriye, beramberî vê ermeniyan jî li Ermenistanê ji kurdan re qenciyên mezin kirine. Demênu ku ermenî û kurd ligel hev jiyane, weke demênu zêrîn, aram û bextewariyê hatine destnîşankirin. Nostaljiyeke nivîskaran –bi taybetî ya Eliyê Evdilrehman- a ber bi wan deman, pir eşkere ye.

Nîqaş an nakokiya olî di van metnan de qet nehatiye rojevê. Ermenî her bi gotara ‘bira’ hatine derpêşkirin. Balkêş e, nakokî û nelihewkirinê kurdêñ êzidî û yên misilman hatine vegotin. Ermenî di peywenda zilm û zordariyekê de têr rojevê.

Di romanen de pratikêne neqenc ên dewleta tirk ên li dijî ermeniyan, bi navbeynkariya koç û revên kurdan, bi berxwedariya kurdan a li dijî hêzên tirkan, tê vegotin. Kurd dema duçarî pratikêne neqenc ên dewleta tirk têr, rewşa ermeniyan, tiştên hatine serê wan bi bir tînin. Pratik û felaketênu ku hatine serê ermeniyan, weke pêşmînakeke rewşa xwe dibînin. Lê sedem û teferûatênu bûyer û qewimandinê wê demê nayêngotin. Bi tenê behsa bûyîna wan tê kirin, lome û nerazîbûnêji wan tê destnîşankirin.

Ji xeynî romana *Ser Li Çiya* di van berheman de bûyera 1915an bi berfirehî cih negirtiye, bi awayekî basit û bi ser re hatiye destnîşankirin. Armanca cihdayîna vê bûyerê ew e ku kurd ji dîrokê ders bigirin. Tiştên ku hatine serê gelê ermenî ji aliyê nivîskarênu kurd ve wek mînak hatine dîtin û wan xwestiye vê mînakê nîşanê xwendevanênu kurd bikin. Da ku xwendevanênu kurd hişyar bin û nehêlin neteweya wî jî têkeve heman rewşê.

Piştî nivîskarênu nifşê ewilîn, di romanen nivîskarênu weke Egidê Xudo de ermenî, di atmosfera jiyana rojane de têr xuyakirin. Ji ber ku bûyeren romanen li Ermenistanê derbas dibin, di romanen de ermenî di nava têkiliyênu rojane de têr qisekirin. Lê dûr û dirêj ji wan nayê behskirin, di vê romanen de gelek caran di asta sîlûetekê de ermenî hatine nîşandan.

ÇAVKANÎ

- Adsay, F. (2013). *Romana Kurdi (Kurmancî) Ya Dîrokî: Bîra Civakî û Nasname*. Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî, Beşâ Ziman û Çanda Kurdi. Teza Mastirê ya çapnebûyî.
- Ahmedzade, H. (2004). *Uluslararası Roman Fars ve Kürt Anlatısal Söylemi Üzerine Bir Çalışma* (wer. Azad Zana Gündoğan). İstanbul: Pêri.
- Akyıldız O.–Kara H. (2015). Çağdaş Türkçe Kurmacada Şiddeti Yazmak: Tol ve Cennetin Kayıp Toprakları. dnd. N. Esen-R. Çeçen (amd.). *Karşılaştırmalı Edebiyat Sempozyumu Tarihselden Güncele Türkçe ve Kürtçe Edebiyatlarında Kimlik Tahyyülleri* (rr. 58-70). Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi.
- Alakom, R. (2015). *1915 Komkujiya Ermeniyan*. Stembol: Avesta.
- Alan, R. (2009). *Bendname Li Ser Ruhê Edebiyatekê*. İstanbul: Avesta.
- Alan, R. (2014). Di Edebiyata Kurdi ya Modern de Lérasthatinê Kolonyal,

- Îmaja Netewî û Klîseyeke Berevajîbûyi. dnd. R. Alan-E. Öpengan (amd.). *Tîr û Armanc, Gotarêñ Rexneyî li ser Edebiyata Kurdî ya Modern* (rr. 49-70). Stenbol: Peywend.
- Boyîk, E. (2004). *Nûra Elegezê Çend Dîdem ji Edebyeta Kurdên Ermenistanê*. Oldenburg: Dengê Êzîdiyan.
- Boyîk, E. (2012). *Çanda Kurdên Sovêtê*. Stenbol: Deng.
- Celîl, C. (2007). *Kürt Halk Tarihinden 13 İlginç Yaprak* (wer. Hasan Kaya). İstanbul: Evrensel.
- Cindî, H. *Hewarî* (2008). Amed: Lîs.
- Delikaya, Ö. (Tîrmeh-Tebax-Îlon-Cotmeh 2015). *Peymana Bêdengiyê û Îşa Kesên Ne ji Me; Rengvedana Jinêñ Ermenîyan di Zûra ya Felat Dilgesû û Bavfile a M. Ali. K. De. Wêje û Rexne*, j. 5. rr. 180-192.
- Evdilrehman, E. (2011). *Şer Li Çiya* (Trans. Hejarê Şamîl). İstanbul: Pêrî.
- Evdilrehman, E. (2004). *Xatê Xanim*. Stenbol: Belkî.
- Filizok, R. Resim Okuma-Îmaj Okuma. 20.10.2014. <http://www.ege-edebiyat.org/wp/?p=2190>.
- Guest, John S. (2012). *Yezidilerin Tarihi, Melekê Tawus ve Mishefa Reş'in İzinde* (wer. İbrahim Bingöl). İstanbul: Avesta.
- Güvenç, B. (2010). *Türk Kimliği Kültür Tarihinin Kaynakları*. İstanbul: Boyut.
- Hassanpour, A. (2005). *Kurdistan'da Milliyetçilik ve Dil 1918-1985* (wer. İbrahim Bingöl, Cemil Gündoğan). İstanbul: Avesta.
- İbo, S. (2009). *Kurdê Rêwî* (Trans. Xanna Omerxalî). Stenbol: Avesta.
- Millas, H. (2005). *Türk ve Yunan Romanlarında “Öteki” ve Kimlik*. İstanbul: İletişim.
- Sasuni, Garo (1992). *Kürt Ulusal Hareketleri ve 15. yy'dan Günümüze Ermeni Kürt İlişkileri* (wer. Bedran Zartaryan, Memo Yetkin). İstanbul: Med.
- Şamil, H. (2005). *“Sovyet kurtleri” hakkında tarihi ve güncel inceleme diaspora kurtleri*. İstanbul: Pêrî.
- Şemo, E. (1988). *Berbang* (Trans. Rêber Dilşêr). Stockholm: Kurdistan.
- Şemo, E. (2007). *Dimdim*. Stenbol: Lîs.
- Şemo, E. (2007). *Hopo*. Stenbol: Lîs.
- Xelîl, T. (2014). Antologiya 35 helbestvan û nivîskarêñ kurd ên Sovyet. İzmir: Na.
- Xudo, E. (1995). *Dê û Dêmarî* (Trans. Nacî Kutlay). Stockholm: Nudem.



DI EDEBIYATA YARSANAN DE KELAMÊN JINAN: MÎNAKA REMZBARÊ*

Sevda ORAK REŞİTOĞLU**

KURTE

Kurdên yarsan xwedî edebiyateke pir kûr û berfireh in û ev edebiyat parçeyeke girîng a edebiyata kurdî ye. Lê ev edebiyat ji ber çanda xwe ya veşartî di nav kurdan de pir nayê zanîn, ji ber vê, xebatê berfireh li ser nehatine kirin. Edebiyat pîroz a yarsanan, di destpêkê de devkî bûye û weku kelam ango gotinên pîroz hatine gotin. Di edebiyata yarsanan de yên ku xwediyyê kelam in ne tenê mér in. Jin jî xwedi cihekî girîng in. Ev girîngî, wan ji jinê çandên din ên weku misilman vediqetîne. Ev taybetiya jinê yarsan ji baweriya wan pêk tê. Li gorî bawerî û kevneşopiya yarsanan her zindî pişî mirina xwe di bedena kesekî din de careke din tê dinyayê. Di vê baweriyê de zayend ne girîng e, lewra kesa/ê ku dimire, wextê ku careke din tê dinyayê, dikare bi zayendeke din bê. Ji ber vê jî jinê ku xwedi kelam in, weku zayend dibe ku di jiyana xwe ya berê de weku mér hatibin dinyayê. Wextê ku em bi vî çavî lê dinêrin, em dibînin ku tu girîngiya zayendê tuneye li bal yarsanan, yanî jin û mér wekhev hatine ditin û jinan bi kelamên xwe dengekî din li edebiyata yarsanan zêde kiriye û ev edebiyat dewlemendir kiriye.

Bêjeyêne sereke: Yarsan, edebiyata pîroz, jin, kelam

ABSTRACT

“The kalams of the women in the Yarsan literature: Example of Remzbar”

Yarsan Kurds have a rich literature that constitutes an important part of the Kurdish literature. Due to concealment for outsiders it has not been exposed to any serious investigation. The Yarsan sacred literature has been orally transmitted through religious *kalâm* (divine discourse) from generation to generation. The narrators of Yarsan literature body were not only male; female narrators had an important position in transmitting the Yarsan *kalâm*. Women's active role in Yaresan *kalâm* narration originates from the belief in *dunadun*; every individual will resurrect in another body; next time maybe a female could resurrect in the shape of a male or vice-versa. Thus, in comparison with neighbouring societies, the Yarsan women have had an eminent position, particularly within its religious community. Consequently, the Yarsan literature has been enriched by a gender-

* Ev gotar li ser bingeha teza mastirê ya Sevda Orak Reşitoğlu (bi şêwîrmendiya Shahab Vali) ya çapnebûyi hatiye amadekirin. Bnr. Sevda Orak Reşitoğlu, *Helbestvanên Jin di Edebiyata Yarsanan de*, Mêrdîn: Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Teza Mastirê ya çapnebûyi, 2016.

** Lêkoliner, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Beşa Ziman û Çanda Kurdî

perspective, unprecedented in the regions. This investigation is an attempt to shed light on the women's role in Yarsan sacred literature.

Keywords: Yarsan, sacred literature, woman, kalām, dunadun

DESTPÊK

Kurdên yarsan ku bi şasî weku Ehl-i Heqq jî têne nasîn, li herêmên Îranê yên weku Kermanşah, Îlam û Loristanê jiyane, ji xeynî Îranê li Iraqê li bajarêن weku Kerkûk, Xaneqîn û Silêmaniyê jiyane. Piraniya yarsanan kurd in. Lê li Azerbaycanê û li derêن din ên Îranê jî çend civakêن yarsanan hene (Vali, 2011, r. 11).

Bingeha edebiyata yarsanan ji helbestan pêk tê ku ji aliyê bawermendan ve weku kelamên pîroz tê qebûlkirin. Edebiyata yarsanan, weku cureyên din ên edebiyata kurdî, bi devkî dest pê kiriye û nifş bi nifş bi vî awayî belav bûye. Bi gelemerî edebiyata kurdî, di warê klasîk de bi lêkolînan an jî bi tîpguhêziyan gihiştiye astekê û xwe gihandiye iro. Lîbelê, edebiyata yarsanî her çiqas kûr û dewlemend jî be, ji xeynî çend lêkolînan xebat li ser nehatiye kîrin, nemaze li ser kelaman. Ev gotinêن pîroz ên yarsanan, ango kelamên wan, heta sedsala 13-14emîn nehatine tomarkîrin û qeydkîrin, lewma ihtimala wendabûna hin kelaman jî heye.

1. NERÎNEKE GELEMPERÎ LI SER BÎR Û BAWEWIYA YARSANAN

72

Dînê yarsanî, yek ji dînêne kêmâr ên kurdan e ku bi piranî li rojhilatê Kurdistanê belav bûye. Ev dîn li gorî misilmantiyê (sunnîtî û şîtiyê) ji aliyê kêmîr kesan ve hatiye qebûlkirin. Her çiqas kokêن wê bigihîje çanda Îranê ya beriya îslamê jî yarsan xwedî sistemeke dînî ya serbixwe ne (Hamzeh'ee, 2008, r. 28). Ji peyva "serbixwe" dikare bê famkirin ku her çiqas weku gel nêzî misilmanan jiyabin jî çand û baweriya wan ji ya îslamê pir cuda ye.

Yarsanî hem dînê xwe hem jî çanda xwe, bi awayekî veşartî jiyane da ku li derive belav nebe. Weku ji kelaman ango ji gotinêن pîroz jî diyar dibe, yarsan xwedî dîrok û çandeke pir kevin in, lîbelê li ser çand û dîroka wan agahiyeke zelal tuneye, lewra li gor kevneşopa wan, yarsanan kelamên xwe heta serdema Sultan Sehak, yanî heta sedsala 13-14an, tomar nekirine. Li gorî yarsanan di serdema Sultan Sehak de baweriya yarsanî şiklê xwe yê herî dawî girtiye, kelam û gotinêن wan ji aliyê Pîr Mûsiyê nivîsevanê Sultan ve hatine tomarkîrin.

Dînê yarsanî, dînekî serbixwe û sistematîzekirî ye ku herî zêde li ser bingeha bawerî û bingeha *dûnadûnê*, ango reenkarnasyonê, ava bûye. Li gorî vê baweriye, her zîndî piştî mirina xwe, careke din tê dînyayê. Lê di bedena însanekî yan heywanekî de têne dînyayê an jî weku giyayekî xuya dibin. Ji ber vê ye ku koçkirina kesekî, weku mirin nayê dîtin di çanda yarsanan de. Li şûna mirinê, têgeha "kirasguhertin"ê tê bikaranîn.

Baweriyeke din a girîng teofanî an jî *tecellî* ye ji bo yarsanan. Têgeha tecelliyyê, ku zuhûra hebûnêن îlahî ifade dike, bûyereke pir berbelav e di hin baweriyan de.

Li gorî vê têgehê, hebûneke xwedayî an jî xwedayek, dikare di mekanekê de, di objeyekê de, di hebûnekê de an jî di însanan de carinan bi temamî carinan jî ne bi temamî, xuya bibe. Dikare bi însanan re têkeve têkiliyê an jî fermanan bide wan (Sinanoğlu, 2011, r. 243-245).

Di kevneşopa yarsanan de yek ji baweriyêن girîng jî *ferîştenasî* ye. Ferîştenasî li cem yarsanan yek ji sîstema perestinê ye. Weku Vladimir Minorsky diyar dike, li gorî kevneşopa yarsanan, civaka yarsanan ji Heft Ferîşteyêن Sereke pêk hatiye, ji avabûna cîhanê û vir de (1964, r. 251).

Herwiha di her serdema xwenîşandanê de yekî ji wan xwe nîşan daye, ango di heft dewran de xwenîşandana îlahî pêk hatiye. Li gorî kevneşopa yarsanan şes ferîşteyêن sereke hene û di her serdemê de ev ferîşte xwe nîşan didin. Digel van şes ferîşteyân, Sultan Sehak wan temam dike û ev sistem weku *Heften* tê binavkirin. Li gorî Hamzeh'ee (2008, r. 162) yarsan ji wî Xwedayî bawer dikan ku bikare li ser rûyê erdê tecellî bike. Li gorî vê baweriyê, bi heft tecelliyan gelek tecelliyan biçük jî pêk hatine.

Weku me li jor behs kir, di her tecelliya Xwedê de ferîşteyêن wî jî xuya bûne weku alîkarêن wî. Ev ferîşte bi piranî mîr in, lê jînêن weku Remzbar an Perî Xanim jî di nav *Heften* de hene. Weku Shahab Vali diyar dike, bi baweriya Tebîbî, (Vali, 2011, r. 54) li gorî doktrîna yarsanan, her ferîşteyekî sereke, îlahî ye û her yek xwedî berpirsiyariyeke taybet e di dinyaya madî û manewî de. Yanî her ferîşte xwedî peywrekê ye û ev her yek bi van pêywirêن xwe alîkariya Xwedê dikan. Her şes ferîşte di serdemekê de xuya nabin, lêbelê wextê ku her şes bi hev re xuya dibin, dîrokeke nû ango serdemeye nû dest pê dike. Pîr Binyamîn, Dawid Dodanî, Pîr Mûsî, Mistefa Dawidan, Xatûn Dayrak (Remzbar), Baba Yadîgar û Sultan Sehak her heft ferîşteyêن sereke ne.

1.1. Edebiyata Pîroz a Yarsanan

Yarsan xwedî edebiyateke pir xurt û kûr in. Bingeja vê edebiyatê ji gotinêن pîroz ên Xwedê, ferîşte û pîran pêk tê û ev gotin weku *kelam* têne binavkirin, yêñ ku *kelaman* dibejin jî weku "yêñ xwedî kelam" têne zanîn. Li gorî ku Ziba Mir-Hosseini (2014a, r. 268) diyar dike, *kelam* bi awayekî îlahî derketine û "gotinêñ pîroz" in ku nifş bi nifş bi awayekî devkî belav bûne (Ji bo diyarkirina cihê kelaman, li edebiyata Goranî ya klasîk bnr. Adak 2014, r. 134-136-151-152). Herwiha Mir-Hosseini (2014b, r. 213) dîsa diyar dike ku mirov dikare di *kelaman* "gotinêñ pîroz" de dîrok, kok û sedemêñ ayînêñ veşartî bibîne, bi kurtasî mirov dikare *sedema bûyînê* bibîne. Di vê edebiyatê de mirov dikare bi piranî hêmâyêñ jiyana civakî, rolêñ Xwedê û ferîşteyân, bingeja yarsanî û baweriyê bibîne. Kelamên yarsanan, bi awayekî melodik hatine gotin û car caran kelam bi tenbûrê re jî hatine gotin. Ev kelamên ku bi tenbûrê re hatine gotin, bi taybetî ji bo ku bi tenbûrê bêne gotin hatine şandin. Derbarê destpêka vê edebiyatê de dîrokeke zelal tuneye di çavkaniyan de, lewra demeke dirêj, ev kelam nehatine tomarkirin, lêbelê li gor kevneşopa yarsanan, kelamên pîroz bi

Behlül (ss. 8emîn) dest pê kiriye, bi Baba Serheng (ss. IXemîn?), Şah Xoşîn (ss. XIemîn?) û Baba Nawis (ss. XIemîn?) dewam kiriye û di serdema Sultan Sehak de bi emrê Sultan ev kelam ji aliyê Pîr Mûsî ve hatine tomarkirin. (Vali, 2011, rr. 72-73). Pîr Mûsî, weku katibê Sultan tê nasîn û kelamên wê serdemê û serdemên berê xwe, hemû ji aliyê wî ve hatine qeydkirin ango tomarkirin. Li gorî Mohammad Mokri (1977, r. 16), sedema qeydnekirina van kelaman ew e ku pîroziya xwe wenda nekin.

Kelamên yarsanan bi piranî, bi zaravayê goranî hatine gotin, lêbelê yên ku bi soranî û farisî hatine gotin jî hene. Herwiha modeleke van kelaman tuneye. Dikarin ji beytekê, ji sê rêzikan, ji çarînan an jî kelamên pir dirêj pêk bê. Armanca van kelaman ne ew e ku helbest bê afirandin an jî metneke edebî bê nivîsîn, lewma beytek bi tenê jî bes e ji bo ku kesek bibe pîroz. Kelamên yarsanan hem bi awayekî monolog hatine gotin ku xwediyyê wan hest û baweriya xwe anîne zimên hem jî bi awayê diyalogê hatine gotin ku weku axaftina bi kesên din re hestêن xwe anîne zimên. Şêwaza wan a helbestî ji ya edebiyata farisî pir ne dûr e û ev îlahî bi awayekî estetîk xweîfadekirina wan e (Vali, 2012, r. 57).

Divê em eşkere bikin ku di kelamên yarsanan de têgeha wextî tuneye. Di kelamekê de, yê ku kelamê dibêje, dikare di heman demê de hem behsa paşerojê, hem behsa niha hem jî behsa pêşerojê bike. Herwiha dikare behsa dûnên xwe bike ku di demên cuda de û li cihêن cuda xuya bûne.

Di her serdemê de *kelamên pîroz* têne gotin û cihê ku ev *kelamên pîroz* têne nivîsîn, weku *defter* tê binavkirin (Vali, 2014, r. 32). Deftereke her serdemê cuda ye û bi navêن cuda têne zanîn. Weku mînak deftera serdema Behlül weku *defter-e dewrey-e Behlül* tê zanîn û deftera serdema Sultan Sehak jî weku *defter-e Perdiwerî* tê zanîn (Vali, 2014, r. 32). "Perdiwer" pira sembolîk e ku mirov pê derbasî dinyaya din dibe. Di heman demê de iro li Hewramana rojhilatê Kurdistanê navê cihekî ye. Girîngiya van defteran ew e ku gotinêن pîroz ên Xwedê, ferîste, kesên pîroz û pîran tê de hatine tomarkirin.

2. DI KEVNEŞOPA YARSANAN DE STATUYA JINÊ Û GIRÎNGIYA WÊ

Jin xwedî statuyeke girîng in di kevneşopa yarsanan de, ji ber ku ji mîran kêmîtir nayêن dîtin, bi wan re xwedî mafêن wekhev in. Ji bo hin jinan "heq" û "sîrr" hatiye dayîn ku ev jî bi têra xwe girîngiya jinan nîşan dide. Jinêن yarsanî, ji ber baweriya xwe, li gorî jinêن misilman, xwedî jiyanekê azadtir in. Dikarin *kelaman* bibêjin, li tenbûrê bidin û biçin *Cemê*. Lê her çiqas biçin *Cemê* jî nikarin li wir *kelam* bibêjin. Weku me diyar kir, li gorî baweriya yarsanan, jiyanâ mirovan li ser *dûnadûnê* ava bûye, yanî piştî mirina kesekî, ruh dikare di bedena yekî din de xuya bibe. Ji ber vê baweriye, ruh heke ji bedena mîrekî derketibe dikare têkeve bedena jinekê, berevajî vê jî mimkun e. Ev taybetiya *dûnadûnê* dihêle ku jin û mîr di baweriya yarsanan de wekhev bêne dîtin.

Herwiha ji ber ku zayenda berê ya kesekî nayê zanîn, dikare bê gotin ku li cem yarsanan girîngiya zayendê tuneye.

Di kevneşopa yarsanan de keç û kur wekhev têne dîtin û Sultan Sehak di kelameke xwe de cih dide wekheviya keç û kuran jî. Li gorî wî di navbera keç û kuran de tu cudahî tuneye. Sultan dêya xwe, Xatûn Dayrak, weku dêya hemû keç û kuran dibîne. Wiha jî diyar dike kesê ku cudahî têxe navbera keç û kuran, di dawiya dinyayê de ew ê tiştên nexweş bê serê wî, yanî bi şûrê tûj dê serê wî bê jêkirin:

Kenaçe û kurî
Tewfirêşan niyen kenaçe û kurî
Beşê Sultanin ezel hewerî
Xatûne Dayrak î beşîş xirî
Pûşakê Yarî ew balaş birî
Biyawe dayan pûran û hurî
Her kesî biwaçû kenaçe û kurî
Meweziş we dem mewdayê key birî

(Tahirî, 2009, r. 206)

75

Weku me berê jî got, kelam xwedî girîngiyeke pir mezin e li cem yarsanan. Kelam ji aliyê Xwedê, ferîşte û pîran ve ji bo kesayetên mezin têñ û ev kesayet jî van kelaman dibêjin. Li cem yarsanan kesên ku xwedî van kelaman in, ne tenê mîr in, yên jin jî hene ku xwedî kelam in û ji ber vê ye ku jin di çanda yarsanan de xwedî statuyeke girîng in.

Di kevneşopa yarsanan de her çiqas me behsa wekheviya jin û mîran kiribe jî helbet hin îstîsna hene. Jinê yarsan, di xwendina kelaman de azad in, lîbelê li ayînên dînî, ango li *Cemxaneyê* yanî cihê îbadeta wan, nikarin tevlî *Cemê* bibin. Lî li dijî vê, xwarina ku li *Cemê* tê belavkirin, ji bo her kesî wekhev tê parvekirin, jin jî tê de.

Di dînê yarsaniyê de xweseriyeke din a jinê ew e ku li *Cemê* cihê sembolîk ê jinekê jî heye û ew cih ê Remzbar e. Remzbar jî li wir weku ferîşte cihê xwe digire û her dem li wir hazir e. Xanê Elmas wextê ku cihê Remzbarê li *Cemê* diyar dike, dibêje gel ji bo karêñ xwe divê ji wê rica bikin (Xan Elmas, nusxeya çapnebûyî, rr. 10-12):

Cemnîşinî Cem
Nukteyî bişniwin ji erkanê Cem
Cism ha ve huzûrê Sultan Sercem
Çenî Çwar Cesed xaseyê muhterem
Çwar guşey Cem çenî fewqê Cem
Cagey Yaranin qayibin we çem
Eger je Yaran biwînan we çem
Key quđret darû binîşû we Cem
Fewqe Cem textê quđretê bîm e
Cageyê Sultanim Padişahê Ezîm e
Guşeyê rasê Cem cayê Binyamîn e
Mudam we lawleddem we amîn e
Rustemê sermest yelê pîlten
Sahivê zor û zat gurzê neh sed men¹
Î guşe cageyê Dawid eyan e
Gîw ê dilawer baş e Keyan e
Feryadresê teng Dawidin Yaran
Amîn newînu xilel je karan
Î guşe cageyê Munşiyê Defterin²
Je kul hesavat ew baxever in
Munşî Pîr Mûsî sahîvtûmarin
Xeyrûşernivîsî ber ta we bar in
Guşeyê çepê Cem baş kemandarin
Yanî Mistefâyê pir qîn û qar
Î guşe cagey Xatûn Rezbarin
Recaçiyê Yaran dest bi kirdarin
Binîşan we Cem Yaran pey müşkil
Ewan cayê wişan nemekin qafil

¹ "men"pîvana giraniyê ya wê serdemê ye.

² Munşiyê Defter yanî Pîr Mûsî, yek ji leqabêñ wî jî diyar e ku Nivîsevanê Defter e.

Herwiha li gorî doktrîna yarsanan, girîngiya mîrêن xwedî kelam û kelamên wan ji aliyê pîrozbûnê ve çiqas zêde be, ya jinan jî ew qas zêde ye. Ji ber vê jî kelamên jinêن yarsanan nehatine piştguhkîrin û ew jî pîroz hatine qebûlkîrin. Kelamên jinêن xwedî kelam, weku hemû kelaman hem bi awayekî monolog hatine gotin ku hest û fîkrêن xwe gotine, hem jî bi awayê diyalogê hatine gotin ku hest û hîzrêن xwe bi dirûvê axaftina bi yekî re anîne zimêن. Herwiha di nav van kelaman de yên pir dirêj jî hene, yên ku ji du beytan pêk têن jî hene. Mijara van kelaman, bi piranî bawerî ye ku em dikarin tê de bûyerêن weku dûnadûn, tecellî û hezkirina Xwedê bibînin. Weku din em dikarin xweza, dîrok, hestêن derûnî û jiyanê jî bibînin di van kelaman de (Orak Reşitoğlu, 2016, r. 39).

2.1. Weku Jineke Pîroz û Xwedî Kelam Xatûn Dayrak (Remzbar)

Di kevneşopa yarsanan de gelek jinêن xwedî kelam hene: Dayê Tebrîzê Hewramî, Celale Xatûn Loristanî (Mama Celale), Reyhan Xanim Loristanî, Fatime Loreyê Goran, Liza Xanim Caf, Xatûn Meyzerd, Dayê Xezan Sergetî, Xatûn Dayrak (Remzbar), Pîr Nazdar Xatûnê Şîrazi, Nêrgiz Xanim Şahrizûrî, Xatûn Zer Banû Derziyanî, Semen Xanimê Dewdanî. Hebûna van kelambêjên jin di nav kelamên pîroz ên yarsanan de ji bo girîngiya jinêن yarsanan delilek e (Orak Reşitoğlu, 2016, rr. 39-117).

Yek ji jinêن ku di kevneşopa yarsanan de xwedî cihekî pir girîng e, Xatûn Dayrak ango Remzbar e. Girîngiya vê jinê di kevneşopa yarsanan de ew e ku Remzbar dêya sembolîk a Sultan Sehak e. Herwiha taybetiyeke wê ya din jî ew e ku bi awayekî bakîre, ango bi awayekî mucîzewî Sutan Sehak anîye dinyayê li gorî kevneşopa yarsanan. Remzbar di kelamên xwe de behsa bardariya (ducanîbûn) xwe, bekareta xwe, ferîsteyêن Xwedê yên serdema xwe û nêrîma civakê ya li hemberî bardariya xwe anîye zimêن. Ji xeynî van Remzbar yek ji ferîsteyan e ku ji aliyê Sultan Sehak ve, Heq ji bo wê hatiye dayîn. Herwiha Remzbar xwedî Sirr e, hatina Sultan Sehak weku sirrekê jê re hatiye dayîn, lewma di kelamên xwe de behsa van sirran jî dike. Sultan Sehak, Pîr Binyamîn û Pîr Mûsî jî li ser Remzbar gelek kelam gotine. Mixabin em ê nikaribin li ser jiyana wê, agahiyeke zêde bidin, tunebûna berhemêن li ser jiyana jinêن yarsanî, me di vî warî de kêm dihêle.

Li gorî kevneşopa yarsanan Xatûn Dayrak di sedsala 15emîn de jiyaye û li Helwanê hatiye dinyayê. Keça Huseyn Beg Celd e. Yek ji figurên herî mezin e ji bo yarsanan, lewra dêya sembolîk a Sultan Sehak e û kurê xwe bi awayekî bakîre anîye dinyayê. Li gorî kevneşopa yarsanan Remzbar yek ji ferîsteyêن *Heftan* e. Remz wateya sirrê dide, yanî navê Remzbar ji vir tê, ya ku sirr weku bar girtiye ser milêن xwe.

Remzbar weku dêya Sultan Sehak jî xwedî kesayetîyeke mezin e. Li gorî kevneşopa yarsanan, jidayîkbûna Sultan Sehak, ji aliyê Baba Nawis ve tê işaretkirin. Piştî ku Baba Nawis, xwe dikişîne xeybê, Pîr Binyamîn, Pîr Mûsî, Dawid û Mistefa Dawidan diçin herêma Hewramanê û li gundê Berzenceya

Şehrezûrê, li benda hatina Sultan dimînin. Li wî gundî, diçin li mala Şêx Îsî bi cih dîbin û jê re dibêjin ku divê bi Dayraka keça Huseyn Beg Celd re bizewice. Şêx Îsî qebûl nake, lewra hem pir kal bûye hem jî gelek zarokên wî yên mezin hene. Dawiya dawî qebûl dike, lê vê carê bavê Dayrak, Huseyn Beg, qebûl nake, lewra naxwaze keça wî bi kalekî re bizewice. Bi israran, herî dawî her du alî jî qebûl dîkin û wan dizewicîn. Piştî demekê Dayrak bardar dibe. Di kelamekê de bardariya Dayrak tê diyarkirin û di wê kelamê de şâhiya xuyabûna Sultan bi xwezayê tê girêdan. Li gorî vê kelamê, wextê ku Sultan weku ronahiya pîroz dikeve zikê Dayrakê, dengê birûskê tê ji çiyayan û digihîje guhê ferîşteyan. Herwiha ferîşte jî şabûna xwe tînin zimên û ji bo pêşwaziya Sultan ji çiyayan dadikevin:

Eywet meremû:

Sedayê re'd û berqî weharan ama ne kêwan

Ce betnê Dayrak peyabî Sultan

Quriştê hewrê weharan piçan ne kêşan

Ya wa ve guşê Çwar Tene Yarî ne bûsan

Dawid vatiş Mistefa derya muradiman

Melekan çe ser meçerû we kêwan we rewan

(Huseynî, 1382/2003, r. 10)

Nasîn Huseyn Beg ên ku li hemberî vê zewacê bûn, ji Huseyn Beg re li ser Dayrak tiştên nexweş dibêjin, lewra li gorî wan ne mimkun e ku zarokek ji vî kalî çêbe û li gorî wan ev zarok ji kesekî din e. Li ser vê Huseyn Beg ji keça xwe pir aciz dibe û tiştên nexweş jê re dibêje, heta wisa nîşan dike ku heqê wê û wan derwêşan kuştin e ji bo ku ji xelqê re bibin îbret. Herwiha sirra keça xwe jî tîne zimên û ji ber vê jî aciz dibe, lewra Remzbar her tim behsa sirrekê dike, lêbelê vê sirra xwe eşkere nake. Herwiha bavê wê dîsa jê bawer nake û li gorî wî weku Meryem keseke din tuneye li vê cîhanê:

Sezat kuştin e çenî derwîşan

Ta bewî be lawme pêy xelkî Sîrwan

Tu her remzê Yarî marî we zuwan

Bicîge Meryem kesî weku to naman vê cihan

(Huseynî, 1382/2003, r. 9)

Ji ber ku Dayrak dizane ev sirra Yar (Xwedê) e, wextê ku bavê wê jê hêrs dibe, Dayrak her dem vê sîrrê tîne bîra wî, lêbelê sirra xwe tu car eşkere nake. Lewma jî bavê wê aciz dibe ku her dem dibêje ev sirrek e û ji ber vî tiştî qet şerm nake.

Li gorî wê, divê xelq şerm bike ku li ser wê tiştên nexwêş dibêjin. Wiha berdewam dike ku Xwedayê ku heft asîmanan xuliqandiye, ev sirr daye derwêşen xwe, ji ber vê jî ew derwêş bê guneh in:

Xelkan bikerdî dî heyâ û şerman
 Herfî bêcayî mawerdî we zuwan
 Min wîm sirrim, sir minin remzim nizanan
 Şermêm nîya mirdantan biyan biwînan
 Wu Xwuwaye xelqîş kirdin hewt asûman
 Ça esrarî Heq we ladê derwêşan nîya gunaşan
 (Huseynî, 1382/2003, r. 9)

Wextê ku Sultan çêdibe, Dayrak behsa Şahbazê Spî dike ku Şahbaz ji bo hatina Sultan Sehak nîşaneyek e. Dayrak dibêje ku Şahbaz ji cihê xwe yê veşartî xuya bûye, yanî weku mizgîniyek ji cihê xwe biriqiye:

Ferzendê emîn ferzendê emîn
 Şahbazê sifid mederay ne kemîn
 Ni ser qulleyê erş amay we zemîn
 (Huseynî, 1382/2003, r. 14)

Remzbar di kelameke xwe de behsa hatina xwe ji hevrişîmê dike, behsa bavê xwe yê Emîr û dêya xwe Zer Xatûn dike, herwiha behsa Sultan Sehak jî dike ka dema çêbûye, ci bêhnfirehiyeke mezin pê re peyda bûye. Lewra weku me li jor behs kir, nasêñ wê, li ser wê tiştên ne xweş gotine, lê bi hatina Sultan, her tiş kifş bûye. Herwiha behsa şabûna xwezayê jî dike ku bi hatina Sultan, gul û kulîlk bi bêhna xwe ya xweş, şabûna xwe nîşan dane. Remzbar behsa *dûnêñ* xwe jî dike ku di vê kelamê de dibêje ku hê di serdema keviran de hebûye û vî tiştê balkêş jî dibêje ku kevir ji wê ye û ew bixwe ji kevir jî pîrtir e. Di vê kelamê de behsa navê dê û bavê xwe, serdem bi serdem behsa kirasguhertinêñ xwe û bi wan guherînan jî behsa navêñ xwe dike:

Amayim çê herîr amayim çê herîr
 Azîz vî remzit amayim çê herîr
 Dadam Zer Xatûn babûmin Emîr
 Pa yanû Îsî to man bî destgîr
 Ça gul û bostan kirdman ebîr
 Îna mîwanî guwayê ezel nûr

Na hecer jiyan namim bî Mûşîr
 Hecer ne eze ez ne hecer pîr³
 Namim Damiya bî na Deycûr twîr
 Ça Serendîlit⁴ bî namim Zermîr
 Ez pakim kird xak kîşam ne qelbîr
 Xizmet û pakîn usa bî dilgîr
 Kirdîn xizmet we xakê zerd besîr
 Ça Serendîl da niyaman tekbîr
 Hem bîm we ferzendê beşer beşîr
 (Huseynî, 1382/2003, r. 306-307)

Remzbar di hin kelamên xwe de behsa wesfîn ferîsteyan jî dike. Di vê kelama xwe de behsa du ferîsteyan dike, weku dibêje Dawid weku delîl û wekîl, Pîr Mûsî jî weku mûrsîd tê dîtin. Herwiha behsa cihê heriya ku însan jê çêbûye dike. Di kelamê de dibêje ku cihê "heriya zer" ango "Zerdegil"⁵ li çiyayê Serendîlê ye û cewherê benî Adem ev heriya zer e:

Dawid Delîl e
 Pîr û Pîr Mûsî Dawid Delîl e
 Pîr Mûsî Mûrsîd Dawid Wekîl e
 Zerdegil mawaş kuyê Serendîl e
 Benayê benî Adem bendeyê celîl e
 Yarê celîl Yarê Pîr û Delîl e
 (Tehmasibî, nusxeya çapnebûyî, r.7)

Remzbar di gelek kelamên xwe de Sultan Sehak weku Xwedê nîşan dide. Çawa ku Remzbar Xwedêbûna Sultan qebûl dike, dixwaze gel jî vî tiştî bizane û qebûl bike. Remzbar di vê kelama xwe de wisa diyar dike; kesê ku di rîya Şah an Sultan de diçe, divê serê xwe di wê rîye de feda bike:

³ Di hin kelaman de wisa tê nîşandan ku kevir ji Remzbar çêbûye. bnr: Huseynî, S. M., (1382/2003). *Dîwana Gewre*, Kermanşah: Enteşarat-e Baqê Ney, r. 309.

⁴ Serendîl (Serendîb) li Hindistanê, navê çiyayekî bû wan çaxan li gorî baweriya yarsanan. Herwiha li gorî yarsanan, mirovê ewil ji axa wî çiyayî û li wî çiyayî hatîye afirandin.

⁵ Zerdegil heriya zer e, heriya zer a ku însan pê hatîye afirandin

Zemzeme û Wade zemzeme û Wade
Cuşîyan Yarî zemzeme û Wade
Ha mirdan qewl medan guwade
Zatê Heftewan kerîyan şehade
Wefa pa kesin ser pêşan dade
Ser û sikkeyê şert înan nihade
(Huseynî, 1382/2003, r. 458)

Remzbar di kelameke xwe de behsa duayan jî dike. Duaya ku di destpêka *Cemê de tê xwendin*, duaya Sultan e û Remzbar weku şefaatkara hemû yarsanan, ji vê duayê re tekbirî tîne. Duaya duyemîn a xwarinê ye. Ev dua beriya xwarinê ji aliyê Pîr Binyamîn ve tê ricakirin û Sultan jî ji bo xwarinê destûr dide:

Padişam duaş da Padişam duaş da
Tekbîriş wanân Padişam duaş da
We duayê duyum Binyam kird reca
Padişam ruxset da Yaran kird xo ra
(Huseynî, 1382/2003, r. 475)

Li gorî yarsanan, Remzbar ji her kesî re şefaat dike. Pîr Mûsî diçe li bal gunehkaran û Deftera xwe vedike. Remzbar li wir ji bo ku şefaat bike, bangî Şah dike û jê rica dike ku perdeyê negire:

Defter kirdewe
Pîr Mûsî Wezîr Defter kirdewe
Şî ew serkanî rûy we derdewe
Ya Şah murwetin mekerit perdewe
(Tehmasibî, r. 97)

Di dema Sultan Sehak de, ji bo civaka ku îro em weku yarsan dizanîn, sîstemeke civakî hatîye avakirin ji aliyê Sultan ve û ev sîstem îro jî berdewam e. Li gorî vê sîstemê, kesenî ku yarsan in an jî dû re dibin yarsan, divê bibin xwedîyê delîl û pîrek. Ev delîl û pîr dikare ji emrîn cihê bê hilbijartîn. Ji bo pêkanîna vê rîbazê, Sultan Sehak bixwe jî ji bo xwe hem delîl hem jî pîrek hildibijêre. Bi hilbijartina wî, Pîr Binyamîn dibe pîrî Sultan. Ji ber vê Remzbar jî Pîr Binyamîn weku pêşengekî dibîne, li gorî wê, Pîr Binyamîn ji erdê heta behran, pêşengê her tişî ye, heta Sultan bixwe jî serê xwe teslimî Pîr Binyamîn dike. Remzbar dîsa behsa

şert û iqrarê dike û dibêje ku Pîr Binyamîn, ev şert û iqrara yarsanan bi cih ankiye:

Ha Pîr Binyamîn î tu serqitar î
Pîrê serqitar çê ber ta bar î
Wekîl Wesî îxtiyardar î
We iqrarî Şah vîş ser pêyet siperden
We iqrar heddit we hedgah birdin
Her çi biwaçî reda û rasiyen
Binayiyê dîdeyê Heqşinasiyen
(Tehmasibî, r. 60-61)

Remzbar di vê kelama xwe de behsa *dûnadûnê* dike û dibêje, Şah ev tişt weku kar daye wan, herwiha wisa diyar dike ku hukmê erd û asîmanan di destê wî de ye:

Kirdin we pîş
Şaman dûnadûn kirdin we pîş
Hukmê asuman û zemîn we pêş e
Vîş xeberdarin xeberker vîş e
(Tehmasibî, r. 16)

Di vê kelama xwe de Remzbar behsa girîngiya Yar, kirasguhertin û çar ferîşteyên sereke dike. Ji Yaran re dibêje "xwediyyê hûş" ango "hişyarbûn" û ji wan re behsa girîngiya *dûnadûnê* dike û dibêje lixwekirina cilên nû bingeha "yarbûn"ê ye. Herwiha diyar dike ku her çar koşeyên alemê, ji çar melekên sereke pêk hatine û şertê yaran jî bi pêyên wan melekan ve hatine girêdan. Weku diyar dike, dinya li ser van her çar melekan hatiye avakirin û ev her çar melek pêşeng in. Yênu ku di rêya Heq de eşê dikşînin, ev her çar melek dibil weku dermanekî ji bo wan. Herwiha vê jî diyar dike ku çiqas êşê bikişînin jî û çiqas xwe ji bo Xwedê têxin ìnzîwayê jî cihê ku herî dawî bikarin biçinê, cihê wan her çar melekan e:

Hûş Yaran hûş
Mirdanê ezel hûş Yaran hûş
Me'rîfet muhr in çe perdeyî sirpûş
Binayê Yar in cameyê nû we nûş
Çahar qurneyê cîhan mewû we çahar cese

Şertiwen we payê çahar cese bes e
 Çahar ten çahar lenger hem cîhangîr e
 Hem serqitar e hem ew Yar Pîr e
 Hem xatircem'î riyazetkişan e
 Ye ser menzilgah ye hedgaşan e
 (Tehmasibî, r. 45)

Di kelamên yarsanan de gelek kelamên li ser cih û girîngiya Remzbarê jî hatine gotin. Weku mînak Sultan Sehak û Pîr Binyamîn, di kelamên xwe de behsa wê kirine. Ev jî careke din girîngiya Remzbarê eşkere dike.

Li gorî yarsanan, Heq ji aliyê Sultan Sehak ve ji bo Remzbarê hatiye dayîn. Sultan Sehak di kelameke xwe de behsa Heq dike û dibêje heta ku kesek Heq nas neke, dûrî her tiştî ye û tiştê ku dike vala ye. Yanî Sultan di kelama xwe de, girîngiya teslîmkirina serî nîşan dide. Li gorî wî, wextê ku yek serê xwe teslîm neke, ango nebe yarsan, ew ê tiştek neyê hesibandin, her tiştê wî dê vala bê dîtin, heta roja dawiyê ew ê neyê hesibandin jî. Dîsa dibêje kesê ku xwe teslîmî Heq dike, di *Deftera Pîr Mûsî* de tê tomarkirin. Herwiha, nîşan dike ku wî Heq daye Remzbara dêya xwe, ji ber vê cihê Remzbarê cihekî taybet e. *Defter* daye Pîr Mûsî ku weku tê zanîn, Pîr Mûsî nivîsevanê wî bû û her tiştî dinivîsi. Ji xeynî vê Sultan, Binyamîn weku saqîyê *Cemê Cilane* dibîne û Dawid jî weku rîber dibîne:

Bê gawan gawî bê gawan gawî
 Gaw bê gawan bê gawan gawî
 Ta ser nesparim kirde welawî
 Ta Heq neşnasin dûr ne gişt bawî
 Her serî ne lû ve huzûrî Cem
 Nesencû ve dest xelîfe û xadim
 Bêşek ew sere ve tûmar nîyen
 Ne rojê hesav ve şûmar nîyen
 Tomar Pîr Mûsîyê Qelem Baqîyen
 Cemê cilane Binyam saqîyen
 Rehber Dawidin des ve daman gîr
 Şert dam ve Binyam Heq dam ve Rezbar
 Defter Pîr Mûsî naz ve Yadigar
 (Sefizade, 1376/1997, r. 113)

Pîr Binyamîn dîsa di vê kelama xwe de behsa girîngiya barê Remzbarê dike. Weku kevneşopa yarsanan, Pîr Binyamîn jî cih dide girîngiya sirra Remzbarê. Weku dibêje îqrara wê jî şerta wê jî şidayî ye. Herwiha diyar dike ku *Heftên* jî şîrîkê wî barî ye û Melekê Teyyarê ku di dawiya kelamê de tê behskirin, sifateke Baba Yadîgar e û mirov dikare weku melekê ku difire, pênase bike:

Lutfî kerem in
Beyayê Pîr Remzbar lutfî kerem in
Remzbar remz bar kanê kerem in
Çe xatircemî xatiriş cem in
Îqrariş bitûyn şertiş muhkem in
Baqiyê malê Yar Çilane Cem in
Şerîk bî we bar
Heftên we mewcûd şerîk bî we bar
Binyam û Dawid Pîr Mûsî Remzbar
Mistefa û Îywet Melekê Teyyar

(Tehmasibî, r. 46)

84

Herwiha di kevneşopa yarsanan de yek ji figurên girîng Sîmûrg e. Sîmûrg xwedî cihekî taybet e ji bo yarsanan. Li gorî baweriya wan Sîmûrg di bedena Remzbarê de tecellî kiriye.

Sîmûrg figureke mîta ûranî-kurdî ye û di dema îslamê de, di edebiyata tesewwufî⁶ ya ûranî de bûye semboleke mezin. Koka vê peyvê "Sîn Morg" e, bi zimanê avestayî "Saena" û bi farisî "Sîmurx" (Vali, 2011, r. 392) û bi kurmancî jî weku "Sîmûrg" tê zanîn.

Di Şâhnameya Fîrdewsî û Kurdî (Vali, 2015, rr. 275-296) de peywendîya Sîmûrg û Zal hatiye nîşandan. Wextê ku Zal çê bûye, bavê wî Sam ew nexwestiye. Bi daxwaza bavê wî, zilamên wî ew birine ber çiyayê Elburzê ku ji însanan pir dûr e û pir tav lê dide. Hêlîna Sîmûrgê li ser vî çiyayî ye. Wextê ku çêlikên Sîmûrgê birçî dibin û Sîmûrg xwe ji çiyê berdide jêr, zarokekî nûçêbûyî dibîne ku ji birçîyan digirî. Xwedê wê demê rehmê dixe dilê Sîmûrgê ku wî zarokî bibe û xwedî bike. Sîmûrg radihêjê wî zarokî û dibe hêlîna xwe. Pişti demekê, wextê ku zarok êdî mezin dibe, bavê wî Sam bîryar dide ku biçe kurê xwe bîne. Sîmûrg ji jor dibîne ku Sam û zilamên wî tê, fam dike ku ew ê kurê xwe bibe. Sîmûrg axaftinê hînê Zal dike, lewra Zal qet naşibe însanan û nizane biaxive. Wextê ku Sîmûrg wî berdide, jê re dibêje ku ew bi çêlikên xwe mezin

⁶ Ji bo cihê Sîmûrgê di edebiyata tesewwufî de bnr. Feridüddin Attar (2015). *Mantiku't Tayr, Kuş Dili*, (çev. Ayhan Yıldırım), 3. Baskı İstanbul: Ataç.

kiriye, rehm, evîn û hezkirin xistiye dilê wî û divê van tiştan ji bîr neke. Herwiha jê re dibêje ku textekî mezin dê bibe weku hêlinék jê re û tacek zérin dê bibe weku baskên wî (Vali, 2011, rr. 393-394).

Remzbar di vê kelamê de xwe weku Sîmûrgê nîşan dide. Çawa ku Sîmûrgê alîkariya Zal kiriye, ew jî xwe weku alîkara Rustem nîşan dide:

Ew sayê şemî ew sayê şemî
 Bargeyê Şam westin ew sayê şemî
 Çenî Sê Tene biyam derhemî
 Sîmurg beyanî ce rayê Rustemê
 (Sefizade, 1376/1997, r. 123)

ENCAM

Di vê xebata xwe de bi awayekî kurt jî be, em li ser bîr û bawerî û rola jinê ya di edebiyata yarsanan de bi giştî û li ser Remzbarê jî bi taybetî sekinîn. Pêşî me hewl da ku em cih bidin doktrîn û kevneşopiya yarsanan, herwiha me cih da têgehêن weku *dûnadûn, tecelliî û ferîştenasîyê* ku ev têgeh hem di baweriya wan de hem jî di jiyana wan a rojane de xwedî cihekî girîng in.

Piştre em weku serfigureke yarsanan li ser Remzbarê sekinîn. Weku ji navê wê jî diyar e, Remzbar bargira sîrrê (remz) ye û şırîka barê yaran e. Remzbar hem weku jineke yarsan, hem weku ferîşteyekê hem jî weku dêya sembolîk a Sultan Sehak, di kevneşopa yarsanan de xwedî cihekî taybet û xweser e. Xweseriya wê jî ber vê ye ku hem xwedî sîrr e, hem jî Heq ji aliyê Xwedê ve ji bo wê hatiye dayîn. Sirra wê ji aliyê kelambêjên din ve jî tê qebûlkirin û di kelamên xwe de vî tiştî jî diyar dîkin. Herwiha di kevneşopa yarsanan de Remzbar weku tecelliya Sîmûrgê tê dîtin ku di vê kevneşopê de xwedî cihekî pir girîng e.

Bingeha kelamên Remzbarê jî weku kelamên din, li ser bawerî, kevneşop û doktrînen yarsanan ava bûye. Bi xwendina van kelaman, em dikarin pirsgirikên di jiyana wê de jî bibînin, beriya jidayîkbûna Sultan Sehak û heta hatina wî. Em dikarin nêrîna civakî ya wê serdemê, bi taybetî jî nêrîna bavê wê bibînin, di kelaman de. Digel ew qas zehmetiyan, sirra xwe ji bavê xwe re jî eşkere nekiriye û ev jî xaleke pir girîng e.

Ji xeynî jiyana wê bixwe, di kelamên Remzbarê de gelek agahî hene li ser bîr û bawerî û doktrîna yarsanan. Bi kelamên wê, em dikarin li ser jiyan, fikir û baweriya yarsanan bibin xwedîyê nêrînekê. Ji ber vê yekê me hewl da ku di her warê baweriya yarsanan de, em mînakekê ji kelamên Remzbarê nîşan bidin.

ÇAVKANÎ

- Adak, A. (2014), *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasik*, 2. Baskı, İstanbul: Nûbihar
- Attar, F. (2015). *Mantiku't Tayr, Kuş Dili*, (çev. Ayhan Yıldırım), 3. Baskı, İstanbul: Ataç
- Hamzeh'ee, M. R. (2008). *Yaresan (Ehl-i Hak)*, çev. Ergin Öpengin, İstanbul: Avesta
- Huseynî, S. M. (1382/2003). *Dîwana Gewre*, Kermanşah: Enteşaratê Baqê Nêy
- Minorsky, V. (1964). The Sect of the Ahl-i Hakk, in *Iranica, Twenty Articles*, Publication of the University of Tehran, vol. 775, r. 251
- Mir-Hosseini, Z. (2014a): Inner Truth Outer History: The Two Worlds of the Ahl-i Haqq of Kurdistan, in *International Journal of Middle East Studies*, Vol. 26, no. 2, (May, 1994), Cambridge University Press, rr. 267-285
- Mir-Hosseini, Z. (2014b): Redefining the Truth: Ahl-i Haqq and the Islamic Republic of Iran, in *British Journal of Middle Eastern Studies*, Vol. 21, no., 2 (1994), published by: Taylor&Francis, Ltd., r. 211-228
- Mokri, M. (1977). La Grande Assemblée Des Fidèles de Vérité au tribunal sur le Mont Zagros en Iran (Dawra-y Dîwâna Gawra), Livre Sacré et Inédit en Gourani Ancien, Texte Critique, Traduction, Introduction et Commentaires avec des Notes Linguistiques et Glossaire, Etudes d'Hérésiologie Islamique et de Thèmes Mythico-Religieux Iraniens, Librairie Klincksieck, Paris
- Orak Reşitoğlu, S. (2016). *Helbestvanên Jin di Edebiyata Yarsanan de*, teza masterê ya çapnebûyî, Enstîtuya Zimanê Zindî yên li Tirkîyeyê, Zanîngeha Mardin Artukluyê.
- Sefizade, S. (1376/1997). Daneşnameyê Namaveranê Yarsan, Ehval ve Asarê Meşahîr, Tarîx, Ketab ha ve Estelahaê Erfanî, Tehran: Enteşaratê Hîrmand
- Serencam Beyanul Heq, nusxeyê Qadir Tehmasibî
- Sinanoğlu, M. (2011). "Tecelliî", *İslam Ansiklopedisi*, cilt. 40, r. 243-245
- Tahirî, T. (2009). *Tarîx we Felsefeyê Serencam*, Hewlêr: Dezgayê Tojînewe û Belavkirdinewey Mukriyanî
- Vali, S. (2011). *Les Yârsâns, Aspects Mythologiques- Aspects Doctrinaux*, Editions universitaires européens, Saarbrücken
- Vali, S. (2012, mars). "La littérature religieuse des Kurdes Yarsan", di *Etudes Kurdes no 11: La Littérature Kurde de*, Ed. Harmattan, Paris, r. 57-64
- Vali, S. (2014, Şubat-Mart). "Yarsan ve Yezidi Kürtlerin Yazılı Edebiyatı", *Kürt Tarihi*, sayı 11, r. 30-35

Vali, S. (2015). Nêrîneke gişfî ya li ser Şahnameya Fîrdewsî û Şahnameya Kurdî, *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî, Dîrok- Teorî- Rêbaz- Lîteratur- Berawirdî-1* (Ed. Ramazan Pertev), İstanbul: Avesta, r. 275-296.

Xan Elmas, *Dîwân*, nusxeya çapnebûyî ya Seyîd Xelîl 'Alînejad



CIHNAV DI ZAZAKIYA GIMGIMÊ DE

İbrahim Bingöl*

KURTE

Ev gotar li ser mijara cihnavan radiweste, bi taybetî di çarçoveya zazakiya devoka Gimgimê de. Wekî tê zamîn bi giştî cihnav di famkirina zimên de xwedî cihekî gîring in. Çawa bi saya xîçke kevirekî dîrokî arkeologek dikare taybetmendiyêner serdemên borî derxe holê, zimannasek jî dikare tenê bi lêkolîneke li ser cihnavan, nexşeya rêzimana vî zimanî diyar bike. Di vê gotarê de em li ser cureyên cihnavan û bikaranîna wan rawestiyân.

Cihnav di vê xebatê de bi daneyên ji devoka Gimgimê û bi perspektîfeke tîpolojîk hatine vekolîn.

Bêjeyê Sereke: Zazakî, Rêzimana Zazakî, Devoka Gimgimê, Cihnav, Navdêr.

ABSTRACT

"Pronouns in the Zazaki of Gimgim's Accent"

This article deals with the subject of pronoun in Gimgim's zazaki accent. As known, pronoun takes an important place in understanding a language. Just as an archaeologist can reveal the features of ancient periods via a part of stone, a map of a grammar of a language can be drawn via a research on pronouns on the language. This article focuses on the kinds of pronoun and their usages in the Gimgim's accent.

In this article the subject of pronoun is examined according to data based on Gimgim's accent, in terms of the typological aspect.

Key Words: Zazaki, Grammar of Zazakî, Gimgim's accent, Pronoun, Noun.

* Xwendekarê doktorayê ye li Şaxa Makezanista Ziman û Wêjeya Kurdî ya Zanîngeha Zaxoyê
ibrahimbingol@hotmail.com

DESTPÊK

Di zimên de mijara cihnavan gelekî girîng e. Cihnav axaftin û nivîsandina zimên herikbar dikan. Dubarekirina navdêran kêm dikan. Di gelek zimanîn de cihnav piranî ji peyvîn kurt çêdibin û ev taybetmendiya cihnavan, axaftin û nivîsandinê hêsan dikan. Bi vî awayî mirov bi saya cihnavan dikare bi lez û herikbar biaxive û binivîse.

Wekî tê zanîn sê devokê zazakî yên mezin hene. Ev sê devok wekî devoka bakur, devoka navendî û devoka başûr hatine dabeşkirin. Xuya ye ku ev dabeşkirina van devokan li gor herêman hatiye kirin, lê bi vî awayî hinek tevlîhevî çêdibin. Li gor mezheban dabeşkirin çêtir xuya dike. Em dikarin van sê devokê mezin wiha dabeş bikin:

1. Yên ku dibêjin “**Heq razî bo/Xwede razî be**” yanê devoka bakur, piraniya wan Elewî ne.
2. Yên ku dibêjin “**Homa razî bo/Xwede razî be**” yanê devoka navendî, piraniya wan Şaffî ne.
3. Yên ku dibêjin “**Allah razî bo/Xwede razî be**” yanê devoka başûr, piraniya wan Heneffî ne. (Çağlayan (2016), r. 203)

Devoka Gimigimê dikeve nav grûba “**Heq razî bo**”. Em dikarin bibêjin di Gimigimê de axêverên vê devokê hema hema hemû Elewî ne.

Wekî tê zanîn zazakî hin jî nehatiye standardîzekirin. Ji bo standardîzekirina zazakî, hewce ye ku li ser her devokê xebatê taybet bêñ çêkirin. Heta niha li ser devokê zazakî kêm xebat hatine encamdan. Em di vê gotarê de ji bo vê armancê, li ser mijara cihnavan radiwestin.

Wekî tê zanîn di xebatê zimên de du rîbazên bingehîn hene (Aksan, 2009, r. 37):

1. Rêbaza senkronîk
2. Rêbaza diyakronîk

Ji ber ku rîbaza diyakronîk karekî dirêj û kûr dixwaze, me li vir mijara xwe wekî senkronîk vekola. Bi gotineke din iro di axaftinê de di devoka Gimigimê de cihnav çawa têñ bikarananîn, em li ser vê mijarê rawestiyen. Ji ber ku li ber destê me bi gelempêrî derbarê zazakî de, bi taybetî jî derbarê devoka Gimigimê de deqêñ kevin û orijinal tunene, em nikarin bi kûrahî rîbaza diyakronîk bi kar bînin.

Senkronîk bêjeyeke yewnaniya kevin e. Bêjeyeke hevedudanî ye. Ji daçeka **σύν** (hem) û **χρόνος** (dem)ê pêk aniye û maneya “**hemdemî**” dide. Ev rîbaz rastî û rewşen zimanekî zindî tespit dike û wan teswîr dike. Lîbelê bandor û sebebê van tiştan venakole (Aksan, 2009, r. 38)

1. CIHNAV (PRONOUN)

Em dikarin bibêjin ku cihnav bi awayekî din navdêr e. Şûna navdêran digire. Ji ber vê yekê di zimên de rola navdêran çawa be, rola cihnavan jî wisan e. Çawa navdêr di sê rewşan de xuya dibin, cihnav jî di sê rewşan de xuya dibin. Bikaranîna cihnavan di rewşa bangkirinê de, ne ewqas fonksiyonel e. Ji ber vê yekê em li ser vê pir nasekinin û bi tenê çend mînakan didin û derbas dibin.

Cihnav di rewşa bangkirinê de ji bo nêr **ero** yan jî **lo**; ji bo mî **erê** yan jî **lê** ye.

Mînak:

Ero! Hela bê! ‘Lo! Hela were!’

Erê! Hela bê! ‘Lê! Hela were!’

Lo! Ti çi wazena! ‘Lo! Tu çi dixwazî!’

Lê! Ti çi wazena! ‘Lê! Tu çi dixwazî!’

1.1 Cihnavê Kesî (Personal Pronouns)

Di gelek zimanî de cihnavê kesî wekî du bir têr dabeşkirin: Cihnavê kesî ji bo karayê; cihnavê kesî ji bo bireserê. Lîbelê em di zazakî de nikarin wisa dabeş bikin. Ji ber ku zazakî nîv-ergatîf (split ergativity) e, em ancax dikarin cihnavê kesî wekî xwerû û tewandî dabeş bikin:

Tablo 1. Cihnavê kesî yên xwerû û tewandî

Xwerû		Tewandî	
Zazakî	Kurmancî	Zazakî	Kurmancî
Ez	Ez	Mi	Min
Ti	Tu	To	Te
O (nêr)	Ew	Ê	Wî
A (mî)	Ew	Aye	Wê
Ma	Em	Ma	Me
Şima	Hûn	Şima	We
Ê (pirhejmar)	Ew	Înan (îne)	Wan

Nîşe: Di devoka Gimimê de pir caran şûna “**ti**”yê de “**to**” tê bikaranîn. (Jandil, 1999, r. 32). Xuya ye ke ew jî nîşana destpêka windabûna ergatîfiyê ye.

1.1.1. Yê Xwerû

1. Dema ku lêker têneper be, di hemû deman de di erka karayê (**subject**) de her tim cihnavêñ xwerû tên bikaranîn.

Mînak di dema niha de:

Ez şono. ‘Ez diçim.’

Tı şona. ‘Tu diçî.’

O şono. ‘Ew diçe.’ (nêr, yekhejmar)

A şona. ‘Ew diçe.’ (mê, yekhejmar)

Ma şonîme. ‘Em diçin.’

Şima şonê. ‘Hûn diçin.’

Ê şonê. ‘Ew diçin.’ (pirhejmar)

Wekî tê dîtin ku di mînakêñ jorîn de lêkera têneper “**şiyene**” hatiye bikaranîn û hemû cihnav jî xwerû û di erka karayê de ne.

Mînak di dema borî de:

92

Ez kewto ra. ‘Ez raketim.’

Tı kewta ra. ‘Tu raketî.’

O kewto ra. ‘Ew raket.’ (nêr, yekhejmar)

A kewta ra. ‘Ew raket.’ (mê, yekhejmar)

Ma kewtîme ra. ‘Em raketin.’

Şima kewtê ra. ‘Hûn raketin.’

Ê kewtê ra. ‘Ew raketin.’

Di mînakêñ jorîn de lêkera “**rakewtene/raketin**” hatiye bikaranîn. Wekî tê zanîn lêkera “**raketin**” têneper e.

2. Dema ku lêker têper be, tenê di demêñ borî de di erka bireserê (**object**) de cihnavêñ xwerû tên bikaranîn.

Mînak di dema borî de:

Mi **ti** kîşta. ‘Min **tu** kuştî.’

To **ez** kîşta. ‘Te **ez** kuştîm.’

Ê ma kîştîme. ‘Wî **em** kuştin.’

Aye **şima** kîştî. ‘Wê **hûn** kuştin.’

Ma **o** kîşt. ‘Me ew kuşt.’ (yekhejmar, nêr)

Şima ê kîştî. ‘**We** ew kuştin.’ (pirhejmar)

Înan **a** kîşte. ‘Wan ew kuşt.’ (yekhejmar, mê)

Di mînakên jorîn de lêkera “**kîştene/kuştin**” hatiye bikaranîn. Wekî tê zanîn lêkera “**kuştin**” têper e. Ji ber vê yekê bireserên vê lêkerê, wekî cihnavêñ xwerû hatine bikaranîn. Lê dema ku di heman rewşê de daçek bêñ bikaranîn, cihnavêñ xwerû nikarin bêñ bikaranîn. Çunkî em dizanin ku bi daçekan re her tim cihnavêñ tewandî têñ bikaranîn.

Mînak:

Mi **to** ra zaf hes kerd. ‘Min ji **te** zaf hez kir.’

Li vir hem biker hem jî biresera lêkerê tewandî ye. Biker ji ber ergatîfiyê; bireser jî ji ber daçekê hatiye tewandin.

Nîse: Ci biker be, ci bireser be, lêker her tim li gor cihnav an jî navdêrêñ xwerû têñ kişandin.

1.1.2. Yêñ Tewandî

1. Di dema borî de dema ku lêker têper be, di erka karayê de her tim cihnavêñ tewandî têñ bikaranîn:

93

Mînak:

Mi saye werde. ‘**Min** sêv xwar.’

To saye werde. ‘**Te** sêv xwar.’

Ê saye werde. ‘**Wî** sêv xwar.’

Aye saye werde. ‘**Wê** sêv xwar.’

Ma saye werde. ‘**Me** sêv xwar.’

Şima saye werde. ‘**We** sêv xwar.’

Înan saye werde. ‘**Wan** sêv xwar.’

Ji mînakên jorîn xuya dike ku lêkera “**werdene/xwarin**” têper e û di dema borî de jî cihnavêñ tewandî wekî biker hatine bikaranîn.

2. Di fraza cihnavî (pronoun phrase) de cihnavêñ kesî yêñ tewandî di erka ravekerê de têñ bikaranîn.

Mînak:

Waya **mi** ‘xwişka **min**.’

Birayê **to** ‘birayê **te**.’

Destê ê ‘destê **wî**.’

Goşarê **aye** ‘guhara **wê**.’



Dewa **ma** ‘gundê **me**.’

Mahîna **şima** ‘mehîna **we**.’

Hêgayê **înan** ‘zeviyê **wan**.’

3. Bi daçekan re her tim cihnavêñ tewandî têñ bikaranîn.

Mînak:

Hesenî **pê ìnan** leqî kerd. ‘Hesenî **bi wan** henek kirin.’

To qey **mi rê** çiyê negirewt? ‘Te çîma **ji min re** tiştekî negirt?’

Ê **ra** mevajê. ‘**Ji wî re** mebêje.’

1.2 Cihnavêñ Nîşander (Demonstrative Pronouns)

Wekî cihnavêñ kesî, cihnavêñ nîşander jî du kom in: Xwerû û tewandî. Du cihnavêñ nîşander hene, yek ji bo kes û tiştên dûr; yek jî ji bo kes û tiştên nêzîk e. Em wan di tabloyê de bidim:

Tablo 2. Cihnavêñ xwerû û tewandî yên ji bo nêzîk û dûr

	Xwerû			Tewandî		
	Nêr	Mê	Pirhejmar	Nêr	Mê	Pirhejmar
Nêzîk	No ‘ev’	Na ‘ev’	Nê ‘ev’	Nê ‘vî’	Naye ‘vê’	Nînan (nînê) ‘van’
Dûr	O ‘ew’	A ‘ew’	Ê ‘ew’	Ê ‘wî’	Aye ‘wê’	Înan (îne) ‘wan’

Ji bo nêzîk û xwerû

No weş o. ‘**Ev** xweş e.’ (nêr, yekhejmar)

Na weş a. ‘**Ev** xweş e.’ (mê, yekhejmar)

Nê weş ê. ‘**Ev** xweş in.’ (pirhejmar)

Ji bo dûr û xwerû

O weş o. ‘**Ew** xweş e.’ (nêr, yekhejmar)

A weş a. ‘**Ew** xweş e.’ (mê, yekhejmar)

Ê weş ê. ‘**Ew** xweş in.’ (pirhejmar)

Ji bo nêzîk û tewandî

Nê xeylî goş werd. ‘**Vî** gelek goş xwar.’ (nêr, yekhejmar)

Naye xeylî goş werd. ‘**Wê** gelek goş xwar.’ (mê, yekhejmar)

Nînan xeylî goş werd. ‘**Van** gelek goş xwar.’ (pirhejmar)

Ji bo dûr û tewandî

Ê xeylî goş werd. ‘**Wî** gelek goş xwar.’ (nêr, yekhejmar)

Aye xeylî goş werd. ‘**Wê** gelek goş xwar.’ (mê, yekhejmar)

Înan xeylî goş werd. ‘**Wan** gelek goş xwar.’ (pirhejmar)

Di îzafeya cihnavan de cihnavên nîşander yên tewandî di erka ravekerê de têr bikaranîn.

Mînak:

Wareyê **înan** ‘zozanê **wan**’

Kavirê **nînan** ‘berxên **van**’

Halê **nê** ‘rewşa **vî**’

Halê **naye** ‘rewşa **vê**’

Astorê ê ‘hespê **wî**’

Mahîna **aye** ‘mehîna **wê**’

Bi daçekan re:

Hesenî pê **înan** leqî kerd. ‘Hesenî bi **wan** henek kir.’

To qey **nê** rê çiyê negirewt? ‘Te çima ji **vî** re tiştek negirt?’

Ê ra mevajê. ‘Ji **wî** re mebêje.’

Naye no qese nêva. ‘**Vê** ev qise negot.’

Nîşe: Heke em bixwazin cihnavên nîşander yên nêzîk zêdetir diyar bikin û wateya şanîdanê xurt bikin wê demê pêşgira “**a**”yê tînin pêşîya cihnavan.

Mînak:

No → **a** no

Na → **a** na

Nê → **a** nê

Nê → **a** nê

Naye → **a** naye

Nînan → **a** nînan

Ji bo nêzîk û nêr û xwerû mînak:

A no weş o. ‘A ev xweş e.’

Ji bo nêzîk û mî û xwerû mînak:

A na weş a. ‘A ev xweş e.’

Ji bo nêzîk û pirhejmar û xwerû mînak:

A nê weş ê. ‘A ev xweş in.’

Ji bo nêzîk û nêr û tewandî mînak:

A nê xeylî goşt werd. ‘A vî gelek goşt xwar.’

Ji bo nêzîk û mî û tewandî mînak:

A naye xeylî goşt werd. ‘A vê gelek goşt xwar.’

Ji bo nêzîk û pirhejmar û tewandî mînak:

A nînan xeylî goşt werd. ‘A van gelek/xêlî goşt xwar.’

1.3 Cihnava Vegerok (Reflexive Pronoun)

Di zazakî de cihnava vegerok “**xo**” ye. Di hevokê de cihnava vegerok her tim li gor karayê (subject) diçe, bi gotineke din karê ku tê kîrin li karayê vedigerîne. Cihnava vegerok tu carî naguhere. Her tim yekhejmar û ji aliyê zayendê ve jî nêtar e.

Mînak:

Ez **xo** şevekneno. ‘Ez **xwe** diparêzim.’

Tî **xo** bena cêr, ana cor. ‘Tu **xwe** dibî jêr, tînî jor.’

O **xo** şuno. ‘Ew **xwe** dişo.’

Aye qukiye de **xo** dî. ‘Wê di neynikê de **xwe** dît.’

Ma qukiye de **xo** dî. ‘Me di neynikê de **xwe** dît.’

Cihnava vegerok di îzafeyê de wekî ravekerê tê bikaranîn:

Ê **piyê xo** berd nîweşxane. ‘Wî **bavê xwe** bir nexweşxaneyê.’

Aye **hevalê xo** ra va: roj baş. ‘Wê ji **hevalê xwe** re got: roj baş.’

Birayê mi **porê xo** şane kerd. ‘Birayê min **porê xwe** şe kir.’

Nîşe: Dema ku em daçeka “**bî**”yê bînin pêşîya cihnava vegorek “**xo**” yan jî bikin navbera du “**xo**”yan, wê demê wateya “**tenê**” yan jî “**bi serê xwe**” bi dest dixin, bi gotineke din wê wateyê dide ku karayê karek bi tena serê xwe kiriye. Ev cihnav heke du caran li pey hev bê gotin, dîsa wateya “**xwe bi xwe**” dide.

Mînak:

Ez **bixo** şîyo lewê ïnan. ‘Ez **bixwe** çûm ba wan.’

Ê **bixo** waşt. ‘Wî **bixwe** xwest.’

Lajê mi **xo bi xo** xebetîno. ‘Kurê min **xwe bi xwe** dixebite.’

Xalê maya min zaf biyo kal, endî **xo xo** de qesey keno. ‘Xalê dêya min zaf kal bûye, êdî **xwe bi xwe** dipeyive.’

Nîşe: Dema ku mirov li taybetmendiyên cihnavêن xwerû û tewandî binêre, derdikeye holê ku cihnava vegerok “**xo**” her tim di rewşa tewandî de ye. Mesela wekî me li jor mînak dane, di fraza cihnavî de cihnava “**xo**” dikare bibe raveker, baş tê zanîn ku cihnavêن xwerû tu carî nabin raveker. Bo nimûne em nikarin di şûna “pêñusa **min**” de bibejin “pêñusa **ez**”.

Ji aliye din ve dema ku cihnava vegerok “**xo**” di dema borî de bi lêkerên têper re tê bikaranîn, paşgirên kesî nayêن dawiya rehêن lêkeran, bi gotineke din wekî xwe dimînin. Ew jî tê vê wateyê ku bireserê van lêkeran jî di rewşa tewandî de ne. Çimkî hem di zazakî de hem jî di kurmancî de di hevokekê de lêker her tim li gor navdêr an jî cihnava xwerû diçê, bi gotineke din biker an jî biresera hevokê, ji wan kîjan xwerû be, lêkera hevokê bi wê re rêkdikeve.

Bo nimûne:

Mi xo **dî**. ‘Min xwe **dît**.’

To xo **dî**. ‘Te xwe **dît**.’

Ê xo **dî**. ‘Wî xwe **dît**.’

Aye xo **dî**. ‘Wê xwe **dît**.’

Ma xo **dî**. ‘Me xwe **dît**.’

Şima xo **dî**. ‘We xwe **dît**.’

Înan xo **dî**. ‘Wan xwe **dît**.’

Di van mînakêن jorîn de ji ber ku di hevokan de wekî biker yan jî bireser navdêr an jî cihnavêن xwerû nînin, lêkera “**diyene/dîtin**” wekî “reha dema borî” maye. Ev jî tê vê wateyê ku biresera wan hevokan “**xo**” di rewşa tewandî de ye.

1.4 Cihnavêن Pirsyarî (Interrogative Pronouns)

Cihnavêن “**xo**” û “**çî**” ne tê de, wekî cihnavêن din, cihnavêن pirsyarî jî ji aliye rewş, mêjer û zayendê ve tên kişandin.

Tablo 3. Cihnavêni ji bo pirsîna kesan

Xwerû			Tewandî		
Nêr	Mê	Pirhejmar	Nêr	Mê	Pirhejmar
Kam ‘kî’	Kame ‘kî’	-	Kamî ‘kê’	Kame ‘kê’	-

Di rewşa xwerû de pirsîna karayê

Kam ame? ‘**Kî** hat?’

Hesen ame. ‘**Hesen** hat.’

Kame amê? ‘**Kî** hat?’

Zozane amê. ‘**Zozan** hat.’

Nîşe: Wekî zimanê îngilîzî, di zazakî de jî dema ku biker bê pirsîn, biker çi yekhejmar ci pirhejmar be, pirs wekî yekhejmar û nêr tê pirsîn.

Mînak:

Who is coming? **Kam** êno? ‘**Kî** tê?’

Bersiva pirsa jorîn li gor karayê dikare yekhejmar an jî pirhejmar be.

Kam êno? ‘**Kî** tê?’

Hesen êno. ‘Hesen tê.’

Xezale êna. ‘Xezal tê.’

Hesen û Xezale ênê. ‘Hesen û Xezal tê’.

Lêbelê dema ku mirov karaya mî û yekhejmar bipirse, wê demê divê bi cihnavâ “**kame**”yê bê pirsîn.

Heke mirov bi taybetî kesan bipirse, divê cihnavâ “**kam**”ê dubare bike. Lê di vê rewşê de lêker dîsa yekhejmar e.

Mînak.

Kam kam ame? ‘**Kî** kî hatine?’

Ehmed û Mehemed amî. ‘Ehmed û Mehemed hatine.’

Mînak:

Kame êna? ‘**Kî** tê?’

Xezale êna. ‘**Xezal** tê.’

Bi vê pirsê bikera yekhejmar û mî hatiye pirsîn. Xwediyyê vê pirsê dizane ku kesê ku tê zayenda wê mî ye lê bi nasnameya wê nizane. Bersiva vê pirsê bivê nevê mî ye.

Pirsîna bikerê di rewşa tewandî de

Kamî werd? ‘Kê xwar?’

Hesenî werd. ‘Hesenî xwar.’

Kame werd? ‘Kê xwar?’

Xezale werd. ‘Xezalê xwar.’ (yekhejmar, mî)

Li jor di paragrafa nîşeyê de tiştên ku ji bo rewşa xwerû hatine, ji bo rewşa tewandî jî derbas dibin.

Pirsîna bireserê di rewşa xwerû de

Ê kam berd mektebe. ‘Wî kî bir mektesbê.’ (yekhejmar, nîr)

Ê kame berde mektebe. ‘Wî kî bir mektesbê.’ (yekhejmar, mî)

Ê kamî berdî mektebe. ‘Wî kî birin mektesbê.’ (pirhejmar)

Pirsîna bireserê di rewşa tewandî de

O kamî beno mektebe. ‘Ew kê dibe mektesbê.’ (yekhejmar, nîr)

O kame beno mektebe. ‘Ew kê dibe mektesbê.’ (mî, yekhejmar)

O kamî beno mektebe. ‘Ew kê dibe mektesbê.’ (pirhejmar)

Cihnava ji bo pirsîna tiştan:

Çi biker be, çi bireser be, dema ku tişt tê pirsîn cihnava “çî”yê tê bikaranîn.

Cihnava “çî”yê di vî warî de nêtar e, li gor rewşan naguhere.

Pirsîna bikerê di rewşa xwerû de

Bersiv: Dîk rema. ‘**Dîk** reviya.’ (nîr)

Pirs: Çi rema? ‘**Çi** reviya?’

Bersiv: Kerge remê ‘**Mirîşk** reviya.’ (mî)

Pirs: Çi rema? ‘**Çi** reviya?’

Bersiv: Dîkî ‘remay. ‘**Dîk** reviyan.’ (pirhejmar)

Pirs: Çi rema? ‘**Çi** reviya?’

Pirsîna bikerê di rewşa tewandî de

Bersiv: Dîkî kerge fetelnê. ‘Dîkî mirîşk qewirand.’

Pirs: Çi kerge fetelnê? ‘Çi mirîşk qewirand?’

Bersiv: Kerge dîk fetelna. ‘Mirîşkê dîk qewirand.’ (yekhejmar, mî)

Pirs: Çi dîk fetelna? ‘Çi dîk qewirand?’

Bersiv: Dîkan kerge fetelnê. ‘Dîkan mirîşk qewirand.’ (pirhejmar)

Pirs: Çi kerge fetelnê? ‘Çi mirîşk qewirand?’

Pirsîna bireserê di rewşa xwerû de

Bersiv: Azadî saye werde. ‘Azadî sêv xwar.’ (yekhejmar, mî)

Pirs: Azadî çî werd? ‘Azadî çî xwar?’

Bersiv: Azadî goşt werd. ‘Azadî goşt xwar.’ (yekhejmar, nîr)

Pirs: Azadî çî werd? ‘Azadî çî xwar?’

Bersiv: Azadî sayî werdî. ‘Azadî sêv xwarin.’ (pirhejmar)

Pirs: Azadî çî werd? ‘Azadî çî xwar?’

Pirsîna bireserê di rewşa tewandî de

Bersiv: Azad saye weno. ‘Azad sêvê dixwe.’ (yekhejmar, mî)

Pirs: Azad çî weno? ‘Azad çî dixwe?’

Bersiv: Azad dîkî weno. ‘Azad dîkî dixwe.’ (yekhejmar, nîr)

Pirs: Azad çî weno? ‘Azad çî dixwe?’

Bersiv: Azad sayan weno. ‘Azad sêvan dixwe.’ (pirhejmar)

Pirs: Azad çî weno? ‘Azad çî dixwe?’

1.4.1 Cihnavâ Kamjîn/Kamjîne ‘Kîjan’

Ev cihnav li gor rewş, zayend û mêjerê diguhere.

Tablo 4. Cihnavâ Kamjîn/Kamjîne

Xwerû			Tewandî		
Nîr	Mî	Pirhejmar	Nîr	Mî	Pirhejmar
Kamjîn ‘kîjan’	Kamjîne ‘kîjan’	Kamjînî ‘kîjan’	Kamjînî ‘kîjanî’	Kamjîne ‘kîjanê’	Kamjînan ‘kîjanan’

Pirsîna karayê di rewşa xwerû de

Kamjî rema? ‘Kîjan reviya?’ (yekhejmar, nêr)

Kamjîne remê? ‘Kîjan reviya?’ (yekhejmar, mêt)

Kamjînî remay? ‘Kîjan reviyan?’ (pirhejmar)

Pirsîna bireserê di rewşa tewandî de

Tî kamjînî bena? ‘Tu kîjanî dibî?’ (yekhejmar, nêr)

Tî kamjîne bena? ‘Tu kîjanê dibî?’ (yekhejmar, mêt)

Tî kamjînan bena? ‘Tu kîjanan dibî?’ (pirhejmar)

1.4.2 Cihnavâ “Kotî” ‘li ku’

Cihnavâ “kotî” digel daçekan jî tê bikaranîn û pirsa cihan dike û li gor rewş, zayend û mêtgerê naguhere.

Hesen kotî yo? ‘Hesen li ku ye?’

Hesen çê der o. ‘Hesen li malê ye.’

Hesen kotî ra yo? ‘Hesen ji ku ye?’

Hesen Mûş ra wo. ‘Hesen ji Mûşê ye.’

Hesen ver ba kotî şono? ‘Hesen ber bi ku diçe?’

Hesen ver ba Mûşî şono. ‘Hesen ber bi Mûşê diçe.’

101

1.4.3 Cihnavâ “Key” ‘Kengî’ ‘Kengê’

Cihnavâ “key” digel daçekan jî tê bikaranîn, pirsa dema rûdanîn dike û li gorî rewş, zayend û mêtgerê naguhere.

Tî key êna çê? ‘Tu kengê tê malê?’

Ez meşte êno çê. ‘Ez sibe têm malê.’

Karê ïnan hetanî key qedîno? ‘Karê wan heta kengê diqede?’

Karê ïnan meşte nê bîro qedîno? ‘Karê wan sibe ne dusibe diqede?’

1.4.4 Cihnavê “Çi Waxt” û “Çi Taw”ê

Pirsên ku li jor bi cihnavâ “key”ê hatine gotin, bi “çî waxt” an jî bi “çî taw”ê bêngotin wateya wan naguhere.

Tî çî waxt êna çê? ‘Tu kengê têyî malê?’

Tî çî taw êna çê? ‘Tu kengê têyî malê?’

Karê ïnan hetanî çî waxt qedîno? ‘Karê wan hetanî kengê diqede?’

Karê ïnan hetanî çî taw qedîno? ‘Karê wan hetanî kengê diqede?’

1.4.5 Cihnavâ “Se”yê ‘Çawa’

Cihnavâ “se” pirsa rewşan dike û li gorî rewş, zayend û mêtjerê naguhere.

Tî **se** ama îta? ‘Tu **çawa** hatî vir?’

Ez ebi otobuse amo îta. ‘Ez bi otobusê hatim vir.’

Ê mêtirkî no bon **se** viraş? ‘Wî zilamî ew xanî **çawa** ava kir?’

A çêneke serê xo **se** şûna? ‘Ew keçik serê xwe **çawa** dişo?’

Cihnavâ “se” bi lêkerên “**kerdene/kirin**” û “**vatene/gotin**” re tê wateya cihnavâ “**çî**”yê.

Mînak:

Tî **se** vana? ‘Tu **çi** dibêjî?’

Ez vano “meşo”. ‘Ez dibêjim “meçe”.

‘Tî **se** kena? ‘Tu **çi** dikî?’

1.4.6 Cihnavâ “Qey”ê ‘Çima’

Cihnavâ “qey” pirsa sebeban dike û li gor rewş, zayend û mêtjerê naguhere.

Erê! Tu **qey** nêna? Erê! Tu **çima** nayî?

Ma **qey** ê ra nêvano? Ma **çima** ji wî ra nabêje?

Piyê to na şodir **qey** şî sûke? ‘Bavê te vê sibê **çima** çû bajêr?’

1.4.7 Cihnavâ “Çinay ra”yê ‘Çima’

Cihnavâ “çinay ra” jî wekî cihnavâ “qey” pirsa sebeban dike û li gor rewş, zayend û mêtjerê naguhere. Em dikarin bibêjin cihnavâ “qey” dişibe cihnavâ “**why**” ya îngilîzî, cihnavâ “çinay ra” jî dişibe cihnavâ “**what for**” a îngilîzî.

Erê! Tu **çinay ra** nêna? Erê! Tu **çima** nayî?

Ma **çinay ra** ê ra nêvano? Ma **çima** ji wî re nabêje?

Piyê to na şodir **çinay ra** şî sûke? ‘Bavê te vê sibê **çima** çû bajêr?’

1.4.8 Cihnavâ “Çend”ê ‘Çend’

Cihnavâ “çend” pirsa jimara tiştan dike û ji ber ku bi xwezayî her tim pirhejmar e, yekhejmar nayê bikaranîn. Li gor rewşê tê tewandin, lêbelê ji aliyê zayendê ve nêtar e.

Çend amî? ‘**Çend** hatin?’

Vîst amî. Bîst hatin.

Çendan werd? ‘**Çendan** xwar?’

Desan werd. ‘Dehan xwar.’

1.4.9 Cihnava “Çiqas”ê ‘Çiqas’

Cihnava “çiqas” pirsa mîqdara tiştan dike û li gor rewş, zayend û mêjerê naguhere.

Des çuvalî ardê mi estê. Ti **çiqas** wazena? ‘Deh çewal ardên min hene.’ ‘Tu **çiqas** dixwazî?’

Ez şono dukan ra tîrî ano. To rê **çiqas** biyarî? ‘Ez diçim dukanê tîrî tînim.’ ‘Ji te re **çiqas** bînim.’

Çiqas mend, **çiqas** vîndî bî? ‘**Çiqas** ma, **çiqas** wenda bû?’

1.5 Cihnavê Xwedîtiyê (Possessive Pronouns)

Cihnavê xwedîtiyê ji veqetandeka “ê”yê, cihnavê kesî yêñ tewandî, cihnavê nîşander ên tewandî û cihnava vegerokê pêk têñ.

Bi cihnavê kesî yêñ tewandî re:

Ê min: Na qeleme ê **min** a. ‘Ev qelem **a min** e.’

Ê to: Çeyê pê koyî ê **to** yo. ‘Xaniyê paş çiyê ê **te** ye.’

Ê (d)ê: Kerga siyaye ê **(d)ê** ya. ‘Mirîşka reş **a wî** ye.’

Ê (d)aye: Na fistane ê **(d)ay** a. ‘Ev fistan **a wê** ye.’

Ê ma: No ìnî ê **man** o. ‘Ev kanî ê **me** ye.’

Ê şima: O ìnî jî ê **şiman** o. ‘Ew kanî jî **a we** ye.’

Ê (d)inan: Dowa jorî ê **(d)inan** a. ‘Gundê jor ê **wan** e.’

Bi cihnavê nîşander ên tewandî re:

Ê nê: Kerga siyaye ê **nê** ya. ‘Mirîşka reş **a vî** ye.’

Ê naye: Na fistane ê **nay** a. ‘Ev fistan **a vê** ye.’

Ê nînan: Dowa jorî ê **nînan** a. ‘Gundê jor ê **van** e.’

Bi cihnava vegerokê re:

Ji ber ku cihnava “xo”yê ji aliyê rewş, mêjer û zayendê ve naguhere, ji bo hemû rewşan tenê formeke wê heye: “ê xo”

Her kesî çeyê xo viraşt. Mi hêna ê **xo** nêviraşto. ‘Her kesî xaniyê xwe ava kir. Min hîn ê **xwe** ava nekiriye.’

Ma **para xo** nêwerde. Ma ê **xo** da ìnan. ‘Me **para xwe** nexwar. Me **a xwe** da wan.’

To **kincê xo** ardê? Mi ê **xo** niyârdê. ‘Te **kincê xwe** anîn? Min ên **xwe** neanîn.’

1.6 Cihnavê Nebinavkirî

Ev cihnav şûna navdêrên nebinavkirî digirin. Hin cihnavênebina vkirî ev in: tayê ‘hin’, kes, ju ‘yek’, filan, ewk, çi, çiyê ‘tiştek’, pêro ‘hemû’, çend, zafine ‘gelek’, her kes, her çî, kulî ‘hemû’, mordem ‘mirov’.

1.6.1 Cihnava “Ju”yê ‘Yek’

Ev cihnav bi xwezayî yekhejmar e. Li gor rewş û zayendê diguhere.

Mînak:

Ju ame. ‘Yek hat.’ (yekhejmar, nêr, xwerû)

Juye amê. ‘Yek hat.’ (yekhejmar, mî, xwerû)

Juyî non werd. ‘Yekî nan xwar.’ (yekhejmar, nêr, tewandî)

Juye non werd. ‘Yekê nan xwar.’ (yekhejmar, mî, tewandî)

1.6.2 Cihnava “Kes”ê

Ev cihnav bi xwezayî yekhejmar û nêr e. Piranî di pirsan de tê bikaranîn. Li gor rewşê diguhere.

104

Mînak:

Kes ame? ‘Kes hat?’ (yekhejmar, nêr, xwerû)

Kesi non werd? ‘Kesi nan xwar?’ (yekhejmar, nêr, tewandî)

Nîşe: Ev cihnav piranî di hevokênebina neyînî de tê bikaranîn.

Mînak:

Kes nîşkîno vajo ke şima çiyê nêkerdo. ‘Kes nikare bibêje ku we tiştek nekiriye.’

1.6.3 Cihnava “Tayê” ‘Hin’

Ev cihnav bi xwezayî pirhejmar e. Li gor rewş û zayendê diguhere.

Mînak:

Tayê amî, tayê şî. ‘Hin hatin, hin çûn.’ (pirhejmar)

Tayîne werd, tayîne newerd. ‘Hinan xwar, hinan nexwar.’ (pirhejmar, tewandî)

1.6.4 Cihnav “Zêde”yê

Ev cihnav bi xwezayî her tim pirhejmar e. Lewra ji aliyê zayendê ve nêtar e.

Zêde amî. ‘**Zêde** hatin.’ (xwerû)

Zêdîne werd. ‘**Gelekan** xwar.’ (tewandî)

1.6.5 Cihnav “Zaf”ê ‘Gelek’

Zaf amî. ‘**gelek** hatin.’ (xwerû)

Zafînê werd. ‘**Gelekan** xwar.’ (tewandî)

1.6.6 Cihnavên “Kulî” û “Pêro”yê ‘Hemû’

Ev cihnav bi xwezayî her tim pirhejmar in. Lewra ji aliyê zayendê ve nêtar in.

Mînak:

Kulî amî, **kulî** şî. ‘**Hemû** hatin, **hemû** çûn.’ (xwerû)

Pêro amî, **pêro** şî. ‘**Hemû** hatin, **hemû** çûn.’ (xwerû)

Kulîne werd. ‘**Hemûyan** xwar.’ (tewandî)

Pêrune non werd. ‘**Hemûyan** nan xwar.’ (tewandî)

Nîşe: Di rewşa tewandî de, hem cihnavva “**tayê**” hem cihnavva “**kulî**” hem jî cihnavva “**pêro**”yê dema ku morfema pirhejmariyê “**an**”ê digirin, “**tayê+an**” dibe “**tayîne**”; “**kulî+an**” dibe “**kulîne**”, “**pêro + an**” dibe “**pêrune**”.

105

1.7 Cihnavva Lihevxitî: “Ci” ‘Jê’

Ev cihnav bi xwezayî yekhejmar e. Ji aliyê zayendê ve nêtar e. Her tim di rewşa tewandî de ye.

Mînak:

Ê ra vajê, ez ê karî nêkeno. ‘**Ji wî re** bibêjin, ez wî karî nakim.’

Ci ra vajê, ez ê karî nêkeno. ‘**Jê re** bibêjin, ez wî karî nakim.’

Aye ra vajê, ez ê karî nêkeno. ‘**Ji wê re** bibêjin, ez wî karî nakim.’

Ci ra vajê, ez ê karî nêkeno. ‘**Jê re** bibêjin, ez wî karî nakim.’

1.7.1 Cihnavva “Pê”yê

Ev cihnav her tim di rewşa tewandî de ye û ji aliyê zayend û mîjerê ve nêtar e.

Mînak:

Bi ê lajekî kay meke. ‘Bi wî lawikî melîze.’

Pê kay meke. ‘**Pê** melîze.’

Tî bi a kardî çi kena hurdî? ‘Tu bi wê kérê çi hûr dikî?’

Ez **pê** sayê kena hurdî. ‘Ez **pê** sêvê hûr dikim?’

Ma bi aye zaf huyayîme. ‘Em bi wê gelek keniyan.’

Ma zaf **pê** huyayîme. ‘Em gelek **pê** keniyan.’

Bi ê hevdriya_xo ano. **Bi wî** hedûriya xwe tînim.

Pê hevdriya xo ano. **Pê** hedûriya xwe tînim.’

1.8 Cihnavâ “Jubînî”ê ‘Hevûdin’ (Reciprocal Pronoun)

Ev cihnav her tim di rewşa tewandî de ye û di zazakî de di pirhejmariyê de zayend tuneye û ji ber ku ev cihnav tu carî yekhejmar jî nayê hesibandin ji aliyê zayendê ve nêtar e.

Mînak:

Mi qaytê aye kerd, aye qaytê mi kerd. ‘Min li wê nêrî. Wê li min nêrî.’

Ma qaytê **jubînî** kerd. ‘Me li **hevûdin** nêrî.’

Ma û piyê mi **jubînî** ra hes kenê. ‘Dê û bavê min ji **hevûdin** hez dikin.’

Înan **jubînî** dî. ‘Wan **hevûdin** dît.’

1.9 Cihnavên Peywendiyê (Relative Pronouns)

Di zazakî de cihnavên peywendiyyê ji bingihaneka (subordinator) “**ke**”yê û îzafeyên rengdêrî pêk tê. Ji ber ku îzafe li gor zayend û mêmjerê diguhere, loma cihnavên peywendiyyê jî sê heb in:

Lajeko + **ke** ‘Kurê + **ku**’ (yekhejmar, nêr)

Çêneka + **ke** ‘Keçika + **ku**’ (yekhejmar, mê)

Domanê+ **ke**, ‘Zarokê + **ku**’ (pirhejmar)

Mînak:

Lajek verê bonî de kay keno. O birazayê min o. ‘Kurik li ber xanî dilîze. Ew birazayê min e.’

Lajeko **ke** verê bonî de kay keno birazayê min o. ‘Kurik**ê** **ku** li ber xanî dilîze birazayê min e.’

Çêneke dewe ra êna. A werezaya min a. ‘Keçik ji gund tê. Ew xwarziya min e.’

Çêneka **ke** dewe ra êna werezaya min a. ‘Keçika **ku** ji gund tê xwarziya min e.’

Domanî kuklî kay kenê. Ê dewa ma ra yê. ‘Zarok veşartokê dilîzin. Ew ji gundê me ne.’

Domanê **ke** kuklî kay kenê dewa ma ra yê. ‘Zarokên **ku** veşartokê dilîzin ji gundê me ne.’

ENCAM

Bi giştî di zazakî de taybetmendiya cihnavan ew e ku dabeşkirina wan ne li gor biker û bireserê ye, li gor rewşen xwerû û tewandî ye. Ev yek tê wê wateyê ku di zazakî de wekî gelek zimanên din, cihnavêni kesî ji bo biker û bireserê sabît nînin, bi gotineke din li gor rewşê diguherin.

Di devoka Gimigimê de di cihnava duyem a yekhejmar de zayend ji holê rabûye. Wekî mînak di devoka Gimigimê de hem ji jinekê re hem jî ji zilamekî re dibêjin:

Tî senêni a. ‘Tu çawa yî?’

Lê di devokêni din de ji jinekê re dibêjin:

Tî senîni a. ‘Tu çawa yî?’

Ji zilamekî re jî dibêjin:

Tî senîni î. ‘Tu çawa yî?’

Dîsa di heman cihnavê de carinan di şûna cihnava xwerû “**tî**”yê de cihnava tewandî “**to**” tê bikaranîn.

ÇAVKANÎ

Aksan, D. (2009): *Her Yönüyle Dil, Ana Çizgileriyle Dilbilim*, Ankara: Türk Dil Kurumu Yayınları.

Çağlayan, Ercan (2016): Zazalar, Kültür ve Kimlik, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, ç. 1 İstanbul.

Jandil, Lerzan (1999): Ziwanê Kurdkî (Diyalekta Kirmanckî) de Zemîrî, Vate Kovara Kulturî, h. 7 Wisar.



WOMEN'S FUNERAL (AN ANTHROPOLOGICAL STUDY)

م.م. نادیه ولی جبار / Nadia Wali JABBAR *

Abstract

This study tries to put a highlight on a social phenomenon, which is women's funeral. The results of this study: describing and analyzing women's funeral tradition, also showing the potency of change in (social, economic and culture) on the prominence of a new appearance and a new tradition associated with women's funeral. In this study, photographic and comparative methods are used. A purposive sample is also used: the sample unit contains (20) individuals in Erbil city, the used tool in this study (interview and observation).

The conclusions of this study: the funeral process; between past and present, it has been changed a lot. According to as now the technology has developed and people get to know earlier, also people now know a lot more about religion and their awareness has increased in funerals; the clothing style has been changed at the same time. In the past, this ceremony would go on only in the dead's house, but nowadays they practice it under tents and in specialized holes. The social roles of the funeral have been changed. Before, social relationships were stronger; people then were going to funerals as a theological and social duty, but now people go for shame and blaming. After that because of change in the way people live in Erbil. The modality and intention behind funeral have been changed. Those changes in funeral significations and its functions are shown. Control Social function. Social solidarity, breaking funeral early, clothing colors over and above black, no lamentation, decreasing visit time to the grave, remmbering.

Key words: Culture, Tradition, Ceremony, Women's Funeral and Ritual.

پوخته

پرسه‌ی زنان (تویزینه‌وهیمه‌کی ئەنترۆپلۆژییه)

ئەم تویزینه‌وهیمه‌کی ھەولەدات بەسەر دیاردیه‌کی کۆمەلایەتىدا بېرۋىت كە ئەھىش پرسه‌ی زنانە. لە ئامانچەكانى ئەم تویزینه‌وهیمه‌بۇسفىكىرىن و لىكىدانه‌وهى نەرىيەتكانى پەيپەست بە پرسه‌ی زنان؛ ھەروەھا دەرخىستى كارىگەربى گورانى (كۆمەلایەتى، ئابۇورى و كولتۇرى) لەسەر دەركەمۇتنى شىۋازى نۇى و نەرىيەتى نوبىي پەيپەست بە پرسه‌ی زنانە. لەم تویزینه‌وهىمەدا مىتۆدى ئىتتۈڭرەفى و بەراوردىكارى بەكارھاتۇون. نموونەمى مەبىستدار بەكارھاتووه؛ يەكمەن نەونەكە

* PhD Student: Nadia Wali Jabbar, in Salahaddin University, College of Art, Sociology Department, Erbill

قوتابىي دكتورا و مامۆستاي يارىددەر لە زانكۈي سەلاھەدین، كۆلىزى ئەمدەبىيات، بېشى كۆمەنلىسى، ھەولىز

له(٢٠) تاکی شاری همولیر و مرگیر او، ئامرازى بىكارهاتوو لەم توپىزىنەوەيە برىتىيە له(چاپىتكەوتن و تېبىنى).

ئەم توپىزىنەوەيە بىچەند ئەنجامىك گەيشتۇرۇدۇ: شىوازى بەرتۇمچۇونى مەراسىمى پرسە؛ لەتىوان راپىدوو و ھەنۇوكەدا، گورانىكى زۆرى بەسەردا ھاتووه؛ بەۋېپېيى نىستا تەكەنلەۋۇزىا پېشىكەوتوو و خەلکى زووتىر ئاكىدار دەكىنەوە، ھەروەها شارەزايۇونى خەلکى بۇ ئايىن و بەرزبۇونەوە ئاستى ھوشيارى خەلکى بەرامبەر بە شىونەنگىزىان له پرسەدا، لەھەمانكاتشا شىوازى جل و بەرگ گورانىكى زۆرى بەخۇوە بىنیوھ. ھەروەها لەر اپىدوودا ئەم رىپەرەسمە تەنھا لەممالى خاوند مەدووڭە بەرىيە دەمچۇو، بەلام نىستا له ژىر چادر و ھۆلى تابىتىشدا ئەنجامدەرىت. ھەروەها و زېفە كۆمەلایەتىكەنلىپەرەسە گورانىان بەسەردا ھاتووه، لەر اپىدوودا پەيموندى كۆمەلایەتى لە ئاستىكى بەرزاپىدا بۇو؛ خەلکى دەمچوھ پرسە بەئەركەنلىكى كۆمەلایەتى و ئابىنى دادھنا؛ بەلام نىستى خەلکى لەپەرە عەيە و گەلپى ئىكەن دەجن. ئىنجا بەھۆى گورانى شىوازى ژيانى تاكەكان له شارى همولىر، ئىتىر چۈنىتى و مەبەستى پاشت پرسە دانانىش، گورانىان بەسەرداھاتووه. ئۇمۇ گورانانش له ئامازەكانى پرسە و و زېفەكانتىدا زۆر بەزەقى دەركەمون. وەك و زېفە ئۆزىنەن كۆمەلایەتى، وابىستە ئۆزىنەن كۆمەلایەتى، ھەروەها زۇو شەكەنلىنى پرسە، پوشىنى جل و بەرگى جەڭ كەلەرنىكى رەش، شىونەن نەكىردن، كەمبۇونەوە ماوە سەرداڭىردىنى گۆرى مردوو، يادىكەنەمەكان.

كلىيمەكانى توپىزىنەوە: كولتۇر، دايونەرىت، مەراسىم، پرسە ئىنان، سرووت.

پېشەكى

كۆمەلگەي مەرقىي بەردهوام لەھەۋا ئەمدا بۇوە ئەندامانى كۆنترۆل بىكەت و لەچوارچىۋە دابۇنەرىت و مەراسىمە كۆمەلایەتى و ئابىنەيەكانەوە، وابىستىبۇون و پەيموندىيە كۆمەلایەتىكەنلىان پەتوو و رېكباتخان. بۇيە لەپەرامبەر پاپەندەبۇون بە دابۇنەرىتائەوە، چەندىن پاداشت و سزا دانراون تاومۇكۇ تاكەكان نەتوانن لىيان لابدەن. گومانى تىدا ئىمە دابۇنەرىتائە لە كۆمەلگەيەكەمە بۇ يەكى دىكە جىاوازن، لەرروو چۈنىتى و چەندىتى دوبۇبار مەركەنەوە ئۇمۇ دابۇنەرىتائە، ئەمەش بۇ جىهانبىنى و تىپوانىنى كۆمەلگا بۇ سروشت و واقىعى كۆمەلایەتى، دەڭەرىتىمۇ.

دابۇنەرىتەكان بەرجەستەكەن بۇونى كۆمەلایەتىيەنەي كۆمەلگەيە و ياساڭەلىكى زارمەكىن، كە كۆمەلېك و زېفە كۆمەلایەتى ئەنجامدەدەن. ھەر ئەمانانش بەشىكەن لە كولتۇر، كۆمەلگا و، لەميانەي كولتۇرەمە پەيمونىيەكان و چۈنىتى كارلىكىكەنلىنى تاكەكان لەمگەنلىكەندا رېكەمەخات و كۆنترۆليان دەكەت.

نەرىتەكانى تايىەت بە پرسە، چەند رەھەندىكى جىاوازىيان ھەمە(ئابىنى و كۆمەلایەتى). رەھەندىكى ئابىنى ھەمە، لەپەر ئەمە پەيمونى بە دىاردەي مەردنەوە، مەردىش يەكىكە لە دىاردە گەنگەكان كە بەردهوام پەرسىارى يەكمىمى مەرۋە كە لە چوارچىۋە فەلسەفە و ئابىنە ئاسمانى و زەمینىيەكانەوە بەدوای وەلامدانوھىدا، گەرلاوە. لەمەتە مەرۋە بۇونى ھەمە بە سۇراخى نەيىن و بەرەنگاربۇونەوە مەردن و نەمرىبىمۇ بۇوە. رەھەندىكى كۆمەلایەتىسى ھەمە، لەپەر ئەمە و زېفە گەلەنلىكى كۆمەلایەتى ئەنجامدەدەت و بەرھەممى گەرۋە مەرقىيەكانە. پرسە دانان بۇ دەربىرەنلى ئەم خەم و فشارەمە كە تاكەكان لە ناخىاندا يە لەكاتى لەدىستان و مەرىنى كەسەتكى نزىك و نازىزىيەكىان، ئىتىر ئەم مەراسىمە لە ھەممۇ

کومه‌لگه‌کاندا بونی همه، به‌لام به شیوازی جیاواز به‌پی کولتوری تایبیت و واقعه کومه‌لایه‌تیبه‌کمیان بمریوه دهبن.

شاری همولیز، به‌وپنیه‌ی شاریکی کون و گموردی هرئیمی کورستانی عیراقه، نهوا کولتور و دابونه‌ریتیکی کونی همه و خملکی همولیز زور پیوه‌ستن پیانه‌وه؛ پرسه‌ش به‌شیکه لهو نهریت و مهرا‌سیمانه که بمردوام حسیبی بو دهکریت لهم شاره. هروه‌ها گمی کورد به‌گشتی هینده کاره‌ساتی ناخوشی له‌هدستانی ئازیز و کم‌س و کاری بینیوه، ئیتر پرسه‌دانان بوده‌ته به‌شیک لهو مهرا‌سیمه کولتوری و ئایینیانه که بمردوام پابنده پیوه‌ی. هر له میزه پرسه‌ی ژنان و پیاوان لهم ناوچیه‌ی لامیک کات، به‌لام له دوو شوینی جیاوازدا بمریوه چووه و دهچیت، پیاوان له مزگه‌وتکان و ژنانیش له هولی تایبیتی پرسه‌ی ژنان که له نیو مزگه‌وتکان دروست دهکریت، یان له مالی خاوه‌ن مردووه‌که، یانیش له نزیک مال و له نیو خیمه‌مکی تایبیت به پرسه کو دهبنه‌وه؛ بو گوزارشکردن له هستی خم و پهزاره‌یان به له‌هدستانی کم‌سو کار و هاوری و خوش‌هویستانیان.

نه‌گهر سالانی رابردوو پرسه له‌نیوان ۷۳ رۆژدابوو، به‌وپنیه‌ی پرسه‌ی کم‌سه به‌تمه‌منه‌کان تمنها (۳) رۆژبورو، به‌لام پرسه‌ی کم‌سیک که ته‌منه‌نی لاو بواهه نزیکه‌ی (۷) رۆژی دهخایند، نهوا هننوکه به‌هۆکاری ئهو گورانه کومه‌لایه‌تی و ئابووریانه بسمر هرئیمی کورستاندا هاتونون، له ریگه‌ی چمند بپیاریکمه هه‌ولدر اووه ریوره‌سمه‌کانی په‌بیوه‌ست به نهریتکانی پرسه ریکبخرینه‌وه، بموهی رۆژه‌کانی پرسه له دوو رۆژ تیپیر نه‌کات. دانیشتی پیاوان له مزگه‌وت به‌مهم‌بستی مهرا‌سیمه‌کانی پرسه‌وه ده‌بیت له کات‌ژمیر (۴-۲) ی پاش نیوهرۆد‌بیت. ئم بپیارانه پرسه‌ی ژنانیش ده‌گریت‌مه، به‌لام سه‌دانکردنی پرسه‌ی ژنان ماوه‌که‌ی دریز تره به‌وپنیه‌ی ئه‌میان به‌زوری له‌نیو رشم‌مال و چادری تایبیت به پرسه له نزیک مالی خاوه‌ن مردوادا، بمریوه دهچیت و همندیک جاریش له‌نیو ماله‌کان یانیش هولی تایبیت به پرسه، ئه‌نجام‌ده‌دریت، بۆیه ژنان له‌بیانیمه‌وه تا نیواره (زوریه‌ی جار کم‌سه نزیکه‌کانی خاوه‌ن مردوو، نانی نیوهرۆ له‌نیدا ده‌خون) بمردوام ده‌بیت.

بابه‌تی ئم توپرینه‌وه‌یه خۆی له‌هدا ده‌بینیت‌مه، که ده‌بیوت تیشک بخاته سه‌پرسه‌ی ژنان، به‌وپنیه‌ی مهرا‌سیمی پرسه دابونه‌ریتیکی کومه‌لایه‌تی ئاینیه، به‌مهم‌بستی پالپشکردن و ده‌بربرینی هاوخ‌می بو خاوه‌ن مردوو، پیاده دهکریت. ئم نهریتیه يه‌کیکه لهو نهریتکانی کومه‌لگا بمه‌میان ده‌هینیت، به ئامانجی يه‌کگرتن و مسوگه‌مکردنی و اباهه‌سته‌بونی ئه‌ندامانی کومه‌لگا بهو گروپه کومه‌لایه‌تیانه‌وه که ئینتمایان بؤیان همه. پرسه دابونه‌ریتیکی کومه‌لایه‌تی و مانا و هیمای کومه‌لایه‌تی زوری همه، که پابهندبون پیشه‌وه ده‌شی پیوهریکی سه‌رکی بیت بو ئینتمابون و پیوه‌ستبون به گروپه کومه‌لایه‌تیه‌کانه‌وه. گورانه کومه‌لایه‌تی، ئابووری و سیاسیه‌کانی کومه‌لگای کوردی و ده‌که‌هونتی ئامرازه ته‌کن‌لۆژیه‌کانی پیوه‌ندیکردن، ده‌شی رولیان هه‌بیت له ده‌که‌هونتی شیوازی نوى له نهریتکانی پیوه‌ست به پرسه و چونیه‌تی ده‌بربرینی هاو‌سوزی بو خاوه‌ن پرسه، به‌تایبیت پرسه‌ی ژنان، که رنگه هننوکه ریوره‌سمه‌کانی پرسه‌ی ژنان و ده‌بربرینی هاوخ‌می و مکو سالانی پیشوا نه‌ماییت، دابونه‌ریت و شیوازی دیکه و رهقاری

نوئ بۇ گۈزارشتىردىن لە ھاوسۇزى بۇ خانھواھى مىرىدۇوهكە ھاتوننەتە ئاراوه و، پرسەى ژنانى ئىستا و پرسەى ژنان لە كۆندا جىاوازىيەكى زۇريان ھەمە. ھەممۇ ئەمانە بەشىۋەھەكى راستەخۇ يَا ناراستەخۇ كارىگەربى لەسەر وزېفەى كۆمەلایەتى ئەم نەرىتە دروست دەكەن. پرسى سەرەكى ئەم توپۇزىنەوەيە خۇي لەچەند پرسىيارىكدا دەبىننەتە: پرسەى ژنان چ مانا و وزېفەكى كۆمەلایەتى ھەمە؟ ئەم نەرىتە چۈن بەرنىو دەچىت؟ گۇرانى كۆمەلایەتى و ئابورى و كولتۇرلى چ كارىگەربىيەكىان لەسەر پرسەى ژنان دروست كەردووه؟ پرسەى ژنان چۈن بەرنىو دەچىت؟ پرسە گىران چ جلوبەرگىك دەپۈشىن؟ ئەمە لەكەل پرسەى ژنان لە كۆندا چۈن جىاوازى ھەمە؟.

ھەروەھا دەتوانىن گىرنىگى ئەم توپۇزىنەوەيە لەم چەند خالە لای خوارەوە بخەينەررۇو:

۱- بابەتىكى سەرەكى ئەنترۆپۇلۇزيا توپۇزىنەوەيە لە دابونەرىتەكان سررووت و مەراسىمەكان. پرسەى ژنانىش يەكىكە لە دابونەرىتە و مەراسىمە گىرنگەكان، كە كۆمەلگا بەردەوام و بى بىرانمۇ لەكەلەيدا دەزىت و لە قۇناغىتىكەوە بۇ يەكى دىكە گۇرانى بەسەردا دىت، ئەمە وادەكتە كە بابەتىكى ھەنۇرەكىي بىت بۇ توپۇزىنەوە.

۲- ئەم نەرىتەنە بەھايەكى كۆمەلایەتىيان ھەمە و پىويىستە بەردەوام بايەخىان پى بىدرىت. ئىنجا لمبىر ئەمە ئەم بابەتە (بەپىنى ئاڭدارى توپۇزەران) لە كۆمەلگا كوردى و لە رۇوى ئەنترۆپۇلۇزىيەوە، توپۇزىنەوەيە لمبىرەوە نەكراوه، بۇيە بايەخىكى زانسى زۇرى ھەمە. ئامانچ لەم توپۇزىنەوەيە:

۱- وەسفىرىدىن و لېكدانەوە دابونەرىتەكانى پەيپەست بە مەراسىمەكانى پرسەى ژنان.

۲- دەرخستى كارىگەربى گۇرانى (كۆمەلایەتى، ئابورى و كولتۇرلى) لەسەر دەركەوتتى شىوازى نۇئى و نەرىتى نوپىي پەيپەست بە پرسەى ژنانەوە. ئەم توپۇزىنەوە لە رىگە ئەندەن تەھەرىنەكەوە ھەمۆلدەت باس لە پرسەى ژنان بىكت. تەھەرىنەكانى ئەم توپۇزىنەوەيە بەمشىۋەھەن:

يەكەم: دىاريىكىرىن و ناساندىنى چەمكەكانى توپۇزىنەوە

۱: دابونەرىتە (Tradition)

ئەمە رەفتار و شىوازىيکى ھەلسوكەوتە كە كۆمەل و گروپە كۆمەلایەتىيەكان پېيان شىتىكى راستە يان شىتىكى باشە، ئەمەش لمبىر ئەمەيە كە لەكەل كولتۇردا ويىچۇوە (الحسن: ۱۹۹۹: ۴۰۴). واتە دابونەرىت توخمىكى پىكەپەنەرى كولتۇرە و شىوازىيکى ھەلسوكەوتىكىنى دىاريىكراوه؛ لمبىرامبىر دىاردە يان سروتىكى دىاريىكراو، كە تاكەكانى كۆمەلگا لەرىيگە ئەندىبارەكىنەوەيەوە، درك بەوه دەكەن كە پىويىستە پابەندىيان بىن و لېيان لانەدەن.

۲: مردن (Death)

مردن، جیابونه‌وهی روحه له جهسته؛ وهستانی کوئندامهکانی لمشه له کارکردن. گوزمرکردن له دنیای زموی و لهدایکبوبونه له دنیای کوتایی.

و اته مردن هم دیاردهیمهکی بایولوژیه و همیش دیاردهیمهکی نیسکاتلوفزی (Escathologie)، ئەممەی دوایی و اته؛ تمواوی ئەو شتانەی دهورەی مردنیان داوه له مerasimی بهخاکسپاردن و هیمای ئائینی. (ئەمەم: ۲۰۱۴: ۲۰). به مردن ژیانی دنیایی کوتایی دىت و ژیانی کوتایی دەست پىدەكتات، ئەممەش بەو مانایه دىت كە مردن له ژیان و له دواي ئەم ژیانه بۇونیان نییە، بەلکو هەرچى هەمیه برىتىيە له گوزمرکردن له ژیاتىكى سنوردار به كات بۆ ژیاتىكى بى کوتایی و بى بۇونی سنوريك و كاتىكى دیاريکراو. (الوائلی: ۹۸۲: ۱۹۸۲).

۳: پرسەی ژنان (Funeral)

پرسە، مerasim و نەريتىكى كۆمەلايەتىيە بەماناي لېپرسىنەوه و پېيەخشىنى ئارامى، دلەوايىكىردن، پالپىشىكىردن و ھەلگرتنى برىيک لە قورسايىكەكانى لە دەستدانى كەسىك دىت لەلاين ئەمانى دىكمەو. ھەممو ئەمانەش بە دەربرىنى ئەو دەستەمۇازانە كە خاون مردوو ئارام دەكتاموھ و خەممەكەھى كەممەكتاموھ، ئەنجامەدرىت.

پرسە، وەك - مerasimىكى - سەرەتكى تايىمت وايه كە خەلکى سەرمخۇشى لەكمس و كارى مردووەكە دەكەن، ئەم پرسەي سىستەمەكى ووردى هەمیه و مالى مردووەكە و سەرمخۇشكاران پابەندن بېۋەي، ئىنجا، دەرچۈن لەم سىستەمە وەك لادان و سەرپىچىكىردنى بەھاكانى گروپ وايه (الاصرف و العقيبة، ۲۰۰۷: ۲۶۷).

بەلام پرسەی ژنان؛ ئەم مerasim تايىتەتىيە پرسەي، كە تەنها ژنان تىيدا بەشدارىدەكەن، دەشى لەنئىو چادر يارەشمالى تايىمت بە پرسە يانىش لەنئىو مالى خاون پرسە، ياخود ھەندى جار لە ھۆلى تايىتەكرارو بە پرسەي ژنان، ئەم پرسە گىرانە ئەنمىجام بىرىت. ئەمشىوازى پرسەگىران بۆ ماوهى دوو رۆژ بەردموام دەبىت.

دووەم: تویىزىنەوهەكانى پېشىو ئاراستە تىيورىيەكانى تویىزىنەوه

۱- تویىزىنەوهەكانى پېشىو:

مانا كۆمەلايەتىيەكانى نەريتى پېيوەست بە دیاردهى مردن: (الاصرف و العقيبة، ۲۰۰۷)

ئامانجى ئەم تویىزىنەوهە بەولدانە بۆ شىكىرنەوهى داب و نەريتى تايىمت بە دیاردهى مردن لەميانەى ئەو گورانكارييە كۆمەلايەتى و ئابورى لە شارى(بانىس)، ئەممەش بەبەراوردىكىردنى داب و نەريت دانىشتۇرى لادىنى بەدانىشتۇرانى شار.

ئەم تویىزىنەوهە بۆ شىكىرنەوهى داب و نەريت پىشت دەبىستى بە دووگۈرىيەنەى سەرەتكى، شرۇقەمکىردنى يەكمە گورانى داب و نەريتى پېيوەست بە دیاردهى مردن لەميانەى گورانى ئابورى و كۆمەلايەتى كە ساحلى سورى بەخۇوه دەبىنى، گۈرىيەنەى دووەم شرۇقەمکىردنى داب و نەريت لە ميانەى تايىتمەندىيەكانى تاك و سىفەتى چۆنایەتى وەك(تەمەن، خۇپىندەوارى، ھۆشيارى كۆمەلايەتى....).

هەروەھا ئەم توپرئىنەوەيە پشت دەبەستى بە مىتۇدى شىكىرنەوهى وەسفى و، مىتۇدى ژىنگەيى(الايکولوجى)، مىتۇدى بەراوردىكارى، نموونەنى وەرگىراو پېكھاتووە لە لەپەتمەنگان و گەنچ وەرگىراون، بەتەمەنگان تاكو بىزان تاچەند پارىزگارىيان لەداب و نەرىتى كۆملەڭاكەيان كەردووە تاكو ئىستاكە و، جياۋىزى لەگەل رابردو چىيە. ئامرازى بەكارھاتوو تىيىنى بەشدارى و، چاپىكەوتتى كەراوەيە.

لە ئەنجامدا توپرئىنەوەكە گەيشتتىيە ئەمەنەن وەزىفەتى كۆمەلەيەتى بۇ داب و نەرىت پەپيوەست بەدىاردەي مردن گۈرانكارى بەسەردا دىت؛ ئەمەش لەگەل ئەمەن گۈرانان گەشتىيەتى كە سورىيا بەخۇوهى بىنیوھ، هەروەھا تايىەتمەننېيەكانى تاك و سىماي چۈنایەتى كارىگەر دەبى ئەم داب و نەرىتە.

داب و نەرىتى كۆمەلەيەتى پەپيوەست بە دىاردەي مردن يەكىكە لەو ميكانزىزمانەي كە كۆمەلەڭا بەرھەمى دەھىتت؛ لە ئەنجامى ئەمەن مۇونەنى كەجيای دەكتەمەن لەكۆملەڭاكەنانى تر و دەبىتتە ھۆرى يەكگەرتەن و وابستەتىي، پارىزگارى لەبۇون و بەردوامى خۆى دەكتەن، ئەمەش ماناي كۆمەلەيەتى و ئامازەكەن لە خۆ دەگرىت كە گەينىگىان زىاتر دەبى بەگۈزىرەتى درك پېكىرنى تاكەكان بۇى، ھۆشىيارىيان بۇ وەزىفەكانىيان لەچوارچىوهى دىياردە و ئەم گۈرانان فراوانانى كە كۆمەلەڭا بەخۇيىمە دەبىنلى كەتتىكەمەن بۇ كاتىكى تر. ئەوانەن پەپيوەستن بە بەھا ئەمەلەيەتى كە لە داب و نەرىتى كۆملەڭاۋە وەريان گەرتۇوە و پابەند بۇون بېوهى بەپىورىكى گەنگ دادەنرەت لەپىورەكانى ئىئىتما و پەپيوەست بۇون بەكۆملەڭاۋە.

114

ئەمگۈرانان خىرايىەت بەسەر بارى ئابۇورى و كۆمەلەيەتى كۆمەلەڭا دەبىتتە ھۆرى دەركەوتتى ھەندى شىوازى نوئى لە رەفتارى كۆمەلەيەتى و داب و نەرىتى تايىەت بەروداوى مردن ناوەستى بەزەرورەت لە بەرامبەر ئەمەن داب و نەرىتى چەقبەستوی خەلکى لەرادردووا.

۲ - ئاراستە تىۋرىيەكانى توپرئىنەوە:

زانىيانى ئەنترۆپۇلۇزيا زۇر گەنگىيان بە مەراسىم(Ceremony) و سروستەكان (Ritual) داوه لەكتەن ئەنلىكەن لە ئايىن، ئەمۇش لەررووی لىتوبىنەوەيەنەوە لە سروشت، خەسلەت و رووكارەكانى ئەم ئايىن، كە وەك سىستەم دەرددەكەن و گۈزارىشت لە چالاکىيە مەرقىيەكان دەكەن لە بواھەكانى ژيانيان. ھەربۆيە سروشتتىيە ئەگەر زۇرتىرىن بايەخ بە بىرۇباۋەر و مەراسىم و سروتەكان بىرىت و ئەم چەندايەتتىيە دەستتىشان بىكەن كە نەرىت، مەراسىم و سروتەكان ھەيانە لەسەر كۆلتۈرۈكى دىاريکراو بەگشتى. ئەمانەن ئايىنكردۇ، كە توپرئىنەوە لە مەراسىم و سروت (رىتال) لەلايمەن ئەنترۆپۇلۇزىستەكانەنەوە گەنگى خۆيان ھېبىت.

ئەنترۆپۇلۇزىستەكان ھەولىانداوه جياۋازى لەنپىان مەراسىم و سروستەكاندان بىكەن. لېرىدا ھەولۇدەرىت لەبەر رۇشنايى بابەتى توپرئىنەوەكەمەن، باس لە مەراسىم و سروتەكان بىرىت.

رېمۇند فېرىت پېيوايە سروت ئامرازىيە بۇ ئەنجامدانى كەردىيەكى ئايىنىي و ئەم سروتە ھېمايەكە بۇ ملکەچىرىن بۇ ئەم ئايىنە.(Firth, 1955, 150.) بەلام راد كەلىف براون و ايدەبىنى

سروت؛ شیوازیکی هیناییه بۆ گوزارشتکردن له هەست و سۆز و پابەندبۇون به بەھاكانەوە. (Beatti, 1968, 238)، كەچى پېتىوایه مەراسىم بەكارىت بۆ گوزارشتکردن له چالاكىيەكى كۆملەنلى و لەچوارچىنوهى نەرىتەمە، شىتكى داواكراوە، كە له بۇنەكانى ژيانى كۆمەلایەتىدا جىئەجى دەكىرىت و برىتىيە له بوارىيەكى تايىھتى چالاكىيە سروتىيەكان و لەنلە خەلکدا جىئەجى دەكىرىت. (Goody, 2010, 36). لەپەرامبەردا؛ ولیم ھافلەند و ئەوانى تر وا باسى سروتەكان دەكەن؛ بەپىتىيە ئامرازگەلەنەن كەسەكان بە شىتكى پېرۋەز دەپەستنەوە و رەنگە ئائينىيەكەمان بەسەردا زالە. ھەروەھا ئامانج لىنى بەھىزىرىنى پەيوەندىيە كۆمەلایەتىيەكانە له لايىك، يارمەتى دەرە بۆ كەمكەرنەمە و نەھىشتى دلەراوکى و شلەزان و خەم و خەفت، لەلایەكى دىكەمە. (Haviland, 1978, 505).

بەلام ئەنترۆپىلۇرۇزىست (مونىكا ويلسون) وايىدەپەتتى سروت؛ بەزۇرى چالاكىيەكى ئائينىيە و رېنېشاندەرە بۆ پېرۋەزىرىنى ھەندىكى ھىزى نادىار. ھەروەھا پېتىوایه سىمبول و چەممەكانى نىيۇ سروت، وەزىفەيان ھەمە. لەپەرامبەردا؛ مەراسىم، درىزچىپەندرى فۇرمىكى نەرىتىيە بۆ گوزارشتکردن له ھەستىكى دىيارىكراو، ئەم رېئورەسمە لەسەر بۇنەيەكى ئائينى كورت نەبۇتەمە. (Goody, 2010, 36).

ويلسون؛ سروت يەكسان دەكات و ھاوسلەنگى دەكات لەگەل چالاكىيەكى ئائينى، لەپەرامبەردا؛ مەراسىم، گشتىگىرتە و دەيگەر بىنەتەمە بۆ فۇرمىكى نەرىتى، نەك ئائينى.

كەواتە لىرەدا وادەرەكەمۈى كە سروت و مەراسىم دوو شتى زۆر لەيەك نزىكىن و زۆر جاران دەكىرى بەھەمان مانا بەكار بىن. لەم روومە؛ ئەڭمەر مەراسىم ئامراز يان ئامانج بىت، ئەوا پىنگىيەكى گەنگى ھەمە لە نىيۇ ژياندا، ھەروەھا زۆربەي جار له چالاكىيەكانى ژيانى رۆزانەي تاكەكاندا بەزۇرى دەرەكەمۈيت. زۆربەي مەراسىم و يان سروتەكان بە ئائين رەنگ رىزز كراون، بەلام ئەمە ماناي وانىيە كە لەميانەي سىستەكانى دىكەمە وەك خزمىيەتىي، ئابورىي و سىياسىدا دەرنەكەمۈيت ھەروەھا لە وەزىفەكانى ئەم مەراسىمانە، لەميانەي بەشدارىكىردن لە مەراسىمىيەكى دىيارىكراو ئەوا دلەراوکى و سەرلىشىوانى تاكەكان كەمەدەكانەوە، ھەروەھا ھەستى ئاسوودەبۇون و ئاسايىش و ئارامى دەبەخشىت، ئاراستەكارە بۆ رووبەر ووبۇنەوەي گىشە و گرفتەكانى ژيانى كۆملەلایەتىي (Taylor Robert B, 1980, 201, 202).

كەواتە ئەم مەراسىمانە گەنگن بۆ گوزارشتکردن له يەكگەرتۈۋىي كۆملەنگا و جەختىرىنەمە لەسەر بەھاوا بېرۋاپاھەكان، لەگەلېشىدا دەستبەرەكىنى كۆنترۇلى كۆمەلایەتىي، ئەممىش بە پارىزگارىكىردن له يەكگەرتۈۋىي كۆمەلایەتى لە رىيگەمى بەھىزىرىنى ھەست و سۆز و پەيوەندىيە كۆمەلایەتىيەكان.

سېيىم: مىتۇدى توپىزىنەوە

مىتۇدى بەكارھاتۇو لەم توپىزىنەوەيدا:

- 1 - مىتۇدى نىتەنگەن (Ethnography): توپىزىنەوە ئىتەنگەن گەيشتتە بە تىيەكىشىتتىكى قوللەلای ئەوتاكانەي ئىتەنمايان بۆ كولتۇرە جياوازوو ووردهكولتۇرەكان ھەمە، لەپەيرىن بەماناي واقعى ئەۋۇزىانە ئىتىدا دەزىن. ئىتەنگەنافيا؛ واتا نۇوسىن لەبارەي كولتۇرەوە. ئىتەنگەنافيا ھەلدەستى بە تىيەنەكىردن و تۆماركىردن ژيانى كۆمەلایەتى ئەمۇ

تاكانه‌ي کۆمەلگا، ئەوپىش و مسفىكى چروپىرى ژيانى رۆژانه‌ي ئەوتاكانه‌ي كە لەوشۇينە دىيارىكراومدا دەزىن. كەواتە ئەيتقۇگرافيا و ئېنمەكى ووردى ئەو مومارسە و داب و نەريتanhى ژيانى رۆژانه‌ي كولتوورىك يان وورده كولتووريك يانىش كولتوورى گروپىكى دىيارىكراو دەدات بەدەستەمەو. ئىنجا گرینگى زۆر بە كەل و پەل و توخە كولتوورييەكانى ئەو تاكانه‌ي توېزىنەمەيان لمبارەوە دەكىرتىت، ھولىدەن ئەم شنانە تومار بكمەن و شىكىردىنەمەو بۇ ئەو پىكەتە جۇراوجۇرانە بىنادى كۆمەلایەتى ئەو كۆمەلگا كە ئەنچام دەدەن. ئەمە رىيگايەكى رۇون و ئاشكرا و تاكىيە(بىر و لېقى، ٢٠١١، ٣٨٨).

٢ - مىتودى بەراوردىكارى (**Comparative Method**) لەم توېزىنەمەيدا مىتودى بەراوردىكارى لەلاينى مەيدانىدا بەكارهاتووه، بۇ بەراوردىكارى مەراسىمەكانى پرسە لەرابردوو و لە رۆژگارى ئەمرۆدا. بەۋىپىھى ئەم دىاردىھە مىزۇوېكى كۆنی ھەمە، تاكو بتوانىن بەراوردىكى بكمەن لەتىوان شىوازى بەرنىوھەچۈنى ئەم مەراسىمە لەكەل شىوازى بەرنىوھەچۈنى ئىستاكىمدا. ھەرۇھا ئەو گۇرانكارىيەنە بەسەرەيدا هاتووه.

مىتودى بەراوردىكارى بەكەلكى پىراكىتىزە دىت لەسەرجمەم زانستە كۆمەلایەتىيەكاندا، توېزىنەمەي كۆمەلایەتى بەسروشتى خۆى دەكىرتىت بەراوردىكارى تىدا بىرىت، بەلکو بەراوردىكارى بە يەكىك لە گرینگىزىن ئەو بەنممايانە دادەنرىت كە ئەنترۆپۇلۇزىا و كۆمەلناسە دامەزرىنەكان لەتوېزىنەمەو كۆمەلایەتىيە بەرايىكەن پېتىيان لەدانانى بەنممايانە ئەنترۆپۇلۇزىا و كۆمەلناسى، دۆركەھايم و زاناكانى دىكە؛ پېتىانوايە مىتودى بەراوردىكارى باشىرىن ئامرازە لە توېزىنەمەي كۆمەلایەتى، بەشىۋىھەك مىتودى مىزۇوى و مىتودى بەراوردىكارىيەن تىكەل كەرددووه(ئېيراش، ٢٠١٣، ٢٨٣).

چوارەم: كۆمەلگا و نموونەي توېزىنەمە

كۆمەلگا و نموونەي توېزىنەمە: ئەم توېزىنەمەي لەبارە (پرسەي ژنان، توېزىنەمەيەكى ئەنترۆپۇلۇزىيە لەشارى ھولىر)، لەم توېزىنەمەيدا نموونەيەكى مەبەستدار و ھەرگىراو، لېبىر ئۇمۇھى ھەولدرابو ئەو كىسانە و ھەربىگىرىن كە زۆرترىن زانىارىيەن لەبارە پرسەمە هەيە؛ ياخود كەسى بەتەمەن كە بەشىۋىھەكى زۆر بەشدارىيەن كەرددووه لەم مەراسىمە و ئاشنایيان ھەمە لەكەل ھەممۇ و ووردهكارىيەكانى، ئەمەش بۇ ئۇمۇھى بتوانىن زۆرترىن ووردهكارى و وەسف و تىكىھىشتن بەخەنەرۇو لەبارە ئەمە مەراسىمانە، وەزىفە كۆمەلایەتىيەكانى و ھىما و ئامازە جىاواز مەكانى.

پىنچەم: ئامرازى كۆكىرىنەوەي زانىارىيەكان

- ئامرازى بەكارهاتوو لەم توېزىنەمەيدا:

1. **چاوپىكەوتىن (Interview):** ئەمەش بە ئامانجى گەميشتن بە زانىارىگەلىيەكى رەنگانەمەي راستىيەكانە ياخود ھەلۇنىستىكى دىاريکراو، كە توېزەر پېۋىستى پېتىي پېتى بگات، لېبىر رۇشنايى ئامانجەكانى توېزىنەمەكە. چاوپىكەوتىن چەند جۇرىكە؛ لېرەدا توېزەر چاوپىكەوتى نىمچە كەراوەي و ھەرگىر تووه ئەم جۇرىيان پېشىت توېزەر پرسىيارەكانى دىاريکەرددووه، بەلام لەوانەيە رېزبەندى پرسىيارەكان بىگورىتىت، ياخود ھەندىكى لابدىتىت، ياخود ھەندىي پرسىيارى ترى بۇ زىاد بگات،

بهپیش بھریو مچوونی چاوپیکھوتنه که، لھم چاوپیکھوتنه دا سھربھستی دھدریتھ لیتویز مران لھ هلسوکھوت و مامھله و قسکھرندا، چونکه لھوانیھ لیتویز مر زانیاریگھانیکی هھبیت که تویز مر به خمایلدا نھهاتبی و ئاگداری نھبیت. (بیبر و لیقی، ۲۰۱۱: ۲۲۱).

- تەکنیکی ئەنجامدانی چاوپیکھوتنه کان لھم تویزینەھوھیدا:

بەممەبھستى ئەنجامدانی نەم کارە:

أ- نەھو تاکانھی بۆ چاوپیکھوتنه که دەستنیشانکران چەند تابیھەمندییەکیان ھېبوو، توانای دەربرینیان ھھبیت، بھزورى بیرورا کانیان لمیھکتر جیاواز نھبیت، هەروھا لەرۇوی زانیاریبیمەکانی تابیھەت بە پرسەوە زانیاریبیمەکی زۆریان ھھبیت.

ب- ھەموو چاوپیکھوتنه کان لھ نیو مال و شوینى کارکردنی تاکمکانى نموونەکەدا ئەنجامدراون، بەشیویمەکی تاکى، رووبەررووانە و بەتەنھا ئەنجامدراون، بۆ نەھوھی لیتویز مر بە دللىيای و بى بۇونى ھیج بھربەست و فشاریک- راستى بیرورا، نەزمۇون، بەسەربردنی ژيانى رۇۋانەی بخاتمەرو. هەروھا بۆ نەھوھی تویز مر بتوانىت چاودىرى و تىبىنیمەکانى خۇى بھوردى تومار بکات.

ث- هەر چاوپیکھوتتىك (٥٠ تا-٦٠) خولەکى خايادنۇو.

ث- ھەموو چاوپیکھوتنه کان بە رېکوردر تومارکراون، كە دواتر تویز مر ھەریەكەمانى بە جىا ياداشت و پاشان پاكنووس كردوو.

لھم تویزینەھوھیدا چاوپیکھوتتى نيمچەکراوه بھكار ھاتوو. نەھو تاکانھی كە بەتەمەنن؛ بۆ زياتر ئاشنابۇون بەم نھریتە و، لېكدانمۇو و دەرخستتى بھراوردىك لەنیوان مانای تابیھەت بە چۈنیيەتى بھریو مچوونی مەراسىمی پرسە لە رابردۇو و ئىستادا. لھم تویزینەھوھیدا فورمی چاوپیکھوتتى ئامادەکراوه بۆ ئەنجامدانی چاوپیکھوتتى نيمچەکراوهى تاکى. دواى ئەھى پرسىيارى چاوپیکھوتته کە ئامادەبۇو؛ تویز مر بەچەند پىپۇریکى ئەکادىمی پېشانداوە تاوهکو گەيشتۇو بە شىوازى كوتاپى كە ئىتىر بۆ ئەنجامدانی چاوپیکھوتنه کان شىاۋىبىت. شىوازى كوتاپى پرسىيارمەکانى چاوپیکھوتته کە لە (٥) تومور پىكھاتوو، كە بەسەر (٢٩) پرسىياردا دابېشكراون. هەروھا (٢٠) كەس وەك نموونەمەکی مەبەستدار و مەرگىراون كە كەسانى شارەزا و بە نەزمۇونبۇون.

2. تىبىنی(Observation): لھ تویزینەھوھیدا چۈنلەتىدا تىبىنی كەمتر رېكھراوه،

واتا تویز مر لھم جۇرە تویزینەواندا پۇلۇن و جۇرى دىيارىكراو بھكار ناھىننیت، بەلکو تىبىنیمەکانى بەشیویمەکی سروشتى و يەك لەدۋاي يەك و كراوهى تومار دەكات، شەتكان وەكى چۇن لەواقدايدە تومارى دەكات(قەدیلەجي و السامرائى، ٣٤٧: ٢٠٠٩). لھم تویزینەھوھیدا تىبىنی بەمشدارى ئاشكرا و مەرگىراوه؛ تىبىنی بەمشدارى واتا بەمشدارىكەن تویز مر لھ ژيانى رۇۋانەي ئەھو تاکانھى كە تىبىنیان دەكات و بەشدارى ھەموو چالاکىمەكان دەكات بۆ ماۋەھىمەکى دىيارىكراو(حسن، ٢٠٠٦: ٣١٢). لېرەدا كۆمەلگاى تویزینەھوھەر لەسەرتاواه دەزانىت كەوا تویز مر تىبىنیان دەكات، بەمېئەش دەبىتە ئاسانكاربىمەك بۆ تویز مر

کاتیک داوای رونکردنده‌ی بابهتیک یاخود مانای ئاماز مکانیان لىدەکات تاکو بۇی ropyonbekنەمەو، لەھەمنکاتدا پەیوەندى نیوان تویىزەر و تاکەکانى كۆمەلگاى تویىزىنەمەك، ئەمەش دېتىھە ھۆى دەرسەتلىپۇنى مەمانە لەنئيۆناندا، ھەروەھا قبۇولىرىدى تویىزەر لەلايمىن كۆمەلگاوه دەگەرتىمەو بۇ سروشتى كۆمەلگاکە و سروشتى پەیوەندى نیوان تویىزەر و كۆمەلگاکە(قىدىليجى و السamarائى، ٢٠٠٩ : ٣٤٩-٣٥٠).

شەشم: شىكىرنەمە زانىارىيەكان و ئەنجامەكانى تویىزىنەمە

يەك: خەسلەتە گشتىيەكانى تاکەكانى نموونەي تویىزىنەمە

خشتەي (1) خەسلەتە گشتىيەكانى تاکەكانى نموونەي تویىزىنەمە دەختەر وو

رېزەي سەدى	ژمارە	وەلامەكان	گۆراوەكان	ژ
%15	3	49-44	تمەن	1
%15	3	55-50		
%30	6	61-56		
%25	5	67-62		
%15	3	73-68		
%5	1	پۈرونگى		
%10	2	نەورۆز		
%10	2	ئازادى1		
%10	2	ئازادى2		
%5	1	كۈران		
%15	3	گۈلان1	گەرەك	2
%5	1	دېي زانڭو		
%5	1	پۇشىپىران		
%15	3	زانڭو1		
%10	2	شارى خەونەكان		
%10	2	برايەتى		
كۆى نموونە= 20 / ناودەنلى ژمیرىي بۇ تمەن= 59.1				

لە خشتەي (1) دا ئامازە بە دوو خەسلەتى گشتىي نموونەي تویىزىنەمە كراوه:

تمەن: رېزەي (١٥٪) ئى نموونەكە تمەننیان لەنئيۆنان (٤٤-٤٩) سالىيە. ھەروەھا رېزەي (١٥٪) ئى نموونەكە تمەننیان لەنئيۆنان (٥٥-٥٠) دايىه و رېزەي (٣٠٪) شىيان تمەننیان لە (٦٦-٥٦) سالىدا رېزەي (٢٥٪) نموونەكە تمەننیان لەنئيۆنان (٦٧-٦٢) دايىه و رېزەي (١٥٪) نموونەكە تمەننیان لەنئيۆنان (٦٨-٧٣) سالىدايە.

گەرەك: گەرمەكانى زانڭو ١ و گۈلان ١ هەرمەيكەميان رېزەي (١٥٪) نموونەكە پىكىدەھىنن. ھەروەھا گەرمەكانى (نەورۆز، ئازادىي ١، ئازادىي ٢، شارى خەونەكان، برايەتى رېزەي (١٠٪) ئى نموونەكە پىكىدەھىنن. بەلام گەرمەكمەكانى (پۇشىپىران، دېي زانڭو،

کوران ۱، روناکی ریزه‌ی (۵٪) ای نمونه‌که پنکده‌هینن. کوی نمونه‌که (۲۰)، هروه‌ها ناوندی ژمیره‌بی بۆ تەمەنی نمونه‌که (۵۹، ۱).

دوق: خسته‌برو و شیکردنەوەی زانیارییەکانی تویزینەوە

لیرددا هەولەدریت لەزیر چەند تومەریکدا، زانیارییە تایبەتییەکانی تویزینەوە بخزینەرتوو، ئەوانیش بەمشیو مین:

1. بەریوەبردنی مەراسیمی پرسە ياخود پرسە دانان:

بەپی بۆچوونى يەکەن نمونه‌کە، دواي مەراسیمی ناشتنى مردوو، پرسە دەست پى دەكتات. لەرابردوودا، پرسە بۆ ماوهی (۷) رۆژ دریزە دەكىشائەمە لە سالانى شەست، حفتا و ھشتاكانى سەدەی رابردوو؛ پاشان رۆژمکانى دانىشتن بەمەبستى پرسە، بۇو بە (۵) رۆژ. دواتريش، مەراسیمەکانى پرسە گىران بۇوە (۳) رۆژ (ئەمە لە سالانى نەمەدەكان تا سەرەتاي دوو هەزار)، كە خەلکى، هەر لە بەيانىيەوە تا كاتى شىوان لە مزگۇت پرسەيان دەگىرا، دواتر، چەند رۆزىكىش لە مالموه، خاونە مردوو، پېشوازىي لە كەسۋكار، ناسياو، خزمۇو كەس و ھاورتىيانى كردوو، ھەممو ئەمانەش، وەك رۆزلىنان بۇوە لە مردووەكە و بەجى نەھىشتنى خىزان و بنەمالەكەن لەو كاتە سەختەدا. ئىنجا بۆ ئەو مەراسیمە بەردوام خواردن و خواردنەوە بۆ ئامادەبوانى پرسەكە، نامادەكر او.

بەپی بۆچوونى نمونە تویزینەوەكە، خۇئامادەكردن بۆ مەراسیمی پرسە وەك داب و نەمرىتىك؛ لە باو باپيرانەوە پشت بە پشت ماوەتەوە؛ گىرانى پرسە، وەك زەرورەتىكى كۆمه‌لایەنلى تەمەشا دەكىيت و بەرگىكى ئابىنى بەبەردا كراوه، بەپىنەي پەيوەندىي تۈوندۇتۇل و خۇشەويىتىي تاكەكان بۆ يەكدىي، وايكىدوو، كاتى يەكىك دەمرىت؛ هەولەدەن بەباشتىرىن شىوه رېز و خۇشەويىتى خۇيان بەرامبەر لە دەستدانى ئەندامىك لە خىزانەكمىان، دەربىرن. پرسە، مەراسىمەكى چاھەر وان نەكراوه، واتا؛ پېشىنەت ھېچ ئامادەباشىيەكى بۆ نەكراوه، هەركە خىزاناتىك كەسىكى لى دەمرىت؛ ئىنجا، هەولەدەن بىزۇترىن كات كەسۋكاريانى لى ئاڭدار بەكەنەوە. ھەنۇوكە لەرىگەن ئامازەكانى گواستتەوە و تەكىنلۈزىيا رۆلەكى كارىگەر دەكىرەن لە چەندايەتى و چۈنایەتىي مەراسىمەكانى پرسەكىران، بەھۆى تەلمەقۇنەوە دەتوانىت بە كەمترىين كات و دەسبەجى، زۇرتىرىن خەلک ئاڭدار و كۆ بەكىنەوە. بەلام لە كوندا، حالتىكە جىاواز بۇو، يەكىك لە نزىكەكانى مردووەكە دەچۇو مالى خزم و ناسياوانى ئاڭدار دەكردەوە، ئەوانىتىرىش كەسانى تريان ئاڭدار دەكردەوە، ياخود ھەندىك خىزان (بەریزەمەكى كەم)، لەرىگەن تەلمەقۇنى مالەوە (تەلمەقۇنى نورمەل)، ئاڭدار دەكرانەوە. دواي ئاڭدار كەنەوە كەسۋكار؛ تابلوەكى پەرۋىنە رەنگ رەش، لەنزايىكى مالى خاونە مردوو ھەلدەوسىرىت، ئەم شتانەي لەنپىو دەنسىرىت: (ناوى سيانى و نازناوى مردوو، باوکى يا دايىكى فلانەكەسە ناوى كورەكانى مردووەكە دەنسىرىت، رۆزى وەفاتكەردنى، ناوى مزگۇتەكەن كە پرسەكەن تىدا بەریوەدەچىت، بەرۋارى وەفات و هەندىكىچار ھۆكارى وەفاتكەكش لەنپىو ئەو تابلوەكى، ئامازەنلىكى پى دەكىيت). دانانى ئەم تابلو پەرۋىنە؛ ھەم ھىمايەكە بۆ ئەمە رايىگەنەنلىكى كە لەو گەرەكە پرسە ھەم، ھەميش بۆ ئاڭدار كەنەوە و ئاسانكارىيە، تاۋەككى كەسۋكار و ناسياو مال و شوينى خاونە مردووەكە بەذۇز نەوە. ئامانچ لە دانانى پرسە، دلەنەوە خاونە

مردووه، هەرووەها بۆ ئەمەيە؛ خاون مردوو ھەندىك دەورى قەرمىلۇغ بىت تاكو خەممەكەي ھەندى لەپىر بىات.

ھەر لەگەل ئاگادار كىرىنەمەي خزم و كەس و كارى مردووەكە و كوبۇنەمەيان؛ دەست دەكەن بە كۆكىرىنەمەي مالى مردووەكە، ئەم كاره لەلايەن ھاوسي و كەس و كارى خاون مردووەكەمە ئەنجامدەرىت، ئىتەر ھەموو كەلۈپەلەكەنى ناو مالەكە لە ژۇورىكى خانووەكەدا كۆدەكىرىنەمە؛ ئەگەر شوينىشيان نەبۇو، لە ژۇورىكى مالى ھاوسييەكىيان دادەنرىت؛ چونكە خاون مردووەكە ئاگايان لەمآل و حايلان نامىنى، بۇيە دەور و دراوسى و خزم و كەس ئەم كاره دەكەن و مالەكە خاون دەكەنەمە و ئامادەي دەكەن بۆ پېشوازىكىرىن لە خەلقى.

لەم بارەيەوە خانمەيىكى تەممەن (٤) سالى دانىشتۇرى گەرەكى (گوندى زانقۇ) دەلىت: ئىستا بە تەلەفۇن كەس و كار ئاگادار دەكىرىنەمە، بەلام لە كۆندا يەكەك دەچوو مالى خزم و كەس و كارەكائىيان ئاگادار دەكىرىمە...!

شىوازى بەرىيەبرىنى مەراسىمىي تازىيە، ئىستا خىمە ھەلدەدن بۆ ئەمەي مالى خاون مردوو پېس نېبى؛ لەھەمانكەندا بەھۆى بچۈوك بۇونەمەي خانووەكەن و نەبۇونى جىورىيەكى گۈنجاو بۆ پېشوازىكىرىن لە سەرداڭكاران، بۇيە، ھەنۇوکە پەنادىبرىتە بەر ھەلدانى خىمە يان چادر، ئەمەش خزم و كەس و كارى نزىكى خاون مردوو بەم كاره ھەلدەستن. لەمبارەيەوە خانمەيىكى تەممەن (٥٥) سال، دانىشتۇرى گەرەكى(نەورۇز) دەلىت: "خزم و كەسە نزىكەكائى وەكى مەندالى خوشك و برا و، جىران يان خېرخوازىك، بەلام لای چىنى بالا بەردەستەكائىيان بەم كاره ھەلدەستن... جاران خىمە نەبۇو، لە مالى پرسەي ژنان دادەنرا، بەلام پىباوان لە خانووەكى ساھىپ تازىيەكە دادەنلىشتن. شەتكى دى، جاران تازىيە (٧) رۆز بۇو، دواتر بۇو (٣) رۆز و پىباوان سېمینان و ئىۋاران لە مزگەفتى دەبۇون، بەس لۇ ناخواردن دەھاتتەمە مارى...".

لەكۆندا خىمە نەبۇو، خەلکى لەممالى خاون مردوو پرسەي ژنانىيان دادەنا، بەلام پرسەي پىباوان بېيانىان و ئىۋاران لە مزگەوت بۇو، لەگەل ئەمۇشدا يەكىك لە مالە جىرانەكان، بۆ پىباوان ئامادە دەكرا، كە لە كاتەكائى تردا لەمئى دەمانەمە، تاكو پرسەكە تمواو دەبۇو. حالى حازر، پرسە دوو رۆژە و پىباوان تەنھا لەسەعات دووی پاش نىوەرۇوە دەچەنە مزگەوت و دادەنلىشنى تاوهەكى پېشوازىي لە سەرداڭكارانى پرسە بىكەن، كاتەكائى تر لە مالىيەكى جىرانى خاون مردوو دادەنلىشنى. ھەرووەها ئىستا پرسە؛ لەھەندىك گەرەكى شارى ھەولۇر بەتەنلىشىت مزگەوتەكائىمە شۇنى تايىھەت بە پرسەي ژنان دىارىيەك او، پېنى دەلىن ھۆلى پرسە گىران؛ ئەمە ئەگەر چىي لەرۇوی ئايىيەمە، پرسە گىران و دانىشتن بەم مەبەستە، بۇونى نىيە، بەلام ئەمە نەريتىكى كۆمەلایتىبە و دىوھ كۆمەلایتىيەكە ئەم حالەتەي فەرزىكىرىدۇوە. بەلام لەھەندىك گەرەكى تردا، يەكىك بۆ خېرى خۆى خانووەكى ھەمە و ھەندىك شتى تىيا داناوه بۆ ئەمەي لەكائى مەراسىمىمەكائى پرسە گىراندا، جىرانەكان بتوانن بەكارىيەن، ياخود شوينىكى ئامادەكىرىدۇوە تەنھا بۆ ئەم مەراسىمە.

ئىستا، لەمھراسىمەكانى پرسەى ژنان؛ مەلازىن^(۱) دەھىن تاوهەكى قورئان بخويىنى، بەلام لەبرابردوودا و لە پرسەى ژناندا، قورئان خوينيان نەبۇو، تاغنها كەسىك كە دەنگى خوش بوايە دەهات و (سەردىلەكە)ى دەگوت، واتا؛ بۇ مردووەكە دەلاۋادمۇ، ياخود كەسىك كە كەسىكى خوشەويىتى مردووە يان كاتىك گەنجىك بەدەستى رېزىمى بەعس لەسىدارە درابا يانىش سەرنىگۈنكرابا، ئىنچا خىزان و كەسوکارەكانىشى ئاڭدار كراپانمۇ كە نابى پرسە بىگىرن؛ ئەوا، كەسوکارى ئەو مردووە، بەتايىھەت دايىك و خوشكى دەستىان دەكىرد بە لاۋاندۇمۇ و سەردىلەكە گۇتن، ھەرۋەھا زۆر بەگەرمى و بەكۆل دەگرىيان و شىوەنپان دەكىردى. ئىتر ئەم حالتە بۇ ئەم جۇرە خىزانانە، لە ھەممۇ پرسەھەك كە ئامادەي دەبۇون، دووبارە دەبىزۇ و بىرىنپان دەكولايىمۇ و كور و براي خۇيان بىردىكەتىمۇ، ھەربىزىيە؛ لە پرسەى مردووى دىكەشدا، بەھەمان گۇر و تىن دەيان لاۋاندۇمۇ و شىوەنپان دەگىردا.

ھەنۇوکە و لە سەردىمى ئىستادا، لە دووم رۆزى پرسەى ژناندا، مەلازىن مەلولۇد دەخويىنى (خوينىنى مەلولۇد سەبارەت بە پرسەى ژنانى خىزانە دەولەمەندەكان، ناوهەند و ھەزارەكانىشدا، ھەر وەكى، تەنھا لەرۋوى پېداۋىستىي و شىرىنى و خواردن و خواردنەمۇوە ھەندىيەك جىاوازىي بەدىيە دەكىرىت). لە رۆزى مەلولۇد پرسەى ژناندا، مېزىيەك لەپىش مەلازىن ئامادە دەكىرىت، ئەمانەي لەسەر دادەنرەت(شەرىمەت، شەكىر، ھېلىكە لەنپىو تاسىيەك شەكىر و قەسپ). مەلازىن مەلولۇد دەخويىنى و يەكىكىش دەف لىدەدات(ئەو ووشاھەي لە مەلولۇدا دەوكۇتىتىمۇ: باسکەرنى ھەندىيەك لە ژىانى پېغەمبەر"-درودى خواي لەسەر بىت"، ھەندىيەك ناوى كەسوکارەكەي و سەحابىيەكان، دەھىنرەت)، دواتر نزا دەخويىن و ھەممۇ ئامادەبوان رۇو لەقىيلە رادەمەستىن و نزا دەكەمن(مەلازىن نزاكان دەلىت و ئامادەبوانىش دەلىن: ئامىن)؛ ھەركە مەلولۇد تەماو دەبىتىت، مەلازىن كارى تەماو دەبىتىت و مەراسىمەكە جىدېلىت، ئىنچا ئەوشتanhى لەسەر مېزەكەن، بەسەر ئامادەبواندا دەبەخشىتىمۇ، ھەركەسمۇ ھەندىيەكى لىدەخوات يانىش بۇ كەسوکارى خۇيان كە ئەم كات لەپرسەكەدا ئامادەنلىپۇون، دەبەنەمۇ.

پرسەكىران بۇ مردووىيەك كە تەممەنەندىبىت يان گەنج بىت، جىاوزىيەكى نىيە، تەنھا ئەمەيە كە دەلىن: گەنجەكە دىنیا نېبىنيوھ و تەممەنى كەم و خۇشىي ژىانى نېبىنيوھ، بۇيە زىاتر خەمىسى بۇ دەخۇن، لاۋاندۇمۇش زىاتر بۇ ئەمان دەكىرىت. جارى وا ھەمەيە كەسىك كور يان كچىكى گەنجى دەمرى، بۇيە بە پەرۇشتە لە كەسىكى بەتەمەن. ئەمەش لەرۋوى دەررونىيەھەي، ھەرۋەھا سەبارەت بە رازاندۇمۇھى گۇرستان و بەخشىنەمە شىرىنى لەسەر گۇرستان، ئەوا؛ ھەممۇ ئەرىتى كۆمەلایتىپەن.

كەواتە؛ ئەم مەراسىمە ھەم ئايىننەيە ھەمەيش كۆمەلایتىي. ئايىننەيە لەبەر ئەمەي زۆر بەھىنگا وەكانى ئەنچامدانى پرسە بە ئايەت و قورئان خوينىن و نويىزىك دەست پېندەكەت و تەماو دەبىتىت، ئەمە رېيگەيەكە بۇ گۇزارشتىكەن لە ھەست و سۆز و بېرۇباھرى ئايىننەي، كۆمەلایتىشە لەبەر ئەمەي ئەو ئامازانەي لە پرسەدا مۇمارسە دەكىرەن، ھەلقۇلاؤى كۆمەلایتىپەن و لە ئايىندا ئامازانپىن نەكراوه، ئەمانە بەشىتىك لە كۆلتۈرۈ ئاۋچەكە،

¹ لىزىدا كاتى دەلىن مەلازىن واتا مەبەست ئەم ئافرەتىيە كە بۇ پرسەى ژنان دەھىنرەت كە ئەزىز مۇون و شارجايىي ھېبىت و بۇ ئەمەي لە پرسەكەدا قورئان بخويىنىت.

همروهها به هوی فرهنگ‌پریمیو له شاری هولییر سهنج دهدزیت، که نهریت و کولتوری کومملگانی تر تیکمی به کولتوری شاری هولییر بوده.

2. وەزىفە ئىكۆمەللايەتى:

پرسه، وزیر فرهنگی کومه‌لایتی ئاینی همیه، به پیشنهاد دمربرینی هاووسزیبیه برو خوشبویستان و کس و کار و خاون مردو، هر لهم ریگمیوه، گوزارشت له هاوخه‌می و دمربرینی ریزه بوق مردووه‌که و خاون مردووه‌که. پرسه گیران؛ جوریک کونترول موماره‌سه دهکات لمسر تاکه‌کان، واته؛ کونترولی کومه‌لایتی موماره‌سه دهکات، وابسته‌ی کومه‌لایتی له نیوان تاکه‌کان به هیزدهکات و یه‌کانگیری کومه‌لایتی و پشوندی کومه‌لایتی توندو تولتر دهکات، کمواته؛ پرسه گیران، بخشیویه‌کی سمره‌کی، ریکختنی کومه‌لایتی له کومه‌لگادا به مرجه‌سته دهکات و کاریگمری همیه لمسر حیگیری و یه‌کانگیری نیو گروپیکی دیاریکراو یان کومه‌لگایه‌کی لوكالی دیاریکراو.

هر روه ها خانمیکی تهمهن (۷۰) سالی دانیشتووی گهړ مکی (زانکوی یهک)، دهليت: "تازیه، و اجبهکی کومه لایهاتیبه، و انا؛ عهیه لهېر کومه لایهاتی لومهست دهکمن، چونکه وهکی قمرزی لیهاتیبه، بهلام همندکه جار ساحیب تازیه همهست دهکات خهی کم دهې، چونکه مهشغول دهې خوی لهېر دهکا...". لهګهمل ئهو هشدا بهېټی بُچونه زورینهه نموونه که دهلين پرسه، لهېر ئوهی ئینسانه کان به حوكمی ئوهی عاتیهه خوشمويستی بُو ئهه مردووه و کامسوكاري؛ پرسهه یې دادهنتن و بتیان باشه".

کمها و اته پرسه و هزیفه‌یکی کومه‌لایتی لهناو کومه‌لگادا ئەنجامدەدات، ئەگەر يەکیکی كەمسييکى و هفات بکات و خزم ياخود هاورييەكى نەچىت بۆ پرسەكە، ئەوا؛ به عىيە بويان هەشمار دەكريت، چونكە چۈننیان بۆ پرسەكە رېز و خۇشمەيىستى خۇيان بۆ خاونەن پرسەكە دادەنرىت؛ هەميش و مکو دەستەوايەكە، قەرزدار، وانە؛ ئەگەر ئەمېش پرسەي هەبۇو، ئەويش دەچىت بۆ پرسەي ئەو و ھاوخەمى و رېز و خۇشمەيىستى خۆى بۆ خاونەن پرسەكە دەردەپرىت. لىرەدا بۆمان دەرمەمەيت؛ لە ئەنجامى پرسە كېراندا، جۇرييىك لە وابەستەيى كومه‌لایتىي و يەكانگىرىي كومه‌لایتىي موئارەسە دەكريت. هەميش و هزيفەيەكى ئابىنى ھېبە كە وادەكتا ئامادەبوان بېپىر و باولەياندا بچنەوە، زۆرجاران خەلگانىيک لەدواي پرسەوە باولەدارلىرى و زياتر پابەند دەبن بە موئارەسەكىرنى سروت و مەراسىمە ئابىنېكاني وەك: نویز، رۆز و، حەج و عەمر ٥.

خانمیکی تمدن(۶۶) سالی دانیشتووی گهره‌کی (گولان ۱)، دلیت: "پیشتر لهناو همولیریايان له تازیبیه، به خیر هاتن نهبو؛ پیمان عهیبوو قسیه بکهن، ساحبیب تازیبیه پیمان عهیبوو به خمرکی بربین به خیر هاتی، پیکمنیین نهبو... خوشیان نهدشوشت هفتا مانگه‌کی (به هیچ شیوه‌کی سه‌ری خویان نهدشوشت). تئیستا خمرکی دهزان و له دیین

گمیشتنینه و خمرکیی فیربوینه. هنکه کوره گەنج و کچه گەنج دەمریی، کەس پرچى ناپەنتموھ و لەخزیان نادەن....".

ھەروەھا، خانیتکی تامەن(۵۲) سالی دانیشتووی گەرەکی(زانکۆی ۱) دەلیت: "ساحیب تازییە، دەبى لەبنە بانى دانیشى، جاھیز مکانیش دەبى لەبنەبانى بن و نابى بۇ پېشوازىكىردن لە سەردانکەران- ھەستتەمە، چونكە عەبىه، پېرەكان دەبى ھەممۇ كات لە تازییە دابنیشىن، چونكە عەبىه و خمرک لۇمەھى دەكەن، پېر و جاھیز دەبى دانیشىن، ئەمە لۇ مردى پېر و جاھیز و مکى يېتكە...".

بەپىلى بۇچۇونى تاكەكانى نموونەكە، دەبى خاون پرسە لەسەرمۇھ ياخود لەبنەبانى شۇينى پرسەكە دابنیشىت؛ يانىش لەتەنیشت مەلازىن دادەنیشىت، بەلام بەگىشىتى دەبىت لەشۈيىنە دابنیشىت كە ھەر كەسىك لەدەر وازەھە بىت يەكسەر خاون پرسەكە بېبىتىت و بتوانىت بە ئاسانىي بچىتە لای و سەرەخۋىشى لى بكتە.

ئەمە ئىستادا دەبىنرىت (سەرەخۋىشى لە مزگەوتەكان و ھۆلى ژنان)، خەلک (خاون تازىيە) ئەم کارە دەكەن، لۇوانىيە بۇ كار ناسانىي بىت، بۇئەمە زۇوتە مەراسىمەكە بەكۆتا بىت. زىتىر لەھۆش، پرسە بەم شىۋىھى ئەمەرۇ دەكرىي بلىيىن، نەرىتىتىكى كۆمەلەيەتتىيە وبەرگىكى ئايىنىي بەپەرداڭراوە. كەواتە؛ پرسە كېران و سەرەخۋىشىكەنلى خەلک لە خاون مەردوو، بەشىكە لە كولۇتۇرۇ وەلقلۇلۇي پاشخانى كۆمەلەيەتتىي ناوچەكەمە.

3. بىرى تىچۇونى پرسە:

123

سەبارەت بە خەرجىيەكانى پرسە؛ باشبوونى بارى ئابۇرۇي خەلکى ھۆكارىكە بۇ دروستبۇونى گۇرائىنەكى زۆرى ئەم مەراسىمە؛ لەھەمانكانتا بۇوەتە ھۆى ئالۇزبۇونى ووردەكەرگىيەكانى پرسە لە شارىيە ھەۋىلەر. اىرەدا بەپىلى بۇچۇونى زۆرەنەي نموونە تۈزۈننەمەكە²، دەلەن: "مەسروفات لەسەر مالى ساحیب پرسەكەمە؛ بەمەرجىك بارى ئابۇرۇي باش بى؛ ئەمگەن نا(واتا زىروفى خرآپ بى)، خزم و كەس پارەي بۇ كۆدەكەنھەو و دەيدەنە خاون پرسەكە، ھەر كەيىان و جەمەتىك خواردۇ ئامادە دەكەن". ھەروەھا بۇ مالى خاون پرسە خواردۇ دروست دەگىرتىت، مەرج نىيە ھەزار بىت ياخود بارى ئابۇرۇي باش بىت، چونكە ئەمە وەكى دەستتەوايەكى لىھاتووه، دواتر ئەوانىش بۇ پرسە ئەوان خواردۇ دروست دەكەن.

بەپىتىيە خەرجىيە مەراسىمى پرسە لەسەر خودىي خاون مەردوو، بەلام ئەمگەن لەرەوو ئابۇرۇيەمە باش نەبى، ئەمە؛ خزم و كەس پارەي بۇ كۆدەكەنھەو، ياخود كەسى نزىكى خەرجىيەكان لە ئەستوئى خۆى دەگىرتىت؛ بەتايىت ئەمگەن كەسە مەردووەكە مندالى لەپاش بەجىمانىت(واتا مەندالەكەنلىان تەممەنيان لەخوار 18 سالىيەمە بىت). ئەم حالتە لەر ابردۇودا و نەبۇو، ھەر كەسىك كە دەچۇو بۇ پرسە، بېرى دەس و دىاريي نەدەچۇو، دىارييەكانىش: فەردە بىرنج، ئارد، شەكر، تەنەكە رون، ياخود حەيوانىيان دەبرد، ئىستاش لای ھەندىك، ئەم نەرىتە مۇمارسە دەكىرت و ماوە، بەلام زۆر بەكمىمە.

² كە دو توپىت زۆرەنەي تۈزۈننەمەكە، واتا ئىيە زىباترى نموونەكە ھەمان بۇچۇونىيان ھەمە.

خواردن و خواردنەمکانی پرسه؛ لەھەممو جىهاندا بۇونى ھەمە، واتە پەيوەندىيەك ھەمە لەنپۇان پرسە و خواردن. تەنانەت ئەمە بۇوە بەمەشىك لە نەرىت و پەيوەستە بە رىزگەرنى لە نەيىنېيە شاراومەكانى مردىن. خواردن پەيوەندىيەكانى نپۇان خزمۇكەس بەھىزدەكت، ھەستى ئاسوودەيى و ئارامى دەبەخشىت و پالپىشىيەكە لەكانى تەنگانەكانى لەدەستدانى ئازىزان(79, Thursby, 2006).

لەرۋىزگارى ئەمرۇدا، لەناو پرسەدا، تەنھا ئاو پېشىكەش بە ئامادەبۇوان دەكىت، بەلام لە ژەمەكاندا خواردن ئامادە دەكىت و پېشىكەش بەوانە دەكىت كە لە پرسەكەدا ماونەتتەوە و نەرۋىشتۇن(ھەنۇوكە؛ لەزەمەكاندا، تەنھا كەس و كارە تزىكەكانى خاونە مردوو لەكەملەئو كەسانەى كە لە شۇنى دوورەوە هاتۇن، بۇ نانخواردن، دەمپىنەمە)، بەلام لەنپۇا پرسەي چىنى بالا، چا و قاوهش پېشىكەش دەكىت. ھەرجەنە لە رابردوودا ئاواو و چا و جىڭەرە پېشىكەش بە ئامادەبۇوان دەكرا. بەلام لەكانى مردىنى كەسەكە، جىرانەكان ياخود خزمىك دەسىبەجى خواردىنىكى ئامادە دەكىد. دەتوانىنин بلىين، ئەمەش گۈرانيي بەسەردا ھاتۇوە، چونكە جاران جىرانەكان ھەركەسە و بەپىي تواناي خۆى سىنېيەك خواردىنى ئامادە دەكردوو دەبىرد لەكەملەيىكى لەخاونەن پرسەكە دادەنىشت و، بەزۇر ئەمە كەسەي دادەناو خوادىنەكە لەكەملەخوارد. ئەمەش بۇ ئەمە بۇوە تاوهك و خاونە پرسە بتوانىت ھەندىيەك لە خەممەكانى وەلاوه بىنیت و بتوانىت تواناي ھەبىت تا لەسەر پېيمەكانىي بۇھەستىت و بەرددەوامى بە ژيانى بىدات.

بىرى تىچۈونى پرسە لە بنەمالېيەكەمە بۇ بنەمالېيەكى تىر دەگۈرېت، لە نپۇ چىنى بالا؛ زۇرجاران، تەنھا لەرۋىزىكەدا نزىكەي (12-9) ملىيون دینار خەرجىراوە، بەلام لەنپۇ چىنى ناولەندا، ئەم خەرجىيە نزىكەي (٥،١تاوهك، ٠٠٠،٠٠٠) ملىيونىك و پىنج سەد ھەزار تا دوو ملىيون بۇوە، كەچىي؛ لەنپۇ چىنى ھەزاراندا، ھەر ئەم خەرجىيە نزىكەي (٩٠٠،٠٠٠،٠٠٠،٠٠٠) ھەزار تا ملىيونىك دینارى تىچۈوە. ئەمە خوادىنەكە لەپرسەدا ئامادە دەكىن؛ بەزۇرە بىرخى بىرخى بەرگە و گۆشىتە، بەلام ھەندىيەك جار خواردن لە چىشىخانەي دەرەوە دەھىزىت، ئىنجا يان بىرخى بەرگە و گۆشىتە يانىش كەباب؛ دىسانەوە، ئەمە بەپىي بنەمالەي خاونە پرسە دەگۈرېت، واتە، لەنپۇ چىنى بالا، ھەندىيەك بنەمالە لە پرسەكائىاندا، بەرخى سوركراوە لەچىشىخانەكان بەرادان دەدەن و، دواي نانخواردىنىش جۆرە شىرىنى؛ چى ئۇمۇ لەمەلەمە دروستى دەكەن، چى ئۇمۇ ھېشىي لە دووكانى شىرىنىيەكەن دەيىكىن و پېشىكەشى ئامادەبۇوانى دەكەن. ئەگەر سەرخى بەھىن، دەبىنن گۈرانتىكى زۇر بەسەر مەراسىمەكانى پرسەدا ھاتۇوە؛ لە نپۇان رابردوو و ئىستادا، چونكە جاران ئەگەر يەكىك پرسەي ھەبوايى، نەدەبۇو ھەممو جۆرە خواردىنىك ئامادە بىكەت، لەبەرئەمەي عەمېب بۇوە، بۇ نۇمنە خواردىنى كەباب، يان بەرخى سوركراوە، ياخود شىرىنىي پېشىكەشىرىن، چونكە لە دواي (٣-١) سال، خاونە مردوو نەياندەتوانى ئەمە جۆرە خواردىنە دروست بەكەن كە لەسەرەمە ئامازەيان پېكىرا، تەنانەت ھەندىيەك لەمە خىزانانەكى كە كورىيەكى گەنچ يان كەچىكى گەنچيان دەمرد، ئەمە ئەمە جۆرە خواردىنىشيان ئامادە نەدەكەد كە مردووەكە حەزى لېيىووە.

هەنۇوکە، لە پرسەدا، مەلازن بۇ قورئان خويىدىن دەھىنرىت، ئەمماش نەرىتىكى نوبىيە(ئەم حالتە لە دواى سالى ۲۰۰۰ موه دەستى پېتىرىدوو) ، ھەرەمكۆ زۇرېنى نموونەسى توپىزىنەمەمەكە دەلىن: "ئەگەر خاونەن مەلازن نەھىنى بۇ پرسەكەمى عاھىء؟ خەلگى لۇمەيەن دەكەن...". ھەندىك لەبەنەمالەمەكان پېتىيان وايە، ئەگەر ئەم مەلازنەسى كە بەنەمالەكىيان بە پەسەندى دەزانى و لە نتىۋياندا باوه كە بۇ ھەممۇ پرسەكەنەن خۆيىان، تەنھا ئەم بەھېنن، ئەوا؛ ئەگەر خودىي ئەم مەلازنە نەھىنى، ئەوا بە بەعىيە ھەزىمار دەكىرىت. ھەرەمكۆ زۇرېنى نموونەسى توپىزىنەمەمەكە دەلىن: ھەندىك دەلىن مەلازن دەنگى خوش بى، ھەندىكى دى دەلىن پارەكەمى كەم بى، ئەم بېنن. بۇ ھەنەنەن مەلازنىش موعامەلەسى دەسەققىشى لەگەن دەكەن.

خانمەتىكى تەمەن(٤٩) سالى دانىشتۇرى گەھەركى(رۇشىپيران)، دەلىت: "ئەمن دېتىتم ئەگەر مەلازنەكە قورئان خىنمەكى باشىش نىبى بىس دەنگى خۇشى دەپەينن، چونكە دەلىن عىيە ئەگەر مەسەجەل بەھېنن و، خەركى لۇمەيەن دەكا و دەرىن رەزىلەن لۇيە مەلازنىان نەھىنایە..." .

بەمېتىيە؛ ھەنەنەن مەلازن بۇ پرسەمى ژنان، بۇو بە نەرىتىكى كۆمەلايەتىي و ئەنجامنەدانى بە عىيە لەقەلەم دەدرىت. لە پرسەكەندا، لەرىگايى كەسانى تەرھو مەلازن دەھىنرىت، دەبى ئەم كەسە، يەكىكى ئەزمۇندا بىتىت و شارەزايى لە دەستىشانكەرنى مەلازنەكەندا، ھەبىت. ئېنجا جارى واهىيە بەھۇي ئەھەنەن مەلەكەنى دىارييكرار ئەم مەلا ژنەيەن بۇ پرسەكەنەن ھەنەنەن، ئېتىر ئەمانى دىكەش دەبىت ھەمان مەلا ژن بەھېننە، ئەگەرنا شۇورەسى دەبىت بۇيان.

لەسەرتادا، واتە سەرتاتى باوبۇونى ئەم دىاردەيە، ئەم پارەيە مەلازن وەرى دەگرت دىارييكرار نەبوو، ھەركەسەم بەئارەزوی خۇى بېرە پارەيەكى بە مەلازن دەدا. پاشان كە دىاردەكە بۇو بە نەرىت، ئېتىر ئەم دەسەققە ورده ورده زىيادىي كرد، واى لىيەت كەمترىن دەسەققى مەلازن لە(٤٠٠) دۆلار كەمتر نەبوو. پېشتر مەلازن بەيانان و ئىواران لە پرسە دادەنىشت و قورئانى دەخويند. پاشان (وزارەتى ئەمۇقاپ و كاروبارى ئائىنىي) نرخى ئەم دەسەققە دىارييكرد كە نابى لە(٢٠٠) ھەزار دىنار زىاتر بى و، كاتەكانى ئامادەبۇونى مەلازنىشى دىارييكرد؛ لە كاتىزىر(٤-٢) ئى عمسى دەبىت مەلازن لە پرسەكەندا دابىشىت.

4. ئاماڭەكانى پرسە^٣:

- پرسە گىران، خۇى لەخۇيدا بەماناي رىزلىنىانە بۇ مردوو، لەھەمانكەتىشدا بۇ دەرخستى پېتىگەنى كۆمەلايەتى خاونەن پرسەكەمە. لەرابرەدودا، ھەندى داب و نەرىت ھەبۇون، كە لەپرسەدا مومارسە كراون و ھەمكۆ ياسايمەكى زارەكى و كۆمەلايەتى لىيەتابۇو؛ لەوانەش خەم باربۇون، گەريان، لەبەرگەرنى جل و بەرگىي رەش بۇ ماوەيەكى دورودرېز؛ ھەندى جار تا مردن لەپەر نەدەكرارو،

³ مەرج نىيە ئەم ئاماڭانە لەلای ھەممۇ بەنەمالەمەك وەمكۆ يەك بى؛ واتا ھەندىكىيان تاكۇ ئىستاكە پابەندىن بە شىيون و لاۋاندىنەو... هەندى بەلام لەلای ھەندى بەنەمالە ئەم شتانە زۇر كەم بۇتەمۇ.

لەھەمانکاتدا قەدەھەگىرىنى ھەندى رەفتار، وەك: پىكەنин، گالتنە و سو عېتىرىدىن، تەماشاڭىرىنى تەلمەفزىيۇن و گۆيىگىرن لە رادىق، ئەنجامدانى ھاوسەرگىرىبىي لەرىگەي ئاهەنگ گىزانەوە، چۈونە ئاهەنگ و لەپەركىرىنى جلوپەرگى ئالا و والا و رەنگاورەنگ، چۈونە ئازايىشىغا، قىز چاڭىرىنى و خۇرازاندىنەوە، زىرلەپەركىرىنى، بەشۇودانى كچان و ژنخواستن بۆ كوران، تەنانەت زۇو سەر شوشۇنىش عەبىبىو.

ئەو كەسەي پېرسەدارە، ياخود دلتەنگە، جلى سەوز و سور و جوان لەپەر ناكات، دەستىيان لەخەنە ناگىن، چاويان كل ناكەن، ناچەن میوانىي و شايىھو. لېرسەدا ژنەكانيان پېيان شەرمە جلى سەوز و سور لەپەر بەكەن و خۇيان بىرازىننەوە و بۇ شايىي و میوانى بچن(بايەزىدى، ۲۰۱۵: ۸۰).

ھەنۋوکە، ئەو نەريتانە ھەندىك گورانىيان بەسەرداھاتووه، ئىستا ھەر لەناو پېرسەدا، لەسەر ھاوسەرگىرىبىي كچان و كورانىيان رىيىكەمۇن و باسى ھەممۇو ووردەكارىيەكەن دەكەن، لەپەركىرىنى جلوپەرگى رەش و رەنگى دېكەش ئاسايىيە. خۇرازاندىنەوە و چاڭىرىنى دەمۇجاوو و لەپەركىرىنى جلوپەرگى گرانبەها و درەشاۋە، لەپەركىرىنى خشلۇزىر و زىۋى گرانبەها، نەك ئاسايىيە، بىلکو بۇوه بە نەريت و مومارەسە دەكىرىت. پىكەنин و گالتنەكىرىن و ئەوشتەنەش ئاسايىين، تەنانەت بۇ دەربازبۇون لە قورسايى ئەو ياسايىيە، قىسىمەك ھەمەيە و لە پېرسەكاندا زۇر دووبارە دەكىرىتىمۇ؛ كاتىك كەسىك لە پېرسەدا پىنەكەننىت دەگۇتىرىت "ئەوە مردووھەكە ئىماندارە بۇويە لە پېرسەكىمدا خەلکىك پىنەكەنن".

خانىيەكى تەممەن(٦٠) سالى دانىشتۇرى گەرەكى (برايدىتى) دەلىت: "پېشتر، پاش تازىيەي، ساحىب تازىيە بەسال يا چەند سال و بە چەند مانگ تەلمەفزىيۇنیان نەدەكەرددوھە، بەس ئىستا(٥) ١٥ رۆز تا مانگەك يان چەند مانگەكى كەم)، يەكمەك دەچى تەلمەفزىيۇنیان لۇ پىنەكە، بەخۇيان پېيان عەبىيە و نايىكەنەوە، نەكى خەرك لۇمەيان بىكا...". هەروەھا خانىيەكى تەممەن(٤٧) سالى دانىشتۇرى گەرەكى (ئازادى ١) دەلىت: "بەخۇرى دەبى ژن، چوار مانگ و دە رۆزان لۇ پىلاوەكە تازىيەي راڭرى. ئەڭەر حەملەيشى ھەبى ھەتا حەملەكەمى دادەنلى...". هەروەكە خانىيەكى تەممەن(٦٣) سالى دانىشتۇرى گەرەكى (ئازادى ١) دەلىت: "ئىستا لەناو تازىيەي ژنان، قىسە و باس لەسەر زىر دەكىرى، لەسەر وزىعى بۇوك و خەسسو، باسى بىرادەر و بىراژن دەكەن و، كچ بەميردەن و ژن ھىنان و بۇوكى فلانكىس بەختى باشە و... بەس جاران لە تازىيەي ھىچ قىسەك نەدەكرا، تەننیا چاڭ و باشى، بەحس و قىسەكىرىن يان بەس لەسەر مەدىيەكە بۇو...". خانىيەكى ترى تەممەن(٥٨) سالى دانىشتۇرى گەرەكى (زانقۇرى ١) دەلىت: "ھەنکە لە تازىيەي بەس بەحسى مەدىيەكە ناكىرى، بەس لە تازىيەي گەنچان بېرەكى لۇ مەدىيەكە بەجى دەليلن، ئۇرى دى بەحسى ھەممۇ مەمۇزۇ عەكە...". بەبۇچۇونى زۆرىنەي نومۇنى تۈزۈننەمە دەلىن: "پېشتر لەناو پېرسە پىكەنин نېبوو، بەلام ئىستا خەلکى ھەندىك گوراون، ئەڭەر پېرسە مەردوویەكى تۆزى بەتەممەن بىت، ئەمە خوا ڕەحم بىكەت چى دەكەن(لىرىدا مەبەستمانە پىكەنин و قىسە و باسى زۇرى تىدا دېبىت)، هەروەھا پېشتر خەلکىي پېيان شەرم بۇو لەپېش خاولەن مەردووھە پىكەنن، دەيانگوت؛ ئەو دلى غەمبارە، چۈن دەبى ئىئىمە پىكەنن، كەچى ئىستا ئەڭەر لەپېرسەمەكدا خەلکىي پىكەنن

دەلین: ئەو مردووهکە ئىماندارە بۇيە پىكەنەنمان دىت (واتا بەشىتىكى پەسندى دادەنلىن)، لەھەمانكاتدا خاونەن مال لۇمەيان ناكات.

ھەروەها پېشىتر دەبوايە خاونەن مردوو بۇ كچ بەميرددان و ژنەنەنائى كورىان بە بىتەنگى بىيان كردايە، هەر بۇ ئەممەش سالىك يا سال ىرادەوەستان تاكو پرسەكە كەمەنگى كاتى بەسەردا تىپەر دەبwoo، ئىنجا دەگۈزارىيەوە، لەم كاتەشدا جارى وا ھەبwoo كىشەي زور لەنیوان ئەو دوو خىزانەي دەيانويسىت ژن و ژنخوازىي بىكەن دروست دەبwoo، بەلام ئىستا وانىيە، كەسە نزىكەكان كۆدەبنەوە و بەھى دەنگى، واتا لەدواي مانگىك بۇ سى مانگ گواستتەھەكە ئەنچامدەن، ئەويش دىسانەوە بەھى ھەلھەل و شايى كردن. ئەمە هەر بۇ خزم و خاونەن پرسە نابوو، بەلکو بۇ ھاوسيكانيش ھەر رەچاوى ئەم حالتانە دەكريت و، بەپەيدەنگى ياخود لەھۆل گواستتەھەكە ئەنچام دەدەن، بىگە پاش ماۋىيەكى كەم، واتا هەر پرسە تەھاوا بۇو، ئەمە ئاسايىيە گواستتەھەكە ئەنچامدەن.

خانمەتكىي تەمەن (٧٢) سالى دانىشتۇرى گەرەكى (كوران) دەللىت: "پېشىتر لەناو ھولىرىيەن (٥١) يان دەكىر؛ ئەلبىريان پېتەنگوت، خزم و كەسى نزىكى ساحىب مەدىي غەدەكرانەو شىومەكىان دەكەد و، لەسەر قەبران دەيان خوارد ھەتا عيشا بانگى دەدا لەوئى دەمانەوە، دەيانگوت، عملە ئەساس لە (٥١) رۆزىي مردى ئىسىك و گۇشتى لىكجودا دەكريتىمە، ئەموجە ئەو عالىمە لەسەر قەبران نانى دەخون بەخىرى وى، ھەتا مەدىيەكە ئەزىزەتى نابى...".

بەگۈزىرەي ئەوانەي سەرەوە، دەركەھوپىت كە لەراپردووردا لەتىپ خەلکى يەك گەرەكدا يەكانگىرىي و يەكگەرتۇرى و وابەستەي كۆمەلایەتى لە ئاستىكى زور بەرزاپوو، كەمەي لەو خەلکە كەردووھ ئەموكات لە ناخوشى و خۇشىيەكەندا پىشى يەكتەن و ناخوشى و خۇشى يەكىيان بە هي خۇيان زانىيە، بەلام ئەم حالتە ھەننۇكە گۇرانى بەسەردا ھاتووھ و ئەم وابەستەي بەوشۇيەي نامماوه و ئەم يەكانگىرىيە كۆمەلایەتىيە خەلکى ناواچە و گەرەكىكى بەيەكمە دەبەستەمە، لەو ئاستىدا نامماوه، ئېتىر ئەمە بەھۆى ھۆكارەكانى (تىكەلاؤبۇونى گەرەكەكان، ئامرازەكانى تەكىنلۇزىيا، گۇرانى كۆمەلایەتىي، ئابورىي سىياسى و كولتۇرېي بەھۆبىت، ئەمە ئىتىيىنى گۇرانىكى زور دەكريت لە مەراسىمەكانى بەپەتىپ چۈونى پرسە لەم ناواچەيە.

پرسە واتا دەدانەوەي كەس و كارى مردوو و، پالىشتىركەن دەن بۇ ئارامگەرن و خۇ گونجاندىن لەگەل ئەم حالتەي كە تىپەكەمەتونن بە لەھەستەنەي كەسە نزىبىك و خۇشەويستەكانيان.

بـ- سەرخۇشى لېكىردىن لە خاونەن مردوو و كەس و كارەكەي سونەتە، چونكە پېغەمبەر (درودى خواي لەسەر بىت) فەرمۇويەتى: ئافرەتانىش دەتوانن وەكى پىباوان پرسە لېكىردىن لە خاونەن (صىقىي ٢٠١١، ٢٤٩). ھەرەمەكە خانمەتكىي تەمەن (٥٩) سالى دانىشتۇرى گەرەكى (گولان ١) دەللىت: " دەرىي خوا لەمەدىتان خۇش بى و ؛ سەبۈورىتەن بادات، خوا لەمەش خۇش بى...". بەپەتىپ دەبىنەن سەرخۇشى لېكىردىن بۇ دەدانەوە و رىزىلىنائى خاونەن مردووهكەيە، ھەروەها بۇ دەرىپىنى ھاوخەمەيە بۇ خاونەن مردووهكە.

ت- مهلوودکردن^{*} یهکیکه لهداب و نهریته تازهکان که ئیستا له شاری همهلیر مومارمه سه دهکریت. لم چهند ساله سه دوايیدا هینانی مهلازن بق پرسه بوروه بهزهروورهتیکی سهرهکی بق بهزیوه چوونی پرسه، چونکه ئهگهه مهلازن نههینریت بهعیبه بق خاونه مردوو همزمار دهکریت، خملکی لومیان دهکمن؛ لهگهله ئههوشدا، بههیچ شیوههک لههایینی ئیسلامدا ئامازه بهم شته نهکراوه، که له پرسهه ژناندا مهلازن بههینریت و مهلوود بخوینتیت، چونکه نه واجبه و نهسونهه، کهوانه؛ تمنها وهک نهریتیک پهپههوبی لیدهکریت.

لهم بارهیمه خانمیکی تمهن(٦٩) سالی دانیشتووی گهرکی (نوروز) دهلىت: "پیشتر، مهلازن ههرسی رؤژ سبیهان و تیواران دادهنىشت، بس ئیستا له سهعات(١) دین و، لمسهعات(٢) تا عمس دادهنىشن...".

هینانی مهلازن و مهلوودکردن، خوى له خویدا ئامازه بق ریز و خوشمویستى خاونه مردووهکه بق مردووهکمیان، لهههمانکاتدا بق ئوهه قورئان بخوین تاكو خیر بق روحى مردووهکه بچى، لهگهله ووتنههه ئهه همموم سهلاواتانه و فاتیحا خویندنه و زیکرکردن له پرسهکمیدا و، خملکی نزا دهکمن، کاتى دهلىن: "خوا له گوناحى خوشبى"، ههروهههه بخساندنههه شیرینى لهدوای خویندنههه مهلوودبیمهكه؛ هممومى بق خیرى مردووهکميه. لهدووم رؤژ پرسهکدا، مهلوود ئەنجامدەرىت؛ دەف لیدەدریت، باسى ژيانى پېغەمبەر دهکریت، سەلموات لیدەدریت، نزاکردن و پارانهه، ناویهناو مهلازن دهلىت: "(الفاتیحة)"، واتا؛ فاتیحه بق روحى پېغەمبەر و ئەم مردووه لېيدەریت. پاشان دهلىن: "خوا له گوناھەكانى خوش بیت". زورجار تیبینى دهکریت که لهنیو مهلوودبیمهكدا دەبیتە دەنگ، ژاۋەزاو و قىسەكىرىتىكى زۆر؛ ئینجا بق بىدەنگىركىنى ئامادەبۇوان، مهلازن بانگ دەكات و دهلىت: "الفاتیحه و سەلاوات لیدەن".

لەرۈزى مهلوودخوینددا، لەسەر مىزى بەردم مهلازن؛ چەند شىتىكىش ئامادەسازى بق دهکریت، وهك: كاسىمەكى گەورە له شەكر: بەپىتىي ئهه شەكرە قورئانى لەسەر دەخويىریت و بق مراز باشه و بەسەر ئامادەبۇواندا دابەش دهکریت؛ تاكو هممومويان مرازيان بىتىه دى، شەكر هەرزانه و شىرىيەنە و دەمى ئامادەبۇوان لەدوای رۇيشتن له پرسەكە، شىرىن دەكات، ئىنجا ئەوانشى رۈزى مهلوودىي نەيانتوانىيەت ئامادەبن، ئەمە ئامادەبۇوان بق ئەوانىش لەگهله خويان هەندىك شەكر دەبەنەمە. ھيلكە: دەكىرەت ناو شەكرەكە و ناوى ئهه ئافرەتانەي بنەمالەكە لەسەر دەنسەرىت كەمە مەنالىيان نابىت، دواتر ئهه ئافرەتەي ناوى لەسەر ھيلكەكە نوسراوه، ئەمە ھيلكەكە دەخوات تاومەكە منالىي بىت. مۇم: لەپىشى مهلازن چەند مۆئىك پېدەكەرىت (زمارەكەي دىيارىكراو نىيە)، ئەمە بق رۆشنىايىه. گۆل: لەسەر مىزى بەردم مهلازن گۆل دادەنریت، ئەمە ماناي دەربىرىنى خوشەمەسىتىبە بق مهلوودەكە و بق مردووهكە. شەربەت: بەپىتىي شەربەت بق كاتە خوشەكان دەبەخشىتىمە، لېرەشدا بق دەربىرىنى خوشىيە، هەروهەا بق ئەمە بىت به

* مهلوود له دووم رۈزى پرسه دهکریت؛ بەلام لەلای چىنى بالا لەسىئەم رۈزىدا مهلوود دەكمن، شەربەت دەگىزىن و جۆرەها شىرنى دادەنن، دواتر بە قايى سەفرى بەسەر ئامادەبۇواندا ئەم شىرىنەيىانە دابەشدەكىرىن.

خواردنویه‌کی پیروز (تفهرک)، لەپەر ئۇمۇھى ئایەتە قورئانیيەكانى بەسەردا دەخویزىت، گوايە، ئۇمۇھى بىخواتەو مازى دلى دىتە دى، بەتاپىت بۇ ئۇ كچانەي مىرىدىان نەكىدووه، ئىتىر گەلاسىك لە شەربەتە لەلایەن ئۇ كچانەو دەخورىتەو بە نىيەتنى مىرىدىكەن. هەروەھا لەدواى خوینىنى مەلولودكە گۇلاؤ بەسەر خەلکىدا دەپەخشىتەو.

خانمىكى تەممەن(۵۹) سالى دانىشتوۋى گەرمەكى (رۇوناكى) دەلتىت: "ئۇ شتانەي لەپېش مەلاڙىن دادەنرى: خورما، شەكر، چوکانىت، شەكرۆكە، لوقم و شەربەت، ئۇوانەي مازىيان لەدلىيە بەخسوسى ئۇ شتانەي دەخون. ھىلکەمى لەلەنەن شەكرى دادەنلىن لۇ ئۇ كەسانەي مەندالىان نابى؛ لۇمۇش پېرسى بەساحىب مردى دەكەن، ئەموجە چەند كەسەك ئۇمۇھى دەكەن، يانىش ساحىب مردى ھىلکەمان لۇ لەلەنەن شەكرەكەمى دادەنلى، ئەموجە لەپاشان كە مەلولود خىنرا، ھەركەسە ئۇوانەي مەندالىان نابى بەئازايى دەچن بە بىتدەنگى ھىلکەكەمى دەبەن، چونكە عادەت وايە، ژەنكە لەمارى لۇ خۇى دەيخوا؛ شەكرەكەش دەگىرىن و ھەركەسە ھەندەكى دەكاتە ناو كلىنىكەسى و دەبەنەمارى يا لەمۇيندەن دەيخۇن، بەس خورماكە، زىياتر لۇ ئۇوانەي دەورى مەلاڙىنېي و دەگىرىن... ئۇ كچانەي مىرىدىيان نەكىدىيە، پەرداخەك شەربەت دەخۇنەو، ئۇمۇھ لۇ مىرىدىكەنېي، چونكە ئۇوانە ھەممۇرى شىرناتىيە...".

لەميانەي تىپىنىكىردىنما نە مەلاڙىن و نە مىزى مەلاڙىن؛ تا ئەم چەند سالانەي دوابى بۇونيان نەبۇوه. دەقى پېرۇزى ئايىن، مەلولودىي خوینىن و لە نىويشىدا قورئان خوینىن لەمزرگەمەكاندا بېپارە، دوور بۇوه لە واقعىيەتى ئايىن و باورى ئايىنى، چونكە دەقەكەنلى خودا بۇ بازركانى و پارە پېيداكردىن نەبۇوه و نىيە، وەك چەندىيەن سالە لاي ئىيمەي كورد و گەلانى دونيا كارى پىندهكىرىت(ئەنور، ۲۰۱۰: ۲۹).

بەمېتىيە ئۇ شتانەي لەسەر مىزى مەلاڙىن دادەنرىت داب و نەرىتىكى وەرگىراوه، لە كولۇتۇرلى ترەوە وەرگىراوه و تىكەل بە كولۇتۇرلى كوردى بۇوه؛ كە ئەممەش بۇوه بە بەشىك لە داب و نەرىتى كۆمەلاًپەتى نېو كۆمەلگەكەمان، ھەروەھا ئۇشەنەنەي كەدەدەنرىت و بەبەرگىكى ئايىنى دايىدەپوشۇن و دەلىن؛ ئۇمۇھ مەلولودى لەسەر خوپۇراوه و بۇوه بە متەرك كەئمەمش پەيوەندىيەكى راستەمۇخۇ ناراستمو و خۇى بە ئايىنەو نىيە؛ بەلکو دروستكراوى كۆمەلگەيە و شىتىكى تر نىيە.

ث- رەشپۇشىن: پۇشىنى جل و بەرگىي رەش و مەكى داب و نەرىتىكى لەلەنەن خەلکى و اباواوه، رەنگى رەش بېپوشن(پۇشىنى رەنگى رەش لەكتى پىسەدا، ئەممە تىگەيشتن و گۈزارشتى خەلکى ئەم ناوجەھىيە بۇ پېسەبارىي، ئەگەرنا لە ناوجەھى دىكە رەنگى دىكە ئامازەيە بۇ ئۇمۇھى كە خاونەن تازىيەكە دلى بەخەمە و نىيەرمانە كە رەشپۇشىي؛ ئامازەيە بۇ ئۇمۇھى كە خاونەن تازىيەكە دلى بەخەمە و نىيەرمانە كە خۆشەمۇيىتىكى لەمدەستداوا، ھەر بۇيە جل و بەرگىي خاونەن پېرسە دەبى سادەرەش بىت. لە رابردىودا، ئەگەر مەردووەكە گەنچ بوايە، نەك ھەر ژنان، بەلکو تەنانەت پىياوانىش بەرگى رەشپۇشى، بەلام ئىستا خاونەن پېرسە، جل و بەرگى سادە رەش ناپوشۇن، بەلکو وا دەخوازرىت كە دەنک دەنک و نىتكى نىتكى سېپى يان رەنگى بەنەوشە ياخود قاوەيى لە جل و بەرگەكائىاندا ھەبىت. لەم

بارهیوه خانمیکی تهممن(٦٠) سالی دانیشتووی گەرەکى (براپەتى)، دەلیت: "جاران دەبا جلکى ساھىپ تازىبە رەش بى، نەدەبا برىقەتىدا بى. كېزى گچكۈكە و گەورە جلکى رەشيان لەپەر دەكىد، ئۇ جاكە(مەكسى ياخلىلىكى) دەبۇر رەشلى ئەوجە ئەگەر مەرىيەكە گەنچ بایە، پىاۋەكائىش قەميسى رەشيان لەپەر دەكىد، گەنچەكان لەپەر مەرىيە گەنچەكە قەميسى رەشيان لەپەر دەكىد. تىستا نەخىر، بەمشتۇپە نىبىي؛ تىستا عالمەكە لەدىنى تىكىچىشىتىيە و دەزانى شەتكى خراپە... خۇ تىستاش رەش لەپەر دەكەن بەس زۆر زۆر لەجاران كەمترە. كەلبەرىش دەكەن رەشكى سادە لەپەر ناكەن، چونكە لەشىرع ئەگەر بەنېيەتى پېرسە سۆرىش لەپەركەتى هەر گۇناحە...".

ھەروەها خانمیکى ترى تەممەن(٥٢) سالى دانىشتووی گەرەکى (زانكوا)، دەلیت: "جاران لۇ تازىبەتى، خەلک زېرى بەخۇوە نەدەكىد. ھەرپىش ھەممو شەتكى دەبا ساھىپ تازىبە و نزىكەكانى ھەرج زېرى دەبا لەخۇيان بەكەنھۇ... نەدەبۇر زېرى بېۋە بى لەپەر ئەوهى تازىبە دارە و ئەوه شەتكى عەبىي، ئەوجە ئەوه لۇۋەيە هەتا دىياربى خەمبارە. تىستا نا، لەپەرى دەكەن و ساھىپ مەرى زۆر كەميان لەپەر دەكەنھۇ، ئەوي ترىش كە زېرى لەمارى ھەبى، لۇ تازىبەتى، ئەويش بەخۇوە دەكا، ئەوه بوبىتە عادەت...". لەھەمانكاتدا خانمیکى تەممەن(٦٥) سالى دانىشتووی گەرەکى (شارى خەنەكەن)، دەلیت: "ھەنکە لۇ تازىبەتى، عالىم جلکى جوان و زېرى بەخۇوە دەكەن....". ھەروەها خانمیکى تر تەممەن(٤٩) سالى دانىشتووی گەرەکى (رۇشىنيران)، دەلیت: "ئەوهى تىستا لە تازىبەتى كەنەن ھەمەن كەنەن خۇپىشاندان و خۇعەرزاڭىزىدە، تىستا جلهكائىان-ھى پېرسە- زۆر زۆر فەرقى ھەمەن. ھەرچى جلى جوانە ئەوهى لۇ حەفلەتى لەپەر دەكەن، بەس سۆر و زەرد نەبى، ئەوي دى ھەمموسى لەپەر دەكەن...". بەھەمانشىوە خانمیکى تر تەممەن(٦٢) سالى دانىشتووی گەرەکى (ئازادى ٢) دەلیت: "ئەو جلکە رەشانەتى ئىستا گەران و بەقاش و ياقۇوتە و ئەوي لەپەر دەكەن، تىستا وەى لىيەتتىيە كو لە حەفلەتىيە كەنەن خۇي دەرازىتتىوە و خۇي دەرەدىنى، تازىبەتىيە لىيەتتىيە...". "رەش پۇشى بۇ ئافرەتان لەپەر خەفتەت بارى مەردووەكەميان ھېچ خراپى تىيا نىبىي" (صدىقى ، ٢٠١١ : ٢٤٨). لېرەدا دەبىنин كە رەش پۇشى و مەكى داب و نەرىتىكى كۆمەلایتى لىيەتتىوە؛ خاونەن مەردوو دەبىي جلکى رەش لەپەر بىكەت؛ ھەروەها ئەوانەتى كەدىنە پېرسەكەم دەبىي جلکى رەش ياخود دەبىي جلنىكى رەنگ مات بېۋشىن و كە دەچنە پېرسە، بەرگى رەنگلەرنگىيان نەپۇشى بىت، ئەمەش ئامازىدەكە بۇ دەربرىنى ھاوخەمى خۇيان بۇ خاونەن مەردووەكە؛ لەھەمنكاتدا جىاوازىيەك دەبىنин لەنپىوان رەشپۇشى تىستا و پېشىر؛ جلکى ئىستا ھەمموسى بەبرىقە و نەخشە لەپەرى دەكەن و كاميان گەران بەھايە ئەوي دەكەن و حازرى دەكەن و دەلىن لەپەر تازىبەتى لەپەرى دەكەن، بەلام پېشىر نەدەبۇر جلکىان برىقەتىدا بىت؛ ياخود بەنەخش بىت؛ ھەروەها تىستا زېرىو ئەلماس لەپەر دەكەن لەپەرسەدا و بۇوه بە عادەت و خۇيان عەرز دەكەن لەنۋا خەلکىدا، بەلام پېشىر ئەگەر يەكىن چ لەخاونەن پېرسە ياخود ئەوكەسانە دىن بۇ سەرداڭىردىنى پېرسەك نەدەبۇر زېرىيان بېۋە بوايە، چونكە عادەت نەبۇر و بىگە زۆر بە توندى لۆمەش دەكران لەلاين خەلکىيەوە؛ ئەمەش ئەو گۇرانكارىيەمان بۇ دەرەدەخت كە بەسەر شىوازى جلک، بەرگ، شىوازى پېرسەدانان، داب و نەرىتەكانى پېرسەدا ھاتۇوە.

